

See discussions, stats, and author profiles for this publication at: <https://www.researchgate.net/publication/392193483>

# Arslan, M. (2025). Kurd Kitêb Çapxane. (Expanded 2nd Edition), Wan: Peywend.

Book · May 2025

CITATIONS

0

READS

2

1 author:



Mesut Arslan

Mardin Artuklu University

14 PUBLICATIONS 10 CITATIONS

SEE PROFILE

Kurd û kitêb? Ma edebiyateke kurdan heye? An bi zimanê kurdî nivîs û perwerde dibe? Erê, bi sedan salan e dibe. Di serdema klasîk de destxetên kurdî hebûn; dîwan, mewlûd, mesnewî, ferheng... Di serdema nûjen de jî piştî çapxaneyên modern pirtûkên kurdî yên çapkirî çêbûn. *Kurd, Kitêb, Çapxane* jî dixwaze ji bo dîroka kurdiya nivîskî bibe çavkaniyek û wê qonaxa ku çaxê destxetan (manuscript) qediya û serdema pirtûkên çapkirî (printed book) dest pê kir ronî bike.

Mijara vê pirtûkê weşangerî û çapemeniya kurdî ya serdema Osmanî ye. Danasîna pirtûkên kurdî yên ku di navbera salên 1844-1923yan de di nav sînorên Osmanî de çap bûne, nasîna weşangerên van pirtûkan û têkiliya wan bi komeleyên kurdî re, herwiha weşanên mîsyoneran ên bi kurdî mijarên sereke yên vê xebatê ne. Loma di beşa 3 û 4an de danasîna 42 kitêbên kurdî yên wê dewrê tê kirin. Herwiha di beşa 2yem de têkiliya di navbera çapkirina kitêbên kurdî û pêşketina nasnameya kurdî tê nîşandan. Ji ber vê yekê di vê beşê de behsa komeleyên wê demê, wekî Civata Hêvî, û weşanên wan ên periyodîk, bi giştî çapemeniya kurdî ya serdema Osmanî, vegotina rewşenbîrên kurd ên wê demê tê kirin. Dîsa behsa du kesayetan tê kirin ku bi fikriyata xwe bandoreke mezin li kurdîtiyê û weşangeriya wê dewrê kirine: Ehmedê Xanî û Hacı Qadirê Koyî.

Naxwe em dikarin bibêjin ku du aliyên vê xebatê hene: Aliyê pratîk dixwaze listeyeke pirtûkên kurdî yên serdema Osmanî derbixe û bi vî rengî beşek ji dîroka kurdiya nivîskî û çapemeniya kurdî ronî bike; aliyê teorîk jî xîret dike peywendiya netewperweriyê û çapxaneyê diyar bike û bi vî rengî bandora çapkirina pirtûkan, weşandina kovar û rojnameyan a li ser nasnameya netewî ya kurdan destnîşan bike.

ISBN: 978-605-84345-0-9



9 786058 434509  
peywend - lêkolîn

KURD KITÊB ÇAPXANE • DR. MESUT ARSLAN

# KURD KITÊB ÇAPXANE

WEŞANGERIYA KITÊBÊN KURDÎ  
DI DEWRA OSMANIYAN DE  
(1844-1923)

DR. MESUT ARSLAN

[Çapa Duyem a Berfirehkirî]



PEYWEND

OPTIMA

*KURD KITÊB ÇAPXANE*  
*Weşangeriya Kitêbên Kurdî*  
*dî Dewra Osmaniyan de*  
*(1844-1923)*

DR. MESUT ARSLAN

Weşanên Peywend: 20 | lêkolîn/dîrok: 5  
Gerînendeyê Giştî: M. Xalid SADINÎ  
Edîtorê Kitêbê: Prof. Dr. Serdar ŞENGÜL  
Xwendina Dawî: Dr. Ayhan YILDIZ  
Berg & Rûpelsazî: Şemal Medya

ISBN: 978-605-84345-0-9

© Weşanên Peywend  
Çapa Yekem: 2015, Stenbol  
Çapa Duyem: 2025, Wan

Çap:  
Bizim Büro Basımevi ve Matbaacılık  
Zübeyde Hanım Mahallesi  
Sanayi 1. Cd. &, Sedef Sk. 6/1  
06070 İskitler/Altındağ, Ankara.

**PEYWEND**

Maraşel Fevzi Çakmak Cad.  
Özok Kültür Sitesi Yanı,  
No: 16 Kat 2, İpekyolu/Van  
Sertifika No: 77422

   @peywendkitab  
[www.peywend.com](http://www.peywend.com)

# KURD KITÊB ÇAPXANE

Weşangeriya Kitêbên Kurdî  
di Dewra Osmaniyan de  
(1844-1923)

DR. MESUT ARSLAN

[Çapa Duyem a Berfirehkirî]

**Mesut Arslan**, Perwerdeya xwe ya lîsansê di sala 2009an de li Zanîngeha İstanbulê di beşa Ziman û Edebiyata Tirkî de, ya lîsansa bilind (master, MA) 2014an de li Zanîngeha Mardin Artukluyê di beşa Ziman û Çanda Kurdî de, ya doktorayê (Ph.D) 2021ê de li Zanîngeha Dicleyê di beşa Ziman û Çanda Kurdî de qedand. Qada wî ya lêkolînê, weşanên kurdî di serdema Osmanî de û edebiyata kurdî ya klasîk e. Hin xebatên wî yên ku hatine weşandin ev in:

1. Şêxê Meczûb. (2023). *Dîwan*. Transkripsiyon: Mesut Arslan. Ankara: Kûltür ve Turizm Bakanlığı Yayınları.

2. Arslan, M. (2024). *Eqîda Kurmancî ya Mela Nesreddînê Zoqeydî*. Wan: Peywend.

3. Arslan, M. (2024). Şêx Suleyman el-Xalidiyê Sêrtî û Sê Helbestên Wî yên Kurdî. *Anemon Muş Alparslan Üniversitesi Sosyal Bilimler Dergisi*, 12(1), 105-125.

4. Arslan, M. (2024). Ali Emîrî'nin Mir'âtü'l-Fevâ'id Adlı Eserinde Osmanlı Dönemi Kürt Şairleri. *Dicle Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü Dergisi*, 36, 207-230.

5. Arslan, M. (2024). Peyrevê Melayê Cizîrî: Şêxê Meczûb û Dîwana Wî ya Kurdî. Di nav *Gotarên Vekolînên Çanda Kurdî* de (r. 205-220). Stenbol: Nûbihar.

6. Arslan, M. (2024). Ulemadan Münevvere Osmanlı Müelliflerinin Yerel Dillere Bakışı (Kürtçe Örneği). *Mukaddime*, 15(2), 250-277.

7. Arslan, M. (2024). Şeyh-i Meczûb (Sa'îd-i Merhûm) (1873-1915). Di nav *Şark Uleması VI. Cilt* de (r. 344-353), Ankara: İlahiyat.

8. Arslan, M. (2023). Pîrsgirêka Helbestên Bêmxes: Lêkolînek Li Ser Helbesta 'Îro Ji Destê Dilberê'. *Şarkiyat*, 15(1), 208-222.

9. Arslan, M. (2023). Hêmanên Fal, Reml û Muneccimiyê di Edebiyata Kurdî (Kurmancî) ya Klasîk de. *Rumelide Dil ve Edebiyat Araştırmaları Dergisi*, (Ö13), 1468-1482.

10. Arslan, M. (2023). Nêrîneke Giştî Li Nameyên Menzûm Di Edebiyata Kurdî (Kurmancî) Ya Klasîk De. *Anemon Muş Alparslan Üniversitesi Sosyal Bilimler Dergisi*, 11(3), 689-703.

11. Arslan, M. (2023). Di Nameyên Menzûm ên Seyid Eliyê Findikî de Çavdêriya Cîvakî, Rexne û Şîret. Di nav *Dilbilim ve Karşılaştırmalı Edebiyat -Karşılaştırmalı Edebiyat-* de (r. 128-138). Mardin: Mardin Artuklu Üniversitesi Yayınları.

12. Arslan, M. (2022). Emin Feyzi'nin Edebi Yönü Hakkında Birkaç Söz. Di nav *Süleymaniye'den İstanbul'a Bir Kürt Aydını Emin Feyzi Bey'in Hatıraları* de (r. 17-25). İstanbul: Nûbihar.

13. Arslan, M. (2016). Hacı Qadirê Koyî: Serencema Dîwana Wî Li Stembolê û Hevaltiya Wî Bi Keyfî Re. *The Journal of Mesopotamian Studies*, 1(1), 91-101.

*“Sê tiştên ku deriyê serdema modern vekirin  
çapxane, barûd û pisûla ne.”*

Francis Bacon, 1620.

*“Qewmê ku zîman û edebiyatê wî tune be ji heyata medeniyetê  
mehrûm e, ji mudafe‘a huqûqê xwe mehrûm e (...) eger ‘emrê min  
bihatana firotin bêtereddud minê bifirota, di rêya kurdan de serf kira.  
Lewra xelk ‘aşîqê mal û milkê dinê ye, wez ‘aşîqê lefzê kurmancî me.”*

Kurdîzade Ehmed Ramîz, 1911

*“Beytê ku bi zîmanê kurdî hatiye gotin, kitêbê ku hatiye çêkirin  
heya niha çap nebûye, ji bo vî qasî kesek şêx û mela û şa‘îrên kurdan  
nas nake, eger eserê wan bihata çapkirin dê bihatana naskirin.  
Îro li ser temamê kurdan ferzê ‘eyn e ku bi zîmanê xu bixwînin û  
binivîsin. Şêx û mela û şa‘îrên xu bizanin, şî‘rê wan,  
kitêbê wan li çapê bidin û bela bikin”*

Xelîl Xeyalî, 1913.

## NAVEROK

|                                                                   |           |
|-------------------------------------------------------------------|-----------|
| TEQDÎMA ÇAPA DUYEM .....                                          | IX        |
| PÊŞGOTINA ÇAPA DUYEM.....                                         | XI        |
| PÊŞKÊŞÎ.....                                                      | XV        |
| PÊŞGOTIN.....                                                     | XIX       |
| DESTPÊK .....                                                     | 1         |
| Armanc û Çarçoveya Xebatê .....                                   | 1         |
| Derbareyê Çavkaniyan û Rêbazê de .....                            | 4         |
| <b>BEŞA EWIL: KURD Û ÇAPXANE.....</b>                             | <b>7</b>  |
| 1.1. Derbareyê Çapxaneyê de.....                                  | 7         |
| 1.2. Çapxane Li Nav Dewleta Osmanî .....                          | 9         |
| 1.3. Çapxane û Rewşenbîrên Kurd .....                             | 13        |
| 1.4. Çapxane Li Nav Kurdistan û Çapxaneyên Kurdî .....            | 16        |
| 1.5. Kurd û Kitêb: Kurtedîroka Kurdiya Nivîskî .....              | 21        |
| <b>BEŞA DUYEM: KURD DI NAV DEWLETA OSMANÎ DE.....</b>             | <b>35</b> |
| 2.1. Pêşketina Nasnameya Kurdî di Nav Dewleta Osmanî de .....     | 38        |
| 2.1.1. Heta Şerê Cîhanê yê Yekem .....                            | 38        |
| 2.1.1.1. Destpêka Rojnamegeriya Kurdî: 22 Nîsan 1898 .....        | 39        |
| 2.1.1.2. Şoreşa 1908an: Meşrûtiyeta Duyem .....                   | 43        |
| 2.1.1.3. Civata Hêvî û Xelîl Xeyalî .....                         | 48        |
| 2.1.1.4. Kurdîzade Ehmed Ramîz û Pirtûka Wî ya Emîr Bedirxan..... | 54        |
| 2.1.1.5. Zextên ITCê Li Ser Civata Hêvî .....                     | 55        |
| 2.1.2. Dema Şerê Cîhanê yê Yekem .....                            | 58        |
| 2.1.3. Piştî Şerê Cîhanê yê Yekem.....                            | 61        |
| 2.1.3.1. Xebatên Siyasî yên KTCê .....                            | 61        |
| 2.1.3.1. Xebatên Siyasî û Dîplomatîk ên KTICê .....               | 64        |
| 2.1.3.2. Xebatên Kulturî.....                                     | 67        |
| 2.1.3.3. Guherîna Zimanê Komeleyên Kurdî .....                    | 74        |
| 2.2. Di Pêşketina Nasnameya Kurdî de Du Kesên Xwedî               |           |
| Bandor: Xanî û Koyî.....                                          | 79        |

|                               |    |
|-------------------------------|----|
| 2.2.1. Ehmedê Xanî.....       | 79 |
| 2.2.2. Hacî Qadirê Koyî ..... | 84 |

## **BEŞA SÊYEM: KITÊBÊN KURDÎ YÊN KU DI DEWRA**

### **OSMANIYAN DE BI HERFÊN ‘EREÎ HATINE WEŞANDIN .....89**

|                                                                                                |     |
|------------------------------------------------------------------------------------------------|-----|
| 3.1. Kitêbên Kurdî yên ku ji Aliyê Saziyên<br>Fermî yên Dewleta Osmanî ve Hatine Weşandin..... | 90  |
| 3.2. Kitêbên Kurdî yên ku ji Aliyê Komele û<br>Rewşenbîrên Kurdan ve Hatine Weşandin .....     | 102 |
| 3.2.1. Beriya Şerê Cîhanê yê Yekem (1898-1913) .....                                           | 103 |
| 3.2.2. Dema Şerê Cîhanê yê Yekem (1914-1917).....                                              | 126 |
| 3.2.3. Piştî Şerê Cîhanê yê Yekem (1918-1923).....                                             | 129 |
| 3.3. Weşangerên Kurd.....                                                                      | 157 |
| 3.3.1. Kurdîzade Ehmed Ramîzê Licêyî: Xidmetkarê<br>Kurdmancan .....                           | 158 |
| 3.3.2. Mehmed Şefîq Arwasî .....                                                               | 168 |
| 3.3.3. Huseyn Huznî Mukriyanî .....                                                            | 170 |
| 3.4. Weşangeriya Kurdî di Nav Sansur û Qedexeyê de.....                                        | 172 |

## **BEŞA ÇAREM: MÎSYONER LI NAV DEWLETA OSMANÎ Û**

### **WEŞANÊN WAN ÊN BI KURDÎ.....181**

|                                                                                                   |     |
|---------------------------------------------------------------------------------------------------|-----|
| 4.1. Derbareyê Mîsyoneriyê de .....                                                               | 182 |
| 4.2. Mîsyonerî di Nav Dewleta Osmanî de .....                                                     | 182 |
| 4.3. Têkiliyên Mîsyoneran bi Kurdî re .....                                                       | 185 |
| 4.4. Kitêbên Kurdî yên ku ji Aliyê Mîsyoneran ve<br>di Nav Sînore Osmanî de Hatine Weşandin ..... | 188 |
| 4.5. Kurtenêrînek li Ser Zimanê Wergerên Încîlê .....                                             | 206 |

|                                                     |     |
|-----------------------------------------------------|-----|
| ENCAM .....                                         | 209 |
| ÇAVKANÎ .....                                       | 215 |
| Lîsteya Kitêbên Kurdî Yên di Serdema Osmanî de..... | 235 |
| Summary .....                                       | 240 |
| Bergên Pirtûkan .....                               | 243 |
| ÎNDEKS .....                                        | 265 |

## TEQDÎMA ÇAPA DUYEM

Kitêb çi hez û qewet tê de di hewînin ku herkesî mirad û hêvî kirine ku bibin *xwedankitêb*? Belkî ji ber ku peyamên xwedevendan, fermanên keya û siltanan, cewherên gelan xwe di kitêban de mihefeze kirine. Kitêb hem bûye delîla mezhera kelama îlahî -Xweda bi me re bi zimanê me axivî!- hem qudreta fermandayînê -keyayên me bi cihan girtine û bi zimanê xwe ferman dane!-hem jî nîşaneya hêz û bedewiya fikr û ramanên me -şaîrên me ku lîsanu'l-xeyb bûn ku kelimên wan ayîneya fikrên nebihîstî û alemên nedîtî bûn!

Di nav kurdan de rol û girîngiya kitêbê di dîbaceya *Mem û Zîna* Ehmedê Xanî de derdikeve pêş. Beytên ku dibêjin “Da xelq nebêjîtin ku ekrad bê merifet in bê esl û binyad/Enwaî milel xudan kitêb in, kurmanc tenê di bêhesêb in” *xudankitêbîyê* di peywenda navnetewiyê de bi cih dike û hişyar dike ku çavên miletan li ser hev in. *Xûdankitêbî* hem nîşaneya xudanî ilm û eşq û îrfan e hem jî îqtîdar e ku di tac û kulahê cihanpenahêkî de xwe nîşan dide.

Di serdema modern de pêşketina kapîtalîzmê, avakirina dewletên navendî û îcadkirina çapxaneyê li ser rol û heza kitêbê bandoreke mezin kir. Kitêb ji dewrên berê bêhtir bûne sembola hêz û şaristaniyê û çavên “milel” bêhtir li ser hev bûn.

*Kurd, Kitêb, Çapxane: Weşangeriya Kitêbên Kurdî di Dewra Osmanîyan de (1844-1923)* di serdema modern de serencema destpêka

weşangeriya kurdî ji xwe re kir mijar. Dr. Mesut Arslan, wekî ku di literature de bûye adet pêşketina çapxane û berhemên çapkirî bi pêşketina fikr û ramana netewebûyîne ve girê dide û bi vî awayî asoya me derbarê bingeha maddî ya netewebûyîna kurdan û çarçoweya wê ya siyasî, civakî û aborî de berfirehtir dike.

Ji ber vê yekê, *Kurd, Kitêb, Çapxane* ne tenê xebateke derbarê kitêb û weşangeriya kurdan de ye. Di heman demê de di dîroka berbanga rewşenbîriya modern a kurdan de xebateke giranbiha ye. Bikaranîna hûr û sofistîke ya arşîvan, rêbazê xwendina wan; awayî têkildarkirina arşîvan bi bûyer û pêşketinên siyasî, civakî û îqtisadî; bîranînên kes û kesayetan xebata *Kurd, Kitêb û Çapxane* wekî berhema civaknasiya dîrokî ya berbanga netewebûyîna modern a kurdan kemilandiye.

Zehmetiyên ku kurdan di serdema modern de kişandine da ku bibin *xudankitêb* bi rêbeza zanistî lê bi şêweya edebî hatine nivîsin. Lewma, gava hûn kitêbê bixwînin ne tenê hîn bibin lê hîs jî bikin.

*Kurd, Kitêb Çapxane*, bi arşîvên dewlemend û bi xwendina kûr a çavkaniyan nîşan dide “çavên miletan” wê serdemê jî hêj li ser hev in û da ku bibêjin kurd *ne xudankitêb* in çî astengî derdixistin pêşîya kurdan û hin kurdên xudanxirêt çawa li ber xwe dan ku kurd bibin *xudankitêb*.

Ji ber zor û zehmetiyên peywendê ku em dibin *xudankitêb* têkiliya me bi kitêbên kurdî re hêj durust nebûye.

Ev berhema giranbiha deh sal şûnde bi çapa berfirehkirî xwe digihîne ber destê xwendevanan. Piştî çapa yekemîn derbarê qonaxên rewşenbîriyê kurdan de bûbû wesîleyê hin nîqaşên zanistî. Hêvî ev e ku *Kurd, Kitêb, Çapxane* ku xwe li ser destpêka kitêbên kurdî yê çapkirî terxan kiriye û di warê xwe de tekane ye, bêhtir bala xwendevan, rewşenbîr û nivîskarên kurdan bixşîne, ji bo xebatên nû îlham bibexşîne da ku xirêt û xebatên ewqas însanan bi avê de neçin û kurd her *xudankitêb* bin.

**Prof. Dr. Serdar ŞENGÜL**

## PÊŞGOTINA ÇAPA DUYEM

*Kurd, Kitêb, Çapxane*, deh sal berê, di 'erefeya roja zimanê kurdî de li Mêrdînê giha ber destê me. Ew îro bi çapeke nû, bi awayê serastkirî û berfirehkirî ji nû ve tê çapkirin. Hem li ser navê xwe hem jî ji bo zimanê kurdî kêfxweş û spasdar im.

*Kurd, Kitêb, Çapxane*, di van deh salan de li zanîngehên welêt, di beşên Ziman û Edebiyata Kurdî de bû pirtûka dersê ku armanca me ya sereke jî ev bû. Ew, ji gelek xebatên kurdî û navnetewî re bû çavkanî û wê ji gelek weşanên akademîk atif stand; bi îngilîzî, kurdî û tirkî çar heb nirxandin (book review) li ser wê hatin nivîsîn. Herwiha bi minasebeta weşandina wê li Stembol, Enqere, Diyarbekir, Mêrdîn û Wanê tevlî bernameyan bûm. Bi vî rengî bi xwendevanan re danûstanên me çêbûn. Di vê çapa nû de me guh da hem rexneyên nivîskî hem jî yên devkî û xîret kir xebata xwe baştir bikin. Di vê pêvajoyê de yek ji rexneyên ku min pir bihîst ev bû: "Te ji çavkaniyên curbicur agahî tomar kirine û di pirtûkê de neqil dike lê fikra xwe nabêje." Ev pirtûka destê we xebateke akademîk e, ne qunciknivîs an bîranîn e. Ferqa akademîsyenekî ji siyasetvanekî yan ji kesekî ku di qehwê de pelik dilîze jî ev e: Ew mecbûr e her gotina xwe îsbat bike, bi belgeyên rast û dirist. Loma di vê çapê de jî -ku bike- di ya sedî de jî hûnê ne fikrên min lê rastiyan ku ji belgeyan hatine dotin bixwînin.

Di vê çapa duyem a berfirehkirî de, jimara kitêbên kurdî yên ku di serdema Osmanî de hatine çapkirin derket 42yan. Me di Pirtûkxaneyaya Teqşîmê de du kitêbên kurdî yên nû tesbît kirin û ew li xebata xwe zêde kirin. Yek ji van *Mewlûda* Melayê Bateyî ye ku kesekî bi navê ‘Ebdussemed Fexrî ew di sala 1909an de weşandiye. *Mewlûda* Bateyî berê jî hatibû çapkirin lê cudahiyeke wê heye: Weşangerê wê di serdema ‘Ebdulhemîdê Duyem de destûra weşanê wergirtiye. Di arşîva Osmanî de me ew destûrname jî dît. Bi vî rengî bersiva pîrsa “kitêbeke kurdî di serdema Osmanî de ji bo ku çap bibe ji kîjan merheleyan derbas dibe?” zelaltir bû.

Kitêba duyem a ku me nû dît *Labder Lusadu/Çirayê Ronî* ya Migirdîç Vartabed Dîkranyan e, ji sala 1866an. Ev kitêb duzimanî (ermenkî-kurdî) lê yek alfabeyî ye. Dîkranyan, wekî zimanê xwe zimanê kurdî jî bi tîpên ermenkî nivîsiye. Bi vî rengî di çarçoveya xebata me de jimara pirtûkên kurdî yên bi tîpên ermenkî derkete 11an. Cihê kêfxweşiyê ku ev kitêba Dîkranyan di sala 2024an de li tîpên latînî hat veguhastin û bi lêkolîneke berfireh hat weşandin. Dîsa Peymanû Nû ya sala 1872yan jî li tîpên latînî hat veguhastin û ligel lêkolîneke berfireh wekî teza doktorayê hat pejirandin. Bi vî rengî êdî em dikarin yek ji kevintirîn nimûneyên pexşana kurdî bi rehetî bixwînin û li ser wan lêkolînên zimanî bikin. Ev ji bo dîroka zimanê me yê perçiqandî çiqas tiştekî mezin e, tenê xemxwarên kurdî dizanin.

Di çapa 2015an de, me nusxeya *Mem û Zîna* Ehmedê Xanî ya ku di 1919an de li Stembolê çap bûye li tu kitêbxaneyan peyde nekiribû. Bi rênîşandana Tahir Baykuşak û Serhat Bozkurt me dît ku li Pirtûkxaneyaya Teqşîmê, hem ew çap hem jî destxetêke *Mem û Zînê* heye. Ji wan re spasdar im. Lêkolînên kurdî herdem ji surprîzên wiha re vekirîne. Kî zane bê hê çi pirtûk û destxetên kurdî di refên pirtûkxaneyan de li benda dîtinê ne.

Di çapa 2015an de, me çavkaniyên Osmanî baş bi kar anîbûn çimkî Stembol, bajarê ku lê dijiyam, paytexta Osmanî bû û hemû arşîv û kitêbxaneyên wê li ber dest bûn lê çavkaniyên bi zimanên Ewrûpî me zêde bi kar neanîbûn. Di vê çapê de, bi taybetî di beşa “Mîsyoner Li Nav Dewleta Osmanî û Weşanên Wan ên Bi Kurdî” de

me hewl da vê kêmasiyê telafî bikin. Kitêba Samuel Bagster a *The Bible of Every Land*, rapora Hörnle&Schneider a li ser herêma Urmiyeyê, xebata Gor Yeranyan a li ser ermeniyên kurdî-ziman; herwiha bîranînên mîsyonerên wekî M.P. Parmelee, *Home and Work by the Rivers of Eden*; C. H. Wheeler, *Ten Years on The Euphrates* çendek ji van in. Di sedsala 19 û 20an de arşîveke mezin a mîsyonerên protestan heye. Di nav vê kulliyatê de, bo nimûne di kovara *The Missionary Herald* de, li ser kurdan jî gelek weşan û agahî hene. Me jê sûd wergirt lê ev mijar lêkolîneke bi serê xwe jî heq dike.

Di çapa 2015an de, ji ber tevliheviya salnameya hîcrî û rûmî, me sala çapkirina hin kitêban tam tesbît nekiribû. Di vê çapê de me hewl da ku vê mijarê jî zelaltir bikin.

Dr. Serdar Şengül, wekî çapa 2015an ji vê çapa nû re jî edîtorî kir; Dr. Ayhan Yıldız, ji bo çapa nû xwendina dawî kir; ji wan re spasdar im.

Vê serdemê, li Zanîngeha Mardin Artukluyê hem ji xwendekarên lîsansê re hem jî ji yên mastera bêtez re dersa Edebiyata Kurdî ya Klasîk dibêjim; ji wan gelek tiştan hîn dibim. Vê kitêbê jî bi hêviya ku jê sûd wergirin ji wan re diyarî dikim.

**Dr. Mesut ARSLAN**

01.02.2025, Berlin



## PÊŞKÊŞÎ

Ev berhema bi navê *Kurd, Kitêb, Çapxane: Weşangeriya Kitêbên Kurdî di Dewra Osmaniyan de (1844-1923)* ku ji hêla Mesut Arslan ve hatiye nivîsandin, xwediyê çawaniyeke wisa ye ku wê di warê xebatên kurdî de valahiyeke muhîm dagire. Berhemê metbû yên kurdan ên di dewra dawî ya Osmaniyan de hatine çapkirin, serpê-hatiya wan a çapkirinê û agahiyên derheqê weşangerên wan de, mijarên bingeîn ên vê xebatê ne.

Derbasbûna ji zêdekirina berhemên destxetî ya ber bi berhemên çapkirî ve, ne tenê têkildarî guhertineke şiklî ya hilberandina metnan e, elaqeya wê bi hin guhertinên bingeîn ên di warê aborî, siyaset û felsefeya zanînê re jî heye. Çi li Ewrûpaya ku cihê metbeeya modern bû û çî li derveyî Ewrûpayê gelek xebatên girîng ên ku bandora metbeeyê derdixin pêş hene. Di vî warê de *Kitabın Doğuşu*<sup>1</sup> [Peydabûna Kitêbê] ya Lucien Febvre û Henry Jean Martin, *Gutenberg Galaksisi: Tipografik İnsanın Oluşumu*<sup>2</sup> [Galaksiya Gutenberg: Pêkhatina Mirovê Tipografik] ya Marshall McLuhan û

- 
- 1 Febvre, Lucien & Martin, Henry Jean. *Kitabın Doğuşu*, wer. G. Batuş, weş. Avcıol, 2000.
  - 2 McLuhan, Marshall. *Gutenberg Galaksisi: Tipografik İnsanın Oluşumu*, wer. G. Çağlalı Güven, YKY, 2007.

*Hayali Cemaatler: Milliyetçiliğin Kökenleri ve Yayılması*<sup>3</sup> [Cemaetên Xeyalî: Kokên Neteweperweriyê û Belavbûna Wê] ya Benedict Anderson, ku di pêvajoya afirandina fikra neteweya modern de roleke bingehîn didin kitêba çapkirî, xebatên sereke ne. Di van xebatan de di navbeyna metbee, kitêbên çapkirî û pêvajoya modernîzmê de behsa têkiliyeke xurt tê kirin. Lîteratura modernîzmê bi analîza van veguherînan tije ye ku di pêvajoya derbasbûna berhemên çapkirî de pêk hatine. *Türkiye’de Çağdaşlaşma*<sup>4</sup> [Li Tirkiyeyê Hemdemîbûn] ya Niyazi Berkes û *Bediüzzaman Said Nursi Olayı/Türkiye’de Din ve Toplumsal Değişim*<sup>5</sup> [Bûyera Bediuzzaman Said Nursî/Li Tirkiyeyê Dîn û Guherîna Civakî] ya Şerif Mardin derbareyê hatina metbeyê ya nav Osmanî û pêvajoya derketina kitêba çapkirî de nîqaşên girîng dihewînin. Bi taybetî Mardin, di beşa bi navê “Di Dawiya Sedsala 19an de di Împaratoriya Osmanî de Dîn, Îdeolojî û Hîşmendî” de, analîzeke berfireh li ser têkiliyên çîna xwende ya Osmanî dike û nîşan dide ka piştî peydebûna kitêba çapkirî û hînbûna tenê ya ji kitêbê têkiliya desthilatîyê û gel çawa veguherîn.<sup>6</sup>

Bi peydebûna berhemên çapkirî re li ser guherînên cîhana îslamî jî xebatên girîng hatine kirin. *Mısır’ın Sömürgeleştirilmesi*<sup>7</sup> [Mêtingehkirina Misrê] ya Timothy Mitchell û *The Caligraphic State: Textual Domination and Histroy in Muslim Society* [Dewleta Kalîgrafîk: Di Civakeke Misliman de Hakimiyeta Metnî û Dîrok] ya Brinkley Messick du xebatên etnografîk in; tevî wan *The Book in the Islamic World: The Written Word and Communication in the Middle East* [Kitêb di Cîhana Îslamî de: Peyvên Nivîskî û Ragihan] ya bi edîtorîya George N. Atiyeh hatî amadekirin jî xebatên girîng in ku guherîn, veguherîn û nîqaşên di vê pêvajoyê de analîz dikin. Mitchell,

3 Anderson, Benedict. *Hayali Cemaatler: Milliyetçiliğin Kökenleri ve Yayılması*, wer. İ. Savaşır, weş. Metis, 2007.

4 Berkes, Niyazi. *Türkiye’de Çağdaşlaşma*, amd. Ahmet Kuyaş, YKY, 2008, r. 50-63.

5 Mardin, Şerif. *Bediüzzaman Said Nursi Olayı/Türkiye’de Din ve Toplumsal Değişim*, wer. M. Çulhaoğlu, weş. İletişim, 1995.

6 Mardin, hb., r.165-231.

7 Mitchell, Timothy. *Mısır’ın Sömürgeleştirilmesi*, wer. Z. Altok, weş. İletişim, 2001.

gava li ser polîtîkayên ku desthilatdariyê dîsîplîne dike disekine ku di pêvajoya mêtîngehkirinê de ji bo yeknesakkirin û duristkirina mirov û mekanan dihatin meşandin, tesîra van polîtîkayan a li ser şeweya hilberîna berhemên çapkirî jî lêkolîn dike.<sup>8</sup> Li gorî Mitchell, pêvajoya ji destxetan ber bi çapê ve, li ser felsefeya zanînê guherîna çêkiriye û ev guherîna jî ji siyaseta mêtîngehkirina Misrê bandor kiriye.<sup>9</sup> Messick, heman pêvajoya di nimûneya Yemenê de lêkolîn kiriye. Di kitêba *The Book in the Islamic World* de, Muhsin Mahdi di gotara xwe ya bi navê “From the Manuscript Age to the Age of Printed Book [Ji Serdema Destxetan ber bi Serdema Kitêba Çapkirî ve]” de li ser guherîna û krîzên ku pêvajoya ji destxetan ber bi kitêba çapkirî ve çûyîna de di cîhana îslamî de derketine teswîr dike. Li gorî Mahdi, pêvajoya peydebûna berhema çapkirî li ser pêvajoya hilberîna zanîna modern a civakên îslamî bandoreke bingeîn kiriye.<sup>10</sup> Ew diyar dike ku hewce ye guherîna ku di vê pêvajoyê de pêk hatine, di nav çarçoveya semantîka zimên, envantera peyvan; cureyên edebî; têkiliya nivîskar-xwendekar-metin; desthilatdarî û veguherîna di pêvajoya hilberîna veguhêzîna zanînê de li ser esasê zimanê erebî, farsî, urdûyî, û tirkî de bîna analîzkirin.<sup>11</sup>

Rêbaza Mahdi ji bo fêmkirina mijarê çarçoveyeke girîng pêşkêş dike lê gotara Mahdî û gotarên din ên kitêbê di analîzên xwe yên li ser Rojhilata Navîn û cîhana îslamî de hîç cih nadine tecrûbeyên peydebûna kitêba çapkirî ya li nav kurdan. Xebatên li ser modernîzasyona Osmanî û bandora çapxaneyê jî derheqê kurdan de “bêdeng” in.<sup>12</sup> Bêguman ev kêmasiyeke mezin e û ne tenê bi Mahdi,

8 Mithcell, hb. Bi taybetî beşa pêncan “Mekanîzmaya Heqîqetê” ya ku têkiliya nivîs û desthilatê tê nîqaşkirin, r. 225-275.

9 Mitchell, hb., r. 254-273.

10 Mahdi, Muhsin. “From the Manuscript Age to the Age of Printed Books”, dnd. *The Book in the Islamic World: The Written Word and Communication in the Middle East*, ed. George Nicholas Atiyeh, weş. State University of New York Press, Albany, 1995, r. 4-6.

11 Mahdi, hb., r. 7-8.

12 Ji bo bîdengkirina dîrokê xebateke hêja ev e: Michel Rolph Trouillot, *Geçmişî Susturmak&Tarihin Üretilmesi ve İktidar*, wer. O. Zeybek, weş. İthaki, 2015.

Berkes û Mardin re sînordar e, ev rewş bi têgihîştana modernîzm û neteweperweriya nav cîhana îslamî ve û bi vê ve girêdayî bi şeweya hilberîna zanînê ya li ser kurdan re ji nêz ve eleqedar e.

Ji ber vê yekê kitêba Mesut Arslan, ji bo lêkolînkirina guherînên peydebûna kitêba çapkirî ya li nav kurdan, destpêkeke baş û muhîm e. Pirsên ku Mahdî ji bo guherînên nav cîhana îslamî kirî ji bo kurdan jî dikare bê pirsîn lê ji ber rewşa kurdan a mêtîngehî hewce ye hin rewş û pirsgirêkên taybet jî li van analîzan bîn zêdekirin. Ji ber nebûna arşîveke dewletî wendabûna destxetên kurdî; tesîra nebûna dibistanên modern ên bi kurdî, li ser hilberîn û belavbûna kitêba çapkirî pirsgirêkên sereke ne. Lewma xwendina xebata Mesut Arslan a ligel *Jiyana Rewşenbîrî û Siyasî ya Kurdan* a Celîlê Celîl û *Nationalism and Language in Kurdistan, 1918-1985* a Amir Hassanpour, ji bo avakirina perspektîfeke dîrokî li ser fêmkirina pirsgirêkên kurd, kitêb, çapxane û weşangeriyê -ku îro jî berdewam in- wê roleke girîng bilîze.

**Dr. Serdar ŞENGÜL**

Nîsan 2015, Mêrdîn

## PÊŞGOTIN

Bingehên çapxaneya modern di sed sala 15an de li Ewrûpayê hate danîn. Bi taybetî li Elmanyayê Gutenberg û li Hollandayê jî Coster, di vî warî de du navendên girîng in. Ya rastî dîroka çapxaneyê kevintir e lê ji ber şert û mercên civakî, aborî û siyasî yên Ewrûpayê, çapxaneyê rola xwe ya resen di vê dewrê de lîst. Bi saya vê mekîneyê, çapa kitêban xurt û belavbûna zanîna bi lez bû. Vê yekê hilweşîna tekelên zanîna û deshilatdariyê, wekî dêr û begên feodal, bi leztir kir. Ji ber vê yekê Francis Bacon dibêje: “Sê tiştên ku deriyê serdema modern vekirin çapxane, barûd û pisûla ne.”

Piştî îcada wê bi gelek sal şûnde çapxane digihe nav Dewleta Osmanî jî. Beriya wê xirîstîyan û cihûyan çapxane diemilandin lê tesîreke wê li ser desthilatê û xelkê musliman nedibû. Di sala 1727an de bi îcazeta şêxulîslam, cara ewil kesekî musliman -Îbrahîm Muteferriqa- li Stembolê çapxane ava kir. Ev tenê destpêkek bû û bandoreke mezin -an jî şoreşek- pêk neanî, lê piştî Fermana Tenzîmatê (1839) bi zêdebûna rojname û kovaran girîngiya çapxaneyê zehftir bû û êdî giha wê astê ku dikarîbû civakê ji aliyê fikrî ve kanalîze bike.

Wekî pêkhatiyên din ên Osmanî, kurdan jî çapxane bi kar anî; kovar, rojname û kitêb bi zimanê xwe çap kirin. Wan jî ev mekîna ji bo pêşdebirina ziman û edebiyata xwe, kemilandina nasnameya xwe ya netewî bi kar anî. Mijara vê xebatê jî weşangeriya kitêbên

kurdî ne ku di dema Osmanî de çap bûne. Car caran behsa destxetan bike jî mijara vê xebatê kitêbên çapkirî ne. Ji ber vê yekê di beşa ewil de behsa kurtedîroka çapxaneyê tê kirin. Çapxane kengî li nav Osmanî belav bû, li nav kurdan çapxaneyên ewil li kîjan bajaran ava bûn, ev jî mijarên beşa ewil in.

Ji ber ku xebat li ser kitêbên dewra Osmanî ye, beşa duyem jî derbarê kurtedîroka kurdan a di nav Dewleta Osmanî de ye. Helbet ev mijar maweyeke berfireh e, lê armanca me ne bi berfirehî ravekirina wê ye. Ev beş zêdetir li ser sedsala 19 û 20an radiweste û bi taybetî dixwaze di dewra dawî de pêşketina nasnameya kurdî ya di nav Osmaniyan de nîşan bide. Di çarçoveya pêşketina nasnameya kurdî de vegotina rewşenbîr/netewperwerên kurd ên sedsala 19 û 20an û veguherîna vê vegotinê jî di vê beşê de bi kurtî tê analîzkirin.

Beşa sêyem êdî bi temamî bîbliyografîk e. Kitêbên kurdî yên bi herfên ‘erebî ku di maweya vê xebatê de çap bûne pêşî têne tesnîfkirin, paşê jî yek bi yek, li gorî rêza kronolojîk behsa wan û naveroka wan tê kirin. Eger ew kitêb ji nû ve hatibine weşandin ew têne gotin. Di dawîya her pirtûkê de jî bo kesên ku dixwazin xwe bigihînin nusxeyên orîjînal ên van pirtûkan, kitêbxaneyên ku lê peyde dibin, tevî hejmara wan a xwemîrî (bi tirkî “demirbaş numarası”) an hejmara cihî (bi tirkî “yer numarası”) têne nîşandan. Bi vî rengî, bi taybetî lêkolînerên ku dixwazin orîjînalê van pirtûkan bibînin dikarin serî li wan kitêbxaneyan bidin. Dîsa di vê beşê de kurtejiyana sê weşangerên kurd cih digire: Kurdîzade Ehmed Ramîz, Mehmed Şefîq Arwasî, Huseyn Huznî Mukriyanî.

Beşa çarem jî bîbliyografîk e, lê vê carê behsa kitêbên kurdî yên ku mîsyoneran çapkirine tê kirin. Pêşî kurtedîroka mîsyoneriyê, xebatên wan ên nav Osmanî û têkiliyên wan ên bi kurdî re tê ravekirin, paşê jî wekî beşa sêyem yek bi yek kitêbên vê dewrê têne rêzkirin û danasîn.

Bîbliyografya/kitabiyat, di lêkolînên zanistî de şaxeke bingeîn e. Ji ber ku hewce ye hê di destpêka lêkolînê de lêkolîner ji çavkaniyên heyî agahdar be û zanibe wê serî li kîjanê bide. Armanca vê xebatê jî derxistana envantera kitêbên kurdî yên dema Osmanî ye.

Hêvî û armanc ew e ku bi vê xebatê lêkolîner ji kitêbên wê dewrê hayedar bibin; hem di lêkolînên xwe de ji wan îstîfade bikin hem jî li ser wan lêkolînan bikin. Ji ber ku malzemeyên li ber destan qet ne hindik in û mirov nikare wan malzemeyan biçûk bibîne.

Gava ev xebat ji teza lîsansa bilind veguherî kitêbeke çapkirî tê de gelek tişt guherîn. Mamoste Remezan Alan û Serdar Şengul bi xwendina xwe ya edîtorîyal gelek kêmasî û zêdehiyên wê tesbît kirin. Ji herdu mamosteyan re spasdar im.

Ji bo ku ji arşîvên xwe yê şexsî çavkanî bi min re parve kirin ji Huseyin Şemrexî, Mele ‘Evdisselamê Bêcirmanî re; ji mamoste Abdurrahman Adak re; ji bo teshîhan ji Mehmet Çetin û Semra Guçlu re; ji bo dostaniya wan ji Dawid Yeşilmen û Sonja Galler re; ji hemû xebatkarên Koma Xebatên Kurdolojiyê re gelekî spas dikim.

**Mesut ARSLAN**

2015, Mêrdîn

## **KURTEBÊJE**

|      |                                       |
|------|---------------------------------------|
| amd. | : Amadekar                            |
| B.   | : Beş                                 |
| Bnr. | : Binêre                              |
| ç.   | : Çap                                 |
| dnd. | : Di nav ... de                       |
| H.   | : Teqwîma Hîcrî                       |
| Hb.  | : Heman berhem                        |
| Hg.  | : Heman gotar                         |
| Hwd. | : Herwekî din                         |
| H.X  | : Hejmara Xwemîrî (Demirbaş Numarası) |
| H.C  | : Hejmara Cihî (Yer Numarası)         |
| j.   | : Jimar                               |
| M.   | : Teqwîma Mîladî                      |
| nd.  | : Nivîskarên din                      |
| R.   | : Teqwîma Rûmî                        |
| r.   | : Rûpel                               |
| vgz. | : Veguhêzer                           |
| wer. | : Wergêr                              |
| weş. | : Weşanger/Weşanxane                  |

## **KURTEYA NAVÊN TAYBET**

|        |                                                                                                       |
|--------|-------------------------------------------------------------------------------------------------------|
| ABCFM: | American Board of Commissioners for Foreign Missions [Meclîsa Delegeyên Amerîkî ji bo Mîsyonên Derve] |
| ABS:   | American Bible Society [Civata Kitêba Pîroz a Amerîkî]                                                |
| BFBS:  | British and Foreign Bible Society [Civata Kitêba Pîroz a Brîtanya û Biyanî]                           |
| BOA:   | Başbakanlık Osmanlı Arşivi [Arşîva Osmanî ya Serkwezîrtiyê]                                           |
| DIA:   | Diyanet İslam Ansiklopedisi [Ansîklopediya Îslamê ya Diyanetê]                                        |

|        |                                                                                                    |
|--------|----------------------------------------------------------------------------------------------------|
| DKTC:  | Diyarbakir Kurd Te‘alî Cem‘iyyeti [Komeleya Bilindkirina Kurdan a Diyarbakirê]                     |
| HIF:   | Hurriyet ve I’tilaf Firkasi [Partiya Azadî û Hevben-diyê]                                          |
| ITC:   | Ittihad ve Terakkî Cem‘iyyeti [Komeleya Yekîtî û Pêşveçûnê]                                        |
| KAKC:  | Kurdistan ‘Azm-i Kavî Cem‘iyyeti [Komeleya Vîna Zexm a Kurdistanê]                                 |
| KATC:  | Kurd Asari Tedkîk Cem‘iyyeti [Komeleya Lêkolîna Berhemên Kurdî]                                    |
| KNMC:  | Kurd Neşr-i Ma‘arif Cem‘iyyeti [Komeleya Belavkirina Zanînê ya Kurdan]                             |
| KKTC:  | Kurd Kadınları Te‘alî Cem‘iyyeti [Komeleya Bilindkirina Jinên Kurd]                                |
| KTC:   | Kurdistan Te‘alî Cem‘iyyeti [Komeleya Bilindkirina Kurdistanê]                                     |
| KTTC:  | Kurd Te‘avun ve Terakkî Cem‘iyyeti [Komeleya Arîkarî û Pêşveçûna Kurdan]                           |
| KTIC:  | Kurd Teşkilat-ı İctima‘iyye Cem‘iyyeti [Komeleya Rêxistana Cîvîkî ya Kurdan]                       |
| KTMNC: | Kurd Ta‘mîm-i Ma‘arif ve Neşriyat Cem‘iyyeti [Komeleya Belavkirina Zanîn û Weşanê ya Kurd]         |
| KTTG:  | Kurd Te‘avun ve Terakkî Gazetesi [Rojnameya Arîkarî û Pêşveçûna Kurdan]                            |
| TMIHC: | Ta‘mîm-i Ma‘arif ve Islah-ı Hurûf Cem‘iyyeti [Komeleya Belavkirina Perwerdeyê û Rastkirina Herfan] |

### **KURTEYA NAVÊ KITÊBXANEYAN**

|          |                                                                                                                     |
|----------|---------------------------------------------------------------------------------------------------------------------|
| Beyazıt: | Beyazıt Devlet Kütüphanesi [Kitêbxaneya Dewletê ya Beyazîtê-Stembol]                                                |
| Dicle:   | Dicle Üniversitesi İlahiyat Fakültesi Kütüphanesi [Kitêbxaneya Fakulteya Îlahiyatê ya Zanîngeha Dicleyê-Diyarbakir] |

- DTCF: Ankara Üniversitesi DTCF Kütüphanesi [Kitêbxaneyeyê DTCF (Fakulteyê Ziman û Dîrok-Erdnîgarî) ya Zanîngeha Ankara-Enqere]
- Millet: Millet Yazma Eser Kütüphanesi [Kitêbxaneyeyê Destxetan a Millet-Stembol]
- Millî: Millî Kütüphane [Kitêbxaneyeyê Netewî-Enqere]
- Ozege: Atatürk Üniversitesi Merkez Kütüphanesi Seyfettin Özege Koleksiyonu [Koleksiyonê Seyfettin Ozegeyî ya Kitêbxaneyeyê Navendî ya Zanîngeha Ataturkê -Erzirom]
- Sermet Çifter: Sermet Çifter Araştırma Kütüphanesi [Kitêbxaneyeyê Lêkolînê ya Sermet Çifter-Stembol]
- Suleymaniye: Süleymaniye Yazma Eser Kütüphanesi [Kitêbxaneyeyê Destxetan a Suleymaniye-Stembol]
- Taksim: Taksim Atatürk Kitaplığı [Kitêbxaneyeyê Ataturk a Taksim-Stembol]
- TBMM: TBMM Kütüphanesi [Kitêbxaneyeyê TBMM (Meclîsê Millet a Mezin a Tirkiyeyê)-Enqere]

## NAVÊ MEHAN

- 1- Çile
- 2- Sibat
- 3- Adar
- 4- Nîsan
- 5- Gulan
- 6- Hezîran
- 7- Tîrmeh
- 8- Tebax
- 9- Îlon
- 10- Cotmeh
- 11- Mijdar
- 12- Kanûn

## DESTPÊK

### Armanc û Çarçoveya Xebatê

Mebesta vê xebatê lêkolînkirina weşangeriya kurdî ya dema Dewleta Osmanî ye. Danasîna kitêbên kurdî yên ku di navbera salên 1844-1923yan de di nav sînorê Osmanî de çapbûne, naskirina weşangerên van kitêban û têkiliya van kesan bi komeleyên kurdî re mijarên sereke yên vê xebatê ne. Mebest û sernavê vê xebatê ji çarçoveya wê re çar sînor danîn:

**Kitêb:** Mijara vê xebatê kitêb in. Ji kitêbê mebest bêyî ku li hej-mara rûpelên wê bê meyzandin hemû weşanên serbixwe û ne perî-yodîk in. Herçiqas di konteksta mijarê de behsa çapemeniya kurdî zehf bê kirin, ji kovar û rojnameyên wê serdemê sûd bê wergirtin ji mijara me ya eslî kitêb in.

**Kurdî:** Ev xebat bala xwe dide kitêbên bi zimanê kurdî.<sup>1</sup> Li gorî vê yekê kitêbek herçiqas derbareyê kurdan de jî be eger ne bi kurdî be ew ne di nav sînorên vê xebatê de ye. Tenê îstîsnayeke vê heye, ew jî *Muqeddîmetu'l-Îrfana* Mehmed Mîhrî ye. Ev kitêb bi tirkîya os-manî ye lê ji ber ku bi temamî li ser fonetîka kurdî ye û destpêka projeya ferhenga pîrzimanî ya bi navê *Îrfan* e, me ew jî daxilî lîsteya

---

1 Ji kurdî mebest tabloya “Zar û devokên zimanê kurdî” ya Hewa Salam Khalid e. Ji bo vê tabloyê bnr. “Zimanê Kurdî, Malbat û Zarên Wî”, *Kurdî-name*, j.1 (November 2019), r. 10.

kitêbên kurdî kir. Ji bo ku kitêbek bibe mijara vê xebatê ne şert e ku bi temamî kurdî be. Kitêbên wekî *Dîwana* Mewlana Xalid ku ji helbestên ‘erebî, farisî û kurdî pêk tê; dîsa *Dîwan-i Et’îmeya* Ebû Îshaq û *Dîwana* M. Esad Erbilî jî ku tenê helbesteke kurdî di hewînî, di nav sînorên vê xebatê de ne.

**Dema Osmanî:** Ev têgeh di nava xwe de du sînoran di hewîne, yek jê dem, a duyem jî erdnîgarî ye. Dema çapkirina kitêbê hewce ye dema Dewleta Osmanî be. Bo nimûne, dema lêkolînê me du çapên *Mewlûda* Bateyî yên bi tarîxa 1927 û 1934ê peyde kirin, lê ji ber ku Dewleta Osmanî 1923yan de êdî qediyabû, me ew tevî lîsteya kitêban nekir. Ji bo sînorê duyem jî, hewce ye kitêb di erdnîgariya di bin desthilatdariya Dewleta Osmanî de hatibe çapkirin. Li gorî vê, wergerên kurdî yên Încîlê ku li London, New York û Julfayê hatine çapkirin derveyî vê xebatê man.

**Weşan/Çap:** Mijara vê xebatê kitêbên çapkirî ne. Herçiqas di beşa “Derbareyê kurtedîroka kurdiya nivîskî de” behsa destxetên kurdî bê kirin jî berê dûrbîna vê xebatê li dewra piştî çapxaneyê û kitêbên çapkirî ye.

Di beşa duyem de hewl tê dayîn ku peywendiya di navbera çapkirina kitêbên kurdî û pêşketina nasnameya kurdî ya di dewra Osmanî de bê nîşandan. Ji ber vê yekê di vê beşê de behsa komeleyên kurdan ên wê demê û weşanên wan ên periyodîk, bi giştî çapemeniya kurdî ya dewra Osmanî, vegotina rewşenbîr/netewperwerên kurd ên wê demê û çend bûyerên girîng tê kirin. Dîsa bi vê mebestê behsa du kesan tê kirin ku bi fikriyata xwe bandoreke mezin li ser kurdayetîya wê dewrê kirine: Ehmedê Xanî û Hacî Qadirê Koyî.

Di beşa duyem a vê xebatê de bi çavkaniyên yekem derbareyê komeleyên kurdan û çapemeniya kurdî ya wê demê de gelek agahî têne dayîn. Di beşa sêyem û çarem a vê xebatê de jî danasîna 40 kitêbên kurdî tê kirin.

Naxwe em dikarin bibêjin ku du aliyên vê xebatê hene: Aliyê pratîk hewl dide ku di nav çarçoveya xebatê de envantera kitêbên kurdî yên dewra Osmanî derbixe, aliyê teorîk jî hewl dide ku beşek ji fikra “kurdayetî”yê û têkiliyên wê yên bi metbûatê re ronî bike. Ji bo pêkanîna vê jî çavkaniyên sereke weşanên wê demê bûn. Kovar,

rojname, kitêb û rêzicknameyên wê dewrê, hin caran jî belgeyên ar-şîva Osmanî rê nîşanî me dan.

Eger bê pirsîn “ka vê xebatê çî li kurdî zêde kir?” bersiva amadekar ev e: Di pêvajoya amadekirina vê xebatê de sê kitêbên kurdî yên ji dewra Osmaniyan hatine dîtin ku kunyeya wan di bibliyografya Mistefa Nerîman a bi navê *Bibliyografyay dûsed salî kitêbî kurdî 1787-1986* de nebû û metnên wan jî heta niha nehatibûn weşandin: *Türkçeden Kurd Lisanına Mutercem Ilmihaldir*<sup>2</sup>, *Xulaseî ‘Eqaîd*<sup>3</sup>, *Dersa Dîn*. Bi dîtina kitêba *Xulaseî ‘Eqaîd* “Reşbelek”a Ehmed Ramîz jî, ku behsa wê dihate kirin lê metnê wê ne li ber dest bû, derkete holê û tîpguhêziya wê jî hate weşandin.<sup>4</sup>

Maweya vê xebatê ji bo kurdî ji dewra destxetan derbasbûna dewra çapê ye (from manuscript to print book). Ev derbasbûn pêvajoyeke dirêj e ku gelek sedem û amadekarên wê hene. Herwiha ev pêvajo di dîroka milletên din de jî pêk hatiye. Muhsin Mahdi, di gotareke xwe de ji aliyê ‘erebî, farsî, tirkî û urdûyî ve li ser vê mijarê lêkolîn kiriye.<sup>5</sup> Herwiha Johannes Pedersen jî di nav dîroka kitêbên ‘erebî/îslamî de behsa vê pêvajoyê kiriye.<sup>6</sup> Ev kitêba destê we ji bo kurdan û kurdî dixwaze ji vê mijarê re bibe destpêkek, ji ber ku ev

---

2 Ji bo tîpguhêziya temamê vê kitêbê bnr. Mesut Arslan, “Türkçeden Kürd Lisanına Mütercem İlmihaldir (1891, Elezîz): İlmihaleke bi Tirkî û Wergera Wê ya Kurdî”, *Kürdoloji Akademik Çalışmalar Cilt 1*, Yargı Yayınevi. İstanbul, 2016, r. 246-272.

3 Kitêba *Xulaseî ‘Eqaîd*, di maweya vê xebatê de me li Kitêbxaneyê Zanîngeha Ataturk a Erziromê dît. Mamoste Kadri Yıldırım dil kir ku li ser wê bixebite û biweşîne, me jî bi kêfxweşî qebûl kir, ji ber vê yekê ew berî qedandina vê xebatê hate weşandin. Bnr. Seyyid Abdullah Nehrî, *Hulâsa-i Akaid Akaidin Özü*, amd. K. Yıldırım, weş. Semerkand, İstanbul, 2013.

4 “Reşbelek Kurdîzade Ehmed Ramîzê Licêyî”, amd. M. Serfiraz-B. Hawar, *Nûbihar*, j.124 (Havîn 2013), r. 5-9.

5 Muhsin Mahdi, “From the Manuscript Age to the Age of Printed Books”, dnd. *The Book in the Islamic World: The Written Word and Communication in the Middle East*, ed. G. N. Atiyeh, State University of New York Press, Albany, 1995, r. 1-15.

6 Johannes Pedersen, *İslam Dünyasında Kitabın Tarihi*, wer. M. M. Karagözoğlu, ç.2, weş. Klasik, İstanbul, 2013.

pevajoya derbasbûna çapê herwiha hêmaneke muhîm a modernîzmê û avakirina nasnameya netewî ye.

### **Derbareyê Çavkaniyan û Rêbazê de**

Di çarçoveya vê xebatê de hewce ye em derbareyê rêbazê de jî çend tiştan bibêjin: Xebatên zanistên civakî ne wekî yên teknîkî û fennî ne. Derfeta lêkolînerên civakî nîne ku di laboratuwaran de ceribandinan bikin û encamên wan binivîsin. Tişteki din ê zehmet heye ku di lêkolînên civakî de rastî ne sabît e. Ji ber vê yekê bidestxistina rastiya mutleq an jî bêqisûr ne mumkun e û fikra ku hûn herî zêde jê ewle ne jî dikare bê pûçkirin. Naxwe di vê rewşa hesas de ji bo lêkolîner rêya ewle xwespartina çavkaniyan, ji wan çavkaniyan jî xwegihandina encamên şareza ye.

Çavkanî du celeb in: çavkaniyên yekem û yên duyem. Çavkaniyên yekem ew belge ne ku rasterast aidê dewra lêkolîner in. Çavkaniyên duyem jî lêkolînên li ser wê dewrê ne. Eger em ji bo vê xebatê bibêjin çavkaniyên yekem kitêbên kurdî û hemû kovar û rojnameyên dewra Osmanî, belgeyên arşîva Osmanî û nivîsarên weke “Reşbelek” a Kurdîzade Ehmed Ramîz in. Çavkaniyên duyem jî ev in: Lêkolînên Malmîsanîj, Celîlê Celîl, Rohat Alakom, Djene Rhys Bajalan, Martin van Bruinessen, Hakan Ozoglu, Veysel Aydeniz; bîranînên Zinar Silopî (Qedrî Cemîlpaşa), Mûsa Anter, Hesên Hîşyar, Nûreddîn Zaza, Nûrî Dêrsimî, Celadet Alî Bedirxan hwd.

Lêkolînek çiqasî xwe bîsipêre çavkaniyên yekem -bi şertê ku malzemeyan baş bi kar bîne- qelîteya wê ewqasî zêde dibe. Lê di bikaranîna çavkaniyên duyem de jî tu kêmasî nîne. Jixwe gelek caran lêkolîner, ku di mijarekê de zanîna wan zêde ne kûr be, xwe diavêjine bextê çavkaniyên duyem û eger întihal neke, ev yek ne qebehet e.

Di veguhastinan de hewce ye lêkolîner hay jê hebe ku xeletiyên çavkaniyên duyem dubare neke. Bo nimûne Zinnar Silopî (Qedrî Cemîlpaşa), di bîranînên xwe de dibêje ku kovara *Hetawî Kurd* di bin îdareya Hemzeyê Muksî de derketiye.<sup>7</sup> Lê gava hûn bi xwe li hejmarên kovarê meyzênin hûnê bibînin ku mudîrê wê Baban

---

7 Zinnar Silopî, *Doza Kürdistan*, Stewr basim-evî, 1969, r. 35.

‘Ebdulezîz e. Ji ber vê yekê hewce ye lêkolîner bi nêrîneke rexneyî nêzî çavkaniyan bibe û wan li bêjîngê bixe.

Ji bo peydekirina kitêbên kurdî yên dewra Osmaniyan, pêşî em li katalogên kitêbxaneyan geriyan. Li Stembolê kitêbxaneyên Suleymaniye, Millet, Beyazit, Taksim; li Enqerê Kitêbxaneya Millî û li Erziromê Koleksiyona Seyfettin Ozege ji vî alî ve pir dewlemend bûn. Ji bilî kitêbxaneyên fermî, arşîvên şexsî jî zehf muhîm in. Lê di vir de problema mezin ew e ku her kes çavkaniyên di destê xwe de bi we re parve nake.

Piştî berhevkirina kitêban, dora tesnîfkirinê ye. Em dikarin kitêbên wê dewrê ji gelek alîyan ve tesnîf bikin: Ên menzûm û pexşan, ên klasîk û nûjen, ên telîf û werger hwd. Lê me ew pêşî li gorî alfabeyê dabeş kirin: Ên bi herfên ‘erebî û yên bi herfên ermenkî. Di vê dabeşkirinê de pîvan tenê alfabe bû lê bikaranîna alfabeya ermenkî bi xwe re sernavekî mezin anî: Kitêbên kurdî yên ku ji aliyê mîsyoneran ve hatine weşandin. Ji ber ku di demên dawî yên Osmanî de mîsyoneran bi herfên ‘erebî jî wergera kurdî ya sê Încîlan çap kirine, ev sernav berfirehtir û rasttir bû. Lê ji bo kitêbên kurdî yên ku ne ji aliyê mîsyoneran ve hatine weşandin me dîsa sernavê “Kitêbên kurdî yên ku bi herfên ‘erebî hatine çapkirin” bi kar anî.

Ev dabeşkirin û tesbîtkirina sernavên jor bi xwe re pîvan jî diyar dikirin ku kîjan kitêb di bin kîjan sernavî de wê bêne bicihkirin. Piştî ku hemû kitêb di bin van sernavan de têne dabeşkirin, êdî yek bi yek kunyeyên wan tên nivîsîn, derbareyê wan de agahî têne dayîn. Di dawiya nasandina her kitêbê de di bin sernavê “nusxe”yê de kitêbxaneyên ku orîjînalê wê kitêbê tê de heye tevî hejmara xwemîrî [demirbaş numarası] tê nivîsîn. Bi vî rengî lêkolînerên ku bixwazin xwe bigihînine nusxeya orîjînal dikarin serî li wan kitêbxaneyan bidin.

Ji ber maweya wê di vê xebatê de gelek caran dîrokên li gorî teqwîmên hîcrî û rûmî derbas dibin. Di veguhastina wan a mîladî de “Tarih Çevime Kılavuzu”<sup>8</sup> û “Tarih Çevirici”<sup>9</sup> hatine ‘emilandin.

---

8 “Tarih Çevime Kılavuzu [Bernameya Veguherîna Dîrokê]”, <http://193.255.138.2/takvim.asp>.

9 “Tarih Çevirici [Veguhezêra Dîrokê]”, <http://www.devletarsivleri.gov.tr/katalog/osmanli/tarih.asp>.

Di beşa encamê de li gorî 42 kitêbên mijara vê xebatê nirxandinên îstatîstîkî têne kirin. Herwisa li gorî beşa duyem a vê xebatê û weşangeriya kurdî ya dewra Osmanî li ser tevgera kurdî ya wê dewrê jî nirxandinek heye. Jixwe di temamê vê xebatê de dîroka weşangeriya kitêbên kurdî û rewşa tevgera kurdî ya wê demê bi awayekî paralel têne xwendin û têkiliyên wan têne nîşandan.

# BEŞA EWIL

## KURD Ê ÇAPXANE

### 1.1. Derbareyê Çapxaneyê de

Teknîka modern a çapkirinê di sala 1440î de li Almanyayê, li bajarê Mainzê ji aliyê Johann Gutenberg ve tê îcadkirin. Nimûneyên kitêbên ku di salên 1454-1455an de li Mainzê, bi tîpên madenî hatine çapkirin îro li ber destan in.<sup>10</sup> Ev teknîk li Ewrûpayê bi awayekî xurt belav dibe. Li gorî Febvre&Martin<sup>11</sup>, di sala 1480î de li zêdeyî 110 bajarên Ewrûpayê êdî çapxane hebûn û hejmara wan her diçû zêde dibû; ji ber ku çapkirina kitêban û firotina wan di demeke kurt de bi destê sermayedaran bûbû bazirganeyeke nû û navenda vê bazarê jî Almanyaya û Îtalya bû: Bi giştî li Ewrûpayê heta sala 1500î 15-20 mîlyon; di sedsala 16an de (1500-1600) jî 150-200 mîlyon nusxe kitêb çap bûbûn.

Li gorî Francis Bacon (m. 1626), sê tiştan di cîhanê de her tişt guherand û serdemeke nû vekir: çapxane, barûd û pisûla. Ji van a ewil edebiyat, a duyem zanista şer, a sêyem jî deryavanî guherand û van bandoreke mezin li dîroka nûjen kir.<sup>12</sup> Em dikarin barûdê wek aliyê leşkerî, pisûlayê aliyê bazirganî û çapxaneyê jî aliyê fikrî yê modernîzmê bihesibînin. Ji bo vê xebatê çapxane û aliyê hizrî yê

---

10 Kemal Beydilli, "Matbaa", *DIA*, c. 28, 2003, r. 106.

11 Lucien Febvre & Henri-Jean Martin, *Kitabın Doğuşu*, wr. G. Batuş, weş. Avcıol, İstanbul, 2000, r. 147-148, 213-214.

12 Francis Bacon, *The New Organon*, ed. L. Jardine-M. Silverthorne, Cambridge University Press, 2000, r. 100.

modernîzmê, bi taybetî jî rola çapxaneyê di avakirina fikra netewî de girîng e.

Piştî îcada alfabeyê pêşî rahîb dûvre jî mustensix/nivîsende bi karê nivîsandinê re mijûl bûn. Kitêb vê demê tenê di destê rahîb û dewlemendan de hebû. Heta dawîya Serdema Navîn jî zanîn di tekela çîna ruhban û çîna desthilatdar de ye. Ev yek li Rojhilatê jî li Rojavayê jî bi vî rengî bû. Bo nimûne, Amir Hassanpour di lêkolîna xwe de nîşan dide ku heta sedsala 19an kesên ku bi kurdî helbest û kitêb nivîsandine piranî yan şêx, feqe û mela ne yan jî mîr û beg û axa ne.<sup>13</sup> Em dikarin bibêjin ku çapxaneyê sînore zanînê fereh kir û ew gihand ber destê girseyên mezin.

Ji bo rola çapxaneyê ya di belavkirina fikr û zanînê de nimûneyeke balkêş Martin Luther e. Luther di sedsala 16an de, ku li Ewrûpayê wekî sedsala reformê tê nasîn, jiyaye. Luther, aliyê reforma olî ya li Ewrûpayê temsîl dike. Ew enduljansê<sup>14</sup> û hin karên din ên Dêra Romayê rexne dike û fikrên xwe bi daxuyaniya xwe ya bi navê “Nod û Pênc Tez” jî gel re îlan dike. Ji ber ku di nêrînên xwe de israr dike û jê venagere, di sala 1521ê de tê aforozkirin/harmonokirin.<sup>15</sup> Lê ew dîsa ji doza xwe venagere û di sala 1522an de wergera almanî ya Peymana Nû diqedîne û çap dike. Sê hezar nusxeyên çapa ewil di nava sê mehan de têne firotin. Wergera Peymana Nû ya Luther, ji çapa ewil heta mirina wî ango di navbera 1522-1546an de ji 300 carî zêdetir çap dibe.<sup>16</sup> Li gorî Benedict Anderson jî ev werger di wê dewrê de bi temamî yan jî bi hin beşên xwe 430 carî çap dibe.<sup>17</sup> Bi

---

13 Amir Hassanpour, *Kürdistan'da Dil ve Milliyetçilik 1918-1985*, wer. İ. Bingöl-C. Gündoğan, weş. Avesta, İstanbul, 2005, r. 154, tablo no:13.

14 Enduljans, efûkirina hinek an jî temamê gunehê kesekî bi wasîteya dêrê ye. Ev ritueleke kevn e di nav xirîstîyanîyê de, lê di sedsala 16an de êdî ew vediguherê bazirganiyê ku rahîb bi pereyan gunehên mirovan efû dikin. Yek ji tiştên ku reformîst herî zêde rexne dikin jî ev bû. Bnr. Hakan Olgun, *Luther ve Reformu Katolisizm'i Protesto*, weş. Fecr, Ankara, 2001, r. 39-45.

15 Olgun, hb., r. 46-47, 55.

16 Olgun, hb., r. 150.

17 Anderson, *Hayali Cemaatler, -Milliyetçiliğin Kökenleri ve Yayılması-*, r. 54.

vî rengî Luther di demeke kurt de û bi awayekî xurt fikriyata xwe digihîne girseyeke mezin.

Lêkolîner di wê rayê de ne ku di serketina şoreşa Luther de roleke mezin a çapxaneyê hebû. Ya na wergera wî û fikriyata wî evqas belav nedibû. Luther, bi vê wergerê tekela dêrê ya li ser Încîlê/Kitêba Pîroz dişikîne û gel pir kêfxweş dibe ku gotinên yezdan bi awayê nivîskî di destê xwe de digire û bi zimanê xwe dixwîne. Bi vî rengî, xwendina pirtûka pîroz bi zimanê xwe li ser nasnameya netewî ya almanan jî bandoreke mezin kiriye. Çimkî wergera Luther ji bilî girîngiya olî, xwedî girîngiyeke zimanî jî bû: Li gorî Erich Auerbach, bingeha zimanê edebî yê almanî yê îroyîn wergera Luther e.<sup>18</sup>

## 1.2. Çapxane Li Nav Dewleta Osmanî

Di pêvajoya modernîzma Osmanî de bandora çapxaneyê pir e. Bi rêya çapemenî û weşangeriyê, hêmanên cuda yên Osmanî derfeta xweîfadekirinê dît. Vê xweîfadekirinê ji xwe, ji nasnameya xwe hayedarbûn û hişmendiyeke kolektîf jî pêk anî. Dîsa weşandina kitêb, kovar û rojnameyên bi zimanê zikmakî hesasiyeteke zimanî afirand. Em di mînakê kurdan de jî dibînin ku hişmendiya netewî ya modern di nav gelên misilman de bi hestiyariya zimên dest pê dike û bi gotina Marshall McLuhan “avakarê netewperweriyê li çapxaneyê çapbûna peyvan e”.<sup>19</sup>

Çapxaneya modern ku di sedsala 15an de li Ewrûpayê derket û li wir pêş ket, di dawiya heman sedsalê de bi destê penaberên cihû yên Îspanyolî giha Stembolê; paşê ermenî û rûman jî çapxaneyên xwe ava kirin. Belavbûna çapxaneyê li nav misilmanan dereng e. Ev rewş piranî wekî “hewcedarî pê nebû lewre” tê îzahkirin. Rast e, li nav Osmanî û bi giştî li nav cîhana îslamê kevneşopîyeke xurt a destxetê hebû û êdî ev hem karekî profesyonel hem jî hunermendî bû. Bo nimûne çavkanî di sedsala 18an de hejmara mustensixên li tevahiya Osmanî 80 an jî 90 hezar nîşan didin ku ji van nêzî 6 hezaran li Stembolê kar dikir. Wekî mustensix û ressamên kitêban

18 Olgun, hb., r. 151-152.

19 vgz. Hassanpour, *Kürdistan'da Dil ve Milliyetçilik 1918-1985*, r. 275.

ên li Parîsê muhtemel e ku mustensixên Osmanî jî ji çapxaneyê ne xweş bin. Çimkî karê wan jî dest diçû. Di nav Osmanî de ev nîqaş bi biryara “li çapxaneyan kitêbên dînî çap nebin” çareser dibe.<sup>20</sup>

Di Dewleta Osmanî de avakarê çapxaneya tirkî Îbrahîm Muteferriqa tê qebûlîkirin.<sup>21</sup> Muteferriqa, di sala 1727an de bi fermana padîşahê Osmanî û bi fetwaya şêxulîslam li mala xwe çapxaneyekê ava dike. Di 31ê Çileyê 1729an de jî kitêba ewil a bi navê “Vankulu Lugati” çap dike. Li ser vê kitêbê navê çapxaneyê “Daru’t-tiba’etu’l-me’mûre” dinivîse. Piştî mirina Muteferriqa, çapxaneya wî dikeve destê gelek kesan. Heta Meşrûtiyeta Duyem (1908) navê wê “Matbaa-i Amire” ye, paşê jê re Matbaa-i Millî û Matbaa-i Dewlet jî tê gotin.<sup>22</sup>

Îbrahîm Muteferriqa, di sala 1726an de ji bo parastina fikra avakirina çapxaneyê li nav Osmanî rîsaleyeke bi navê *Vesiletu’t-Tiba’a* dinivîse. Di vê rîsaleyê de girîngî, hewceyî û fêdeya çapxaneyê wiha diparêze: Ji ber îstîlayan gelek berhem hatine talankirin, ji ber ku mustensixên baş nemane destxet tije şaşî û kêmayî ne. Lê bi saya çapxaneyê wê berhem baştir û bê xeta bêne çapînin, buhayê wan wê erzan bibe û bi vî awayî wê kitêbxaneyên mezin bêne avakirin. Herwiha Dewleta Osmanî ku bi cîhadê şerefa îslamê bilind dike bi çapkirina kitêban jî wê çanda îslamê bilind bike. Jixwe kitêbên îslamî li Ewrûpayê zû de û bi gelek şaşîyan çap dibin, eger li nav Osmanî çapxane hebe ew pereyên ku diçine ji Ewrûpayê re jî wê ji Osmanî re bimînin.<sup>23</sup>

Gotina dawî ya Muteferriqa balkêş e, lewre bi rastî jî kitêbên îslamî cara ewil li Ewrûpayê çap dibin. Bo nimûne Quran di sala 1530î de li Venice û di sala 1694an de li Hamburgê çap dibe. Dîsa kitêba tibê ya Îbn-i Sîna jî di sala 1593yan de li Romayê çap dibe, lê di van çapan de -wekî ku Muteferriqa jî dibêje- gelek şaşî hene.<sup>24</sup> Li

---

20 Beydilli, “Matbaa”, r. 106-108.

21 Erhan Afyoncu, “İbrâhim Mûteferrika”, *DIA*, c. 21, 2000, r. 324-327.

22 Turgut Kut, “Dârüttibâa”, *DIA*, c. 9, 1994, r. 10-11.

23 Afyoncu, “İbrâhim Mûteferrika”, r. 326.

24 Mahdi, “From the Manuscript Age to the Age of Printed Books”, r. 1.

vir hem hesasiyeteke dînî hem jî rastiyeke aborî xuya dike. Çapxane hem ji aliyê fikrî û çandî ve wê bibe amadekarê gelek guhertinan hem jî wê bibe bazareke/endustriyeke mezin. Muteferriqa dixwaze ku Osmanî jî di vê bazarê de cihê xwe bigire.

Li nav zanayên misilmanan li hember çapxaneyê hesasiyeta herî mezin çapkirina kitêbên dînî bû, nexasim jî çapkirina Quranê: Kontrolkirina destxetan rehet bû, jixwe hejmara wan bi sînor bû û ji ber buhayê wê jî di nav komeke ast-bilind û elît de belav dibû. Lê çapxane ne wisa bû; wê çawa dikarîbû zanîne pir xurt belav bike, dikarîbû şasiyê jî wisa xurt belav bike.<sup>25</sup> Di fermana padişahê Osmanî de jî destûra sazkirina çapxaneyê bi şertê ku Quran û kitêbên hedîs, tefsîr û fiqhê lê çap nebin hatibû dayîn. Em dibînin ku ev hesasiyet di sedsala 19an de mutmeîn dibe, lewre Quran di sala 1854an de li Kelkûta (Kolkata), 1864an de li Qahîre û 1872an de jî li Stembolê çap dibe.<sup>26</sup> Helbet Quran û wergerên wê li navendên Ewrûpayê zû de û gelek caran çap bûbûn<sup>27</sup>, lê bi destê misilmanan çapkirina wê gaweke girîng e, herwiha rakirina astengeke mezin a li pêş çapxaneyê ye.

Ji çapkirina kitêba ewil heta 1830î ango di sedsalekê de li nav Osmanî tenê 180 kitêb çap dibin, lê ji 1830î heta 1876an ev hejmar digihe 3066an. Ev yek nîşan dide ku kitêbên çapkirî di destpêkê de zêde rewac nedîtine lê bi demê re kîtleçek bo xwe ava kirine.<sup>28</sup>

Li nav Dewleta Osmanî demên ku çapemenî û weşangeriyê herî zêde rewac dîtiye, dewrên meşrûtiyetê ne. Bi taybetî Meşrûtiyeta Duyem di vî warî de şoreşek pêk aniye. Bandora herî mezin a Meşrûtiyeta Duyem li ser çapemenî û weşangeriyê rakirina sansûrê bû. Bi azadiya metbûatê û rakirina sansûra posteyê re, di vî warî de serbestiyek mezin çêdibe. Di demeke kurt de bi dehan rojname

---

25 Pedersen, *İslam Dünyasında Kitabın Tarihi*, r. 143.

26 Pedersen, hb., r. 145.

27 Bnr. Pedersen, hb., r. 140.

28 Jale Baysal (Buğra), *Müteferrika'dan Birinci Meşrutiyete Kadar Osmanlı Türklerinin Bastıkları Kitaplar*, İstanbul Üniversitesi Edebiyat Fakültesi Basımevi, İstanbul, 1968, r. 13-14.

têne weşandin, hetta li Stembolê hejmara rojnameyên rojane giha-  
 ye pêncihî.<sup>29</sup> Lê ev azadî jî zêde dewam nake. Piştî “31 Mart Vak’ası  
 [Bûyera 31ê Adarê]”<sup>30</sup> rewşa awarte tê îlankirin û çapemenî bi rêzik-  
 nameya methûatê (1909) dîsa dikeve bin zebt û rebtê, nexasim yê-  
 dijberî Ittihad ve Terakkî Cem’iyyeti [Komeleya Yekitî û Pêşveçûnê-  
 ITC] û meşrûtiyetê bin. Şûna qedexe, sansûr û sirgûnên rejîma ‘Eb-  
 dulhemîdê Duyem vê carê yê ITCê digirin. Bo nimûne, piştî Bûye-  
 ra 31ê Adarê xwediyê rojnameya *Serbestîyê* Mewlanzade Rif’et di  
 Dîwana Herbê ya Orfî de (dadgeha rewşa awarte ya rejîma leşkerî)  
 tê darizandin, ji ber tawanbarkirina ku serhildêr sor kirine deh sa-  
 lan tê sirgûnkirin, herwiha çapxane û rojnameya wî jî tê girtin.<sup>31</sup>  
 Seîdê Kurdî jî, ku yek ji mexdûrên serdema ‘Ebdulhemîdê Duyem  
 bû, di vê dadgehê de tê darizandin û parastina wî ji aliyê Kurdîzade  
 Ehmed Ramîz ve tê çapkirin.<sup>32</sup>

Çapxane û çapemenî daîma di bin bandora rewşa siyasî û aborî  
 de ye, lê piştî Meşrûtiyeta Duyem êdî hem ji aliyê jimarê ve hem jî  
 ji aliyê qelîteyê ve kemilînek xuya dike. Lewre êdî kitêbên destxet  
 -perwerdeya dînî ne di nav de- bi temamî ji holê radibin û rojname  
 jî dibe parçeyeke jiyana mirovên bajarî.

Di navbera salên 1908-1917an de di nav sînorên Osmanî de 335  
 heb çapxane û weşanxaneyên ku bi tirkî kitêb diweşandin hebûn  
 ku ji van 250 heb li Stembolê bûn.<sup>33</sup> Loma em dikarin bibêjin ku  
 herçiqas bi saya çapxaneyên wîlayetê û yê taybet çapxane belavî  
 gelek bajarên Osmanî bûbe jî navend hertim Stembol bû.

Piştî Şerê Cîhanê angoyê di dewra mutarekeyê de (1918-1922), li  
 nav Osmanî çapemenî û weşangerî ji aliyê reqeman û curbicurbûnê

29 Taner Aslan, “II. Meşrutiyet Döneminde Matbuat ve Neşriyat Yasakları”,  
*Tarihin Peşinde*, j.2 (Ekim 2009), r. 230.

30 Ji bo hûrgiliyên vê bûyera dîrokî bnr. Azmi Özcan, “Otuzbir Mart Vak’ası”,  
*DIA*, c. 34, 2007, r. 9-11.

31 Aslan, “II. Meşrutiyet Döneminde Matbuat ve Neşriyat Yasakları”, r. 233.

32 Bedî’uzzaman, *İki Mekteb-i Musîbetin Şehâdetnâmesi Yâhûd Dîvân-i  
 Harb-i Örfî: ve Sa’îd-i Kurdî*, Iqbal-i Millet Matba’ası, İstanbul, 1327.

33 Alpay Kabacalı, *Başlangıcından Günümüze Türkiye’de Matbaa, Basın ve  
 Yayın*, weş. Literatür, İstanbul, 2000, r. 148-149.

ve geş dibe lê ji aliye sansûre ve dîsa xirab e. Lewre Osmanî êdî dewleteke têkçûyî bû. Hikûmetê li ser hevdu biryarnameyên sansûrê diweşandin. Bi biryarnameya 1919an êdî bêyî destûra nivîskî ya hikûmeta ‘eskerî û saziya sansûrê, çapkirina her cure weşanê tê qedexekirin. Rojnameyan sitûnên ku hatine sansûrkirin vala dihiştin û bi vî şiklî belav dibûn. Êdî mirovan sansûr di sitûn hetta rûpelên vala de, bi çavê xwe didîtin.<sup>34</sup>

Jimara weşanên kurdî di vê dewra mutarekeyê de zêde dibe: Di navbera salên 1918-1923an de 15 kitêbên kurdî me tesbît kirin. Lê herwiha weşanên kurdî jî ji sansûr û qedexeyan para xwe distînin (bnr. Beşa 3.4). Ligel vê, mîsyoneran cara ewil di vê serdemê de karîbûn wergerên kurdî yê Încîlan bi herfên ‘erebî li Stembolê biweşînin. Xuya ye ku li Stembola dagirkirî, rêvebirîya navnetewî rehetîyek daye karên mîsyoneriyê û weşanên bi zimanê kêmanî/mînorîteyan.

### 1.3. Çapxane û Rewşenbîrên Kurd

Rewşenbîrên kurd ên ku di serê sedsala 20an de li Stembolê di nav kar û barên kulturî de ne, ji girîngiya çapxaneyê agahdar in. Babanzade Ehmed Ref‘et, di nivîseke xwe de, ku tê de bangî ciwanên kurd dike, pesnê pêşketina ‘ilmî û zanistî ya cîhanê dide û bal dikeşîne ser rola çapxaneyê ya di vê pêşketinê de: “Helbet ev pêşketina ‘ilmî bi kitêbên destxet ku em di salekê de kitêbokekê dinivîsin pêk nehatiye. Bêguman bi çapxaneyê, bi hêsanbûna belavkirina zanînê, ku çapxaneyê bi xwe re aniye, pêk hatiye.”<sup>35</sup> Xelîl Xeyalî jî di sala 1913an de di kovara *Rojî Kurdê* de girîngiya çapkirina kitêbên kurdî wiha îzah dike:

“Beyt[ê] ku bi ziman[ê] kurdî hatiye gotin, kitêb[ê] ku hatiye çêkirin heya niha çap nebûye, ji bo vî qas[î] kesek şêx û mela û şa‘îr[ên] kurdan nas nake, eger eser[ê] wan bihata çapkirin dê bihatana naskirin. Îro li ser temam[ê] kurdan ferzê

34 Aslan, “II. Meşrutiyet Döneminde Matbuat ve Neşriyat Yasakları”, r. 151.

35 Babanzade Ehmed Ref‘et, “Kürd Genclerine”, *Hetawî Kurd*, J.3 (29 Kanûniyewwel 1329/11 Çile 1914), r. 18.

‘eyn e ku bi ziman[ê] xu bixwînin û binivîs[in]. Şêx û mela û şa‘ir[ên] xu bizanin, şî‘r[ê] wan, kitêb[ê] wan li çapê bidin û bela bikin.”<sup>36</sup>

Mehmed Salih Bedirxan, li ser rola çapemeniyê disekine û dibêje; miletekî ku girîngiyê nede çapemeniyê nikare bibe xwediye armanceke hevpar, gava armanceke hevpar jî nebe hemû hêza surîştî ya wî miletî wê zîyan bibe û biçê.<sup>37</sup>

Helbet bi qasî rewşenbîrên kurdan, rayedarên dewletê jî ku ji pêşketina nasnameya kurdî aciz bûn, ji girîngiya çapxaneyê hayedar bûn. Wekî mînak di sala 1919an de gava Kulûba Kurdan a Diyarbekirê bi navê xwe yê din Diyarbekir Kurd Te‘alî Cem‘iyyeti [Komeleya Bilindkirina Kurdan a Diyarbekirê], dixwest bibe xwediye çapxaneyekê, walîtiya Diyarbekirê hewl dide vê asteng bike. Li gorî fikra walî weşanên kurdî yên kulûbê li ser “gelê cahil” wê bandoreke xirab çêbike.<sup>38</sup>

Nimûneya Luther, gotinên rewşenbîrên kurdan û helwesta waliyê Diyarbekirê nîşan dide ku çapxane, bi taybetî jî çap û weşana bi zimanekî bindest hem ji bo wî zimanî hem jî ji bo hişyarbûna xwediyan wî zimanî gelekî muhîm e. Lewre ew bi van weşanan ji aîdiyeta xwe hayedar dibin, xisûsiyeta xwe ya millî ferq dikin û ev agahdarbûn jî ji bo xwestina maf û statuyê dibe zemînek. Di vî warî de anektoda Lutî Fikrî hêjayî veguhastinê ye: Di kovara *Rojî Kurdê* de Lutî Fikrî dibêje ku îro piştî ‘ereb û ernewûdan unsurê ku hebûna xwe herî xurt fêm û hîs dike kurd in. Ew, ji derengmayîna kurdan a di warê hişyarbûna netewî re wekî sedem asêbûna welatê wan nîşan dide û bîranîneke xwe vedibêje: Ew li gundekî kurdan li odeya gund li ser çekmeceyekê kitêbeke biçûk dibîne, ev kitêbeke kurdî ye ku ji Stembolê gihaye vir. Gundî bi qasî kitêbeke dînî qedir didine vê kitêba kurdî. Gava behsa wê dikin, kelecânî dibin û ji ‘eşqa çavê wan hêstir dike. Ew dibêjin:

36 *Di Sedsaliya Wê de Rojî Kurd 1913*, amd. Koma Xebatên Kurdolojiyê, weş. Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, Stenbol, 2013, r. 226.

37 *Di Sedsaliya Wê de Rojî Kurd 1913*, amd. Koma Xebatên Kurdolojiyê, r. 28.

38 Sinan Hakan, “Diyarbekir Kürt Kulübünün Yayıncılık Mücadelesi-1919”, *Kürt Tarihi*, j.10 (Aralık 2013-Ocak 2014), r. 47.

“Kürdce kitâb! Bunu hîç görmemişdik, demek Kürdce de kitâb olurmuş! Köyün imâmına bunu birkaç def’a okutduk. Çok yerlerini anladık. Meserretimizden gözlerimiz sulandı. Çok şükür bu günü de gördük!”<sup>39</sup>

[Bi kurdî kitêb! Me qet ev nedîtîbû, naxwe bi kurdî jî kitêb çêdibe! Me bi melayê gund çend caran da xwendin, gelek cihên wê me fêm kirin. Ji kêfxweşiyê çavê me hêstir kir, mala Xwedê ava me ev roj jî dît!]

Nivîskar ji vê anekdotê digihe vê encamê ku êdî fikra kurdayeriyê gihaye heta van gundên biçûk ên bêrê jî û îmkana astengkirina wê nîne. Di gotinên gundiyan û di şeweya nivîskêr de “romantîzma netewî” xuya dike. Dîtina kitêbeke bi kurdî ji bo wan gundiyan bi awayekî şênber dîtina nasnameya xwe ye û bi vê nasnameya ku di destê xwe de digirin ew bi mensûbiyeta xwe ya –bi gotina Benedict Anderson- “cemaeta xeyalî” dihisin, wekî wan almanên ku cara ewil pirtûka pîroz bi wergera Luther bi zimanê xwe xwendin.

Muhsin Mahdi, pêvajoya ji destxetan ber bi çapê ve çûyînê bi sedemên civakî û kulturî ve girê dide.<sup>40</sup> Lewre di nîveka duyem a sedsala 19an û destpêka sedsala 20an de wekî Ewrûpa li nav civakên misliman jî fikra netewperweriyê derkete pêş. Herwiha perwerdeya modern jî çîneke nû ya xwende û sekuler afirand. Wan îhtiyacî bi berhemên nû û orîjînal dît û xwestin ji bo xwe kitêbxaneyên şexsî ava bikin. Van şertên nû nivîskariya modern afirand. Ji bo kurdan jî di dawiya sedsala 19an û destpêka sedsala 20an de em dikarin behsa çîneke nû, xwedî perwerdeyeke modern û aşînayî fikriyata ewrûpî bikin. Li Stembolê malbatên mîrektiyên tesfîyekirî, ciwanên xwendekar, esker û memûrên kurd ev çîn temsîl dikir. Jixwe kême zêde ye ku tevgera kurdî diafirand jî ev çîn bû: Ê ku komele ava dikir, dibistan vedikir, kovar û rojname derdixist, kitêb çap û belav dikir, siyaseta û dîplomasî dikir...

Şertên ku Mahdi behs dike hemû li rewşa kurdan nayên, lewre ew di vê pêvajoya modernîzmê de rol dide dewletê jî, lê kurd ji vê

39 *Di Sedsaliya Wê de Rojî Kurd 1913*, amd. Koma Xebatên Kurdolojiyê, r. 203-204.

40 Mahdi, “From the Manuscript Age to the Age of Printed Books”, r. 6-7.

mehrûm in. Herwiha bi kurdî perwerdeya modern jî nîne. Kurdperwer, di vê dewreyê de girîngiyeke mezin didine perwerdeyê û zimanê kurdî, hetta di şertên musaîd de bi xîreta xwe dibistaneke kurdî jî (Kurd Meşrûtiyet Mektebi) vedikin. Xelîl Xeyalî elîfbayeke kurmançî amade dike, ‘Ebdurehîm Rehmî ji bo perwerdeya kurdî amadekariya kulliyatekê dike. Lê dawîya dawî di mektebên modern ên Osmanî de hikmê kurdî nîne. Ew encax li medreseyên kurdan wekî zimanê ders vegotinê cih digire. Aktivîstên kurd ên vê dewreyê jî piranî li van medreseyan perwerde dîtine, paşê hatine Stembolê û li vir perwerdeya modern standine an jî xwe bi xwe hînî vê cîhana nû bûne û xwestine kurdan jî modernîze bikin. Çap, çapxane û çapemenî di vê modernîzasyonê de dikarîbû roleke mezin bilîze, lewma wan jî berê xwe da van amûran. Ji ber vê yekê tiştekî asayî ye ku di çapxaneyê kurdî de pêşîn klasîkên kurdî û kitêbên medreseyê çap bibin. Ev hem tesîra kevneşopê/destxetan a li ser dewra modern hem jî nebûna “nivîskar/helbestvan” nîşan dide. Heta piştî şerê cîhanê jî bi kurdî berhemeke edebî ya nû(jen) çap nabe. Di sala 1919an de ‘Ebdurehîm Rehmî wekî helbestvanekî modern, kitêba xwe ya helbestê (*Gaziya Welat* -Kitêba Ewîl-) dide çapkirin; cara pêşîn e ku kitêba helbestvanekî ku hîn li jiyanê ye tê çapkirin. Ev jî “manuscript”ê derbasbûna “printed book”ê de qonaxeke nû ye; dawîya dewra destxetan û destpêka dewra kitêba çapkirî ye.

#### 1.4. Çapxane Li Nav Kurdan û Çapxaneyên Kurdî

Wekî Dewleta Osmanî, li nav kurdan jî çapxaneyên herî kevin ên xirîstiyanan bûn. Wekî mînak di sala 1858an de li Wanê, di Manastira Warakê de çapxaneyê Rahîb Migirdîç Xîrîmyanê Wanî hebû. Wî di salên 1855-1856an de li Stembolê kovareke bi navê *Ardziv Vaspuragan* (Teyrê Wanê) derdixist. Di 1858an de çapxaneyê xwe vediguhêze Wanê, gava di sala 1862an de li Mûşê tê wezîfedarkirin jî çapxaneyê dibe wir û li wir jî kovara *Ardziv Darona* (Teyrê Daronê) derdixe.<sup>41</sup> Ji bilî Wanê li Erzirom, Xarpêt, Erzingan û Entabê jî çapxaneyên ermenîyan hebûn.<sup>42</sup>

41 Teotig, *Baskî ve Harf Ermeni Matbaacılık Tarihi*, wer. S. Malhasyan-A. İn-cidûzen, weş. Birzamanlar, İstanbul, 2012, r. 110.

42 Teotig, hb., r. 188-189.

Cema'eta suryanî jî di dewra Osmaniyan de xwedî çapxane bû. Cara ewil Patrîk Ye'qûbê Duyem (1847-1871) çapxaneyeye biçûk dikire û tîne Mêrdînê, Manastira Deyru'l-Zafaranê. Patrîk Petrûsê Çaremîn (1872-1894) ji bo çapxaneyê di nava Manastira Deyru'l-Zafaranê de bînameke cuda dide çêkirin. Di vê çapxaneyê Mêrdînê de berhema ewil di sala 1888an de çap dibe, lê piştî bi salekê kar û barên vê çapxaneyê tê qedexekirin. Di sala 1907an de çapxane ji nû ve dest bi şixul dike û di sala 1913an de kovara bi navê *Hikmet* tê weşandin.<sup>43</sup> Li gorî Ahmet Taşgîn, li vê çapxaneyê Deyru'l-Zafaranê di dewra 1888-1917an de ji bilî kovara *Hikmetê* -yek jê çapa duyem- 17 kitêb çap bûne.<sup>44</sup>

Di sala 1864an de di nav Osmanî de Nîzamnameya Wîlayetan tê weşandin û rêvebiriyên herêmî ji nû ve tên sazkirin.<sup>45</sup> Piştî vê biryarê tê standin ku li her wîlayetê çapxaneyeye wîlayetê bê sazkirin û di van çapxaneyan de rojnameyên herêmî bêne weşandin.<sup>46</sup> Li bajarên kurdan cara ewil di sala 1866an de li Erziromê<sup>47</sup>, di sala 1869an de li Diyarbekirê<sup>48</sup>, di sala 1893yan de li Elezîzê<sup>49</sup> çapxaneyên wîlayetê tên sazkirin. Di çapxaneyê wîlayetê ya Elezîzê de kitêbeke tirkî-kurdî bi navê *Türkçeden Kurd Lisanına Mutercem Ilmihaldir* tê

---

43 Ahmet Taşgîn, "Süryani Kadim Ortodoks Kilisesinde Yenileşme Çabaları: Deyru'l-Zafaran Manastırında Patriklik Matbaası", dnd. *Süryaniler ve Süryanilik*, c. 4, weş. Orient, Ankara, 2005, r. 11-20. Ji bo agahiyên berfi-rehtir derbareyê kovara *Hikmet* de bnr. hb., r. 52-53.

44 Taşgîn, hb., r. 24-25.

45 *Türkiye Tarihi 3 -Osmanlı Devleti 1600-1908*, ed. S. Akşin, weş. Cem, İstanbul, 2009, r. 146-147.

46 Kabacalı, *Başlangıcından Günümüze Türkiye'de Matbaa, Basın ve Yayın*, r. 88-89.

47 Talip Atalay, "Yerel Bir Tarihi Kaynak Olarak Diyarbekir Vilayet Gazetesi ve Ermeniler", *AÜİFD*, j.47 (2006), r. 146.

48 Atalay, hg., r. 147. Jale Baysal (Buğra), dîroka avakirina çapxaneyê Diyarbekirê 1870 (1287) nişan dide. Bnr. *Müteferrika'dan Birinci Meşrutiyete Kadar Osmanlı Türklerinin Bastıkları Kitaplar*, r. 50.

49 Zafer Çakmak, "Elazığ'da Yayınlanan İlk Gazete: Mamuretü'l-Aziz", *Doğu Anadolu Bölgesi Araştırmaları*, j.3 (2003), r. 28

çapkirin.<sup>50</sup> Dîsa di hejmara 12an a rojnameya *Peymanê* de, ku di çapxaneyê wîlayeta Diyarbekrê de dihate çapkirin, nivîseke bi kurdî tê weşandin.<sup>51</sup>

Di hejmara 4 û 5an a rojnameya kurdî ya ewil *Kurdistanê* de “Li Misrê Metbea Cerîdeya Kurdistanê tebi’ bîye” tê nivîsîn.<sup>52</sup> Ev yek îhtimala ku li Misrê ji bo rojnameyê çapxaneyek hatiye avakirin tîne bîra yekî, lê di hejmarên paşê de careke din ev nav derbas nabe.

Li gorî Ferhad Pîrbal, çapxaneyê Ictihadê çapxaneyê kurdî ye. Hetta ji ber ku berî çapxaneyê Huznî Mukriyanî ava bûye, ew Ictihadê yekemîn çapxaneyê kurdî qebûl dike.<sup>53</sup> Bi rastî jî xwediyê wê ‘Ebdullah Cevdet bi eslê xwe kurd e û wî heya dawîya Dewleta Osmanî jî di nav komeleyên kurdî de cih girtiye. Herwiha li vê çapxaneyê weşanên kurdî jî belav bûne. Bo nimûne; *Mewlûda* Bateyî (1906) û jimara duyem a *Rojî Kurdê* (1913) li vir çap bûne. Dîsa kitêba *Emîr Bedirxan* a Lutfî ango Kurdîzade Ehmed Ramîz jî li vir çap bûye. Ev berhem herçendî ne bi kurdî jî be ji aliyê mijarê ve bi kurdan re têkildar e. Bi qasî çapxaneyê, kovara *Ictihadê* jî ku xwediyê wê ‘Ebdullah Cevdet e, dîsa bo kurdan muhîm e. Çimkî di vê kovarê de hem ‘Ebdullah Cevdet li ser pîrsgirêka kurd û ermenîyan çend gotar nivîsîne<sup>54</sup> hem jî tê de çend nivîsên Kamiran Alî Bedirxan hene.<sup>55</sup>

---

50 Arslan, “Türkçeden Kürd Lisanına Mütercem İlmihaldır (1891, Elezîz): İlmihaleke bi Tirkî û Wergera Wê ya Kurdî”, *Kürdoloji Akademik Çalışmalar Cilt 1*, r. 246-272.

51 Ji bo tîpguhêziya vê nivîsê bnr. Malmîsanîj&Mahmûd Lewendî, *Li Kurdistanê Bakur û li Tirkîyê Rojnamegeriya Kurdî (1908-1992)*, weş. Özge, Ankara, 1992, r. 49-51; Zülfükar İpek, *Peymân Gazetesi’nin 1325 (1909) Transkript, Tahlil ve Değerlendirilmesi*, (teza lîsansa bilind), Zanîngeha Dicle, 2018, r. 161-162.

52 M. Emîn Bozarslan, *Kurdistan Rojname Kurdî ya Pêşîn (1898-1902)*, c. I, weş. Deng, Uppsala, 1991, r. 152, 167.

53 Ferhad Pîrbal, “Pioneer Kurdish Publishers”, dnd. *Shadow of the Lion*, wer. Kurdish Globe, Shahab Printing House, Erbil, 2012, r. 46.

54 Bnr. Alişan Akpınar, “İttihatçı Bir Kürt Aydını: Dr. Abdullah Cevdet’in Yazıları”, *Vesta*, j.1 (2003), r. 280-298.

55 Ji bo lîsteya nivîsên Kamiran Alî Bedirxan ên di weşanên serdema Osmanî de bnr. Mesut Arslan, “Serbestî Gazetesi (1918-1919) ve Be-

Dîsa Celadet û Kamiran Bedirxan piştî şerê Balqanan (1912-1913) bi navê *Edirne Sukutunun İç Yuzu* [Rastiya Jidestçûna Bajarê Edirneyê] kitêbekê dinivîsîn, ew li çapxaneya Serbestîyê ya Mewlânzade Rif'et çap dibe û beriya çapê muqeddimeya wê di kovara *Ictihadê* de tê weşandin. Ev hemû di warê weşangeriyê de têkiliyên xurt ên rewşenbîrên kurdên wê dewrê nîşan didin.

Çapxaneyeke din a ku bi kurdan re têkildar e, li Stembolê Met-bee-i Amedî ye. Li gorî Malmîsanîj xwediyê vê çapxaneyê ji Diyar-bekirê ye yanî Amedî ye û derbareyê kurdan de jî kitêb çap kirine.<sup>56</sup> Di lêkolîna xwe de me tenê du kitêbên ku li vir çap bûne û bi kurdan re têkildar in dîtin: *Kurd Neşr-i Ma'arif Cem'iyyeti Nizamnamesi* û *Tezkire-i Şu'ara-yı Amid a 'Alî Emîrî Efendî*.

Zinar Silopî dibêje ku Xelîl Xeyalî, Mîrîkatîbîzade Cemîl û Kurdîzade Ehmed Ramîz tevî dibistaneke kurdî, çapxaneyeke kurdî jî, ku girêdayî komeleya kurd e, saz kirine.<sup>57</sup> Ji dibistana kurdî mebest "Kurd Meşrûtiyet Mektebi", ji komeleya kurd jî qesta wî "Kurd Neşr-i Ma'arif Cem'iyyeti [Komeleya Belavkirina Zanînê ya Kurdan-KNMC]" ye. Gelo ew çapxaneya ku Silopî behs dike dibe ku Met-be'e-i Amedî be? Çapbûna rêzîknameya KNMCê li vir vê îhtimalê xurt dike lê li jor jî me got li vê çapxaneyê tenê du weşanên bi kurdan re 'eleqedar hatine çapkirin, ew jî bi tirkî ne.

Li Qahîreyê Ferecullah Zekî el-Kurdî (1882-1940), bi navê "Met-be'etu Kurdistani'l-'İlmiyye" çapxaneyekê ava dike.<sup>58</sup> Di vê çapxaneyê de di navbera salên 1907-1912an de 116 kitêb çap bûne, lê yek ji wan jî ne bi kurdî ye.<sup>59</sup>

---

dirxanîler: Celadet Alî Bedirxan'ın Yazıları ve Kürtlere Dair Bazı Haberler", *Kürdoloji Akademik Çalışmalar Cilt 2*, weş. Yargı Yayınevi, İstanbul, 2016, r. 454-455.

56 Malmîsanîj, *Yüzyılımızın Başlarında Kürt Milliyetçiliği ve Dr. Abdullah Cevdet*, weş. Jîna Nû, Uppsala, 1986, r. 42; Malmîsanîj, *Türkiye ve Suriye'de Kürtçe Kitap Yayıncılığının Dünü ve Bugünü*, weş. Vate, İstanbul, 2006, r. 34.

57 Silopî, *Doza Kürdüstan*, r. 23.

58 Hassanpour, *Kürdistan'da Dil ve Milliyetçilik 1918-1985*, r. 277.

59 Sever Işık, "Mısırdaki İki Ünlü Naşir: Ferecullah Zeki el-Kürdi ve Muhiddin Sabri el-Kürdi", *Kürt Tarihi*, j.9 (Ekim-Kasım 2013), r. 54-55.

Di serdema Osmanî de çapxaneya ku herî zêde weşanên kurdî çap kirine “Necm-i Istiqbal Matbaasi” ye. Rohat Alakom îddia dike ku xwediyê vê çapxaneyê Hemzeyê Muksî bû.<sup>60</sup> Lê me daxwaznameya avakirina vê çapxaneyê di arşîva Osmanî de dît û li gorî vê avakarê wê Diyarbekirli Ehmed Hemdî ye.<sup>61</sup> Xuya ye ku Hemze ne xwediyê vê çapxaneyê ye, lê ji ber ku xwediyê wê Diyarbekrî ye û ihtimalek mezin ji kurd e, çî kitêb çî kovar gelek weşanên kurdî li vir çap bûne.

Di sala 1918an de Ekrem Cemîlpaşa li Diyarbekirê bi gotina wî “çapxaneyêke biçûk a nîpnû” dikire û li vir rojnameya *Gazîyê* çap dike.<sup>62</sup> Ev rojnameya kurdî çend hejmar hate weşandin, di vê çapxaneyê de ji bilî wê tiştekî din bi kurdî çap bû an na, em nizanin; îro tu berhemeke şênber jê nemaye û wê bandorek jî li ser weşangeriya kurdî nekiriye.

Ji bilî van li gorî çend belgeyên ji arşîva Osmanî kesekî bi navê Kurdîzade Xurşîd Efendî, ku ji xelkê Helebê ye, ji bo ku li Helebê<sup>63</sup>; yekî bi navê Mehmed Macid Kurdî ji bo li Mekkeyê bi navê “Teraqqî”<sup>64</sup> çapxaneyekê vekin destûrê dixwazin. Lê bi qasî ku em dizanin ji van çapxaneyan tu weşaneke kurdî derneketiye.

Xuya ye di dewra Osmaniyan de çapxaneyên ku xwediyê wan kurd in hene lê yeke ku navê “çapxaneya kurdî” heq dike heye an na, ev mijara nîqaşê ye. Di vir de çapxaneya Ekrem Cemîlpaşa

60 Rohat Alakom, *Eski İstanbul Kürtleri*, , ç.2, weş. Avesta, İstanbul, 2012, r. 141.

61 BOA. DH. MKT. 2735-66, dîrok: 18/M /1327 (H), 10.02.1909 (M).

62 Ekrem Cemil Paşa, *Muhtasar Hayatım*, weş. Beybun, Ankara, 1992, r. 31; Malmîsanîj&Mahmûd Lewendî, *Li Kurdistanê Bakur û li Tirkîyê Rojnamergeriya Kurdî (1908-1992)*, weş. Özge, Ankara, 1992, r. 288.

63 BOA. MF.MKT. 73/22, Dîrok: 29/L /1291 (H), 09.12.1874 (M); BOA. MF.MKT. 122/26, Dîrok: 17/S /1292 (H), 20.03.1875 (M). Di belgeya duyem de navê xwediyê daxwaznameyê Hacı Xurşîd Efendî derbas dibe. Balkêş e, li Elezîzê çapxaneyêke bi navê el-Hac Xurşîd Efendî heye û *Qewaidî Lîsanî Kurdî* ya Omer ‘Ewnî Efendî li wir çap bûye. Di navbera herdu Xurşîd Efendiyan de têkiliyek heye, nîne; me di vî warî de agahiyek bi dest nexist.

64 BOA. DH.MKT. 2735/70, Dîrok: 18/M /1327 (H), 10.02.1909 (M).

ya li Diyarbekirê û ya Huseyn Huznî Mukriyanî ya li Helebê têne bîra mirov lê ji herduyan jî berhemeke şênber xuya nake. Ji ber vê Amir Hassanpour, “Çapxaneya Dewletê” ku di sala 1920î de li Silêmaniyê, bi destê mandateriya îngilîzan hatiye avakirin çapxaneya pêşîn a kurdî dihesibîne.<sup>65</sup> Dîsa jî hewce ye mirov çapxaneya Ictihadê ya Ebdullah Cevdet paşguh nekê, herçiqas rengê osmanîtiyê pê re zêdetir jî be xwediyê wê kurd e çend weşanên kurdî lê çap bûne.

Di her hal û karî de çapxane, ji bo modernîzma kurdî bû hêmaneke girîng; bi çapxaneyê derfetên belavbûn û standartbûna kurdî zêde bû. Klasîkên edebiyata kurdî ku heta wê demê bi destxetan dihatine zêdekirin û di nav derdoreke teng de dihatine zanîn, wekî kitêb çap bûn û gihane ber destê girseyên mezintir. Bi rêya kovar û rojnameyan pexşana kurdî pêş ket, cureyên nû li edebiyata kurdî zêde bûn; edebiyata kurdî ya nûjen hem zîl da hem jî belav bû.

### 1.5. Kurd û Kitêb: Kurtedîroka Kurdiya Nivîskî

Lêkolîner, seyyah, mîsyoner, leşker an jî sîxur, piraniya biyanîyên ku bi kurdan re têkilî danîne teqez dîkin ku kurd, xwedî çandê dewlemend a gelêrî ne. Bo nimûne, Xaçatûr Abovyanê ermenî (m. 1848), ku qederekê di nav êlên kurdan de maye, behsa dewlemendiya folklorê kurdî dike û çend stranên wan derbasî nivîsê dike.<sup>66</sup> Lê gava em têne mijara çanda nivîskî rewş diguhere. Bi taybetî derbareyê kurdiya nivîskî ya berî îslamê de em pir hindik tiştan dizanin. Agahiyên di destê me de, ji berhemên nivîskî zêdetir, riwayetên derbareyê hebûna wan de ne û ya rastî ev agahî jî nakokî ne.

Nazim Hacı, behsa alfabeya mixî dike ku kurdan ev alfabe bi kar anîye û berhemên kurdan ên herî kevin ên bi vê alfabeyê îro di Muzeya Londrayê de ne. Di hejmara 53. a kovara *Sewtu'r-Rafideyn*

---

65 Amir Hassanpour, “Kürt medya kültürünün yaratılması”, dnd. *Kürt Kimliği ve Kültürü*, ed. P. Kreyenbroek-C. Allison, wer. Ü. Aydoğmuş, weş. Avesta, İstanbul, 2003, r. 85-86.

66 Bnr. Wezîrê Eşo, “Dost û xêrxezê cim’eta Kurda yî mezin”, *Çira*, j.10 (Havîn 1997), r. 11-26; “Dost û xêrxezê cim’eta Kurda yî mezin-II”, *Çira*, j.11 (Payîz 1997), r. 3-15.

de derbareyê tabletên bi alfabeya mixî de gotareke berfireh hatiye nivîsîn.<sup>67</sup>

Kadri Yıldırım ji *Zuhûru'l-Kurd fi't-Tarîx* a Cemal Reşîd Ehmed neql dike ku kurdan beriya mîladê di sedsala 4an de dev ji alfabeya mixî berdan û dest bi alfabeya aramî û yûnanî kirin. Yek ji berhemên nivîs-kî yên kurdiya herî kevin ku bi van alfabeyan hatiye nivîsîn *Kitabeyên Hewramî* ne. Ev, sê tabletên cuda ne, du heb jê bi alfabeya yûnanî yek jî bi alfabeya aramî ye. Tableta bi alfabeya aramî ku behsa firotina tirihi û şerabê dike ji sala yazdehan a beriya mîladê maye.<sup>68</sup>

Îbnî Wehşîyye, di kitêba xwe ya bi navê *Şewqu'l-Musteham fî Me'rifeti Rumûzi'l-Eqlam* (H. 241/M. 856) de behsa alfabeyeke kevin a qralên kurdan û sih kitêbên bi vê alfabeyê hatine nivîsîn dike. Li gorî vê, kurdên “Bînû Şad” û “Masî Sûratî” hemû berhemên xwe yên hunerî û “ilmî bi vê alfabeyê dinivîsîn. Herf û îşaretên vê alfabeyê hem kevin hem jî balkêş in, ew di tu alfabeyên din de cih nagirin. Îbnî Wehşîyye li Bexdadê li goristana xirîstiyanan sih kitêbên ku bi vê alfabeyê hatine nivîsîn dîtine, ji van du hebên bi kurdî ligel wî ne û wî ev herdu kitêb wergerandine ‘erebî jî. Îbnî Wehşîyye piştî van agahiyan şiklên vê alfabeyê jî di berhema xwe de nîşan dide.<sup>69</sup>

Ev alfabeya ku Îbnî Wehşîyye nîşan dide ji 37 herfan pêk tê. Wî di binê sih herfî de hemberiya wan a di alfabeya ‘erebî de nîşan daye lê heft jê vala hiştine. Îbnî Wehşîyye dibêje ku di tu ziman û alfabeyan de hemberiya van herfan nedîtiye, ji ber ku ev alfabe ji herfên ‘ecêb û ji şiklên xerîb pêk tê. Îbnî Wehşîyye, alfabeya Bînu Şad û Masî Sûratî wekî alfabeya qralên kurdan bi nav dike.<sup>70</sup>

Bletch Chirguh, îddia dike ku beriya îslamê qebûl bikin alfabe-yeke kurdan a netewî hebû. Ev herf gelekî dişibîyan herfên kevin ên

---

67 vgz. Kadri Yıldırım, “Kürtlerin İslam Öncesi Alfabe Serüveni”, *Kürt Tarihi Dergisi*, j.5 (Şubat-Mart 2013), r. 26.

68 vgz. Yıldırım, “Kürtlerin İslam Öncesi Alfabe Serüveni”, r. 26.

69 Yıldırım, “Kürtlerin İslam Öncesi Alfabe Serüveni”, r. 26-28.

70 Muhammed Ronî El-Meranî, “Bilinen En Eski Kürt Alfabeti”, *Kürt Tarihi*, j.5 (Şubat-Mart 2013), r. 17-18. Li gorî Kadri Yıldırım jî, Bînû Şad û Masî Sûratî du eşîrên kurdan ên hikimdar in. Bnr. Yıldırım, “Kürtlerin İslam Öncesi Alfabe Serüveni”, r. 27-28.

ermenî û asûriyan û ji çepê ber bi rastê ve dihatine nivîsandin. Piştî ku dînê îslamê qebûl kirin, kurdan dev ji alfabeya xwe berdan û hemû kitêbên xwe şewitandin.<sup>71</sup> Li gorî Ekrem Cemîlpaşa jî kurdan çar hezar sal berî mîladê bi tîpên mixî dinivîsandin, berî mîladê bi hezar salî merivekî bi navê “Misîsûrat” tîpên din çêkirin û heta dewra îslamê, kurdan ev alfabeyê emilandin. Piştî îslambûnê kurdan dev ji tîpên kevnare berdan û derbasî herfên ‘erebî bûn.<sup>72</sup> Xuya ye ji “Misîsûrat” mebesta Ekrem Cemîlpaşa alfabeya Masî Sûratî ye ku Îbnî Wehşîyye behs dikir.

Me di serî de got derbareyê kurdiya berî îslamê de agahiyên heyî hem kêr in hem jî bi problem in. Di demên dawî de Ergin Opengin li ser van agahiyên ku di gelek berheman de têne dubarekirin û li jor me jî beşek ji wan veguhastin nivîseke rexneyî nivîsand û piraniya van îddiayan red kir. Li gorî wî tu nivîskên (kitabe) kurdî yên beriya îslamê nînin: Pirtûka pîroz *Avesta* ne bi kurdî ye, ji sê *Kitabeyên Hewramî* du heb bi yûnanî yek jî bi zimanê partî ye. Metnê helbesta “Boraboz” û ew metnê ku ji devê rahibê zerduştî hatiye nivîsîn metnên sexte/çêkirî ne û bingeheke wan nîne. Ji bo alfabeya mixî ku dibêjin Medan bi kar aniye jî delîlek nîne çimkî ji Medan tu nivîsk nemane.<sup>73</sup>

Li gorî Opengin, ji bo kurdiya nivîskî metnê herî kevin a li ber dest di sedsala 15an de duayeke xirîstîyaniyê ye. Ev dua bi tîpên ermenî ye û di nava destxetêke mezin de ye. Li gorî Prof. Akaki Shanidze, ku cara ewil li ser vî metnê lêkolîn kiriye, nusxe di navbera salên 1430 û 1446an de ji nusxeyeke kevintir hatiye zêdekirin.

71 Bletch Chirguh, *Kürt Sorunu Kökeni ve Nedenleri*, weş. Avesta, İstanbul, 2009, r. 23.

72 Ekrem Cemîl Paşa, *Dîroka Kurdistan Bi Kurtebirî*, Enstituya Kurdî ya Brukselê, Bruxelles, 1995, r. 19.

73 Ergin Opengin, “Tevatür ve Temellük Kısacasında Kürt Kültür Tarihçiliği”, *Kürt Tarihi*, j.11 (Şubat-Mart 2014), r. 18-27. Opengin, ev rayên xwe yên li ser dîroka zimanê kurdî di weşaneke navnetewî de berfirehtir rave kiriye, bnr. “The History of Kurdish and the Development of Literary Kurmanji” dnd. Bozarslan H, Gunes C, Yadirgi V, eds. *The Cambridge History of the Kurds*. Cambridge University Press, 2021, r. 603-632.

Di nusxeyê de heman dua bi heft zimanan hatiye nivîsîn. Yek ji wan zimanan jî kurdî ye: “pâkiž xudê, pâkiž zahm, pâkiž vēmarg, kōy hâtî xāçê îz kir ma, rahmatê ma.”<sup>74</sup>

Di vê destxetê de tişteki balkêş jî ev e, li ser metnê duaya bi kurdî “medî” dinivîse, yanî zimanê duayê wekî “zimanê Medan” tê nîşandan. Li gorî Prof. Akaki Shanidze jî, li gorî David Neil Mackenzie jî ev teksteke bi kurdî ye. Jixwe her kesê ku bi kurdî-kurmancî dizane bi rehetî dikare bigihe vê encamê. Naxwe çima li serê “medî” dinivîse? Li gorî Asatrian, ev ‘adeteke kevn e û kevneşopîyeke ku dîrokzan gelên heyî/mewcûd bi yên qedîm/antîk re hevyeke dikin. Dîrokzanên ermenî yên serdema navîn jî ev ‘adet meşandine û kurd wekî Med, kurdî jî wekî zimanê Medan wesifandine, bi îngilîzî “qualifying the Kurds as Medians”. Dîrokzan û rewşenbîrên kurdan ên modern jî, wekî Tofîq Wehbî, Îsmet Şerîf Wanlî ev îddia domandine û gelê kurd wekî neviyê Medan penase kirine ku ev vegotin (discourse) di nasnameya netewî ya kurdan de bûye hêmaneke girîng.<sup>75</sup>

Derbareyê kurdiya nivîskî de çavkaniyeke kevin û balkêş *Seyahetnameya* Ewliya Çelebî ye. Ewliya Çelebî, di sala 1655-1656an de li warên kurdan geriyaye, derbareyê bajar, navçe, gund, ‘eşîr û mîrek-tiyên kurdan de û herî girîng jî derheqê kurdî de gelek agahî dane. Wî mîrê Bedlîsê ‘Ebdal Xan ji nêz ve nas kiriye, têkçûyîna wî ya li hemberî paşayê Osmanî û desteserkirina kitêbxaneya wî ya dewlemend bi çavê xwe dîtiye. Balkêş e, li gorî Çelebî di kitêbxaneya ‘Ebdal Xan de ji bilî hezaran destxetên hêja kitêbên çapkirî jî hebûn. Naxwe em dikarin bibêjin ku kitêbên çapkirî hê wî çaxî (1655) di kitêbxaneyên taybet ên mîr û begên kurd de peyde dibûn.<sup>76</sup>

Ewliya Çelebî, di *Seyahetnameya* xwe de ferhengokeke kurdî amade kiriye, bi zimanê kurdî ji Cizîrê straneke gelêrî û ji Amêdiyê

---

74 David Neil Mackenzie, “The Language of the Medians”, *BSOAS*, 22/2 (1959), r. 355; Öpengin, hg., r. 27. Dua, bi alfabeya kurdî ya îro wiha ye: “pakij xudê, pakij zehm, pakij vêmerg, koy hatî xaçê ij kir me, rehmê me” bnr. Öpengin, hg., r. 28.

75 Garnik Asatrian, “Prolegomena to the Study of the Kurds”, *Iran and the Caucasus*, 13 (2009), r. 21-22.

76 Hassanpour, “Kürt medya kültürünün yaratılması”, r. 84-85.

jî xezeleke pir orîjînal veguhastiye.<sup>77</sup> Ev hemû nîşan didin ku *Seyahetnameya* Ewliya Çelebî, ji bo dîrok, ziman û edebiyata kurdî çavkaniyeke resen û girîng e<sup>78</sup> loma ew hê di sala 1979an de li kurdiya soranî tê wergerandin.<sup>79</sup> Bo nimûne, Ewliya Çelebî peydebûna zimanê kurdî bi tofana Nûh Nebî û kurê wî Melîk Kurdîm ve girê dide.<sup>80</sup> Dîsa ew dibêje ku Yûnus Pêxember çaxê li Mûsilê bû bi ummeta xwe re bi kurdî diaxivî, xelkê Akreyê jî ji çaxê Yûnus Pêxember ve îman kirine û bi kurdî diaxivin.<sup>81</sup>

Dîroka kitêbên kurdî yên piştî îslamê wekî kevneşopî xwe di-sipêrê destxetan. Çaxên ku teknîka çapê qet nebû yan pir kêmbû, kitêb bi destê mustensîx/nivîsendeyan dihat kopîkirin. Di afirandina kurdiya nivîskî de medreseyên kurdan jî çavkaniyên sereke bûn. Medrese, herwiha navendên zêdekirina destxetên kurdî û afirandina edebiyata kurdî ya klasîk bûn.<sup>82</sup> Bo nimûne, yek ji destxetên kevintir ên *Nûbar/Nûbihara Biçûkan* a Ehmedê Xanî, di sala H. 1121/M. 1709an de li Xîzanê, li Medreseya Dawudiyê ji bo seydayekî kurd hatiye îstînsaxkirin/kopîkirin. Orîjînala vê destxetê îro bi qoda/classmarka “Ms. or. oct. 1200” li “Staatsbibliothek zu Berlin”ê ye û ew hatiye dijîtalkirin jî.<sup>83</sup> Şerefhanê Bedlîsî, di sala 1597an de di *Şerefnameyê* de, behsa vê Medreseya Dawudiyê dike ku avakarê

77 Ji bo lêkolîneke berfireh li ser *Seyahetnameyê* û ferhengok û agahiyên Ewliya Çelebî bnr. Martin van Bruinessen, “Onyedinci Yüzyılda Kürtler ve Dilleri: Kürt Lehçeleri Üzerine Evliya Çelebi’nin Notları”, *Studia Kurdica*, No:1-3 (Nisan 1985), r. 13-37; M. Z. Karak, “Şopên Ziman û Edebiyata Kurdî di “Seyahatname”ya Ewliya Çelebî de”, *Kurdiname*, j.11 (2024), r. 96-117.

78 Mesut Arslan, “Ulemeden Münnevver Osmanlı Müelliflerinin Yerel Dille-re Bakışı (Kürtçe Örneği)”, *Mukaddime*, 15(2), r. 256-259.

79 Rohat, *Kürdolojî Bilimi’nin 200 Yıllık Geçmişi (1787-1987)*, weş. Komkar, Köln, 1987, r. 197-198..

80 Evliya Çelebi, *Evliyâ Çelebi Seyahatnâmesi IV. Kitap*, amd. S. A. Kahraman-Y. Dağlı), İstanbul, YKY, 2001, 45-46, 56.

81 Evliya Çelebi, hb., r. 307, 316.

82 Mesut Arslan, “Destpêkek ji bo Edebiyata Kurdî ya Klasîk”, dnd. *Rêbera Hînkirina Kurdî*, weş. PHZH, Zürich, 2023, r. 176-177.

83 Ji bo dijîtala vê destxetê bnr. [https://digital.staatsbibliothek-berlin.de/werkansicht/?PPN=PPN781372445&PHYSID=PHYS\\_0005](https://digital.staatsbibliothek-berlin.de/werkansicht/?PPN=PPN781372445&PHYSID=PHYS_0005), 11.03.2025.

wê mîrê kurd Emîr Dawudê kurê Emîr Melek “39 salan bêasteng û bêgirê bi awakî serbixwe li Xîzanê hukumdartî kir.”<sup>84</sup>

Di serî de Stembol, Diyarbekir, St. Petersburg û Berlin di kitêbxaneyên tarîxî yê bajarên qedîm de destxetên kurdî pir in. Wekî mînak, di encama lêkolînên xwe yê di Kitêbxaneyaya Suleymaniye û Millet de, ku li Stembolê du kitêbxaneyên dîrokî ne, rastî nêzî bîst destxetên kurdî hatim. Di nav van de, *Dîwana Melayê Cizîrî*, *Nûbihara Biçûkan* a Ehmedê Xanî, *Mewlûda Melayê Bateyî*, *Yûsif û Zuleyxaya Selîm Silêman*, *Nehcu’l-Enama Mele Xelîlê Sêrtî*, *‘Eqîda Kurmançî* ya Mela Nesreddînê Zoqeydî, *Dîwana Nalî* û hê gelek berhemên din ên girîng hebûn. Herçendî ev herdu kitêbxane ji lêkolîneran re vekirîbin jî, ev nayê wateya lêkolîneke bêastengî. Berî her tiştî di katalogên van kitêbxaneyan de gelek şaşî hene. Gelek destxetên kurdî weke ‘erebî, farsî an jî tirkî hatine qeydkirin. Bo nimûne, li Kitêbxaneyaya Milletê destxetêke pir spehî ya *Nûbihara Biçûkan*, di katalogê de wekî ferhengeke ‘erebî-hindî hatibû nîşandayîn. Dîsa li Kitêbxaneyaya Suleymaniyeyê jî *El-Kufr û we’l-Kebaîra Şêx Fethullahê Werqanîsî* û *Nehcu’l-Enama Mele Xelîlê Sêrtî* wekî ‘erebî, nusxeyeke din a *Nehcu’l-Enamê* jî wekî tirkî hatibû qeydkirin.<sup>85</sup>

Destxetên kurdî li gelek deverên dinyayê belav bûne. Bo nimûne, em baş dizanin ku gava Aleksandre Jaba (m. 1894) wekî konsolosê Rûsyayê tê Erziromê, Mele Mehmûdê Bazîdî nas dike û bi saya wî gelek destxetên kurdî bi dest dixê û wan dişîne St. Petersburgê. Ev destxet paşê dibin mijara gelek xebatan. Wek mînak, Margarita Borisowna Rudenko, ji bilî ku kataloga destxetên kurdî yê li vir amade bike (Moskova, 1931), *Mem û Zîn* (Moskova, 1962), *Leyla û Mecnûn* (Moskova, 1965) û *Yûsif û Zelîxa* (Moskova, 1986) jî amade dike û diweşîne.<sup>86</sup> Di sedsala 19 û 20an de li Rûsyayê bi

84 Şerefxanê Bedlîsî, *Şerefname*, wer. Z. Avcı, weş. Azad, Mersin, 2014, r. 258.

85 Piştî hişyariyên me, piraniya van şaşîyan hatin sererastkirin. Li gorî Saziya Destxetan a Tirkî di pirtûkxaneyên girêdayî wê de 55 heb destxetên kurdî hene. Lê piştî ku katalog hatine sererastkirin pêkan e ku ev hejmar zêdetir bibe. Bnr. <https://portal.yek.gov.tr/works/search>, 12.01.2025.

86 Mehmet Malmisanlı, “Osmanlı Döneminde Yazılan Kürtçe Eserler Üzerine II”, *Tarih ve Toplum*, j.55 (Temmuz 1988), r. 63.

bandora koleksiyona Jaba ekoleke kurdolojiyê ava dibe.<sup>87</sup> Kataloga destxetên kurdî yên di koleksiyona Jaba de vê dawiyê ji nû ve hate amadekirin. Li gorî vê di vê koleksiyonê de 69 berhem hene ku piranî kurdî ne.<sup>88</sup>

Kemal Fuad, li ser destxetên kurdî yên li Almaniyayê xebitiye û kitêbeke bi navê *Kurdische Handschriften* [Destxetên Kurdî]<sup>89</sup> amade kiriye. Di vê xebata Kemal Fuad de 92 heb defterên destxet ên bi kurdî hatine lêkolînkirin. Ev destxet ji aliyê rojhilatnasên wekî Oskar Mann, Albert von Le Coq, Eduard Sachau ve August Petermann ve hatine berhev kirin û di nav wan de bi kurmancî, soranî û goranî gelek berhemên hêja hene. Bo nimûne, yekane nusxeya *Dîwana Weda'î* û nusxeyeke tekûz a *Perîşannameya Mela Perîşanê Dînewerî* (m. 1420-21) li “Staatsbibliothek zu Berlin”ê ye û Kemal Fuad danasîna wan kiriye.<sup>90</sup>

Celîlê Celîl jî di warê destxetên kurdî de xebitiye, bi navê *Keşkûla Kurmancî* berhevokê amade kiriye. Di vê berhevokê de ji 38 helbestvanan 65 helbest hene.<sup>91</sup> Celîlê Celîl, mesnewiya *Seyfulmulûk* a Siyahpoş jî weşandiye.<sup>92</sup>

Kitêba tibê ya Melayê Erwasî, ku ji sedsala 18an kitêbeke bijîşkiya gelêrî ye û nimûneyeke girîng a pexşana kurdî ye, vê dawiyê bi tîpên latînî hate weşandin.<sup>93</sup>

---

87 Ji bo ekola rojhilatnasiyê ya rûsî û geşbûna kurdolojiyê bnr. M. Leezenberg, “Soviet Kurdology and Kurdish Orientalism” dnd. *The Heritage of Soviet Oriental Studies*, weş. Routledge, London, 2011, r. 86-102.

88 Mustafa Öztürk, *Koleksiyona Aleksandre Jaba ya Destnivîsên Kurdî (Vekolîn û Saloxdan)*, weş. Lîs, Diyarbakir, 2018.

89 Kamal Fuad, *Kurdische Handschriften*, Steiner Franz, Wiesbaden, 1970, 158 r.

90 Kamal Fuad, hb., r. 1-2, 14-15.

91 Celîlê Celîl, *Keşkûla Kurmancî*, Çapker: Komala lêkolînê û alîkariya ziman, çand û diroka kurdî, Wien, 2004, 312 r.

92 Siyahpûş, *Seyfulmuluk*, Çapker: Înstîtûta kurdzanîyê, Wien, 2000, 323 r.

93 *Ji Sedsala 18. Pirtûkeke Kurdî ya Bijîşkiya Gelêrî Tiba Melayê Erwasî*, amd. K. Yıldırım, weş. Enstîtuya Zimanên Zindî ya Zanîngeha Artuklu ya Mêrdînê, Stenbol, 2013, 67+67 r.

Ev destxet hemû nîşanî me didin ku ne tenê folklorê kurdan, herwiha edebiyata kurdan a nivîskî jî têra xwe qedîm, dewlemend û rengîn e. Kurd, di herka dîrokê de di xeleka folklorê de asê nemane; derbasî jiyana bajarî bûne, mîrektyên wan hebûn, li bajarên xwe xwedî desthilat bûn. *Şerefname*, dîroka wan mîrektyên kurdan e.<sup>94</sup> Bi vê ve girêdayî zimanê kurdî, bi hemû lehçeyên xwe (lorî, goranî, kurmançî, soranî û kirmanckî) edebiyateke nivîskî afirandiye ango hemû lehçeyên kurdî ji edebiyata devkî derbasî çanda nivîskî bûne. Ji Baba Tahîrê ‘Uryan (m. 1055) heta Seîdê Cizîrî (Şêxê Meczûb, m. 1915) berhemên edebiyata kurdî ya klasîk; dîwan, mesnewî, mewlûd û ‘eqîdenameyên kurdî hemû delîlên vê rastiyê ne.<sup>95</sup>

Edebiyata kurdî ya klasîk herwiha perwerdeya kurdî ye. Di wan medreseyên ku ji aliyê mîrên kurdan ve hatine avakirin, wekî Medreseya Sor a Cizîrê, *Nûbar* û ‘*Eqîdeya Îmanê* ya Ehmedê Xanî, *Tesrîfa* ‘Eliyê Teremaxî, *Terkîb* û *Zurûfa* Mela Yûnisê Helqetînî, *Mewlûda* Melayê Bateyî, *Nehculenama* Mela Xelîlê Sêrtî wekî pirtûka dersê dihate xwendin û jiberkirin.<sup>96</sup> Feqe, mela û seydayên kurd, bi taybetî “dîwanxwan”ên dengxweş ji bo zewqa edebî *Dîwana* Melayê Cizîrî ji ber dikirin û bi meqam dixwendin; ev kevneşopiyek bû.<sup>97</sup> Wekî ku Marûf Xeznedar jî piştrast dike, di serdema îslamî de serkeftina herî mezin a kurdî ew bû ku wê karîbû bikeve medrese û hicrikên mizgeftan û di nav zimanên giregir ên wekî ‘erebî, farsî û tirkî de ji xwe re cihekî çêbike; bi vî rengî jî xwendin û nivîsandina kurdî bibe kevneşopiyek.<sup>98</sup>

94 Bnr. Şerefxanê Bedlîsî, *Şerefname*, wer. Z. Avci, weş. Azad, Mersin, 2014.

95 Arslan, “Destpêkek ji bo Edebiyata Kurdî ya Klasîk”, r. 176-177.

96 Arslan, hg., r. 177. Ji bo lişteyê berfireh a “Pirtûkên Xwendinê” di medreseyên kurdan de bnr. Zeynelabidîn Zinar, *Xwendina Medresê*, weş. Pencînar, Stockholm, 1993, r. 63-100.

97 Serdar Şengül, “Melayê Cizîrî ve Diwan Okuma Geleneği”, *Folklor/Edebiyat*, j.86 (2016), r. 194-195.

98 Marûf Xeznedar, *Dîroka Edebîyata Kurdî*, c. I, wer. Z. Avci, Stenbol, weş. Nûbihar, 2024, r. 58-60.

Kevneşopiya destxetên kurdî, di serdema modern de jî dewam dike. Zeynelabidînê Amidî (m. 2020), yek ji nûnerên dawî yê vê tradîsyonê bû. Wî gelek berhemên edebiyata kurdî ya klasîk îstînsax (kopî/zêde) kirine û ew jî windabûnê xilas kirine. Herwiha ew bi xwe jî xwedî dîwaneke klasîk û gelek berhemên din bû.<sup>99</sup> Jixwe yek ji taybetiyên edebiyata kurdî ya klasîk ev e ku ew, di serdema modern de jî betal nebûye, nemiriye; ew heta îro jî di nav şert û mercên xwe de berhem dide. Rewşenbîrên kurdan jî, wekî Xelîl Xeyalî<sup>100</sup>, di pêvajoya modernîzmê de ev edebiyat red nekirine; berovajî ew li edebiyata xwe ya qedîm xwedî derketine û wan xwestiye nasname-ya kurdî ya nûjen li ser wê qedîmiyê ava bikin.<sup>101</sup>

Dîroka kitêbên kurdî yê çapkirî digihe sedsala 18an û ya ewil *Grammatica E Vocabolario Della Lingua Kurda* (Gramer û Ferhenga Zimanê Kurdî) ye ku Maurizio Garzoni (m. 1804) amade kiriye û ew di sala 1787an de li Romayê çap bûye. Garzoni jî ber vê xebata xwe bi navê “Bavê Kurdolojiyê” tê naskirin.<sup>102</sup>

Garzonî, mîsyonerekî katolîk e. Ew di ‘emrekî ciwan de tê nav kurdan, li Mûsil û Amêdiyê dijî û li wan deran hînî kurdî dibe. Ew jî bo mîsyonerên piştî xwe vê gramer û ferhenga kurdî amade dike. Xebata wî jî 288 rûpelan pêk tê, 68 rûpelên wê li ser gramera kurdî, 220 rûpel jî ferhenga îtalî-kurdî ye. Beşa ferhengê, kêr zêde 4.600 peyvî dihewîne.<sup>103</sup>

Di dawîya vê xebata Garzonî de, wergera kurdî ya du duayên girîng ên xirîstiyaniyê cih digirin: Duaya “Orizione Domenicale” bi

99 Ji bo listeya berhemên Zeynelabidînê Amidî û wan berhemên ku wî îstînsax kirine bnr. Mehmet Nezir Esin, “Molla Zeynelabidin Çiçek (Âmidî) ve İlmî Kişiliği”, *Dicle Üniversitesi İlahiyat Fakültesi Dergisi*, 21/1 (2019), r. 52-58, 58-61.

2019: 58-61).

100 Bo nimûne, li nivîsa “Bextreşî û Mehrûmiya Kurdan” a Xelîl Xeyalî binêrin: *Di Sedsaliya Wê de Rojî Kurd 1913*, amd. Koma Xebatên Kurdolojiyê, r. 195.

101 Arslan, “Destpêkek ji bo Edebiyata Kurdî ya Klasîk”, r. 177.

102 Rohat, *Kürdolojî Bilimi’nin 200 Yıllık Geçmişi (1787-1987)*, r. 29.

103 Rohat, hb., r. 29-30.

îngilîzî “Lord’s Prayer” angî “Duaya Rebb” û duaya “Salutazione Angelica” angî “Silavên Ferîşteyan”<sup>104</sup> Ew herdu jî ji bo dîroka wergera kurdî nimûneyên kevn û girîng in.

Sedsala 19 û 20an ku serdema kolonyalîzmê ye, herwiha ew serdema oryantalîst û mîsyoneran e jî. Çimkî ji bo kolonîzekirina warekî pêşî “enformasyon” diviya, zanîna wê derê, naskirina wan kesan hewce dikir. Loma piştî Garzonî, ji gelek netewan mîsyoner, seyyah, leşker û lêkolîner li ser ziman, edebiyat, çand, dîrok û rewşa siyasî ya kurdan xebat dikin.<sup>105</sup> Lê ew etîketa folklor, koçerî û nezaniyê tu wextî ser kurdan ranebû. Di serdema klasîk de Ehmedê Xanî bi şahesera xwe *Mem û Zînê* bersiv dida wan xelkên ku digotin “Kurd bêmarîfet in, bêesl û binyad in”. Li gorî Xanî, kurd mêr, camêr û xwedî potansiyeleke mezin in; ew ne cihêl in lê “yetîm û bê-mecal in” loma di vî halê xirab de ne. Eger xudanekî kurdan hebûya Xanî wê bikariya alaya helbesta kurdî bilind bike lê ew çî bike ku “bazar kesad e” angî kurdî qîymet nake.<sup>106</sup>

Ehmedê Xanî, ji bilî kurdî zimanê ‘erebî, farsî û tirkî jî dizanî. Hetta wî bi van çar zimanan helbesteke mulemma jî nivîsiye:

Fate ‘umrî fî hewake ya hebîbî kulle hal (e)  
Ah û nalem hemdemem şod der firaqet mah û sal (f)  
Ger benim kanım dilersen çoktan olmuşdur helal (t)  
Dîn û ebter bûm ji ‘îşqê min nema ‘eql û kemal<sup>107</sup> (k)

Ehmedê Xanî helbestvanekî wisa bû ku dikarî bi çar zimanan

---

104 Maurizio Garzoni, *Grammatica E Vocabolario Della Lingua Kurda*, Roma, 1787, r. 283-284. Ji van wergera kurdî ya “Orizzone Domenicele” li bajarê Qudsê li ser dîwarê Dêra Pater Noster neqîşandiye û îro jî disekine. Herwiha ji bo kurdedîroka wergerê bi zimanê kurdî bnr. Ayhan Yıldız, “Tevgera Wergera Kurmancî li Sûrî û Tirkîyeyê”, *Nûbihar Akademî*, j.13 (2020), r. 124-132.

105 Ji bo bîbliyografyayeke birfireh a van xebatan bnr. Rohat, *Kürdolojî Bili-mi’nin 200 Yıllık Geçmişi (1787-1987)*.

106 Ehmedê Xanî, *Mem û Zîn*, amd. K. Yıldırım, weş. Avesta, İstanbul, 2010, r. 157-158.

107 M. Zahir Ertekin-Ayhan Yıldız, *Govenda Zimanan Mulemma’*, weş. Lorya, Wan, 2022, r. 67.

helbest bibêje lê wî bi zanebûn kurdî hilbijartiye, hemû berhemên xwe bi kurdî nivîsîne. Loma em dikarin bibêjin ku kurdînivîsîna Ehmedê Xanî ne folklorîk e, ew ji bo serdema xwe tiştekî nedîtî dike û “kurdîtiya bîrewer” temsîl dike. Hetta Hemzeyê Muksî, di kovara *Jînê* de wî ji aliyê milletperweriyê ve dişibîne Firdewsiyê helbestvanê *Şahnameyê*.<sup>108</sup> Berî Hemzeyê Muksî, Alî Emîrî Efendiyê Diyarbekrî di sala H. 1296/M. 1879an de, di berhema xwe ya *Mir’atul-Fewaid* de bi kurdî behsa Melayê Cizîrî, Ehmedê Xanî û Melayê Bateyî dike. Ew behsa kurtejiyan û berhemên Xanî, navdarbûna wî ya li nav kurdan dike û dibêje ku tirba wî ziyaretgaha gel e.<sup>109</sup>

Şêx ‘Ebdurehmanê Aqtepî (m. 1910) jî ji bo ku xelk nebêjin “şa’irên kurdan nînîn” bi zimanê kurdî şahesera xwe *Rewdneîmê* dinivîse.<sup>110</sup> Birayê wî yê biçûk Şêx Mihemed Can (m. 1910) jî çîroka *Leyl û Mecnûnê* bi zimanê kurdî dinivîse û di destpêka wê de zimanê kurdî dişibîne xizîneyeke veşartî û înciyeke biha: “Elfazê di kurdî pur şêrîn in/Meqbûl in û wek durrê semîn in”.<sup>111</sup> Ji Ehmedê Xanî (m. 1707) heta Hilmiyê Siwêregî (m. 1950) helbestvanên kurdan hem bi vê sekna xwe hem jî bi kurdînivîsîna xwe xwestina hebûn, qedîmî û dewlemendiya edebiyata kurdî nîşanî “xelkê” bidin. Ango berhemên wan hem huner in hem jî bertekên xwe îsbatkirinê ne.

Di sedsala 19 û 20an de jî kurd ji van etîketan xilas nabin. Hetta ji ber pirsgirêkên kurd û ermenîyan, kurd û nestûriyan li Ewropayê îmajê kurdan xirabtir dibe. Bi taybetî ermenî di weşanên xwe de bi propagandaya li dijî kurdan vê îmajê xirab belav dikin. Rewşenbîrên kurdan ên wekî Xelîl Xeyalî jî bersiva îddiayên ermeniyên didin.<sup>112</sup>

108 M. Emîn Bozarslan, *Jîn Kovara Kurdî-Tirkî/Kürdçe-Türkçe Dergi 1918-1919*, c. IV, weş. Deng, Uppsala, 1987, r. 825.

109 Mesut Arslan, “Alî Emîrî’nin Mir’atü’l-Fevâ’id Adlı Eserinde Osmanlı Dönemi Kürt Şairleri”, *Dicle Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü Dergisi*, j.36 (2024), r. 211-222.

110 Şêx Evdîrehmanê Aqtepî, *Rewdneîm*, amd. Z. Zinar, Stockholm, 1991, r. 421-422.

111 Şêx Mihemed Can, *Leyl û Mecnûn*, amd. Z. Zinar, Stockholm, weş. Pencînar, 1991, r. 8-9.

112 Bnr. Beyiz Karabulut, “Hetawî Kurd’de Xelîl Xeyalî’dan Arşak Çoban-yan’a Cevaplar”, *Toplumsal Tarih*, j.297 (Eylul 2018), r. 60-67.

Ne tenê Xelîl Xeyalî, ji Hacî Qadirê Koyî heta Keyfî, Mîqdad M. Bedirxan, Kurdîzade Ehmed Ramîz, Mehmed Salih Bedirxan, Eb-durehîm Rehmî û Kurdiyê Bitlîsî xwendeyên kurdan di serdema modern de bi avakirina komeleyan, çapkirina pirtûk, kovar û rojnâmeyan xwestine îmajê kurdan rast bikin; hebûn û qedîmiya dîrok, ziman û edebiyata kurdî hem bi kurdan bidin fêmkirin hem jî nîşanî xelkê bidin. Lê ji serdema klasîk heta îro bi giştî rewşenbîrên tirkên ji ziman û edebiyata kurdî bê xeber in.<sup>113</sup> Di sala 1919an de anekdota Mehmed Mîhrî ya di kovara *Jînê* de jî vê nîşanî me dide: Mehmed Mîhrî, bi kurtî dibêje “min niyêt kir jiyannameya helbestvanên kurdan amade bikim û nimûneyên berhemên wan çap bikim. Gava min ev ji derdora xwe re, kesên zana û xwende yên Osmanî re got, ew şaş bûn. Wan got “ma edebiyata kurdî heye? Ma bi zimanê kurdî edebiyat dibe?” Li ser vê yekê Mehmed Mîhrî jî radibe çîrok, kilam û helbestên kurdî tercumeyî tirkî dike û di bin sernavê “Edebiyat-ı Kürdiyyeden Bazı Numûneler [Ji Edebiyata Kurdî Hin Mînak]” di kovara *Jînê* de diweşîne.<sup>114</sup>

Ev xebata me jî xîret dike ku bi delîl û belgeyan beşek ji dîroka kurdiya nivîskî ronî bike û li hemberî van etîketên sedansalan ên wekî folklor, koçerî û nezaniyê; kurd, kitêb, çapxaneyê derbixwe pêş. Çimkî ev folklorîzekirina kurdan, ev vegotina ku kurdan ji çanda nivîskî û bajarî bêpar nîşan dide ne masûmane ye. Di sala 1911an de Kurdîzade Ehmed Ramîz ev yek fêmkirîye û di “Reşbelek” a xwe de “qewmê ku ziman û edebiyatê wî tune be, ji heyata medeniyetê mehrûm e, ji mudafe‘a huqûqê xwe mehrûm e” gotiye.<sup>115</sup> Ev gotina Ehmed Ramîz rihê serdemê ye: Destpêka sedsala 20an, wextekî wisa nazik e ku împaratorî belav dibin û neqşeya cîhanê diguhere. Miletêkî bêxwendin, bêkitab, bêdîrok ango “primitive” di vê serdema nû de çawa dikare hebûna xwe nîşan bide û xwebûna xwe bixwaze? Loma Kurdîzade Ehmed Ramîz di sala 1906an de ji berîka xwe *Mewlûda* kurmançî ya Melayê Bateyî çap dike û di dawiyê wê

113 Arslan, “Ulemeden Münnevver Osmanlı Müelliflerinin Yerel Dillere Bakışı (Kürtçe Örneği)”, r. 253-254.

114 Bozarslan, *Jîn Kovara Kurdî-Tirkî 1918-1919*, c. I, r. 219-222.

115 “Reşbeleka Kurdîzade Ehmed Ramîzê Licîyî”, amd. M. Serfiraz-B. Hawar, r. 9.

de ji kurdan rica minnet dike ku jê re pirtûkan bişînin ew jî çap bike. Loma Xelîl Xeyalî bangî kurdan dike ku eserên bav û kalan li çapê bixin da ku ew bêne naskirin.<sup>116</sup> Loma Ebdullah Cevdet gazî ciwanan dike ku alfabeya xwe sererast bikin, rêjeya xwendinê di nav milletê xwe de bilind bikin, dîroka xwe binivîsin<sup>117</sup> çimkî li miqambilê wan li gundê ermeniyî “Shakespeare” tê xwendin.<sup>118</sup>

Ji bo dîroka kurdiya nivîskî û van etîket û ezberên li ser kurdan gotine me ya dawî ev e: Madem edebiyata kurdan a nivîskî nîne *Dîwana Melayê Cizîrî* kê nivîsî? *Mem û Zîna* Ehmedê Xanî, *Zembîlfiroşa* Feqiyê Teyran, *Nehculenama* Mela Xelîl, *Seyfulmulûka* Siyahpoş, *Dîwana Şêxê Meczûb...* Li kutubxaneyên Diyarbekrê, Stenbolê, Berlinê, St. Petersburgê, Londonê hezaran rûpel destxetên kurdî kê nivîsî? Eger kurd hemû koçer bin, di bin konan de bijîn, ewçax Medreseya Sor kê ava kir? Li Cizîrê Birca Belek, li Muksê Medreseya Mîr Hesenê Welî, li Finikê Medreseya Feqiyê Teyran, li Xîzanê Medreseya Dawudiyê, li Colemêrgê Medreseya Meydanê, li Amêdiyê Medreseya Qubbexan, li Bedlîsê Kulliyeya Şerefiyê, li Sineyê Mizgewtî Darulîhsan... Eger bajarê kurdan nebin, hikûmetê wan nebîn, ewçax ew mîrektiyên ku Şerefexanê Bedlîsî, di *Şerefnameyê* de behsa wan dikir kî bûn? Bedlîs, Heskîf, Cizîr, Hekkarî, Amêdiye, Erdelan... Çawa ku edebiyateke sedansalî ya kurdan a nivîskî heye, herwiha mîmarî û bajarvaniyeke wan jî heye; divê hebe ya na ev berhem, ev avahî çênedibûn. Çimkî berovajî xwezayîbûna folklorê, edebiyata nivîskî bi xwe malê bajêr û berhema bajarvaniyê ye. Ew wekî folklorê ji xwe re çênabe, şert û mercên wê hene.<sup>119</sup> Bi gotina Xelîl Xeyalî ma “zimanê temamê milletê ‘alem ji ezmanan hatiye, ya me bi tenê ji ‘erdê derketiye? (...) Hal ew e ku zimanê me ji giştî zimanê ‘alem çêtir e û bi rehetî tê nivîsandin û xwendin, edebiyata me heye feqet ji nezaniya me bêrewac maye.”<sup>120</sup>

116 *Di Sedsaliya Wê de Rojî Kurd 1913*, amd. Koma Xebatên Kurdolojiyê, r. 226.

117 *Di Sedsaliya Wê de Rojî Kurd 1913*, amd. Koma Xebatên Kurdolojiyê, r. 99-100.

118 *Di Sedsaliya Wê de Rojî Kurd 1913*, amd. Koma Xebatên Kurdolojiyê, r. 140.

119 Arslan, “Destpêkek ji bo Edebiyata Kurdî ya Klasîk”, r. 176-177.

120 M[odanî] X[elîl], “Derdê Kurdan”, *Hetawî Kurd*, j.2 (21 Têşrînisani 1329/4 Kanûn 1913), r. 26-27.



# BEŞA DUYEM

## KURD DI NAV DEWLETA OSMANÎ DE

Kurd û parçeyekî mezin ê warê wan ji Şerê Çaldiranê (1514) heta belavbûna Osmanî (1923) ji çar sed salî zêdetir di bin rêvebiriya Dewleta Osmanî de dimînin. Di çavkaniyên Osmanî de ev herêm zêdetir wekî “Kurdistan-i Osmanî” derbas dibe, ji bo ku ji qismê di bin rêvebiriya Îranê de ferq bibe.<sup>121</sup> Herçiqas di destpêkê de kurd li warê xwe xweser jî bin, bi demê re rewş diguhere. Bi taybetî di sedsala 19an de, Siltan Mehmûdê Duyem dermanê paşveçûna dewletê di tesfîyekirina derebegan/hêzên feodal ên herêmî û di xurtkirina pergala navendî ya dewletê de dibîne. Ji bo vê yekê, ji aliyekî ve artêşê dişîne seferê ji aliyê din ve jî reforman pêk tîne. Piştî wî di dema Siltan ‘Ebdulmecîd de jî ev hewldan berdewam dikan.<sup>122</sup>

Di sedsala 19an de pergala teba’e ya Osmanî diguhere. Dewleta Osmanî ji bo ku pêşiya serhildanên gelên nemusliman û mudaxelayên dewletên Ewropî bigire di warê mafên nemuslimanan de mecbûr dimîne ku hin gavan bavêje. Di sala 1839an de Fermana Tenzîmatê, di sala 1856an de Fermana Islahatê tê qebûlkin. Di sala 1876an de rejîma Dewleta Osmanî diguhere, Meşrûtiyeta Yekem tê îlankirin, li gel îradeya padîşah meclîseke ku endamên wê bi rayên gel tên hîlbijartin vedibe û cara ewil Qanûn-i Esasî [Makezagon] tê

---

121 Ji bo nimûneyên vê bikaranînê bnr. *Osmanlı Kürdistanı/Kurdistanı Osmanî*, amd. Koma Xebatên Kurdolojiyê, weş. bgst, İstanbul, 2011.

122 *Türkiye Tarihi 3 – Osmanlı Devleti 1600-1908*, r. 100-101.

qebûlkin. Li gorî maddeya 8an a Qanûn-i Esasîyê, ji hemû kesên ku di nav Dewleta Osmanî dijîn re bêyî ku li dîn û mezhebê wî bê meyzandin wê “Osmanî” bê gotin. Armanca vê maddeyê bêguman astengkirina parçebûna împaratoriye bû. Li gorî amadekaran eger hemû hêmanên Osmanî di meclîsê de xwe îfade bikin hewce bi veqetandinê namîne.<sup>123</sup> Çimkî împaratoriye di sed salên dawî de gelek cih winda kiribûn û li Balqanan dîsa serhildanan dest pê kiribû.

Di pêvajoya hewldanên navendîbûna Osmanî de mîrektiyên kurdan li dijî vê derdikevin û li ber xwe didin, lê li hemberî seferên leşkerî yên Osmanî têk diçin.<sup>124</sup> Di sala 1847’an de, piştî ku berxwedana Bedirxan Beg têk diçe, di nav sînore Osmanî de “Eyaleta Kurdistanê” tê avakirin. Avakirina eyaletê di tarixa 13ê Kanûna 1847an de wekî nûçe di rojnameya fermî ya Dewleta Osmanî *Takvîm-i Vakiyî* ‘[*Teqwîm-i Weqayî*]’ de cih digire. Li gorî vê, Eyaleta Diyarbekirê, sencaqên Wan, Mûş û Hekarî, qezayên Cizîr, Bohtan û Mêrdînê bi hev ve têne girêdan û navê Eyaleta Kurdistanê lê tê kirin. Waliyê ewil ê vê eyaletê Esad Paşa ye.<sup>125</sup> Guherîna sînoren eyaletê û navê kesên ku li wir kar kirine ji salnameyên wê demê têne şopandin.<sup>126</sup> Di sala 1868an de ev eyalet tê betalkirin.<sup>127</sup>

Bi hewldanên ITCê, di sala 1908an de ‘Ebdulhemîdê Duyem, mecbûr dimîne ku Meşrûtiyetê îlan bike. Ev pêngaveke nû û ji bo hemû gel û cemaetên Osmanî gaveke dîrokî ye. Bi vê îlanê êdî dewra îstîbdatê ya ‘Ebdulhemîdê Duyem diqede, Meclîsa Mebûsan vedibe ku nûnerên wê bi raya gel têne hilbijartin. Dîsa di vê pêvajoyê de

---

123 Hb., r. 145

124 Ji bo berxwedana Mîrê Botan Bedirxan Beg bnr. Lütflî (Ahmed Ramiz), *Emir Bedirhan*, amd. Koma Xebatê ya di Çavkaniyên Osmanî de Kurd, weş. bgst, İstanbul, 2007. Ji bo rûxandina Mîrektiya Soran bnr. Wadie Jwaideh, *Kürt Milliyetçiliğinin Tarihi Kökenleri ve Gelişimi*, wer. İ. Çekem-A. Duman, ç.6, weş. İletişim, İstanbul, 2009, r. 116-129. Bo dawîya Mîrektiya Behdînan bnr. Jwaideh, hb., r. 129-30.

125 Ji bo tîpguhêziya metnê nûçeyê bnr. *Osmanlı Kürdistanı/Kurdistan Osmanî*, r. 96-97. Ji bo wergera wê ya kurdî bnr. hb., r. 136-137.

126 Hb., r. 99-129.

127 Hb., r. 95.

hepîsxane têne valakirin, kesên li sirgûnê têne efûkirin, li Stembolê xwepêşandan têne organîzekirin. Herwiha zextên li ser çapemenî û weşangeriyê radibin û hejmara weşanan bi derbekê zêde dibe.

Hewce ye em bibêjin ku hewayaya meşrûtiyetê ya li Stembolê, li taş-rayê ewqas xweş nayê. Çimkî piştî Meşrûtiyeta Duyem, rejîma ITCê berê xwe dide hêzên herêmî (wekî Alayên Hemîdiye, komên dînî yên ku wekî Şêx ‘Ebdusselam Barzanî serbixwe tevdigeriyan, eşîrên koçer yên Dêrsimê, axayên xwedîhêz ên wekî Axayê Sor li Botanê), da ku otorîteya wan bişkîne û deshilatdariya dewletê ya navendî saz bike. Bi saya vê deshilatdariya navendî, wê bi kurdan ‘eskeriya dewletê bide kirin, bacan bi rêk û pêk berhev bike, kurdan “medenî” bike û ya herî girîng wê herêmê bixe bin îtaeta xwe. Ev polîtîka li nav kurdan dijberiyekê li hemberî ITCê ava dike. Lê sedemên dijberiyê tenê ne ev in. Ji meşrûtiyetê heta şerê cîhanê kurd di nav tirsê de ne ku li welatê wan wê dewleteke ermenîyan ava bibe. Têkçûna Osmanî di şerên Balqan û Trablusgarbê de û nîqaşên reformê bo ermenîyan vê tirsê zêde dike. Eşîrên kurdan ku di dema Alayên Hemîdiye de gelek ‘erd û milkên ermenîyan zeft kiribûn, ji van reformên ku daxwaza îadekirina wan dike ‘aciz bûn. Li hemberî vê yekê ‘eşîra Millî serî hildide, ‘eşîra Heyderan jî koçî Rûsyayê dike.<sup>128</sup> Serhildana Bedlîsê ya 1914an jî em dikarin wekî nerazîbûneke li hemberî siyaseta ITCê bibînin. Polîtîkayên navendîkirinê, reformên ji bo ermenîyan û daxwaza serî‘etê sedemên vê serhildanê bûn.<sup>129</sup>

Berevajî hêzên herêmî, gelên bajêr piştgirî didane ITCê, çimkî ew jî di dewra ‘Ebdulhemîdê Duyem de ji xurtbûna ‘eşîran, zêdebûna bacan nerazî bûn. Têkiliyên gelê ermenî û kurdan bi hev re û bi iqtîdarê re tişteki pir tevlihev e û faktorên cuda cuda li ser van têkiliyan bandor dikin lê kêma zêde em dikarin bibêjin ku ITC li navendên bajaran bihêztir, li gundewaran jî qelstir bû.<sup>130</sup>

---

128 Yener Koç, “Siird Sancağ’ında 1912 Seçimleri Toplumsal Dinamikler ve Politik Farklılaşmalar”, *Toplum ve Kuram*, j.6-7(Zivistan-Bihar 2012), r. 291-292.

129 Koç, hg., r. 293-294.

130 Koç, hg. r. 294-295.

## 2.1. Pêşketina Nasnameya Kurdî di Nav Dewleta Osmanî de

Li gorî Benedict Anderson “netew” cemaeteke siyasî ya xeyalî ye. Ji xeyaliyê mebest qebûlîkirin e, yanî civakek an jî çend civak bi hin noqteyên hevpar xwe yek texeyyul dikin û xwe cemaetek dihesibînin.<sup>131</sup> Berî fikra netew, cemaetên xeyalî yên dînî hebûn lê di sedsala 16an de êdî ev cemaetên xeyalî yên dînî zêf dibin, berevajî wan cemaetên netewî pêş dikevin. Çimkî di vê dewrê de zimanên gel (îngilîzî, frensî) pêş dikevin û girîngiya zimanê pîroz latînî kêm dibe.<sup>132</sup>

Fikra netewperweriyê û avabûna nasnameyê di serdema nûjen de bi sazî, komele û weşanê şênber dibe û bi vî awayî li ser civatê bandor dike. Rewşenbîrên kurd jî ji dawiya sedsala 19an û pê ve tevî komele û tevgeran dibin, yan jî ew bi xwe komeleyan ava dikin. Di nav Dewleta Osmanî de komeleya kurdan a herî kevin “Kurdistan ‘Azm-i Kavî Cem‘iyyeti [Komeleya Vîna Zexm a Kurdistanê- KAKC]” ye, ku di sala 1900î de bi hewldanên Fikrî Efendiyê Diyarbekrî tê avakirin, lê derbarê wê de zehf kêm tişt tê zanîn û xuya ye îllegal e.<sup>133</sup> Bes, çend sal berê belavokeke wê ya destxet hat peydekirin û weşandin.<sup>134</sup> Komeleyên kurdan ên fermî û çalak emê piştî Meşrûtiyeta Duyem bibînin.

### 2.1.1. Heta Şerê Cîhanê yê Yekem

Piştî pêvajoya navendîbûna Osmanî, em dikarin bibêjin ku têkiliyên kurdan û Osmanî zêdetir dibin; kurd zêdetir di bin tesîra siyaseta navendî ya dewletê û muxalîfên wê de dimînin. Lewre malbatên mezin ên mîran û şêxan ê kurdan êdî li paytexta Osmanî ango li Stembolê dijîn, wekî burokrat di nav kar û barê dewletê de cih digirin û di siyasetê de xwedî rol in. Endamên malbatên wekî

---

131 Anderson, *Hayali Cemaatler*, r. 20.

132 Anderson, hb., r. 32-33.

133 Silopî, *Doza Kürdistan*, r. 25-26; Malmîsanîj, *Yirminci Yüzyılın Başında Diyarbekir’de Kürt Ulusçuluğu (1900-1920)*, weş. Vate, İstanbul, 2010, r. 15-21.

134 Bnr. Şükrü Hanioglu, “Kürt proto-milliyetçiliği, Jön Türklük ve II. Abdülhamid Rejimi: Azm-i Kavî Cemiyeti Örneği”, *Derin Tarih*, j.44 (Kasım 2015), r. 60-66.

Bedirxanî, Baban û Nehrî di nav komele û partiyên Osmanî de cih digirin. Wekî mînak; Komeleya Ittihad-i Osmanî [Yekîtiya Osmanî] ku bingeha ITCê ye, ji pênc avakarên wê dido jê kurd in.<sup>135</sup> Ev nêzikbûn û danûstana rewşenbîrên kurdan û Osmanî wê di warê çapemenî û weşangeriyê de jî xwe nîşan bide.

### 2.1.1.1. Destpêka Rojnamegeriya Kurdî: 22 Nîsan 1898

Ji amûrên girîng ên dewra modern yek jî çapemenî ye ku bando-ra wê li ser avakirina nasnameyê heye. Rojname û kovarên çapkirî ku bi awayekî bi lez digihijîne ber destê sedan, hezaran û belkî hê zêdetir kesan, di belavkirina fikr û ramanan de, di avakirina rayeke giştî û zimanekî hevpar de roleke sereke dilîzin. Kurd jî di dawiya sedsala 19an de dibin xwediyê vê amûrê. Di vê çarçoveyê de 22yê Nîsana 1898an ji bo dîroka kurdî mîladek e. Çimkî hejmara ewil a rojnameya pêşîn a kurdî *Kurdistan* di vê rojê de hatiye weşandin. Avakarê rojnameya *Kurdistanê* Mîqdad Mîdhet Bedirxan e, pênc hejmarên ewil ji aliyê wî ve li Qahîreyê tên weşandin. Ji hejmara 6an pê ve rêvebirî derbasî birayê Mîqdadî, ‘Ebdurehman Bedirxan dibe û rojname jî bar dike Cenewreyê; heta hejmara 19an li wir tê weşandin. Ji hejmara 20an pê ve vedigere Misrê û heta jimara 23yan li vir derdikeve. Ji Hejmara 24an pê ve bar dike Londonê û êdî mehane ye. Ji hejmara 25an pê ve jî li London/Folkstoneê derdikeve. Du hejmarên dawî, yên 30-31ê jî li Cenewreyê tên weşandin. Dîroka hejmara dawî 14ê Nîsana 1902an e.

Rojnameya *Kurdistanê* bi zextan re rû bi rû dimîne û ji ber vê yekê jî gelek caran cih diguherîne, periyoda hejmarên wê dereng dikeve. Ji hemû hejmaran îro tenê ya 19an kêmtir e. Gava ji aliyê zimên ve em lê binêrin, jimareyên 1., 2., 3., 8., 9., 11., 15. û 16. xwerû kurdî, yên din kurdî-tirkî ne. Di rojnameyê de serdestiya kurmancî aşîkar e lê bi soranî jî helbesteke Hacî Qadirê Koyî (m. 1897) hatiye weşandin.<sup>136</sup>

Bi ‘erebî (1828), tirkî (1832) û farisî (1848) weşanên periyodîk ên

135 Malmîsanîj, *Kürt Teavûn ve Terakki Cemiyeti ve Gazetesi*, weş. Avesta, İstanbul, 1999, r. 11.

136 Bozarslan, *Kurdistan Rojname Kurdî ya Pêşîn (1898-1902)*, c. I, r. 8-21.

ewil, ango dîroka rojnamegeriya van zimanan, bi piştgiriya hikûmetên Misir, Osmanî û Îranê dest pê kir.<sup>137</sup> Lê yekemîn rojnameya kurdî, bê arîkariya tu hikûmetê, berevajî wê di bin zext û qedexeyên rejîma ‘Ebdulhemîdê Duyem de, bi xîreta netewperwerên kurd ava bû.

Rojnameya *Kurdistan*, bi keda du kurdperweran, di rojên giran de hat weşandin, lê ev nayê wê maneyê ku têkiliyên wê yên polîtîk nînin: Muxalifên ‘Ebdulhemîdê Duyem zêdetir li Misrê bi cih in, em dibînin ku *Kurdistan* jî li Misrê, li Qahîreyê derdikeve û têkiliya wê bi Jontirkan<sup>138</sup> ango muxalifên ‘Ebdulhemîdê Duyem re heye. Bi taybetî piştî ku rêvebirî derbasî ‘Ebdurehman Bedirxan dibe, têkiliya rojnameyê bi van muxalifan re xurttir dibe. Hanioglu, gava navê Jontirkên pêşeng rêz dike navê ‘Ebdurehman Bedirxan jî dinivîse<sup>139</sup> û gava behsa çapemeniya Jontirkan dike navê rojnameya *Kurdistanê* jî dijimêre.<sup>140</sup>

Erê, ‘Ebdurehman Bedirxan endamê ITCê ye; ew li Ewrûpayê di rojnameya ITCê ya bi navê *Osmanli* de cih digire û di sala 1902an de ligel Baban Hikmet, beşdarî kongreya Jontirkan a li Parîsê jî dibe.<sup>141</sup>

Derbareyê têkiliyên rojnameya *Kurdistanê* û rojnameya *Osmanli* de Ferhad Pîrbal jî lêkolînek kiriye û bi heşt xalan ev têkilî eşkere kiriye.<sup>142</sup> Ji van ên herî balkêş ev in: Ji jimara 6an heta ya 19an rojnameya *Kurdistanê* li Cenewreyê di çapxaneyê ITCê de çap bûye ku

---

137 Hassanpour, “Kürt medya kültürünün yaratılması”, r. 91.

138 Têgeha “Jonturk”, zêdetir ji bo kes û komên muxalifên ‘Ebdulhemîdê Duyem tê bikaranîn. Bnr. M. Şükrü Hanioglu, “Jön Türkler”, *DIA*, c.23, 2001, r. 584-587.

139 Hanioglu, hg., r. 586.

140 Hanioglu, hg., r. 587; M. Şükrü Hanioglu, “Jön Türk Basını”, *Tanzimat’tan Cumhuriyet’e Türkiye Ansiklopedisi*, c. 3, weş. İletişim, İstanbul, 1985, r. 849.

141 Murat Issı, “Kürt Basını ve Kürdistan Gazetesi (1898-1902)”, *e-Şarkiyat İlmi Araştırmalar Dergisi*, j.9 (Nisan 2013), r. 130. Di hejmara 31ê ya rojnameya *Kurdistanê* de bi kurdî û tirkî, bi awayekî berfireh behsa vê kongreyê tê kirin. Di rojnameyê de navê vê kongreyê wekî “Ahrar-i Osmaniye Kongresi” derbas dibe.

142 Ferhad Pîrbal, *Rojnamegerîyê Kurdî be Zimanî Ferensî*, ç.2, Belavkirawekanî Binkey Xendan-Kovarî Aso, Silêmanî, 2006, r. 25-31.

rojnameya *Osmanli* jî li vir çap dibû. Herwiha li Cenewreyê navnîşa-na herdu rojnameyan jî yek bû: “Rue de Carouge, No. 7”. Di rojnameya *Osmanli* de derbareyê rojnameya *Kurdistanê* de, li ser pirsgrêka kurd û derheqê rewşa Bedirxaniyan a li Stembolê çendîn nûçe û îlan derketine.<sup>143</sup> Helbesteke bi tirkî ya sernivîskarê *Osmanli* ‘Ebdullah Cevdet, ku ew bi xwe kurd e û yek ji avakarên komeleya Ittihad-i Osmanî ye ku paşê wê veguhere ITCê, di jimara 17an a *Kurdistanê* de, bi nameyeke wî ya bi înzeya “Bir Kurd” [Kurdek] hatiye weşandin.<sup>144</sup>

Ev têkiliyên xurt ên rojnameya *Kurdistanê* yên bi Jontirkan re bandor li mayîndetiya wê jî dike, yanî qedera rojnameyê bi rewşa vê tevgerê ve tê girêdan. Bo nimûne di kongreya 1902an de tevgera Jontirkan dibe du şiq: Koma Prens Sebaheddîn û koma Ehmed Riza. Ev parçebûn tesîrê li çapemeniyê jî dike; hin rojname û kovar betal dibin, hin dibine yek, yan jî yên nû têne derxistin. Di vê parçebûnê de rojnameya *Kurdistanê* di grûba Ehmed Riza de cih digire. Grûb beyan dike ku ewê piştgirî bide rojnameyê, da ku weşana wê dewam bike.<sup>145</sup> Lê xuya ye ev pêk naye, çimkî hejmara 31ê dibe hejmara wê ya dawîn.

Ji ber ku ‘Ebdurehman Bedirxan di nav vê derdorê de cih girtiye, bi wan re hevkarî kiriye, em nikarin wî suçdar bikin. Çimkî wî çaxî fikrîyata wî jî wekî ya Jontirkan bû. Ew ne dijminê Dewleta Osmanî bû, berevajî, mayîndetî û menfeetên Osmanî ji wî re xem bû. Balkêş e, di jimareya 31ê ya *Kurdistanê* de gava behsa kongreya li Parîsê dike, heyf dike ku çend beşdarên nemisliman bi tirkî nizanîbûn û ji ber vê jî bi frensî xeber dabûn. Ew dibêje ku ev kongreya ummeta Osmanî ye, zimanê fermî yê vê ummetê jî tirkî ye û îfadeya “lisan-i resmîmiz olan Türkçe” angî “zimanê me yê fermî tirkî” bi kar tîne.<sup>146</sup>

143 Ji bo nûçe û nivîsên derbareyê kurdan yên di rojnameya *Osmanli* de bnr. Bahattin Demir-Serhat Bozkurt, “*Osmanlı Gazetesi ve Kürtler*”, *Müteferrika*, j.37 (Havîn 2010/1), r. 51-81.

144 Ji bo metnê vê helbest û nameyê bnr. Malmîsanij, *Abdurrahman Bedirhan ve İlk Kürt Gazetesi Kurdistan Sayı: 17 ve 18*, Sweden, 1992, r. 57-58, 60-61.

145 Hanioglu, “Jön Türk Basını”, r. 849.

146 Bozarslan, *Kurdistan Rojname Kurdî ya Pêşîn (1898-1902)*, c. II, r. 561-562.

Wekî kurdekî tevlîbûna ‘Ebdurehman Bedirxan a vê kongreyê ji bo wî ne pîrsgirêk e, lewre ew “Jonkurd” e<sup>147</sup>; li gorî wî, wekî hemû hêmanên Osmanî xilasbûna kurdan jî bi rêvebiriya meşrûtiyetê pêkan e, li pêşberî vê jî astenga mezin rejîma ‘Ebdulhemîdê Duyem e ku hewce ye bê hilweşandin. Jixwe xala ku Jontirkan digihîne hev ev daxwaza meşrûtiyetê û dijberiya ‘Ebdulhemîdê Duyem e. Ya na zehmet e ku mirov karibe behsa îdeolojiyeke wan a yekpare û giştî bike.<sup>148</sup> Herwiha divê em bibêjin ku Jontirkên wî çaxî û yên piştî Bûyera 31ê Adarê, ango piştî ku ‘Ebdulhemîdê Duyem hel kirin û desthilat bi temamî bi dest xistin ne ‘eynî ne. Jontirkên ku li hember kiryarên rejîma berê “hurriyetxwaz” bûn piştî ku bûn desthilatdar heman siyaseta despot meşandin. Emê di beşa “Weşangeriya Kurdî di Nav Sansur û Qedexyê de” de vê bi berfirehî bibînin.

Rojnameya *Kurdistanê*, bala rojhilatnasên Ewrûpayê jî kişandiye: Martin Hartman, di sala 1898an de di gotara xwe de behsa wê dike. Ew dibêje ku wî pênc jimarên wê yên ewil bi dest xistiye û lê zêde dike: “Mixabin wiha dixwiye ku ji rojnameyê re umrekî kin nesîb bûye. Bi hejmara 5an, ya 4ê hezîrana îsal, hatiye girtin. Ew li Tirkîyeyê qedexe ye û her kurdê ku ew di destan de bê dîtin giran tê cezakirin.”<sup>149</sup> Divê em bibêjin ku rojnameya *Kurdistanê* ji ber zextên rejîma ‘Ebdulhemîdê Duyem piştî hejmara 5an navberek dide lê paşê bi rêvebiriya ‘Ebdurehman Bedirxan, heta hejmara 31ê weşana xwe dewam dike.

Dîsa rojhilatnas Hugo Makas, li Cenewreyê ‘Ebdurehman Bedirxan şaxsen nas dike û wiha behsa wî dike:

“Abderrahman ist der Herausgeber der ersten kurdischen Zeitung ‘Kurdistan’ und wohnte bis vor kurzem in Genf. Herr

---

147 Djene R. Bajalan, kurdên di nav Jontirkan de wekî “Jonkurd” bi nav dike. Li gorî wî Jonkurdan nasnameya kurdî qebûl dikir; qiymet didane wê û di heman demê de ew tevlî tevgera rizgariya Dewleta Osmanî dibûn. Bnr. *Jön Kürtler Birinci Dünya Savaşı’ndan Önce Kürt Hareketi (1898-1914)*, weş. Avesta, İstanbul, 2010, r. 85.

148 Hanioglu, “Jön Türkler”, r. 587.

149 Martin Hartmann, “Li ser Edebiyata Kurdî & Li ser Melayê Cizîrî”, wer. A. İncekan, *Nûbihar Akademi*, j.3 (2015), r. 128.

‘Abderrahman unterstützte mit größter Bereitwilligkeit meine litterarischen kurdischen Bestrebungen und erklärte alles mir dunkel Gebliebene, soweit er es selbst wußte...”<sup>150</sup>

[‘Ebdurehman edîtorê yekemîn rojnameya kurdî “Kurdistan” e û heta van çaxan li Cenewreyê dijiya. Birêz ‘Ebdurehman bi dilxwaziyeke mezin piştgirî da xebatên min ên li ser wêjeya kurdî û her tişta ku bo min nediyar bû bi qasî ku dizanî rave kir...]

### 2.1.1.2. Şoreşa 1908an: Meşrûtiyeta Duyem

Piştî pêvajoyeke zor û zehmet ‘Ebdulhemîdê Duyem daxwaza muxalifan qebûl dike û meşrûtiyetê ji nû ve îlan dike. Êdî ligel otorîteya mutleq a padişahî meclîseke ku bi rayên gel tê hilbijartin ji wê hebe. Muxalifên ‘Ebdulhemîd meşrûtiyetê wekî şoreşekê qebûl dike û wê wekî dawîya despotîzma ‘Ebdulhemîd, ku jê re “Dewra Îstîbdat” digotin, dibînin. Ev li Stembol û gelek deverên Osmanî dibe sedema şahî û kêfxweşiyê: Yên li sirgûnê vedigerin, yê girtî tene berdan, misliman û nemisliman bi hev re meşrûtiyetê pîroz dikin. Sê sloganên vê dewra nû hene: Hurriyet (azadî), uxuvvet (biratî), musawat (wekhevî).<sup>151</sup> Huseyn Kamî, helbestvanê tirk ku Kurdîzade Ehmed Ramîz dîwana wî weşandiye, destpêka dîwana xwe de bi çavdêriyên xwe behsa wê coşa millet a piştî îlankirina Meşrûtiyetê dike ku misliman nemisliman hemû hêmanên Osmanî hev hembêz dikir, maç dikir.<sup>152</sup>

Piştî Meşrûtiyeta Duyem (1908), gelek rewşenbîr û serekên kurd ji sirgûnê vedigerin paytexta Osmanî Stembolê. Wekî mînak di rojnameya *Şark ve Kurdistanê* [*Şerq û Kurdistan*] de dinivîse ku “Em bi hesret li benda hatina ‘Ebdurehman û Miqdat Bedirxan in”.<sup>153</sup>

---

150 Hugo Makas, *Kurdische Studien*, Carl Winter’s Universitätsbuchhandlung, Heidelberg, 1900, r. 19.

151 Bnr. M. Şükrü Hanioglu, “Meşrutiyet, <https://islamansiklopedisi.org.tr/mesrutiyet>, 06.03.2025.

152 Hüseyin Kâmi, *Dehrî Dîvançesi*, amd. A. Tanyıldız, weş. Akademik Kitaplar, İstanbul, 2013, r. 77-80.

153 Ji bo tîpguhêziya nivîsê bnr. Alişan Akpınar û nd., “Bir II. Meşrutiyet Gazetesi Olarak Şark ve Kürdistan”, *Müteferrika*, j.35 (Havîn 2009), r. 9.

Paşê em dibînin ku ev herdu Bedirxanî ji sirgûnê vedigerin û têne Stembolê.<sup>154</sup> Ji bilî wan, Seyyid ‘Ebdulqadirê kurê Şêx ‘Ubeydullahê Nehrî jî vê demê vedigere Stembolê.<sup>155</sup>

Di rojnameya bi navê *Ittîfak* de nûçeyek derbas dibe ku “doh li şarê Stembolê, li devera Vezneciler zêdetirî pênc sed kurd ji bo avakirina ‘Osmanlı Kurd Te‘avun ve Terakkî Cem‘iyyeti’ li hev civiyane. Di vê civînê de Muftîzade Reşîd Begê Mûşî li ser pêvajoya nû û bashiyên rejîma meşrûtiyetê axaftinek kiriye, paşê jî Qeymeqam Cemîl Begê Diyarbekirî axiviye. Di dawiyê de ji bo hîlbijartina heyeta rêvebiriyê, axaftina li ser hin maddeyên nîzamnemeyê biryar tê standin ku roja yekşemê, danê sibehê li mizgefta Ayasofyayê bê civîn.<sup>156</sup> Ev civîn di weşana fermî ya ITCê *Ittihad ve Terakkî* de jî cih digire, lê di wir de navê komeleyê wekî “Imdad ve Terakkî Cem‘iyyeti” [Komeleya Hawar û Pêşveçûnê]” derbas dibe.<sup>157</sup>

Li gorî rojnameya *Tanîn*, komeleyek bi navê “Kurd Ittihad ve Te‘avun Cem‘iyyeti [Komeleya Yekîti û Arîkirinê ya Kurdan]”, ji aliyê “ulema û meşayix û rûsayê ekra” angî ‘alim, şêx û serekên kurdan ve hatiye avakirin. Di nûçeyê de pesnê avakaran û hewldana wan tê dayîn ku ew dixwazin qanûna meşrûtiyê di nav kurdan de belav bikin û vê qanûnê biparêzin. Li gorî nûçeyê armancên esasî yên vê komeleyê wiha ne: bêtî ferq û cudahî, di nav mirovan de berfirehkirina yekîtiyê, belavkirina perwerde û wekheviyê û bi vî rengî rakirina dijminatîyê ji nav eşîr û êlên kurdan; temînkirina terbiyeya fikrî di nav kurdan de ku di xilqeta xwe de saf û saxlem in, bi vî hawî jêbirina wan menzereyên nebaş angî nêrînên xirab ên derbareyê kurdan de.<sup>158</sup>

---

154 Malmîsanîj, *İlk Kürt Gazetesi Kurdistan’ı Yayımlayan Abdurrahman Bedirhan (1868-1936)*, weş. Vate, İstanbul, 2009, r. 79-81.

155 Malmîsanîj, *Kürt Teavûn ve Terakkî Cemiyeti ve Gazetesi*, r. 16.

156 “Osmânlı Kürd Te‘avûn ve Terakkî Cem‘iyyeti”, *Ittîfak*, No.22 (25 Agustos 1324/7 Îlon 1908), r. 3.

157 “Kürd Kulübü”, *Ittihad ve Terakkî*, No.21 (9 Eylul 1324/22 Îlon 1908), r. 3.

158 “Osmânlı Kürd İttihâd ve Terakkî Cem‘iyyeti”, *Tanîn*, No.67 (23 Eylul 1324/6 Cotmeh 1908), r. 8. Balkêş e, navê komeleyê di sernavê û di nava nivîsê de ji hev cuda ye. Ev jî delîlek e ku derbareyê navê komeleyê de tevliheviyek heye.

Piştî hefteyekê em ji heman rojnameyê hîn dibin ku “Kurd Ittihad ve Te‘avun Cem‘iyyeti” li Veznecilera Stembolê xaniyek peyde kiriye û ev der weke navenda komeleyê hilibijartîye. Komeleyê ji bo berhevkirina arîkarî û karên din memûrên taybet wezîfedar kirine û wereqeyên ku bi mohra komeleyê hatine pejirandin dane wan.<sup>159</sup> Li gorî rêzîknameya komeleyê (îlaweya maddeya 7.) serekê daîmî yê KTTCCê Seyîd ‘Ebdulqadirê Nehrî ye.<sup>160</sup>

Bi qasî ku em dizanin piştî îlana meşrûtiyetê 12ê Tebaxa 1908an de “Kurd Te‘avun ve Terakkî Cem‘iyyeti [Komeleya Arîkarî û Pêşveçûna Kurdan-KTTCC]” tê avakirin.<sup>161</sup> Lêkolîner Tarik Zafer Tunaya, “Osmanlı Kurd Te‘avün ve Terakkî Cem‘iyyeti” û “Kurd Te‘avün ve Terakkî Cem‘iyyeti” cuda dihesibîne<sup>162</sup>, lê bi qenaeta me ev komeleyên ku bi navê “Osmanlı Kurd Te‘avun ve Terakkî Cem‘iyyeti, Imdad ve Terakkî Cem‘iyyeti, Kurd Te‘avun ve Terakkî Cem‘iyyeti” derbas dibin hemû yek in. Dibe ku di pêvajoya avakirinê de li ser navê wê nîqaş çêbûbin, ji ber vê yekê jî rojnameyên serdemê navê wê cuda cuda nivîsandibin.

KTTCC, bi navê *Kurd Te‘avun ve Terakkî Gazetesi* [Rojnameya Arîkarî û Pêşveçûna Kurdan-KTTCC] weşaneke kurdî-tirkî derdixe (1908). Xwedî û berpirsiyarê wê Suleymaniyeli Tewfîq (Pîremêrd), sernivîskarê wê Diyabekirli Ehmed Cemîl e. Ji bilî wan Malatyali Bedrî, Babanzade Îsmâîl Heqqî, Bedîuzzeman Seîdê Kurdî jî nivîskarên wê bûn. Îro di destê me de neh hejmarên vê rojnameyê hene ku Mehmed Emîn Bozarslan bi herfên latînî ji nû ve çap kirine.<sup>163</sup> Rojnameyê ji derdorên cuda, kesên xwedî hizr û ramanên cihê cihê li hev kom kirine, tê de giraniya fikra osmanîtiyê xuya dike, lê di asta kulturî de netewperweriyeke kurdî jî heye. Di piraniya nivîskarên vê

159 *Tanîn*, No.74 (30 Eylul 1324/13 Cotmeh 1908), r. 8

160 Ji bo rêzîknameya komeleyê bnr. Tunaya, *Türkiye’de Siyasal Partiler Cilt: 1 İkinci Meşrutiyet Dönemi 1908–1918*, r. 409–413; Malmîsanij, *Kürt Teavün ve Terakki Cemiyeti ve Gazetesi*, r. 109–116.

161 Malmîsanij, *Kürt Teavün ve Terakki Cemiyeti ve Gazetesi*, r. 109.

162 Tarik Zafer Tunaya, *Türkiye’de Siyasal Partiler Cilt: 1 İkinci Meşrutiyet Dönemi 1908–1918*, weş. Hürriyet Vakfı, İstanbul, 1984, r. 404.

163 M. Emîn Bozarslan, *Kürt Teavün ve Terakkî Gazetesi Kovara Kurdî-Tirkî/Kürdçe-Türkçe Dergi 1908–1909*, weş. Deng, Uppsala, 1998.

rojnameyê de bandora fikriyata roşingêr xuya dike, ew pêşveçûna kurdan diparêzin û îslamê di vê pêşveçûnê de ne asteng, berevajî wê destek dibînin.<sup>164</sup>

Rojnameya *Kurdistanê*, ne muxalifê Dewleta Osmanî bû, ew muxalifê rejîma ‘Ebdulhemîdê Duyem bû. Di *Kurdistanê* de jî, di *KTTGê* de jî meyldariya osmanîtiyê xuya ye û di asteke bilind de ye. Ferq û cudayiya *KTTGê* ew e ku ew êdî ne muxalifê rejîmê ye<sup>165</sup>, lewre rejîm guherî, di bedêla rejîma îstîbdatê ya ‘Ebdulhemîdê Duyem rejîma meşrûtiyetê hat, jixwe aktîvîstên kurd ên vê dewrê -bi gotina Djene Rhys Bajalan, Jonkurdan- jî ev dixwast.

Rojnameya *Kurdistanê* piştî meşrûtiyetê vê carê li Stembolê ji aliyê Ehmed Sureyya Bedirxan (bi navê xwe yê mustear Azîzî Ehmed) ve tê weşandin. Îro di destê me de tenê hejmara 3 (12 Şubat 1324/25 Sibat 1909) û ya 4an (5 Mart 1325/18 Adar 1909) heye. Di van herdu hejmaran de nivîsên Mehmed Salih Bedirxan, Huseyn Kenan Bedirxan, Emîn Alî Bedirxan, Hacî Hesên Tehsîn hene. Ji bilî van nivîsek jî heye ku ji kurên Bedirxan Beg; Hesên, Xelîl, Mîdhet û ‘Ebdurehman bi hev re nivîsîne.<sup>166</sup> Wekî ku xuya dike, nivîskar hema bêje hemû Bedirxanî ne û vê rojnameyê xwe berde wama rojnameya *Kurdistanê* ya ku Mîqdad Mîdhet Bedirxan li Qahîreyê derxistibû dihesibîne.<sup>167</sup> Rojnameyê meşrûtiyet diparast û li kurdan şîreta yekîtiyê, vekirina dibistanan, girîngîdayîna huner û perwerdeyê dikir.<sup>168</sup> Lê ITCê, piştî Bûyera 31ê Adarê nivîskarên vê rojnameyê bi tawanbariya îrtîcayê (paşverûtiyê) diavêje hebsê û rojnameyê jî digire.<sup>169</sup>

---

164 Ayhan Işık, “Kürt Teavûn ve Terakki Cemiyeti ve Gazetesi (1908-1909)”, *Kürt Tarihi*, j.8 (Ağustos-Eylül 2013), r. 49.

165 Bajalan, *Jön Kürtler Birinci Dünya Savaşı’ndan Önce Kürt Hareketi (1898-1914)*, r. 113.

166 Yener Koç-Serhat Bozkurt, “Du Hejmarên Rojnameya Kurdistan (1908-1909)”, *Zend*, j.21 (Zivistan 2014), r. 96-98.

167 Yener Koç-Serhat Bozkurt, “Du Hejmarên Rojnameya Kurdistan (1908-1909)”, r. 84.

168 Yener Koç, “Kürdistan Gazetesi (1908-1909) Üzerine Birkaç Not”, *Kürt Tarihi*, j.8 (Ağustos-Eylül 2013), r. 42.

169 Oğuz AYTEPE, “Kürt İstiklâl Komitesi”, *Tarih ve Toplum*, j.173 (Mayıs 1998), r. 48; Malmîsanîj, *Cızıra Botanlı Bedirhaniler*, r. 122-124.

Ehmed Sureyya Bedirxan, di navbera salên 1917-1918an de jî rojnameya *Kurdistanê* li Qahîreyê diweşîne. Ev rojnameya ku panzdeh rojan carekê derdiket, bi tirkî û kurdî bû û bi giştî yazdeh hejmar hatiye weşandin: Hejmara ewil (15 Zîlqade 1335/2 Îlon 1917) û hejmara 11an (15 Rebîussanî 1336/28 Çile 1918). Di hejmara dawî de tê gotin ku qeyrana peydekirina kaxezan didome loma ew mecbûr in rojnameyê rawestînin.<sup>170</sup> Bi rastî jî piştî wê hew derdikeve. Xuya ye Şerê Cîhanê hem ji aliyê siyasî ve hem jî aborî ve bandoreke xirab li çapemeniya kurdî kiriye. Dr. Kemal Fuad, 11 hejmarên vê rojnameyê berhev kirine û ji nû ve çap kirine.<sup>171</sup>

Di sala 1908an de rojnameyeke bi navê *Şark ve Kurdistan* jî tê weşandin. Avakarên vê rojnameyê Malatyali Bedrî, Hersekli Îsmâîl û Hersekli Ehmed Şerîf in. Di nav nivîskarên wê de ji bilî van her sê avakaran navê Seîdê Kurdî balê dikişîne. Çapemeniya kurdî ya beriya wê duzimanî bûn ango hemû bi tirkîya osmanî û kurdî bûn lê di *Şark ve Kurdistanê* de nivîsên kurdî nînin. Wekî rojnameyên beriya xwe wê jî rejîma meşrûtiyetê diparast û li ser vê esasê weşan dikir.<sup>172</sup>

Di sala R. 1326/M. 1909an de li Stembolê bi navê KNMCê komeleyek tê avakirin. Li gorî nîzamnâmeya wê armanca vê komeleyê di nav kurdan de, ku ji ewladê welêt ên herî zêde hewcedarên mearîfê ne, belavkirina zanî û sin'etê ye. Ji bo vê yekê jî pêşî li Stembolê paşê bi arîkariya erbabê hemîyyetê li gund û navçeyên ku kurd lê dijîn vekirina mektebên seretayî yek ji armancên komeleyê ye.<sup>173</sup> Komeleyê ev armanca xwe qismen pêk aniye û di sala 1910an de

170 "Kari'lerimize", *Kurdistan*, j.11 (15 Rebîussanî 1336/28 Çile 1918), r. 2.

171 Kemal Fuad, *Kurdistan: Yekemîn Rojnamey Kurdî Dewrey Sêyem 1917-1918*, Çapxaney Zankoy Silêmanî, 1998, r. 1-44.

172 Derbareyê vê rojnameyê de ji bo agahiyên berfirehtir bnr. Alişan Akpınar, nd., "Bir II. Meşrutiyet Gazetesi Olarak Şark ve Kürdistan", r. 3-47. Ji bo wergera kurdî ya beşek ji ya heman gotarê bnr. "Rojnameyeke Meşrutiyeta 2'yem: "Şerq ve Kurdistan", *Zend*, j.12 (Havîn 2009), r. 75-78.

173 Ji temamê tîpguhêziya nîzamnâmeya komeleyê bnr. Mehmet Bayrak, *Açık-Gizli Resmi-Gayr-ı Resmi Kürdoloji Belgeleri*, weş. Özge, Ankara, 1994, r. 546-549.

bi destûra Dahiliye Nezareti (Wezareta Karûbarên Navxwe) bi navê “Mekteb-i Meşrûtiyet” dibistanek vekirîye.<sup>174</sup> Mudîrê vê mektebê ‘Ebdurehman Bedirxan bû. Mektebê di sala 1911an de gava Baban-zade Îsmâil Heqqî demeke kurt bûbû Wezîrê Perwerdeyê ji weza-retê arîkariya maddî jî wergirtiye.<sup>175</sup> Mektebê çend sal ‘emr kiriye ne diyar e, lê sedema betalbûna wê bi şahidiya Sureyya Bedirxan kifş e: Zextên ITCê. Li gorî Sureyya Bedirxan, ji ber ku di lewheya wê de peyva “kurd” derbas dibû ITC ji komeleyê û dibistana ku wê vekirîye aciz dibû. ITCê îddia dikir ku armanca van ne belavkirina zanîna lê amadekirina tevgera netewî û cudaxwaz a kurdî ye. Ji ber ku newêrbû rasterast bigire, bi rêya tacîzê rêvebiriya komeleyê aciz dikir û dawîya dawî komele mecbûr ma ku belav bibe.<sup>176</sup> Girtina di-bistanê jî bi belavbûna komeleyê ve têkildar e.

### 2.1.1.3. Civata Hêvî û Xelîl Xeyalî

Em dibînin ku piştî KNMCê, sala 1912an li Stembolê, li Halka-li Zira‘at Mektebi [Dibistana Çandinê ya Xelqelî] komeke ciwanên kurd, bi pêşengî û piştevaniya Xelîl Xeyalî Civata Hêvî Feqeyê Kur-dan (Hêvî Kurd Talebe Cem‘iyyeti) ava dikin<sup>177</sup> lê têkiliyeke wê bi siyasetê re nîne. Civata Hêvî ji navê wê jî diyar e, komeleya xwen-dekar û ciwanan e. Bi vî aliyê xwe ji komeleyên beriya xwe cuda dibe. Qedrî Cemîlpaşa, ‘Emer Cemîlpaşa, Fuad Temo, Cerrahzade Zekî sazkarên wê; Hîzanîzade Kemal Fewzî, Memdûh Selîmbegî, Ekrem Cemîlpaşa, Baban ‘Ebdulezîz, Mistefa Şewqî, Mehmed Şefîq Arwasî, Hemzeyê Muksî, Asef Bedirxan, Mehmed Mîhrî, ‘Ebdurehîm Rehmî jî ji hin endamên wê bûn.<sup>178</sup> Civata Hêvî, gelek armanc dane pêşîya xwe. Ev armanc di beyannameya xwe de yek bi yek nîşan dane:

---

174 Bahattin Demir, “Devlet Destekli Kürtçe Eğitim Kürd Meşrutiyet Mektebi” *Toplumsal Tarih*, j.200 (Ağustos 2010), r. 75.

175 Demir, hg., r. 76.

176 Malmîsanîj, *İlk Kürt Gazetesi Kurdistan’ı Yayımlayan Abdurrahman Bedirhan (1868-1936)*, r. 90-91.

177 Silopî, *Doza Kürdüstan*, r. 28.

178 Bozarslan, *Jîn Kovara Kurdî-Tirkî 1918-1919*, c. I, r. 123.

“1. Feqeê kurdan bi hev bidine naskirin û di mabeyna wan da biratiya misilmanî bidine danîn. 2. Zimanê kurdan yek kirin û kitêbên kurdî civandin û tarîx û qewaid çêkirin û çap kirin û kitêb ji bo zarokê kurdan çêkirin. 3. Di Kurdistanê da medrese vekirin. 4. Zar’wê feqîrê kurdan li ber xwendin û sin’et danîn û ji bo muhtacan arî kirin. 5. Di Kurdistanê da û xaseten di gundan da [ji] mizgeft û mekteb çêkirin ra rêberî kirin. 6. Ji bo pêşçûna kurdan û bilindbûna wan çî ji dest bê ewê çêkirin. 7. Xebat ji me, muyesser kirin ji Xudê.”<sup>179</sup>

Civata Hêvî, di 6ê Hezîrana 1913an de kovara *Rojî Kurdê* ava dike û di 19ê Hezîrana 1913an jî hejmara wê ya ewil diweşîne. Ev kovar bi temamî çar hejmar hatiye weşandin. Xwedî û gerînendeyê berpirsiyar ê vê kovarê Silêmanî ‘Ebdulkerîm (Süleymaniyeli Abdülkerim) e. Nivîsên kovarê bi tirkîya osmanî û kurdî (kurmancî-soranî) ne. Di nav nivîskarên sereke yên vê kovarê de em dikarin navê Xelîl Xeyalî, Mehmed Salih Bedirxan, ‘Ebdullah Cevdet, Kerkuklu Necmeddîn, Diyarbekirli Fikrî Necdet, Fuad Temo, Babanzade İsmail Heqqî bijimêrin. Di kovarê de mijarên sereke, sedemên paşvemana kurdan, ji bo pêşveçûnê girîngiya xwendin, nivîsandin, xebat û îttîfaqê, girîngiya pêşvebirina zimanê kurdî û nivîsandina dîroka kurdan e. Di kovarê de nîqaşên li ser alfabeyê bi tena serê xwe mijareke lêkolînê ye. Ji bilî van di *Rojî Kurdê* de nivîsên derbareyê jinan, ciwanan, cotkariyê de hene û herwiha helbest û çîrokên kurdî jî tê de cih digirtin.<sup>180</sup>

Piştî hejmara 4an ku weşana *Rojî Kurd* radiweste an jî tê rawestandin<sup>181</sup>, em dibînin ku kovara *Hetawî Kurd* dest bi weşanê dike. *Hetawî Kurd*, dezgehê nû yê weşanê ya Civata Hêvî ye. Jixwe beyannameya komeleyê di hejmara 4-5an a vê kovarê de bi tirkî û kurdî tê

179 “Beyana ‘Civata Hêvî’ Feqeê Kurdan”, *Hetawî Kurd*, j.4-5 (10 Mayıs 1330/22 Gulan 1914), r. 13. Ev beyanname di kovarê de bi tirkîya osmanî û bi zaravayê soranî jî hatiye weşandin, me ya bi kurmancî bi kar anî.

180 Ji bo agahiyên zêdetir derbareyê *Rojî Kurdê* bnr. *Di Sedsaliya Wê de Rojî Kurd 1913*, amd. Koma Xebatên Kurdolojiyê, weş. Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, Stenbol, 2013.

181 Ji bo raveya vê nîqaşê bnr. *Di Sedsaliya Wê de Rojî Kurd 1913*, r. 57-59.

weşandin.<sup>182</sup> Gerînenneyê berpirsiyar ê *Hetawî Kurdê*, Baban ‘Ebdulêzîz e. Ev kovar herî kêr deh hejmar derketiye, lêbelê di destê me de hejmarên wê yên 1, 2, 3, 4, 4-5 û 10an hene. Ji ber Şerê Cîhanê yê Yekem, *Hetawî Kurd* mecbûr dimîne ku weşana xwe bisekinîne.<sup>183</sup>

Gava li Stembolê *Hetawî Kurd* derdiket, li Bexdadê jî bi navê *Bangî Kurd* kovareke kurdî dihate weşandin. Berpirsiyarê *Bangî Kurdê*, Baban Cemaleddîn e. Zimanê kovarê kurdî-tirkî ye, panzdeh rojan carekê derdiket. Ew bi tevahî çar hejmar derketine. Hejmara ewil 8ê Sibata 1914an de hatiye weşandin. Şukrî Fezîlî, Sidqî Suleyman Tewfîq, Xakî Bexdadî, Elî Bapîr Axa û Behaeddîn Şêx Nûrî ji nivîskarê wê ne. Çar jimarên wê yên berdest li Silêmanî ji aliyê Binkey Jîn ve ji nû ve hat çapkirin.<sup>184</sup>

Di hindurê paşbergê hejmara 4-5an a *Hetawî Kurdê* de danasî-neke biçûk a *Bangî Kurdê* tê kirin û tê diyarkirin ku xwendevan dikarin vê kovarê ji cihê rêvebirîya *Hetawî Kurdê* peyde bikin. Diyar e ku Baban Cemaleddîn û Baban ‘Ebdulêzîz ji heman malbatê ne; malbata Babanan ku li herêma Silêmanî mîrektî kirine. Ew danasî-na biçûk ji me re nîşan dide ku li du navendên Osmanî; Stembol û Bexdadê rewşenbîrên kurd ji hev hayedar in û piştgirî didine hev.

Ji rojnameya *Serbestîyê* em hîn dibin ku encama *Bangî Kurdê* jî wekî ya *Hetawî Kurd* e, ew jî di pêvajoya şerê cîhanê de ji aliyê hukûmetê ve tê “te’îlîkirin” ango weşana wê tê betalkirin. Piştî şer ew hewl dide ku ji nû ve dest bi weşanê bike û li gorî nûçeya *Serbestîyê* hejmara wê ya nû li ber weşanê ye<sup>185</sup> lê bi qasî ku em dizanin ev pêk nehatiye.

Li gorî çavkaniyan Civata Hêvî bi navê *Yekbûnê* rojnameyek jî derxistiye. Hetta Rewşen Bedirxan û Mûsa Anter derbareyê

---

182 “(Kürd Talebe Hêvî Cem’iyyeti)nin Beyânnâmesidir”, “Beyana ‘Civata Hêvî’ Feqeê Kurdan”, *Hetawî Kurd*, j.4-5 (10 Mayıs 1330/22 Gulana 1914), r. 1-4; r. 11-14.

183 Mesûd Serfiraz, “Hetawî Kurd Nasandin û Naveroka Wê”, *Zend*, j.18 (Havîn 2012), r. 66-72.

184 Sidîq Salih û nd., *Govarî Bangî Kurd 1914, Bexda*, weş. Binkey Jîn, Silêmanî, 2021.

185 “Bangî Kurd, Kurdistan, Jîn”, *Serbestî*, No: 490 (9 Mayıs 1919/9ê Gulana 1919an), r. 2.

naveroka wê de hin agahiyan jî didin<sup>186</sup>, lê tu nusxeyên vê rojnameyê îro li ber dest nînin.

Xuya ye piştî Meşrûtiyeta Duyem hejmara komeleyên kurdan û weşanên van komeleyan zêde dibin.<sup>187</sup> Hebûn û çalakîyên van komeleyan teqez bandoreke erênî li ser pêşketina nasnameya netewî ya kurd dike lê gelo tevgerên van komeleyan wekî “netewperweriya kurd” dikarin bên hesibandin yan na, li ser vê nîqaş heye. Li gorî Rohat Alakom<sup>188</sup>, Celîlê Celîl<sup>189</sup> û gelek dirokzanên kurd bersiva vê pirsê “erê” ye, lê li gorî Hakan Ozoglu “na” ye. Li gorî Ozoglu tu daxwazên siyasî yên van komeleyên beriya şerê cîhanê tune bû, ew ji esîlzadeyên kurdan re bûne kulûbên kulturê û herçendî bûbine nimûneyên şînhatina çanda kurdî jî ew ne rêxistinên netewperwerên kurdan in. Ozoglu ji bo tevgera komeleyên vê demê têgeha “pêş-netewperwerî” bi kar tîne.<sup>190</sup> Djene Rhys Bajalan hem ji bo tevgera kurdî ya berî şerê cîhanê û ya piştî şerê cîhanê ji hev veqetîne hem jî ji bo ku ji têgeha “pêş-netewperwerî” cuda bibe, ji kesayêten vê dewrê re “Jonkurd” dibêje. Lewre li gorî wî Jonkurdan bi rengê kurdîtîyê netewperweriya Osmanî dikirin. Ji bo van kesan parastina nasnameya kurdî û fikra osmanîti ne nakokiyek bû.<sup>191</sup>

Li gorî Tarik Zafer Tunaya jî, di dema Meşrûtiyeta Duyem de pirsgirêkên wîlayetên rojhilat li nava parlementoya Osmanî û li derveyî wê zêdetir hatine nîqaşkirin, komeleyên kurdan ku ji aliyê kadyroyên feodal ve dihatine birêvebirin car caran li hemberî tirkperestîya ITCê li ber xwe dane, lê daxwaza cudabûna ji Osmanî nekirine;

---

186 Malmîsanij, *Kürt Talebe-Hêvî Cemiyeti*, r. 146-149; Malmîsanij&Mahmûd Lewendî, *Li Kurdistanê Bakur û li Tirkîyê Rojnamegeriya Kurdî (1908-1992)*, r. 58-60.

187 Derbareyê komeleyên vê dewrê de bnr. Bozarslan, *Jîn Kovara Kurdî-Tirkî 1918-1919*, c. I, r. 24-29; Alakom, *Eski İstanbul Kürtleri*, r. 122-128.

188 Alakom, *Eski İstanbul Kürtleri*, r. 96.

189 Celîlê Celîl vê dewrê di nav ronesansa kurdî de dihesibîne. Bnr. *Kürt Aydınlanması*, r. 55-95.

190 Hakan Özoglu, *Dewleta Osmanî û Netewperwerên Kurd*, wer. A. Karadeniz, weş. Kitap, İstanbul, 2012, r. 114-115.

191 Bajalan, *Jön Kürtler*, r. 44.

ev daxwazên serxwebûnê piştî Şerê Cîhanê yê Yekem têne dîtin.<sup>192</sup>

Dema mirov berê xwe dide nivîsên Xelîl Xeyalî yên di navbera salên 1908-1914an de dibîne ku nêrîna wî ya li ser zimên dişibe asta yekem a teoriya netewperweriyê ya Miroslav Hroch.<sup>193</sup> Çimkî Hroch, gava li ser netewperweriya Ewrûpaya Rojhilat lêkolîn kiriye netewperweriya wan dabeşî sê astan kiriye. Di asta yekem de rewşenbîr li ser zimên, wêje û çanda milletê xwe wekî arkeologan dixebitin.<sup>194</sup>

Bi rastî jî Xelîl Xeyalî di warê zimên de pir hesas e û nasnameya kurdîtiyê li ser zimên ava dike. Xeyalî nivîsa xwe ya bi sernavê “Bextreşî û Mehrûmiya Kurdan” de dibêje ku “Elî Herîrî nehsed û sih sal berê, Melayê Cizîrî jî heştê sal berê bi kurdî helbest nivîsîne. Herwiha Ehmedê Xanî *Mem û Zîn*, û ji bo zarokan *Nûbar* telîf kiriye, bi çar zimanan şîr gotiye.”<sup>195</sup> Xeyalî, bi van gotinan hem qedîmtiya kurdî nîşan dide hem jî pesnê wan helbestvanên kurdî nûs dide. Dîsa di nivîseke xwe de xwe dispêre *Şerefnameyê* û pênc zaravayên kurdî dijmêre (kurmanc, goran, kelûr, lor, zaza) û paşê jî yek bi yek herêmên van zaravayan rave dike.<sup>196</sup> Bi vî rengî Xeyalî neqşeya zimanê kurdî derdixe.

Xelîl Xeyalî gava pirsê kurd îro muhtacê çi ne dibersivîne û lazimiyên kurdan xal bi xal dijmêre jî dîsa girîngiyeke mezin dide zimên.<sup>197</sup> Dema em berê xwe didine van xalan, xuya dike ku tu daxwazeke siyasî ya Xelîl Xeyalî nîne û ev yek teza Hakan Ozoglu piştrast dike. Lê hewce ye em vê bibêjin ku nasnameya komele û çapemeniya kurdî ya vê dewrê ku xwe durrî polîtîkayê digire nayê wateya ku kurd qet bi polîtîkayê re ‘eleqedar nebûne. Ji bo xuyakirin û

---

192 Tunaya, *Türkiyede Siyasal Partiler Cilt: 1 İkinci Meşrutiyet Dönemi 1908–1918*, r. 408.

193 Tahir Baykuşak, “Xelîl Xeyalî Modan (1864-1946)”, *Wêje û Rexne*, j.8 (2016), r. 83, 86.

194 Miroslav Hroch, *Avrupa’da Milli Uyanış*, wer. A. Özdemir, weş. İletişim, İstanbul, 2011, r. 50.

195 *Di Sedsaliya Wê de Rojî Kurd 1913*, amd. Koma Xebatên Kurdolojiyê, r. 195.

196 Babê Naco M. X., “Erbâb-ı Hamiyet ve Himmeye”, *Hetawî Kurd*, j.4 (19 Mart 1330/1 Nisan 1914) r. 6.

197 *Di Sedsaliya Wê de Rojî Kurd 1913*, amd. Koma Xebatên Kurdolojiyê, r. 187.

vegötina kurdan a di qada polîtîk de mînakeke balkêş hilbijartinên mebûsiyê yên 1912an in.<sup>198</sup>

Hilbijartinên sala 1912an di navpera ITC û Hurriyet ve İtilaf Firkasiyê [Partiya Azadî û Hevbendiyê-HIF] de derbas dibû û Huseyn Kenan Paşayê Bedirxanî li Sêrtê ji HIFê namzet bû. Gelek sedem hebûn ku di şexsê Huseyn Kenan Paşa de kurd xwe nêzî HIFê bibînin. Li hemberî ITCya navendîparêz û tirkperest, HIFê jî "ittihad-i 'enasisir [Yekbûna pêkhateyan]" û wehdet-i Osmanî [Yekîtiya Osmanî] diparast lê bi pergaleke nenavendî ('edem-i merkeziyet) û ji kêmnayan re zêdetir maf û serbestî.<sup>199</sup> Bi vî rengî HIF, ji bo kurdên ji ITCê nerazî alternatîfa yekane bû. Bo nimûne HIFê, di sala 1912an de di rêzîknameya xwe de li dibistanên gundan perwerdeya bi zimanê mehellî/herêmî qebûl dikir.<sup>200</sup> Bi vî rengî belkî ji cara pêşîn perwerdeya bi zimanê zikmakî dikete lîteratura siyasî ya Osmanî. Ev ji bo kurdan û hêmanên din ên Osmanî we'deke mezin bû ku daxwaz dikirin. Bo nimûne, di sala 1908an de Seîdê Kurdî ji bo kurdan vekirina dibistanên seretayî ji hikûmetê daxwaz dikir.<sup>201</sup> Piştî Şerê Cihanê, ku Osmanî têk diçe û serekên ITCê direvin, wê KTCê li ser navê kurdan bi HIFê re peymaneke muxtarîyetê/otonomiyê ji îmze bike.<sup>202</sup> Divê em bibêjin ku serekê KTCê Seyîd 'Ebdulqadir Efendî wextekî endamê navenda giştî ya HIFê bû.<sup>203</sup> Lê namzetiya Huseyn Kenan Paşa jî, ev polîtîkayên HIFê jî, nayên wateya ku kurdan ITCê bi temamî berdaye. Di vê hilbijartina 1912an de Babanzade İsmail Heqqî li Bexdadê, Pirinççizade Arîf jî li Diyarbekirê namzetên ITCê ne û herdu jî dibin mebûs. Lê Huseyn Kenan Paşa ji ber zextên ITCê

---

198 Bnr. Koç, "Siird Sancağı'nda 1912 Seçimleri Toplumsal Dinamikler ve Politik Farklılaşmalar", r. 289-306.

199 Ali Birinci, *Hürriyet ve İtilaf Fırkası*, ç.2, weş. Dergâh, İstanbul, 2012, r. 64, 69.

200 Birinci, hb., r. 296.

201 Akpınar û nd., "Bir II. Meşrutiyet Gazetesi Olarak Şark ve Kürdistan", r. 18.

202 Ji bo metnê peymanê bnr. Bayrak, *Kürtler ve Ulusal-Demokratik Mücadeleleri*, r. 94-95.

203 Tarık Zafer Tunaya, *Türkiyede Siyasal Partiler Cilt: II Mütareke Dönemi*, weş. Hürriyet Vakfı, İstanbul, 1986, r. 321.

nayê hilbijartin.<sup>204</sup> Piştî hilbijartinan bi demek kurt wê Huseyn Ke-  
nan Paşa bimore û wê sûretê wî li ser bergê hejmara 3yan a kovara  
*Rojî Kurdê bê weşandin*.<sup>205</sup>

#### **2.1.1.4. Kurdîzade Ehmed Ramîz û Pirtûka Wî ya *Emîr Bedirxan***

Di vê demê de kesekî ji aliyê vegotina netewperweriya kurdî ve balê dikişîne jî Kurdîzade Ehmed Ramîz e. Kitêba wî ya bi navê *Emîr Bedirxan* û nivîsa wî ya bi sernavê “Reşbelek” ji bo dîroka netew-  
perweriya kurdî gelekî balkêş in. Ji ber ku “Reşbelek” di beşa sêyem a vê xebatê de wê bê lêkolînkirin, emê li vir behsa kitêba *Emîr Be-  
dirxan* bikin.

Di 23yê Adara 1906an de şaredarê Stembolê Ridwan Paşa, ku navbera wî û ‘Elî Şamil Paşayê Bedirxanî nexweş bû, ji aliyê çend kesên kurd ve tê kuştin. Tê îddiakirin ku di vê sûtîqesdê de bando-  
ra ‘Elî Şamil Paşa û ‘Ebdurezaq Bedirxan jî heye û ‘Elî Şamil Paşa kesên kujer hîmaye kirine. Piştî ku ev agahî digihîje ‘Ebdulhemîdê Duyem, ew jî biryara sirgûna tevahiya mêrên malbata Bedirxani-  
yan û hê gelek kesên din dide. Li gorî Malmîsanij jimara sirgûniyan nayê zanîn, hin çavkanî behsa sedan hetta hezaran dikin lê wî navê sed û heftê û heşt kesî tesbît kirine.<sup>206</sup> Li ser vê bûyerê Ehmed Ramîz kitêba *Emîr Bedirxan* dinivîse û di sala 1907an de li Misrê di çapxa-  
neya Ictihadê de çap dike, lê li ser kitêbê navê nivîskar Lutfî derbas dibe. Em ji îlaneke di kovara *Ictihadê* de hîn dibin ku Lutfî, navê mustear ê Ehmed Ramîz e.<sup>207</sup>

Ehmed Ramîz pêşî behsa serhildana Bedirxan Beg dike, wî û tekoşîna wî bilind dike. Balkêş e ku ew vê serhildanê ne weke

---

204 Koç, “Siird Sancağı’nda 1912 Seçimleri Toplumsal Dinamikler ve Politik Farklılaşmalar”, r. 296, 301.

205 *Di Sedsaliya Wê de Rojî Kurd 1913*, amd. Koma Xebatên Kurdolojiyê, r. 167.

206 Malmîsanij, *İlk Kürt Gazetesi Kurdistan’ı Yayımlayan Abdurrahman Bedirhan (1868-1936)*, r. 38.

207 Lutfî (Ahmed Ramiz), *Emir Bedirhan*, amd. Koma Xebatê ya di Çavka-  
niyên Osmanî de Kurd, weş. bgst, İstanbul, 2007, pêşgotin.

bûyereke herêmi yan ji eşîretî lê weke tevgereke kurdî dihesibîne.<sup>208</sup> Di vê beşê de gotina herî balkêş a Ehmed Ramîz derbareyê teklîfa îngilîzan de ye: Di dema serhildanê de îngilîzan teklîfa hikûmetê-ke serbixwe li Bedirxan Beg kiriye, lê bi gotina Ehmed Ramîz “wa esefa” yanî “mixabin” Bedirxan Beg ji ber hesasiyeta xwe ya îslamî ji bedêla serxwebûnê esareta Osmanî tercîh kiriye û ji ber vê yekê jî hem rehetiya wî xira bûye hem jî kurd di nav sefaletê de mane.<sup>209</sup>

Ehmed Ramîz paşê derbasî bûyera sirgûniya Bedirxaniyan dibe û li vir bi zimanekî tund ‘Ebdulhemîdê Duyem rexne dike. Di dawîya kitêbê de jî bi helbesteke tirkî bangî padişah dike. Şairê vê helbestê xwe wekî “kurê kurdan”, “lawê Bedirxan” bi nav dike û bi awayekî eşkere dibêje ku ew ji siltan re serê xwe natewîne.<sup>210</sup> Piştî vê helbestê, lîsteya çil kesên sirgûnkirî û herî dawî jî beşa 5an a *Mem û Zînê*, ew beşa ku li ser zimanê netewperwerên kurd bûye sirûdeke netewî, di kitêbê de cih digire.

### 2.1.1.5. Zextên ITCê Li Ser Civata Hêvî

Di mînaka KNMCê de jî me dît ku komeleyên kurdî yên kulturî jî ji aliyê ITCê ve siyasî û cudaxwaz têne hesibandin û astengkirin. Mînakeke balkêş a vê dewrê jî girtina Mehmed Salih Bedirxan e. Ji rojnameya *Tercuman-i Hakikat* [*Tercumanê Heqîqet*, No. 11687, r. 3] em hîn dibin ku Mehmed Salih Bedirxan ji ber naveroka nivîseke xwe ya kurdî ya di *Rojî Kurdê* de ji aliyê hikûmeta leşkerî ve tê dari-zandin û girtin. Nûçeya rojnameyê wiha ye:

“Bedirhânzâdelerden M. Salih Bedirhânî ba’z makasîd-ı hâ’inân-eyi Kürdce olarak *Rojî Kurd* ile neşr eylediğinden hükûmet-i

208 Lütflî (Ahmed Ramiz), hb., r. 25.

209 Lütflî (Ahmed Ramiz), hb., r. 40.

210 Lütflî (Ahmed Ramiz), hb., r. 58. Ev helbest cara pêşîn di rojnameya *Um-mîd* de, ya ku ji aliyê Mehmed Salih Bedirxan ve li Qahîreyê dihate we-şandin, hatiye belavkirin: “Hitâb-i Mûr be Suleyman”, j.2 (1 September/Îlon 1900), r. 3. Li gorî Malmîsanij muhtemelen ev helbest a Mehmed Salih Bedirxan e, lê Kurdîzade Ehmed Ramîz gava veguhastiye hin gu-hertin tê de kirine. Bnr. *Abdurrahman Bedirhan ve İlk Kürt Gazetesi Kur-distan Sayı: 17 ve 18*, r. 42-43.

‘askeriyeyece taharrî idilmekde idi. Dûn merkum tevkîf idilerek Dîvân-i Harb-i ‘Örfî tevkîfhânesine gönderilmiştir.”<sup>211</sup>

[Mehmed Salihê Bedirxanî yê ku ji ber hin meqsedên xainane bi kurdî di *Rojî Kurdê* de weşandibûn ji aliyê hukûmeta ‘eskerî ve derbarê wî de biryara derdestkirinê hebû, duh hate girtin û berê wî dane girtîgeha Dîwana Herba Orfî.]

Memdûh Selîmbegî jî di nivîseke xwe ya derbareyî Civata Hêviyê de behsa zextên ser wan dike. Ev nivîs li ser gotareke di kovara *Near East* de ji bo parastina *Rojî Kurd* û Civata Hêviyê hatiye weşandin. Memdûh Selîmbegî dibêjê ku Hêvî jî wekî komeleya “Muntediya’l-Edebî” ya ‘ereban, “Başkim”a ernewûdan li hemberî turanîzmê ji bo parastina hebûna civaka xwe hatiye avakirin û li hemberî hikûmetê bi wêrekî tevgeriyaye.<sup>212</sup> Jixwe eger bi wêrekî tevnegeriyaba *Rojî Kurd* nedihate girtin, mudîrê wê jî di hebsan de perîşan nedibû.<sup>213</sup>

Em dibînin ku gelên Osmanî yên ne tirk li hemberî polîtîkaya tûranîzmê refleksê nîşan didin û ji bo parastina nasnameya xwe, xwe bi rêxistin dikin. Ciwanên kurd jî bi heman armancê Civata Hêvî ava dikin. Memdûh Selîmbegî jî diyar dike<sup>214</sup> û di nivîsên *Rojî Kurd* û *Hetawî Kurd* de jî xuya ye ku ev komele bi siyasetê re ‘eleqedar nebûye, daxwazeke polîtîk nekiriye, tenê di warê zanîn, çand, sin’et û perwerdeyê de ji bo pêşveçûna kurdan bernameyek amade kiriye lê bi vî halê xwe jî ji zextên hikûmeta ITCê xilas nebûye.

Diyarbakirli Tewfîk Hemîd Beg, bi munasebata salvegera avakirina Civata Hêviyê de li ser navê xwendekarên kurd axaftinekê dike û dibêje “berî vê bi heşt salan sê-çar xwendekar, bi rêberiya kesekî birêz li qurçikeke Halkali Zira‘at Mektebiyê bingeha Hêviyê saz dikirin. Di nav tunebûn û mehrûmiyê de bi hêza xwe ya ji hêvî û bawerîya xwe werdigirtin bo nîşandana hebûnekê dixebitin. *Rojî Kurd* derxistin; bi derbeke îstîbdatê hate girtin, ciwanek bi mehan

---

211 vgz. *Di Sedsaliya Wê de Rojî Kurd 1913*, amd. Koma Xebatên Kurdolojiyê, r. 59.

212 Heman tiştî Zinar Silopî jî dibêje. Bnr. *Doza Kürdistan*, r. 189.

213 Ji bo tîpguhêziya nivîsê bnr. Malmîsanîj, *Yirminci Yüzyılın Başında Diyarbakir’de Kürt Ulusçuluğu (1900-1920)*, r. 85-87.

214 Malmîsanîj, hb., r. 87.

di hepisxaneyan de şepirze bû. Yeke din, *Hetawî Kurd* derxistin. Fermî, nefermî çu gef û astengî ew ji rêka wan venegerand.”<sup>215</sup>

Pêşketina nasnameya kurdî, li navenda împaratoriye; bi komele, rojname û kovarên xwe xuyakirina kurdan mumkun e ku hin derdor aciz kiribin. Di gelek nivîsên berî Şerê Cihanê yê Yekem de nivîskar weke ku xwe ji van rexneyan biparêzin fikra îslamiyetê û osmanîtiyê didane pêş. Di *Rojî Kurdê* de Kerkuklu Necmeddîn dibêje ku “Armanca ewil a komeleyan qewîkirina dilsoziya gelê xwe bi xilafetê re ye, ji bo nîfşên nû û yê bîr ji wan hayedar bibin ezê derbareyê xizmetên kurdan yên ji xilafetê re gotaran binivîsim.”<sup>216</sup> Di *Hetawî Kurdê* de jî Babanzade Îsmail Heqqî Beg, dibêje ku kurd berî her tiştî misilman, dûvre osmanî û di dereceya sêyem de jî kurd in.<sup>217</sup> Li gorî Îsmail Heqqî, nivîsandina ziman nayê wateya “nasyonalite”yê û jixwe di îslamiyetê de qewmîyetperestî qedexe ye.<sup>218</sup> Di vî warî de dîsa di *Rojî Kurdê* de ‘Ebdullah Cevdet anekdoteke balkêş vediguhêze:

“(Rojî Kurd) mecmû‘asîni, yazî masamîn üzerinde gören bir muhterem ve mu‘azzez dostum birden bire nedir bu mecmû‘a? Dedi. Ben “Kürdölöcyä” “organ”ı ya’nî Kürdlük hakkındaki tedkîkât-ı ictimâ‘iyye ve ‘ırkıyyenin vâsıtâ-ı neş-rîdir dedim. Arkadaşım mecmû‘ayı açdı, gözü Kürdce bir makâleye tesâdüf idince: “Mâdâm ki Türkce değil, mâdâm ki Kürdcedir “tefrika” gazetesini demektir” diyerek “Rojî Kurd”ü masamîn üzerine bıraktı.”<sup>219</sup>

[Dostekî min ê birêz û hêja dema kovara Rojî Kurd, li ser masaya min a nivîsê dît, ji nişka ve got: “Ev çi kovar e?” Min got: weşana “kurdolojî” ye yanî navgîna weşana vekolînên civakî û nîjadî yê derbareyê kurdan de ye. Hevalê min kovar vekir, gava çavê wî bi nivîsareke kurdî ket, got: “Madem ne bi

---

215 Bozarslan, *Jîn Kovara Kurdî-Tirkî 1918-1919*, c. V, r. 1000-1001.

216 *Di Sedsaliya Wê de Rojî Kurd 1913*, amd. Koma Xebatên Kurdolojiyê, r. 102.

217 Babanzade Îsmail Heqqî, “Kürdler ve Kürdistan”, *Hetawî Kurd*, j.3 (29 Kanûniewwel 1329/11 Çile 1914), r. 4.

218 *Di Sedsaliya Wê de Rojî Kurd 1913*, amd. Koma Xebatên Kurdolojiyê, r. 138-139.

219 *Di Sedsaliya Wê de Rojî Kurd 1913*, amd. Koma Xebatên Kurdolojiyê, r. 139.

tirkî ye, madem bi kurdî ye, ev rojnameya ‘cudaxwazî’ yê ye”  
û danî ser maseya min.]

Dostê Ebdullah Cevdet, bêyî ku naveroka nivîsê bipirse, sirf ji ber ku kurdî ye *Rojî Kurdê* “cudaxwaz” îlan dike. Hal ew e ku, wekî me li jor jî behs kir, di *Rojî Kurd*, *Hetawî Kurd* û *Bangî Kurdê* de bi qasî kurdîtiyê giraniya osmanîti û îslamîtiyê jî heye. Lê xuya ye ev ji bo dostê Ebdullah Cevdet ne girîng in. Ev bertek jî nîşanê me dide ku êdî naverok her çî be bikaranîna zimanê kurdî bi xwe polîtîk e û tirkperestan aciz dike.<sup>220</sup> Civata Hêvî di nav vê atmosferê de heta Şerê Cîhanê xebatên xwe yên kurdî dewam dike.

### 2.1.2. Dema Şerê Cîhanê yê Yekem

Dî dîroka kurdan de şikestineke mezin jî Şerê Cîhanê yê Yekem e. Ev şer bi hemû êş, zilm û xirabkariya xwe bandoreke mezin li kurdan dike. Warê kurdan ku bi salan bûbû qada şerê Osmanî û Sefewî, di dema şerê cîhanê de jî di bin lingên artêşên osmanî, îngilîz û rûs de diperçiqe. Ji aliyekî ve leşkerên kurd di eniyên şer de dimirin li aliyê din kurdên sîvîl şerpeze û koçber dibûn.

Bi taybetî li herêma Serhedê şerekî dijwar di navbera artêşa Osmanî û Rûsyayê de diqewimî. Di vî şerî de milîsên kurd bi artêşa Osmanî re, yên ermenî jî bi artêşa Rûsyayê re bûn. Ji ber şikestina hêzên Osmanî, Erzirom, Wan, Bedlîs û Mûş dikevîne bin destê Rûsyayê. Ji ber vê yekê jî bi hezaran kurd mihacir dibin.<sup>221</sup>

Mihacirbûna kurdan esasan ji ber dagirkirina rûsan a bi piştgiriya komên çekdar ên ermeniyan pêk tê. Lê desthilatdariya ITCê, bi destê “Aşa’ir ve Muhacirîn Mudîriyeti [Mudîriyeta Eşîran û Mihaciran]”<sup>222</sup> vê facîayê ji bo endazyariya civakî diemilêne. Ew

---

220 Ji serdema klasîk heta serdema modern nêrîna ‘ulema û minewerên Osmanî li zimanê kurdî guheriye. Ji bo agahiyên zêdetir li ser vê mijarê bnr. Arslan, “Ulemadan Münevvere Osmanlı Müelliflerinin Yerel Dillere Bakışı (Kürtçe Örneği)”, r. 250-277.

221 Sinan Hakan, *Türkiye Kurulurken Kürtler (1916-1920)*, ç.2, weş. İletişim, İstanbul, 2013, r. 19-23, 30-35.

222 Ji bo armanca vê mudîriyetê bnr. Serhat Bozkurt, *Bir Toplumsal Mühen-*

bi îskankirina muhacirên kurd ên li Enedola Navîn û bi astengkirina vegera wan li warê xwe, dixwaze demografiyê biguherîne. Di vê dewra şerê cihanê de bi sed hezaran kurd bi awayekî sistematîk ji warên xwe hatine koçberkirin.<sup>223</sup> Celadet Alî Bedirxan bi xwe di arşivên vê saziyê de lêkolîn kiriye. Li gorî wî 650 hezar kurd li rojavayê Enedolê hatine koçberkirin. Xelkê hatî koçberkirin di rê de pir şerpeze bûye, piraniya wan mirine, ê sax jî di halekî pir xirab de ne.<sup>224</sup> Celadet di nivîsarên xwe yên *Serbestîyê* de jî gelekî li ser vê facîayê disekine. Herwiha ew ji rêzîknameya xefî/veşartî ya vê mudîriyeti jî agahdar e û çend maddeyên wê di nivîseke xwe de rêz dike:

“Kürd muhâcirleri memleketlerine i’ade edilmeyecektir. Kürdlerin iskâmı için dâire-i memûriyetiniz dâhilinde ne gibi müsâ’id arâzî ve kurâ vardır? Muhâcirîn-i mezkûre hâricle ihtilâtan memnûdur. Kürd muhâcirîninin taksîmî meselesinde nazar-ı dikkate alınacak en esâslı nokta merkûmundan on hânedan kesretli olarak bir noktada ictimâ’ına imkân vermemektir.”<sup>225</sup>

[Mihacirên kurdan li welatên xwe dê neyêne vegerandin. Ji bo îskankirina kurdan di bin emrê we de çi erd û gundên musaîd hene? Qedexe ye ku ev mihacir bi derve re tevlihev bibin ango têkilî deynin. Di dabeşkirina mihacirên kurd de qaîdeya bingehîn ev e ku derfet neyê dayîn ku ji deh malan zêdetir li ba hev bicivin.]

Kurdistan Te’alî Cem’iyyeti [Komeleya Bilindkirina Kurdistanê-KTC], bi rewşa muhacirên kurd re gelekî ‘eleqedar dibe. Derbareyê wan de di weşanên wê de gelek nivîs têne weşandin, endamên KTC, bi rayedarên Osmanî re li ser vê meseleyê gelek caran diaxivin.

---

*dislik Kurumu Olarak Aşâir ve Muhacirîn Müdiriyyet-i Umumîyyeti*, teza lîsansa bilind, Mimar Sinan Güzel Sanatlar Üniversitesi, İstanbul, 2013.

223 İsmail Göldaş, *Kürdistan Te’alî Cemiyeti*, ç.2, weş. Doz, İstanbul, 1991, r. 119-120.

224 Celadet Alî Bedirxan, *Mustafa Kemal’e Mektup*, weş. Avesta, İstanbul, 2012, r. 37. Celadet Alî Bedirxan, di berhemeke xwe ya din de hejmara penaberan 700 hezar dibêje. Bnr. *De la question Kurde/Kürt sorunu üzerine*, wer. T. Doğan, weş. Avesta, İstanbul, 1997, r. 18.

225 Arslan, “Serbestî Gazetesi (1918-1919) ve Bedirxanîler: Celadet Alî Bedirxan’ın Yazıları ve Kürtlere Dair Bazı Haberler”, r. 406.

Herwiha di rojnameya *Serbestîyê* de jî gelekî li ser vê mijarê gelek nûçe têne weşandin.<sup>226</sup>

Mihacirkirina bi sed hezaran kurdî bi destê ITCê faciayeke mezin e û bi rehetî em dikarin wekî tehcîra ermenîyan navê “tehcîra kurdan” lê bikin, hetta bi wê peyva ku ji kurdên êzîdî re bûye mu-semma, em dikarin jê re “firmana kurdan” jî bibêjin. Celadet Alî Bedirxan, yek ji şahîdên vê bûyerê, behsa êş û azarên wan mihacîran dike. Herwiha ew dibêje ku van êş û azaran tevgera kurd nese-kinandîye, berevajî wê fikra netewî di nav kurdan de geştir kiriye û tevgera kurdî bi coştir bûye.<sup>227</sup>

Di encama şer de Dewleta Osmanî têk çû. Hikûmeta ITCê îstîfa kir û qedroyên wê revîyan.<sup>228</sup> Ji bo sekinandina şer (mutareke) di navbera Dewleta Osmanî û Dewletên Îtîlafê de Peymana Mondrosê hat îmzekirin. Di xala 24. a vê peymanê de “Wîlayet-i Sîtte” ango Erzirom, Wan, Elezîz, Diyarbekir, Bitlîs, Sêwas wekî “şêş wîlayetên ermenîyan” derbas dibin û ev yek ji bo daxwazên ermenîyan dibe bin-geheke xurt.<sup>229</sup> Piştî vê êdî netewperwerên kurd bi rêya çapemeniya kurdî hewl didin ku kurdûna van bajaran îsbat bikin. Bo nimûne; îstatîstîkên nufûsê yên bajarê Wanê di kovara *Jînê* de têne weşan-din.<sup>230</sup> Rewşenbîrên wekî Kamiran ‘Alî Bedirxan<sup>231</sup>, Îhsan Nûrî<sup>232</sup> di nivîsên xwe de li ser vê meseleyê disekinin û bi tundî li dijî hikû-meteke ermenîyan a li van bajaran derdikevin. Serekê KTCê Seyîd ‘Ebdulqadir jî dibêje: “Damad Ferîd Paşa dixwest li wîlayetên şerqê Ermenistanekê ava bike, em li dijî vê derketin, me got ew der kurd in, emê heta dilopa dawî ya xwîna xwe li hember vê derkevin, wekî KTCê armanca me astengkirina avakirina Ermenistanê bû.”<sup>233</sup>

---

226 Arslan, “Serbestî Gazetesi (1918-1919) ve Bedirxanîler: Celadet Alî Be-dirxan’ın Yazıları ve Kürtlere Dair Bazı Haberler”, r. 422-431.

227 Bedirxan, *Mustefa Kemal’e Mektup*, r. 37-38.

228 Hakan, *Türkiye Kurulurken Kürtler (1916-1920)*, r.72

229 Hakan, hb., r. 76-78.

230 Bozarslan, *Jîn Kovara Kurdî-Tirkî 1918-1919*, c. III, r. 660-663.

231 Bozarslan, hb., c. II, r. 431-433.

232 Bozarslan, hb., c. III, r. 655-657.

233 Mehmet Bayrak, *Kürtler ve Ulusal-Demokratik Mücadeleleri*, ç.2, weş. Özge, Ankara, 2013, r. 154.

Dîrokzanekî tirk dibêje ku Şerê Cîhanê yê Yekem ji bo gelê tirk bi bîranînên xemgîn tije ye, lê vî şerî civaka tirk ber bi netewekî modern ve bir; berxwedana wî zêde, nasnameya wî tekûztir kir.<sup>234</sup> Gelo em dikarin heman tiştî ji bo kurdan jî bibêjin? Eger em şert û mercan berawirdî bikin êş û derdên ku kurdan kişandine ne kêmtir yên tirkên in. Di eniya şer de û di paşîya wê de her cure şepirzeyî bûye para kurdan jî. Em dibînin ku piştî şer êdî daxwazên aktîvistên kurdan netewîstir dibin; di vegotina wan de rengê osmanîtiyê kêmtir, ê kurdîtiyê zêde dibe. Naxwe em dikarin bibêjin ku şerê cîhanê nasnameya netewî ya kurdî kemiland û kurd ji tebayiya Osmanî ber bi netewbûnê ve bir. Daxuyaniya Encum Yamulkî xanim a ku li jêr emê behs bikin vê yekê piştrast dike.

### 2.1.3. Piştî Şerê Cîhanê yê Yekem

Piştî Şerê Cîhanê gelek tişt diguherin, ev guhertin tesîra xwe li ser kurdan jî dike. Bi gotina Mehmed Emîn Zekî Beg, “rewşenbîr û lawên kurd, piştî Şerê Cîhanê yê Yekem faalîyetên xwe zêdetir kirin.”<sup>235</sup> Berî her tiştî piştî şer komeleyên kurdan ji nû ve hatin avakirin û bi vî rengî tevgera kurdî ji nû ve dest pê kir. Lê taybetmendiyê komeleyên vê dewrê heye ku ew êdî bi siyasê re jî ‘eleqedar in. Jixwe ferqa herî mezin a vê dewrê ji ya beriya şerê cîhanê ev e. Êdî nûnerên kurdan daxwazên siyasî dikin û ji bo mafê kurdan bi dest bixin dixebitin. Naxwe em dikarin xebatên vê dewrê wekî yên siyasî û yên kulturî bikine du beş. Lê hewce ye em hê di destpêkê de bibêjin ku ev ji hev ne cuda ne, sedî sed bi hev re têkildar in, bandora wan jî li ser hev heye.

#### 2.1.3.1. Xebatên Siyasî yên KTCê

Piştî Şerê Cîhanê yê Yekem, rewşenbîrên kurd dîsa xwe bi rêxistinê dikin û êdî ne tenê komeleyên kulturî û perwerdeyî herwiha yên

234 İlber Ortaylı, *İmparatorluğun Son Nefesi Osmanlı'nın Yaşayan Mirası Cumhuriyet*, ç.2, weş. Timaş, İstanbul, 2014, r. 145.

235 Mihemed Emîn Zekî Beg, *Dîroka Kurd û Kurdistanê*, wer. Z. Avci, ç.2, weş. Avesta, Stembol, 2012, r. 222.

siyasî jî ava dikin. Di vê dewrê de komeleya ku mafên kurdan ên siyasî diparast KTC bû: KTC, li gorî Prensîbên Wilson tevdigeriya û armanca wê ji bo kurdan bidestxistina statuyeke fermî bû. Nêrînên KTCê nerm bûn û wan bi HIFê re li ser muxtariyeta kurdan di nav sînorên Osmanî de peymanek jî îmze kiribûn.<sup>236</sup> KTCê ji bo statuya kurdan bi nûnerên Brîtanya, Frensa, Îtalya û Emerîkayê re jî hevdi-tinan çêdike.<sup>237</sup> Herwiha ji bo parastina mafên kurdan di Konferan-sa Aştiyê ya Parisê de Şerîf Paşa wezîfedar dike.<sup>238</sup>

Şerîf Paşa di 20ê Kanûna 1919an de li Parisê bi nûnerên erme-niyan re hevdi-tinekê dike û di encama wê de jî herdu alî daxuya-niyeke hevpar didin.<sup>239</sup> Ev yek wekî hevbendiya kurd û ermeniyan di çapemeniya Stembolê de cih digire û dibe sedema nerazîbûnê. Piştî lihevkirina Şerîf Paşa û nûnerê ermeniyan Bogos Nubar Paşa li Meclîs-i Mebûsana Osmanî, ku piraniya mebûsên wê alîgirê Mistefa Kemal bûn, gelek nîqaş û nerazîbûn çêdibin. Bi taybetî Şerîf Paşa û Seyîd ‘Ebdulqadir ji tîrên wan re dibine armanc.<sup>240</sup> Ji aliyê din Mis-tefa Kemal jî hewl dida ku KTCê di nav kurdan de bêbandor bike.<sup>241</sup>

Piştî van rexneyên tund di nîsana 1920an de Şerîf Paşa ji Monte Carloyê telgrafekê dişîne Stembolê û îstîfaya xwe ya ji nûnertiya kur-dî beyan dike. Di telgrafê de Şerîf Paşa dilsoziya xwe ya ligel meqamê xîlafetê angî padişahê Osmanî teqez dike û beyan dike ku wî ji bo ku ev dilsozî bi fikrên “iftiraqçûyane” angî cudaxwaz, lekedar nebe ji

---

236 *Kürdistan Tarihi*, ed. M.S. Lazarev&Ş.X. Mihoyan, wer. İ. Kale, ç.3, weş. Avesta, İstanbul, 2010, r. 206; ji bo metnê peymanê bnr. Bayrak, *Kürtler ve Ulusal-Demokratik Mücadeleleri*, r. 94-95.

237 Bozarslan, *Jîn Kovara Kurdî-Tirkî 1918-1919*, c. I, r. 118. Hevdi-tina bi lijneya Amerîkî re di çapemeniya Osmanî ya wê demê de jî cih digire. “Amerikan Hey’eti Bugün Tahkîkata Devam edecek”, *Vakit*, No: 635 (4 Ağustos 1335/4 Tebax 1919), r. 1. Ji bo tîpguhêziya beşek ji vê nûçeyê bnr. Göldaş, *Kürdistan Te’ali Cemiyeti*, r. 310.

238 *Kürdistan Tarihi*, ed. Lazarev&Mihoyan, r. 206.

239 Hb., r. 206. Ji bo metnê peymana ku Şerîf Paşa, Bogos Nubar û H. Ohan-canyan îmzekirî bnr. Göldaş, *Kürdistan Te’ali Cemiyeti*, r. 268.

240 Göldaş, *Kürdistan Te’ali Cemiyeti*, r. 210-211.

241 Göldaş, hb., r. 224.

serektiya heyeta kurdî îstîfa kiriye.<sup>242</sup> Balkêş e, di heman rojnameyê de, ku ev telgraf tê de hatî weşandin, tê gotin ku di Konferansa San Remoyê de, ku ji bo rewşa Dewleta Osmanî û amadekariya peymana Sewrê hatibû lidarxistin, meseleya Kurdistanê hel (çareser) bûye.<sup>243</sup> Xuya ye hem di nav nûnerên kurdan de hem jî di navbera nûnerên kurdan û rayedarên Osmanî de rewşeke aloz heye, lê pirsgirêka statuya kurdan êdî ketiye rojeva navnetewî. Di atmosfereke wiha de, piştî çend mehan peymana Sewrê tê îmzekirin.

Tevî van dijberiyên ji derve, di nava KTCê de jî nakokî hebûn: Neqşeya ku Şerîf Paşa wekî nûnerê kurdan pêşkêşî konferansê kiribû beşek ji endamên KTCê jî aciz dike, ji ber ku di vê neqşeyê de gola Wanê di nav Ermenistanê de xuya dike. Li ser vê yekê Emîn Alî Bedirxan neqşeyeke nû pêşkêşî konferansê dike.<sup>244</sup> Piştî hevpeyvîneke serekê KTCê Seyîd ‘Ebdulqadir, ku di vê hevpeyvînê de Seyîd ‘Ebdulqadir ji bo kurdan tenê mafê muxtariyetê dixwaze<sup>245</sup>, komele dibe du parçe. Ji nûçeyêke *Serbestîyê* em hîn dibin ku ji ber cuda-tiya fikrî, ji siyan duduyê endamên KTCê îstîfa kirine.<sup>246</sup> Berî vê bi demeke kurt jî nozdeh şaxên komeleyê ji aliyê Wezareta Karûbarên Navxwe ve hatibûn girtin<sup>247</sup> û dawîya dawî hikûmeta Osmanî navenda KTCê jî digire.<sup>248</sup> Girtina wê di nusxeya 11ê Hezîrana 1920an a

242 “Şerîf Paşa Kürd Hey’et-i Murahhasası Riyâsetinden İstifâ Ediyor”, *Vakit*, No. 882 (24 Nisan 1920), r. 1.

243 “Konferansın Mukarreratı”, *Vakit*, No. 882 (24 Nisan 1920), r. 1.

244 Ji bo neqşeya Şerîf Paşa û ya Emîn Ali Bedirxan bnr. Özoğlu, *Dewleta Osmanî û Neteweperwerên Kurd*, r. 64-65.

245 “Bugün Kürdlerle mütemekkin [Kürtlerin oturduğu] beş, altı vilâyet vardır. Hükûmet bu vilâyetlere muhtâriyet versin.” “Kürdler ve Osmânlılık”, *İkdam*, No: 8278 (27 Şubat 1336/20ê Sibata 1920an), r. 2. Ji bo tîpguhêziya vê hevpeyvînê bnr. Malmîsanij, *Yirminci Yüzyılın Başında Diyarbekir’de Kürt Ulusçuluğu (1900-1920)*, r. 106-108.

246 “Da’vet”, *Serbestî*, No:597 (22 Nisan 1920), r. 3. Ji bo tîpguhêziya temamê vê nûçeyê bnr. Malmîsanij, *Yirminci Yüzyılın Başında Diyarbekir’de Kürt Ulusçuluğu (1900-1920)*, r. 115.

247 Malmîsanij, *Yirminci Yüzyılın Başında Diyarbekir’de Kürt Ulusçuluğu (1900-1920)*, r. 122.

248 Göldaş, *Kürdistan Teâlî Cemiyeti*, r. 226.

rojnameya *Ikdam* [*Îqdam*] de tenê bi hevokekê tê ragihandin: “Kurd Te’alî Cem’iyyetinin seddine hukûmetce karar verilmiştir. [Ji aliye hikûmetê ve biryara girtina KTCê hatiye dayîn.]”<sup>249</sup>

### 2.1.3.1. Xebatên Siyasî û Dîplomatîk ên KTCê

Ew kesên ku ji KTCê îstîfa dikin bi serektiya Emîn Alî Bedirxan komeleyeke nû ava dikin: Kurd Teşkilat-ı İctima’iyye Cem’iyyeti [Komela Rêxistina Civakî ya Kurdistan-KTIC]. Li gorî Qedrî Cemîlpaşa, di nava vê komeleyê de Ekrem Cemîlpaşa, Memdûh Selîmbegî, ‘Ebdullah Cevdet, Kemal Fewzî, Mewlânzade Rif’et, ji malbata Babaniyan Şukrî, Fuad û Hikmet, Kerkuklu Necmeddîn, Dr. Mehmed Şukrî û Ferîd Begê Bedirxanî cih digirtin û endamên vê komeleyê serxwebûnîxwaz bûn.<sup>250</sup>

Serekê KTCê Emîn Alî Bedirxan, li ser armancên komeleyê daxuyaniyekê dide çapemeniya Osmanî. Li gorî vê daxuyaniyê, rewşenbîr û pêşengên kurdan bi paldana îradeyê miletê kurd û arîkariya Xwedê, ji bo ku hemû sazîbûn û rêxistinbûyîna civakî ya li gorî vê sedsalê li welatê kurdan pêk bînin, KTIC ava kiriye. Komele ji bo hurriyet û refaha civaka kurdan hatiye avakirin û armanca wê ya esasî di nav miletên cîhanê de, bilindkirina miletê kurd e ku kurd di nav civata miletan de bibine miletekî rêzdar û xwedî rêz li mafê xwe, bi taybetî di nav sînorên xwe yên xwezayî û netewî de bi cîranên xwe re têkiliyên aştiyane dideyne, bibe miletekî bîrêwer, rewşenbîr û parçeyekî mirovayetiye yê medenî.<sup>251</sup>

KTC û KTIC, nîşanî me didin ku aktivîstên kurd êdî polîtîk in û daxwazên wan ên siyasî hene. Di vê çarçoveyê de asta herî bilind bi navê kurdan avakirina partiyê siyasî bû û ew jî di vê dewrê de pêk tê: Kurd Millet Firkasi [Partiya Milet a Kurdistan-KMF]. Ji rojnameyeke

249 “Kürd Te’alî Cem’iyyetinin Seddi”, *Ikdam*, No:8379 (11 Haziran 1920/11ê Hezîrana 1920an), r. 2.

250 Silopî, *Doza Kürdüstan*, r. 59.

251 “Kürd Teşkilât-ı İctimâ’iyye Cem’iyyeti”, *Vakit*, No:911 (7 Haziran 1920/7ê Hezîrana 1920an), r. 2. Ji bo bi zimanê tirkîya îro ya vê daxuyaniyê bnr. Malmîsanîj, *Cizira Botanlı Bedirhaniler*, r. 162-163; Mehmet Bayrak, *Kürtler ve Ulusal-Demokratik Mücadeleleri*, r. 103-104.

wê dewrê em hîn dibin ku ciwanên kurd ên rewşenbîr û tehsîla bilind kirî, ji bo avakirina partiyeke bi navê KMFê bername û rêziknameya xwe teslîmî rayedaran kirine û beşeke mezin a kurdan alîgirê vê partyê ne.<sup>252</sup>

Di encama Kongreya Aştiyê ya Parisê de peymana Sewrê tê îmzekirin (10 Tebax 1920). Di vê peymanê de qismê sêyem de sê madde (62, 63, 64) derbareyê kurdan de ne. Li gorî vê peymanê, ji çemê Firatê heta sînorê Îranê wekî herêma Kurdistanê tê pejirandin. Eger saleke din kurd bixwazin û Konseya Komeleya Netewan (navê berê yê Neteweyên Yekbûyî ya îro) jî qebûl bike kurd dikarin serxwebûna xwe îlan bikin. Herwiha eger kurdên Mûsilê bixwazin ew jî dikarin tevî vê dewleta kurdan bibin.<sup>253</sup>

Di pêvajoya peymana Sewrê de, Kerkuklu Necmeddîn Huseyn Beg wekî serekê KTICê<sup>254</sup> derbarê rojevê de daxuyaniyeke berfireh dide rojnameya *Ileri* (24ê Hezîrana 1920an). Li gorî vê daxuyaniyê, “ew memnûn in, ji ber ku mafên kurdan jî di vê peymanê de cih girtine. Lê xemgîn in, ji ber ku yekîtiya netewî û sînorên xwezayî yên kurdan bi qasî ku hêvî dikirin li ber çavan nehatine girtin”. Dîsa li gorî Kerkuklu Necmeddîn, “Riha, Mêrdîn û herêmên nakokî yên wekî Wan û Bitlîsê jî Kurdistan in. Konferansê derbarê Wan û Bitlîsê de biryarek nestand, ev jî mafên kurdan tesdîq dike. Ji bo tevlibûna nav welêt salek dem dane kurdên Iraqê, ji ber vê ew pir memnûn in. Eger dewlet, ji avakirina hikûmeteke kurdî ya modern û medenî gumanbar bin, ew dê çavdêriya îngilîzan qebûl bikin. Ev jî armanc

---

252 “Kürd Millet Fırkası”, *Alemdar*, j.1516-116 (19 Temmûz 1335/1919), r.

1. Ji bo vê nûçeyê û çendêke din di çapemeniya Osmanî de derbarê KTC û KMFê bnr. Serhat Bozkurt, “Kürdistan Teali Cemiyeti ve Kürt Millet Fırkası İle İlgili Birkaç Haber”, *Kürt Tarihi*, j.33 (Temmuz-Ağustos-Eylül 2018), r. 14-15.

253 Ji bo metnê peymana Sewrê bi tirkî bnr. “Sevr Andlaşması”, dnd. Nihat Erim, *Devletlerarası Hukuku ve Siyasi Tarih Metinleri Cilt I*, Ankara Üniversitesi Hukuk Fakültesi, Ankara, 1953 r. 551-552.

254 Di çavkaniyan de serekê vê komeleyê wekî Emîn Ali Bedirxan derbas dibe lê di vê nûçeyê de ji bo Kerkuklu Necmeddîn “Kurd Teşkilat-ı İctima’iyye Cem’iyyeti Re’îsi” tê gotin.

û niyeta baş a kurdan nîşan dide. Ermenî eger di nav sînorên xwe yê netewî de hikûmeta xwe ava bikin, kurd jî dê bi wan re li hev bîn; lê eger herêmên ku piraniya wan kurd in jî daxwaz bikin, kurd wê wekî hemû netewên medenî tevbigerin. Dibêjin ermenî ji aliyê pêşveçûn û medenîbûnê ve ji kurdan pêşdetir in, lewre dikarin hikim li kurdan bikin. Li derve di nav kurd û ermeniyan de gelek kesên bijarte hene, lê li hundir ermenî ji kurdan pêşdetir nînin. Ermenî wekî Ewropîyan ne xwedî navgînên medenî ne. Kurd xwediyê çi mafî bin, kêmnîyên (eqeliyet/azınlık) welatê wan jî dê xwediyê heman mafan bin. Ew eynî tiştî ji ermeniyan jî hêvî dikin. Nûçeya girtina komeleya wan ne rast e. Hereketekê wiha di vî zemanî de wê gelek ecêb bimîne. Şewirmendê 'edlî yê Daxiliye (Wezareta Karên Navxweyî) hinek îtiraz kirine. Lê hewce ye hikmê qanûnê li gorî demê bin. Hakimên Romyê daîma di biryarê xwe de dem li ber çavan digirtin. Yê ku wiha nekin nikarin welatekî baş îdare bikin.”<sup>255</sup>

Nêrîna nûnerekî kurd li peymana Sewrê û çend mijarên rojevê wiha ye. Bi rastî ji vê daxuyaniyê tê fêmkirin ku KTIC, di nav “sînorên xwezayî û netewî” de hikûmetekê kurdan dixwaze. Belkî jî ew, komeleya pêşîn a kurdan bû ku daxwaza dewleteke modern ji bo kurdan dikir. Ji vî alî ve ew ne dişiibe KTTCê, ne jî KNMCê. Bo nimûne, di warê dîplomasiyê de karekî wan ê balkêş jî ev e ku Emîn ‘Alî Bedirxan û Memdûh Selîm di sala 1920an de ji bo pejirandina mafê kurdan ji Mr. Wilson re, serekê Dewletên Yekbûyî yê Amerîkayê, telgraf dikişînin.<sup>256</sup> Lê ev hewldan nagihine encamekê. Netewperwerên tirk peymana Sewrê qebûl nakin, şer dikin û di encamê de peymana Lozanê tê îmzekirin ku tê de navê kurdan jî derbas nabe.

255 “Kürdlerin Mütâlebi -Kürdistanın Vaz'iyeti - İngiliz Murâkabesi-”, *Ileri*, No:877 (24 Haziran 336/24ê Hezîrana 1920an), r. 1. Ji bo tîpguhêziya temamê vê daxuyaniyê bnr. Bozkurt, Kürdistan Teali Cemiyeti ve Kürt Millet Fırkası İle İlgili Birkaç Haber, r. 14-15.

256 “File 36/1919 Pt 3 ‘Kurdistan Policy & Situation’ [148r] (308/608)”, lînk: [https://www.qdl.qa/en/archive/81055/vdc\\_100000000419.0x0002a4](https://www.qdl.qa/en/archive/81055/vdc_100000000419.0x0002a4), 24.01.2025.

### 2.1.3.2. Xebatên Kulturî

Pîştî şer komeleyên kulturî jî dest bi xebatan dikan. Civata Hêvî ku ji ber şer xebatên xwe rawestandibûn ji nû ve dest bi kar dike. Di sala 1919an de, di beyannameya xwe de wiha behsa vê serdema nû dikan:

“Va civat, sala 328 de ji alîyê lepek feqîhê kurdan vebû. Berî me, yê ku di nav civatê de xebitîn wan gelek şixul dîtîn. Li wî zemanî de çavê Kurdistanê li vira bû. Çi çare kî Şerê Mezin hat; hinek ciwanê kurdan çûn seferê, hinek bela bûn. Îtîhad-çîyê xêrnexwazyar civat bela kirin. Îro ji me zarûyê kurda lazîm e ku wê civata mîbarek di nuh da bijînin. Îşte bi hîmmeta heval û feqîhê kurdan, me dîsa ji nuh da rakir. Em hêvî dikan kî dîsa bi hîmmeta hemû kurdan ew civata yê dewam bike. Meqseda me wekî berê ye: Feqîhê kurdan li hev din naskirin din, ji bêxwedîya ra yardim bikin, edebiyat û tarîxê kurdan qeyd û berhev bikin, sin’et, zîraet û tîcaretê wan pêşda bibin. Li boy vê şixulê ‘Civata Ta’mîm û Neşrê Mearîf’ vekir. Me va şixula mezin û bixêr li ser ustîyê xwe girtîye.”<sup>257</sup>

Wekî ku di bendê de jî tê gotin di vê dewrê de “Civata Ta’mîm û Neşrê Mearîf” ango bi navê xwe yê tirkî “Kurd Ta’mîm-i Ma’arîf ve Neşriyat Cem’iyyeti [Komeleya Belavkirina Zanîn û Weşanê ya Kurdan-KTMNC]” tê avakirin. Li gorî Amir Hassanpour, KTMNC komeleya pêşîn a weşangeriya kurdî ye.<sup>258</sup>

Ji nûçeyêke rojnameya *Serbestî* em hîn dibin ku di bin banê KTCê de “Kurd Asari Tedkîk Cem’iyyeti [Komeleya Lêkolîna Berhemên Kurdî-KATC]” hatiye saz kirin. Di vê nûçeyê de herwiha tê gotin ku vê komeleyê lêkolîna xwe ya li ser *Mem û Zînê* qedandîye û ev berhem li ber çapê ye.<sup>259</sup> Jixwe piştî vê nûçeyê bi demêkê *Mem û Zîn* li Stembolê ji aliyê KTMNC ve tê weşandin. Ji vê yekê tê fêmkirin ku KATC û KTMNC bi hev re têkildar in û berhemên ku wê KTMNC biweşîne ji aliyê KATCê ve dihatin qontrol kirin.

257 Bozarslan, *Jîn Kovara Kurdî-Tirkî 1918-1919*, c. V, r. 905.

258 Hassanpour, “Kürt medya kûltürünün yaratılması”, r. 101.

259 Arslan, “Serbestî Gazetesi (1918-1919) ve Bedirxaniler: Celadet Alî Bedirxan’ın Yazıları ve Kürtlere Dair Bazı Haberler”, r. 449.

Dîsa ji nûçeyeye *Serbestîyê* em hîn dibin ku “Neşr-i Ma‘arif Cem‘iyyeti” ango KTMNC, li ser mecmûaya helbestan a Xoce Qadir, bi navê xwe yê meşhûr Hacı Qadirê Koyî, ku sê hezar xezelan di hewîne lêkolînek daye destpêkirin. Piştî tenzîm û tesnîfa wê, dê berhemê bişînin çapxaneyê.<sup>260</sup> Lê me di çarçoveya vê xebatê de dîwaneke wiha nedît. Dibe ku ev berhema girîng temam nebûbe yan jî derfeta çapê nedîtibe.

Komeleye balkêş a vê dewrê jî Kurd Kadınları Te‘alî Cem‘iyyeti [Komeleya Bilindkirina Jinên Kurd-KKTC] ye. Memdûh Selîmbegî di *Jînê* de li ser vê komeleyê nivîsekê dinivîse.<sup>261</sup> Dîsa ji nûçeyeye di *Jînê* de em hîn dibin ku komeleyê di 20ê Hezîrana 1919an de bi xwendina mewlûdê dest bi xebatên xwe kiriye.<sup>262</sup> Xebateke din a komeleyê jî di roja duyemîn a cejnê de li Stembolê, li nexweşxaneyê Şişli Etfalê sinetkirina zarokên kurdan e. Komele herwiha musamereyekê (piyes) jî organîze dike.<sup>263</sup> Yavuz Selim Karakışla rêzîknameya vê komeleyê derbasî tîpên latînî kiriye û weşandiye. Li gorî vê armancên komeleyê; bi zihniyeteke modern temînkirina bilindkirin û geşedana jinên kurd, di jiyana malbatî de pêkanîna islahên bingehîn û civakî, ji sêwî û jinebiyên kurd re, ku ji ber koçberkirin û qetilkirinan şerpeze bûne, bi dîtina kar û arîkariya neqdî xilaskirina wan ji sefaletê ye. Komele ji bo bicihanîna van armancan wê serî li van rêbazan bide: weşandina rojname, kovar, kitêb û rîsaleyan, vekirina şax, xwendinxane û kitêbxaneyan, dayîna dersên serbest û konferansan.<sup>264</sup> Sereka vê komeleyê ne eşkere ye lê li gorî ku di bernameya mewlûdê de axaftinek kiriye em dikarin Encum Yamulkî

---

260 Arslan, “Serbestî Gazetesi (1918-1919) ve Bedirxanîler: Celadet Alî Bedirxan’ın Yazıları ve Kürtlere Dair Bazı Haberler”, r. 451; Mesut Arslan, “Hacı Qadirê Koyî: Serencema Dîwana Wî Li Stembolê û Hevaltiya Wî Bi Keyfî Re”, *The Journal of Mesopotamian Studies*, j.1 (2016), r. 94-95.

261 Bozarslan, *Jîn Kovara Kurdî-Tirkî 1918-1919*, c. IV, r. 853-856.

262 Bozarslan, hb., c. V, r. 932.

263 Bozarslan, hb., c. V, r. 1040.

264 Yavuz Selim Karakışla, “Kürt Kadınları Teali Cemiyeti (1919)”, *Toplumsal Tarih*, j.111 (Mart 2013), r. 24.

pêşeng bihesibînin.<sup>265</sup> Herwiha em ji rojnameyeke wê dewrê ya bi navê *Istiklal* [*İstıqlal*] hîn dibin ku KKTCê ev peywîr peşniyazî Leyla Xanimê, jina Şerîf Paşa, kiriye û wê jî qebûl kiriye.<sup>266</sup>

Di sala 2019an de nîzamnane ango rêzicknameya çapkirî ya KKT-Cê hat dîtîn û bi tîpguhêziya latînî, çapa wekxwe û herwiha bi wergera kurdî (kurmancî-kirmanckî) hat weşandin.<sup>267</sup> Bi vî rengî êdî em dizanin ku ew di nav pergala Osmanî de komeleyeke fermî bû. Li gorî rêzicknameyê meqsed û armanca komeleyê “Kürd kadınlığının ‘asrî zihniyetle te‘alî ve inkişafını te‘mîn etmek [bi hişmendiyeye nûjen bilindkirin û geşedana jinîtiya kurd]” bû.

Tevgera kurdî ya dema Osmanî ku zêdetir piştî Meşrûtiyeta Du-yem gur dibe pêşeng û rêvebirin wê giregirên kurdan bûn. Di mîna-ka Civata Hêvî de me dît ku ciwanan di ber giregiran re sefeke nû ava kir û tevlî xebatê bûn. Lê beşdarbûna jinan cara ewil bi KKTCê çêbû. Balkêş e, hemdemê KKTCê komeleyek bi navê Çerkes Kadın-ları Te‘alî Cem‘iyyeti<sup>268</sup> [Komeleya Bilindkirina Jinên Çerkes] jî heye. Hemdemî û hemnaviya wan nîşan dide ku ev herdu komele jî en-cama heman pêvajoyê ne. Lêkolînerê li ser herdu komelayan jî xebat kiriye û li gorî berawirdkirina bernameyên wan ew dibêje ku KKTC hêmanên cudaxwaz ên etnîkî di hewîne.<sup>269</sup>

Ji nû ve avakirina komeleyan, li ser çapemeniya kurdî jî bandor dike. Kovar û rojnameyên kurdî yên ku di pêvajoya şer de hatibûne

---

265 Ev axaftin paşê di *Jînê* de jî tê weşandin. Bnr. Bozarslan, *Jîn Kovara Kurdî-Tirkî 1918-1919*, c. V, r. 932-933.

266 vgz. Göldaş, *Kürdistan Teâlî Cemiyeti*, r. 79-80. Li gorî Rohat Alakom navê jina Şerîf Paşa di nûçeyê de xelet derketiye, navê wê yî rast Emîne ye. bnr. *Eski İstanbul Kürtleri*, r. 164.

267 Ekrem Malbat, *Kürt Kadınları Teali Cemiyeti ve Nizamnamesi*, weş. Nûbi-har, İstanbul, 2019, r. 55-84.

268 Derbareyê vê komeleyê de ji bo agahiyên zêdetir bnr. Yavuz Selim Ka-rakışla, “Çerkes Kadınları Teali Cemiyeti (1919)”, *Toplumsal Tarih*, j. 88 (nîsan 2001), r. 39-43.

269 “Kürt Kadınları Teali Cemiyeti’nin ayrılıkçı etnik unsurlar içermekte ol-duğu görülmektedir...” Yavuz Selim Karakışla, “Kürt Kadınları Teali Ce-miyeti (1919)”, r. 23.

girtin hin bi navên nû hin jî bi navê xwe yê berê dest bi weşanê dikan. KTMNC, kovara *Jînê diweşîne*. *Jîn*, kovareke kurdî-tirkî ye ku di navbera salên 1918-1919an de li Stembolê bi giştî bîst û pênc hejmarên wê hatine weşandin. Di hejmara dehemîn a *Jînê* de bernamêya vê komeleyê tê weşandin, di dawiya vê bernamêyê de jî tê gotin ku komeleyê, rêvebiriya *Jînê* girtiye ser xwe.<sup>270</sup> Berpirsiyariya *Jînê* Hemzeyê Muksî (bîst hejmarên ewil) û Memdûh Selîmbegî (pênc hejmarên dawî) kiriye.<sup>271</sup> Li gorî Mehmed Emîn Bozarslan, *Jîn* kovara nefermî ya KTCê bû.<sup>272</sup>

Tahir Baykuşak, li ser kovara *Jînê* tezeke lîsansa bilind amade kiriye û vegotina wê bi weşanên kurdî yên beriya wê re -wekî *KTG*, *Rojî Kurd*- berawirdî kiriye û li gorî teoriyên netewperweriyê analîz kiriye. Li gorî wî *Jîn*, di serdema mutarekeyê de ango di atmosfera piştî şerê cîhanê de quthûnekê siyasî temsîl dike. Di bedêla wê vegotina osmanîparêz û îslamî ya berê di *Jînê* de êdî netewperweriya kurdî serdest e.<sup>273</sup>

Nakokiyên di nav KTCê de bandora xwe li *Jînê* jî dikan û derketina hejmara wê ya 23yan dereng dikeve. Di vê hejmarê de tê gotin ku *Jîn* ji bo veguherîna rojnameyêke siyasî dixebite lê ji ber ku karên resmî hê neqediyane dîsa bi şiklê xwe yê kevin derketiye. Piştî hejmara 25an jî weşana *Jînê* radiweste û piştî ku KTIC ji KTCê veqetiya *Jîn* jî derbasî vê komeleyê bû.<sup>274</sup> Kovara *Jînê*, ji hejmara 26an pê ve dibe rojnameyêke hefteyî û êdî di formata rojnameyên rojane de bi çar rûpelên mezin tê weşandin. Di hejmara 33yan de ev agahî tê dayîn, paşê jî tê ravekirin ku vê rewşê mesrefa weşanê pirtir kiriye, lewre ji hejmara 26an pê ve hemû abonetî hatine betalkirin. Yê ku dixwazin abone bibin hewce ye salane 130, şeş mehane 70 qirûş bidin.<sup>275</sup> Halê hazir di destê me de hejmara 33 (9 Adar 1920) û ya 36an (21 Hezîran 1920) a rojnameya

270 Bozarslan, *Jîn Kovara Kurdî-Tirkî 1918-1919*, c. II, r. 470.

271 Bozarslan, hb., c. I, r. 98-99.

272 Bozarslan, hb., c. I, r. 9.

273 Tahir Baykuşak, *The Role of The Press in The Construction of Kurdish Collective Identity: A Case Study on "Jîn" Journal (1918-1919)*, teza lîsansa bilind, Istanbul Bilgi University, 2014.

274 Silopî, *Doza Kürdistan*, r. 59-60.

275 "Abone ve Kari'lerimize", *Jîn*, j.33 (9 Mart 1336/9 Adar 1920), r. 2.

*Jînê* heye ku ew di koleksiyona weşanên periyodîk a Hakki Tarik Us de ne.<sup>276</sup> Di van herdu hejmaran de, di bin navê rojnameyê de dinivîse ku *Jîn* rojnameyeke hefteyî ya siyasî û 'ilmî ye ku maf û yekîtiya netewî ya kurdan diparêze. Di van herdu hejmaran de piraniya nivîsan bê îmze ne. Nivîsên ku nivîskarê wan diyar in ên 'Ebdullah Cevdet, Kemal Fewzî, 'Ezîz Yamûlkî, Mardinli Îbrahîm Heqqî, Neviyê Hiso û helbestên 'Ebdurehîm Rehmî û Zaxoyî ne.

Ji bilî *Jînê* kovara *Kurdistanê* jî, ku bi berpirsiyariya Mehmed Şefîq Arwasî û Mehmed Mîhrî li Stembolê dihate weşandin, girêdayî KTCê bû. Li gorî hejmara ewil destpêka kovarê 30ê Çileyê 1919an e. Dîroka hejmara 19an jî 29ê Adara 1920an e. Ev kovar herî kêr nozdeh hejmar derketiye lê hejmara 17an winda ye. Jimarên din wekxwe li Silêmanî hatine weşandin<sup>277</sup> û li tîpên latînî hatine veguhastin.<sup>278</sup>

Di 1918an de Ekrem Cemîlpaşa li Diyarbekirê di çapxaneyê xwe de rojnameya *Gazî* çap dike.<sup>279</sup> Ev rojnameya kurdî çend hejmar hate weşandin, nayê zanîn û hîç nusxeyek wê jî li ber dest nîne.

Di vê dewrê de rojnameyeke balkêş jî *Serbestî* ye. Ev rojnameya Mewlanzade Rifet, herçendî tê de nivîsên bi kurdî nebin jî, di dewra 1918-1919an de bi naveroka xwe wekî rojnameya tirkî ya KTCê xuya dike. Bo nimûne; di jimara wê ya 2yê Gulana 1919an de

---

276 Lêkolînerê tirk Şukru Hanioglu di xebata xwe ya li ser 'Ebdullah Cevdet de (*Doktor Abdullah Cevdet ve Dönemi*, Üçdal Neşriyat, 1981) nivîseke wî ya di hejmara 32yan a *Jînê* de referans nişan daye. Li ser vê yekê me pê re têkilî danî. Wî di e-mailê de nivîsand ku dema lêkolînê ji sehafan desteyêke wê rojnameyê ya bi qasî 30 hejmarî peyde kiriye. Lê ji ber malbarkirina Amerîkayê ew dosya niha ne li ber destê wî ye. Wî fotokopiya nivîsa 'Ebdullah Cevdet a hejmara 32yan scan kir û ji me re şand. Herwiha soz da ku eger ew desteya rojnameya *Jînê* bibîne wê wekî diyarî bide kitêbxaneyê beşa kurdî ya Zanîngeha Mardin Artukluyê. Em jê re minetdar in.

277 Sidîq Salih-Reffîq Salih, *Govarî "Kurdistan"* (Estemûl, 1919-1920), weş. Binkey Jîn, Silêmanî, 2022.

278 Seîd Veroj, *Kurdistan (1919-1920)*, weş. Dara, Stenbol, 2023.

279 Ekrem Cemil Paşa, *Muhtasar Hayatım*, r. 31; Malmîsanîj&Mahmûd Lewendî, *Li Kurdistanê Bakur û li Tirkiyê Rojnamegeriya Kurdî (1908-1992)*, r. 288.

beyannameya KTCê, di jimarên wê yên 20 û 21ê Gulana 1919an de jî wergera muxtiraya Şerîf Paşa, ku ji aliyê KTCê ve wekî nûnerê kurdan li Kongreya Parîsê hatibû wezîfedarkirin, tê weşandin. Li gorî bîranînên yek ji şahidên wê dewrê Suleyman Tevfik, Mewlânzade Rif'et belavkarê fikra "Kurd Tealî Cemiyeti" bû û serekê vê komeleyê Şêx 'Ebdulqadir Efendî jî arîkariya *Serbestîyê* dikir.<sup>280</sup> Ji "Kurd Tealî Cemiyeti" mebest KTC ye, Şêx 'Ebdulqadir jî serekê KTCê Seyîd 'Ebdulqadir e.

Dîsa em dibînin ku di rojnameya *Serbestî* de gelek nivîsên Celadet û Kamiran Bedirxan hene: Ji 9ê Mijdara 1918an heta 21ê Gulana 1919an de 15 nivîsên Kamiran û 7 jî yên Celadet di *Serbestîyê* de tene weşandin; mijarên van nivîsan pirsgirêkên kurdan in.<sup>281</sup> Li gorî efserê îngilîz Edward William Charles Noel, Celadet edîtorê arîkar ê *Serbestîyê* bû.<sup>282</sup>

Di nusxeya 9ê Gulana 1919an a *Serbestîyê* de li ser rewşa dawî ya kovarên *Bangî Kurd, Kurdistan û Jînê* agahiyên kurt hene.<sup>283</sup> Ev yek bi xwe têkiliya van her çar weşanan nîşan dide: Tiştê ku wan her çaran digihîne hev kurdayetî ye û rêvebirê vê kurdayetiyê jî KTC ye.

Di vê dewrê de rojnameyeke din jî heye ku hewce ye em têkiliya wê ya bi tevgera kurdî re ronî bikin: Li gorî bîranînên Suleyman Tevfik, Celadet û Kamiran Bedirxan di rojnameya *Türkçe İstanbul* (1918, Stembol) a Said Molla de nivîskariya daîmî dikirin û dîsa li gorî wî, Said Molla, Celadet û Kamiran "İngiliz Muhibleri Cem'iyeti [Komeleya Hezkiriyên İngilîzan]" ava kiribûn; îdarexaneyê rojnameyê jî kiribûne navenda vê komeleyê.<sup>284</sup> Li gorî lêkolîna me

280 Süleyman Tevfik (Özzorluoğlu), *II. Meşrutiyet'ten Cumhuriyet'e: Elli Yıllık Hatıralarım*, amd. Ş. Özdemir-T. Yıldırım, weş. Dün Bugün Yarın, İstanbul, 2011, r. 514.

281 Arslan, "Serbestî Gazetesi (1918-1919) ve Bedirxanîler: Celadet Alî Bedirxan'ın Yazıları ve Kürtlere Dair Bazı Haberler", r. 453-454.

282 E. W. Charles Noel, *Kürdistan 1919 Binbaşı Noel'in Günlüğü*, wer. B. Birrer, ç.2, weş. Avesta, İstanbul, 2010, r. 108.

283 "Bangî Kurd, Kurdistan, Jîn", *Serbestî*, No: 490 (9 Mayıs 1919/9ê Gulana 1919an), r. 2.

284 (Özzorluoğlu), *II. Meşrutiyet'ten Cumhuriyet'e: Elli Yıllık Hatıralarım*, r. 513-514.

jî di temamê rojnameya *Türkçe İstanbul* de (289 jimar, 09.11.1918-25.09.1919) bi navê Celadet ‘Alî 4 , bi navê Kamiran ‘Alî jî 11 nivîs hene.<sup>285</sup> Hin nivîsên Kamiran di rûpelê pêşîn û di sitûna ewil de yanî wekî nivîsa sernivîskar hatine weşandin. Ev yek pozîsyona wî ya bilind nîşan dide.

Celadet, di vê rojnameyê de bi sernavê “Rûzname-i Harb” rêzenivîsek daye destpêkirin ku tê de bîranînên xwe yên şerê cîhanê vedibêje. Ew di destpêka vê rêzenivîsê de eşkere dike ku piştî beş bi beş weşandina di rojnameyê de niyeta wî wekî kitêb çapkirina van bîranînan e. Gelo ev bîranîn wekî kitêb çap bûne yan na, em nizanin. Îro li ber destê me berhemek wiha nîne lê bi saya vê rojnameyê qet nebe sê parçeyên rojnivîska şer a Celadet gihane îro.<sup>286</sup>

Ji Celadet û Kamiran pê ve, nivîsên ‘Ebdullah Cevdet jî di rojnameya *Türkçe İstanbul* de hene. Herwiha nivîsên derbareyê kurdan de û îlanek li ser kovara *Jînê* jî di vê rojnameyê de cih digire.<sup>287</sup> Ev hemû nîşanî me didin ku têkiliyên KTCê bi vê rojnameyê re, bi awayekî xwezayî bi xwediyê wê Said Molla re û îhtimaleke mezin bi Ingiliz Muhibleri Cem’iyyeti re jî hene. Lê gelo wekî ku Suleyman Tevfik dibêje Celadet û Kamiran di rêvebiriya vê komaleyê de cih girtine?

Lîsteya avakar û rayedarên bilind ên vê komeleyê li ber destê me ye.<sup>288</sup> Gava mirov bala xwe didiye navê Celadet û Kamiran di wan de derbas nabe. Ya rast mentiqen jî ev îhtimaleke dûr e. Çimkî gava em li van lîsteyan dinêrin, em dibînin ku ew hemû giregire paşa, siyasetvan û burokratên payebilind in. Ne mumkin e ku Celadet û Kamiran di nav wan de cih bigirin, ji ber ku ew hê di ‘emrekî

---

285 Arslan, “Serbestî Gazetesi (1918-1919) ve Bedirxanîler: Celadet Alî Bedirxan’ın Yazıları ve Kürtlere Dair Bazı Haberler”, r. 454-455.

286 Sernavê van bîranînên Celadet tevî jimar û rûpelên rojnamayê wiha ne: Çöl Hayatı: Develer (No: 129, r. 2), Geçit (No: 147, r. 2), Borazanın Kurşunu (No: 191, r. 2).

287 “Jîn-Hayât”, *Türkçe İstanbul*, No: 162 (11 Mayıs 1919/11ê Gulana 1919an), r. 2.

288 Bnr. Cengiz Dönmez, *Millî Mücadele’ye Karşı Bir Cemiyet: İngiliz Muhibleri Cemiyeti*, ç.2, Atatürk Araştırma Merkezi, Ankara, 2008, r. 65-69, 74-75, 145-149.

ciwan de ne û ne xwedyê meqam û unwaneke bilind in. Eger em endamtiya wan a vê komeleyê nîqaş bikin, hewce ye em pêşî vê agahiyê bizanin: İngiliz Muhibleri Cem'iyeti piştî ku ava bû, di nava sê mehan de hejmara endamên wê giha 53.000an.<sup>289</sup> Di destê me de wesîqeyek nîne lê mumkin e ku ji van hezaran endaman du heb jî Celadet û Kamiran Bedirxan bin. Nivîskariya wan a di rojnameya *Türkçe İstanbul*ê de vê ihtimalê xurttir dike.

### 2.1.3.3. Guherîna Zimanê Komeleyên Kurdî

Eger em bixwazin dîroka çapemeniya kurdî dabeş bikin, dikarin ji rojnameya *Kurdistan*ê (1898) heta Meşrûtiyeta Duyem dewra destpêkê; ji *Kurd Te'avun ve Terakkî Gazetesi*yê (1908) heta *Hetawî Kurd*ê (1914) dewra yekem bihesibînin. Piştî şerê cihanê êdî dewreke nû dest pê dike. Di vê dewra nû de kovarên bi navê *Jîn û Kurdistan* têne weşandin. Ew jî weke selefên xwe pirzimanî/zaravayî ne (kurmancî-soranî, tirkîya osmanî, car caran 'erebî û farisî) lê vegotina wan cuda ye. Ew şeweya *Kurd Te'avun ve Terakkî Gazetesi*yê ya helîm, vegotina îslamî ya *Rojî Kurd*ê li paş dimîne, çimkî rewşeke giran a siyasî li ber rewşenbîrên vê dewrê heye: Împaratoriya kal, ku heta niha kurdan bi zik û pişt parastina wê dikir, belav dibe û kurd ji bo çarenûsa xwe hewce ne biryareke dîrokî bidin. Ji ber vê yekê di weşanên vê dewrê de vegotina kurdaiyê bilindtir û bi biryartir e. Bo nimûne; 'Ezîz Yamulkî ji bo ciwanên kurd behsa welatekî dîrokî yê *şêş hezar salan* dike.<sup>290</sup> Dîsa di vê çarçoveyê de hewce ye em berê xwe bidine kovara *Jîn*ê û guh bidine axaftina sereka komeleya jinên kurd Encum Yamulkî. Çimkî ev axaftin ruhê dema xwe û di têkiliyên kurd û tirkan de qonaxa nû nîşanî me dide:

“Hanımefendiler, biz Kürdler, ihtilâfât-ı ümemi, “innemelmü'minûne ihvetun” nass-ı celîli ile bertaraf ederek, akvam-ı muhtelifeyi kardeşleştiren İslâmiyetin zuhurundan, yani asırlardan beri Türk milletinin en sadık bir muhibbi, en kavî bir dostu ve en zahîr bir kardeşi olarak bulunuyoruz. Bugün bütün milletlerin mukadderatı başka şekiller aldığı ve herkese bir hak

289 Dönmez, *Millî Mücadele'ye Karşı Bir Cemiyet: İngiliz Muhipleri Cemiyeti*, r. 72.

290 Bozarslan, *Jîn Kovara Kurdî-Tirkî 1918-1919*, c. V, r. 1040.

verildiği bir zamanda, bizler de kendi hakkımızı istiyoruz. Çün-  
kü ortada milyonlarla Kürd var ve büyük bir Kürdistan var.”<sup>291</sup>

[Xanimno, me kurdan, îxtîlafên navbera gelan bi ayeta pîroz  
a ku dibêje “mumîn encax birayê hev in” berteref kirine, ji  
zihûra îslamê ve ku qewmên cuda dike bira, yanî bi sedan  
salan em hezkiriyê herî dilsoz, dostê herî xurt û birayê herî  
xuyayî yên miletê tirk in. Di vê demê de ku çarenûsa hemû  
miletan şiklekî nû wergirtiye û ji herkesî re mafek tê dayîn  
em jî mafê xwe dixwazin. Lewre li ortê bi milyonan kurd û  
Kurdistaneke mezin heye.]

Pêşketina vegotina kurdaiyîyê, ku encama rewşa siyasî ya krîtîk  
e, bandora xwe li edebiyatê jî dike. Helbestvanên wekî ‘Ebdurehîm  
Rehmî, Qazîzade Mistefa Şewqî, Fadil Muxlîs, Diyarbekirli Fîkrî Nec-  
det, Silêman Bohtî bi helbestên xwe fikra kurdaiyîyê bilind dikin û  
hişyarbûnê ji kurdan dixwazin da ku di vê pêvajoya hesas de ev fîrset  
ji destê kurdan neçe û ew jî di çarçoveya Prensîbên Wilson de mafên  
xwe yên netewî wergirin. Di vê mijarê de hewce ye em li ser helbestên  
Lahûtî Xan bi taybetî bisekinin. Lewre di temaya kurdîtiyê de weşana  
herî xurt *Jîn* be, di *Jîn*ê de jî yê derdikeve pêş Lahûtî Xan e. Ev şairê  
Kirmanşahî, koka Medî û Îranîbûna kurdan derdixe pêş, behsa îlhaqa  
(girêdan, tevlibûn) kurdan bi Îranê re dike:

Kurdan ku hemûyan “Medî” û neslî Keyan in  
l'em fikre çî lewn xefletyan kird eme rene

...

Îran wetena kurd e, û kurd milleta Îran  
Xesmî legel xakî weten zillet û neng e

...

Kurmanca dê îlhaq be Îran bikî axir  
Dest, weqtê ku mulheq weten xo bû qeşeng e<sup>292</sup>

Li gorî Lahûtî, kurd û Îran wê bibine yek û bi vî rengî wê kurd ji  
bendên xwe azad bibin, xofa tirk û ‘ereban ji ser xwe rakin:

---

291 Bozarslan, hb., c. V, r. 932.

292 Bozarslan, hb., c. V, r. 976.

Mexsûsen kurdan qelbî Îran en  
Tuxmatî keyan, neslî şêran en

...

Da xoyan le em bende reha kin  
Hem turk, hem ‘ereb le xofa rakîn<sup>293</sup>

Lahûtî Xan, di helbesteke xwe de jî helbestvanên ku behsa tereb (mûsikî) û meygedeyê (meyxane) dikin bi awayekî sergirtî rexne dike û hessasiyeta xwe ya welatevîniyê beyan dike:

Rêgey tereb û meykede Lahûtî dezanî  
Emma le fîraqî wetenî hewsele teng e<sup>294</sup>

Dîsa helbestvan Qazî Letîf jî di “Xezel”a xwe de rica ji şairên kurdan dike ku êdî behsa zulfî yaran mekin, behsa wan tiştan bikin ku bi kêrî kurdan bîn:

Şairî kurdan, meken behsî uzar û zulfî yar  
Behsî behsêkî biken, bo kurd l’eme-w paş bête kar<sup>295</sup>

Di hejmara heftan a *Jînê* de jî Mehmed Mîhrî, gava helbestekê diweşîne, di têbîniyê de dibêje ku maddeya vê xezelê bisk, xal û xeyal e, helbestên wiha ne layiqî *Jînê* ne lê ji ber ku di vê helbestê de sê beytên netewî hene wî ew weşandiye.<sup>296</sup> Yanî di *Jînê* de pîvana weşandina helbestekê netewîbûna wê ye.

Ya rastî mûsikî, şerab -çi rast çi metaforîk-, xezel, eşq mijarên sereke yên helbesta Rojhilat in ku kurd jî şaxekî vê tradîsyonê ne. Lê tehemmula şert û mercên giran û xeternak ên dewrê ji van gotinan re nîne. Çimkî bi gotina ‘Ebdurehîm Rehmî “zeman pîrr nazik e”.<sup>297</sup> Ji ber vê pêvajoya hesas helbestvanên wê heyamê jî wekî pêxemberekî bisebr, bi dengêkî bilind bangî kurdan dikin, bi dubarekirinên bêdawî dixwazin rewşê bi wan bidin zanîn, wan ji xewa sedsalî şiyar bikin. Bo nimûne, ‘Ebdurehîm Rehmî di *Jînê* de dibêje

---

293 Bozarslan, hb., c. V, r. 1044-1045.

294 Bozarslan, hb., c. V, r. 977.

295 Bozarslan, hb., c. II, r. 380-381.

296 Bozarslan, hb., c. II, r. 375.

297 Bozarslan, hb., c. I, r. 50.

“Gelo rabin, zeman teng e”.<sup>298</sup> Lê dengê wan ji Stembolê çiqasî digiha kurdan ev mijara nîqaşê ye.

Ji bo dîtina kokên netewekî “amûr”ekî girîng ji folklor e. Çimkî “netewetî, çiqas ruhê serdemê be, ewqas girêdayî motîfên kevn e jî”.<sup>299</sup> Kovara *Jînê* ji girîngî daye folklorê: Kemal Fewzî ji bo îbatkirina hebûna folklor û mîtolojiya kurdî piştî nivîseke lêkolînê, çîrokeke kurdî wergerandiye tirkî û di hejmara 22, 23 û 24an de weşandiye.<sup>300</sup> Herwiha Law Reşîd û Hilmiyê Siwêrekî gotinên pêşiyên kurdan berhev kirine û di *Jînê* de weşandine.<sup>301</sup>

Di warê mîtoloji, efsane û folklorê kurdî de di *Jînê* de figurê herî balkêş “Kawe/Kawa” ye. Kurdiyê Bitlîsî<sup>302</sup> li hemberî îddiyên kitêba Dr. Friç a bi navê *Kurdler* û nivîseke M. Zekerîya Bey a di kovara *Ictimaiyyatê* de ku dîroka kurdan înkâr dike, ji bo îbatkirina hebûn û qedîmbûna kurdan xwe dispêre destana Kaweyê Hesinkar. Ew destanê wiha neql dike: Hikimdarê bi navê Dehaq ku bi eslê xwe ‘ereb e, welatê kurdan dagir kiriye û zilmê li gel dike. Ew ji bo têrkirina herdu marên li ser milê xwe her roj mêjiyê çar însanan derdixe. Rojek ji rojan du lawên Kawe, ji bo derxistina mêjiyê wan dibin. Li ser vê yekê Kawe serî hildide, serhildan mezin dibe û di dawiya serhildanê de jî Dehaq tê kuştin, Fereydûn li dewsa wî dibe hikimdar û gel ji zilmê xilas dibe. Ev roja ku beramberî 31ê tebaxê tê, wekî roja xilasbûna netewî di nav kurdan bi navê “Cejna Kurd” tê pîrozkirin. Di dawiya efsaneyê de Kurdiyê Bitlîsî digihîje sê encaman: Kurd bi eslê xwe teqez îranî ne û di nav qewmên îranî de yê qedîmtirîn in, herçiqas hin kurd di dema Dehaq de berê xwe dabine rojava jî dîsa vegeriyane bakur û gihane welatê xwe yê resen, ê ku dawî li îstîlaya

---

298 Bozarslan, hb., c. II, r. 349.

299 Remezan Alan, *Folklor û Roman li dor texeyyulên berê rêçên îroyîn*, weş. Peywend, Stenbol, 2013, r. 44.

300 Bozarslan, *Jîn Kovara Kurdî-Tirkî 1918-1919*, c. I, r. 72-73.

301 Bozarslan, hb., c. I, r. 73.

302 M. Emîn Bozarslan nivîskarê bi navê Kurdiyê Bitlîsî, Xelîl Xeyalî dihesibîne lê li gorî Ebdulla Zengene, ew ne Xelîl Xeyalî ye, ew Yuzbaşî Emîn Begê Bitlîsî ye. Bnr. Ebdulla Zengene, *Rojnamevanî*, j. 6-7 (2001-2002), weş. Kurdistan Journalist Union, Hewlêr, r. 196-197.

Dehaq anîne ji bilî malbata qedîm a kurdan pê ve ne tu kes e.<sup>303</sup>

Di avakirina nasnameyeke netewî, dîrok û çandeke hevpar de folklor çavkaniyeke resen e. Herwiha rojên taybet ên netewî, rituel û merasîmên netewî jî di avakirina bîr û baweriyeke mustereke de roleke mezin dilîzin. Di vê çarçoveyê de dîsa di *Jînê* de ji nivîseke Memdûh Selîmbegî em hîn dibin ku bi pêşengtiya KTMNCê bi munesebata “Roja Kawa ya Netewî” musamereyek pêk hatiye. Di bernameyê de konferanseke bi tirkî, du konferansên bi kurdî hatine dayîn û helbesteke kurdî hatiye xwendin. Hêviya Selîmbegî ji musamereyê ev e ku beşên cuda yên gelê kurd bi hev bide nasîn û bide hezkirin, fêdeya wê bigihîje armancên netewî.<sup>304</sup>

Em van hewldanên netewperwerên kurd dikarin bişibînine xebatên Yeats û hevalên wî ku ji bo yekîtiya Îrlandaya perçebûyî berê xwe dabûne mît û mîtolojiyê.<sup>305</sup> Çimkî Kurdiyê Bitlîsî û Memdûh Selîmbegî jî bi zîndîkirina mîteke kevnare, dixwazin kurdên ji aliyê zarava, bawerî, êl, eşîr û sînorên siyasî ve ji hev qetiyane li dora vê mîtê bigihînin hevdu. Wekî Lahûtî Xan, Kurdiyê Bitlîsî jî gelekî li ser Îranîbûna kurdan disekine û vê di encamnameya xwe de jî dubare dike. Xuya ye ev Îranîbûna kurdan ku wan ji ‘ereb û tirkan cuda dike bi xwe mafekî xweseriyê -qet nebe mafê daxwazkirina wê- bexşî kurdan dike. Netewperwerên kurd jî hêvî ji “Prensîbên Mr. Wilson”<sup>306</sup> dikin, ku dibêje her gel wê xwediyê welatê xwe be, û ji bo nîşandana cudabûna xwe ya ji ‘ereb û tirkan xwe dispêrin Îranîbûnê.

Tiştêkî din ê balkêş jî guhertina lehengên dîrokî yên kurdan e: Beriya şerê cîhanê lehengê dîrokî yê kurdan Selaheddînê Eyyûbî bû. Mesela li ser bergê hejmara ewil a *Rojî Kurdê* wêneyê wî hebû, herwiha di hejmara 2. û 3. a heman kovarê de jî biyografiya wî ya berfireh cih digirt. Fîgurê Selaheddîn di wê demê de zewaca du

---

303 Bozarslan, *Jîn Kovara Kurdî-Tirkî 1918-1919*, c. I, r. 189-192.

304 Bozarslan, hb., c. V, r. 1030.

305 Alan, *Folklor û Roman*, r. 36.

306 Ji bo 14 prensîbên Mr. Wilson, serekê USA, ên piştî Şerê Cîhanê bnr. “President Woodrow Wilson’s 14 Points (1918)”, <https://www.archives.gov/milestone-documents/president-woodrow-wilsons-14-points>, 26.01.2025.

nasnameyan temsîl dikir: Îslam û kurdîtî. Selaheddîn hikimdarekî kurd ê misilman e, wî li hemberî xaçparêzan şer kiriye û di dawiyê de jî bajarê pîroz Quds ji destê wan xilas kiriye. Bi van taybetiyên xwe Selaheddîn, kurdên piştî meşrûtiyetê, rewşenbîrên wekî Babanzade Îsmail Heqqî, Kerkuklu Necmeddîn ku nasnameya kurdîtiyê parçeyekî îslamê dihesibandin bi temamî temsîl dikir. Lê di vê heyama nû de, bi gihîştina rewşenbîrên modern, sekuler êdî bandora îslamê li ser nasnameya kurdî hêdî hêdî kêmbûye. Ya duyem, fîgurê Selaheddîn êdî daxwazên kurdan tam temsîl nake, ji ber ku netewperwerên kurdî êdî xwedî daxwazên polîtîk in. Kurdîyê Bitlîsî bi vê destanê peyama dide serdestên kurdan, ewên ku hebûna kurdan înkâr dikin; bê çawa berî vê bi çend sed salî kurdan Dehaqê zordest ji welatê xwe derxistibin îro jî dikarin heman tiştî bikin.

## 2.2. Di Pêşketina Nasnameya Kurdî de Du Kesên Xwedî Bandor: Xanî û Koyî

Bi rastî di bin vî sernavî de em dikarin bi dehan navan binivîsin. Wekî mînak em dikarin hemû nivîskarên ku di çapemeniya kurdî de nivîsandine, bi taybetî yên ku bi kurdî nivîsandine, bijimêrin. Lewre her herfa ku li ser navê kurdan li çapê diket, fikra kurdariyê geş dikir, nasnameya kurdî bi pêş ve dibir. Lê helbet di vê dewrê de navên ku zêdetir derketine pêş hetta bûne fenomen hene ku emê jî li ser wan bisekinin: Ehmedê Xanî û Hacı Qadirê Koyî.

### 2.2.1. Ehmedê Xanî

Ehmedê Xanî bi çar berhemên xwe yên kurdî edebiyatvanê herî girîng ê kurdî ye. Ew xwediyê ferhenga pêşîn a kurdî-‘erebî ye (*Nû-behara Biçûkan*), nivîskarê yekemîn ‘eqîdenameya kurdî ye (*‘Eqîdeya Îmanê*) û şairê mesnewiya ewil a kurmancî ye (*Mem û Zîn*). Lê ji wan hemûyan girîngtir, ew bi fikrîyata xwe, ku di beşên pêncemîn û şeşemîn ên *Mem û Zînê* de beyan dike, di nav kurdan de fenomenek e.

Li gorî Amir Hassanpour, fikra netewî ya kurd cara pêşîn Ehmedê Xanî di *Mem û Zîna* xwe de formule kir.<sup>307</sup> Ferhad Şakelî jî dibêje

307 Hassanpour, *Kürdistan’da Dil ve Milliyetçilik (1918-1985)*, r. 128.

ku Ehmedê Xanî yekem kes e ku bingeha netewperweriya kurdî daniye hetta wî di *Mem û Zînê* ji bo avakirina netew-dewleteke kurdan gazî kiriye.<sup>308</sup> Li gorî Roger Lescot, Ehmedê Xanî di nav helbesta netewî de figurekî derasayî ye. Wî sedsala xwe gihand çend sedsalên din. Wî di zemanê ku netewperwerî di nav misilmanan de nedihate zanîn, behsa mafên kurdan û bingeha azadiyê dikir.<sup>309</sup> Kamiran Alî Bedirxan gava behsa edebiyata welatî dike pêşengê vê edebiyatê Xanî dihesibîne: “Ji xwe Ehmedê Xanî berî sêsed salî vê rêyê ji me re vekiribû. Lê heyf paşîyên wî pê ve neçûn.”<sup>310</sup> Birayê Kamiran, Celadet Bedirxan jî ji bo Xanî wiha dibêje: “Belê Xanî jî xudan kitêb e. Lê Xanî pêxember e jî. Pêxemberê diyaneta me a milî, pêxemberê ola me a nijadîn.”<sup>311</sup> Celadet, berî *Hawarê* hê di sala 1919an de di rojnameya *Serbestî* de jiyannameya Xanî dinivîse û ji bo qebra wî ya li Bazîdê “Kabeya netewîtiya kurdan” dibêje.<sup>312</sup>

Hewce ye em bibêjin ku Bruinessen ji van îddiayan guman dike: Li gorî wî em nikarin Xanî netewperwerê kurd bihesibînin û ji wan çend beytên wî jî nikarin bigihine encama ku ew dewleteke kurdî dixwaze.<sup>313</sup> Dîsa li gorî wî heta ku çap nebû *Mem û Zîn* bi rastî ne berhemeke popûler bû, encax piştî ku çap bû -em dizanin ku ev yek jî di sedsala bîstemîn de pêk hat- gihaşte kîtleyeke berfireh a xwendekaran.<sup>314</sup>

308 Ferhad Şakelî, *Mem û Zîn'de Kürt Milliyetçiliği*, weş. Doz, İstanbul, 1996, r. 8-9.

309 Roger Lescot, “Edebiyata Kurdî”, wer. S. Ay, *Wêje û Rexne*, j.1 (rêbendan-sibat-adar-avrêl 2014), r. 217.

310 *Hawar Cild 1 Hejmar 1-23 (1932-1933)*, amd. F. Cewerî, weş. Nûdem, Stocholm, 1998, r. 27.

311 *Hawar Cild 2 Hejmar 24-57 (1934-1943)*, amd. F. Cewerî, weş. Nûdem, Stocholm, 1998, r. 813.

312 Arslan, “Serbestî Gazetesi (1918-1919) ve Bedirxanîler: Celadet Alî Bedirxan'ın Yazıları ve Kürtlere Dair Bazı Haberler”, r. 422.

313 Martin van Bruinessen, “Ehmedê Xanî'nin Mem û Zîn'i ve Kürt Milli Uyanışının Ortaya Çıkışındaki Rolü”, dnd. *Kürt Milliyetçiliğinin Kökenleri*, ed. A. Vali, wer. F. Adsay-Ü. Aydoğmuş-S. Kılıç, weş. Avesta, İstanbul, 2005, r. 64.

314 Bruinessen, hb., r. 70.

Bi rastî jî beytên Ehmedî Xanî yên jêr, belkî ji dewra xwe zêdetir di sedsala 19 û 20an de deng vedan. Di dewreke ku mîrektiyên kurdan hatine tune kirin, bi Alayên Hemîdiye kurd hatine parçekirin, ji aliyê din ve tirsî ku duwelî muezzeme (dewletên mezin) welatê wan jî wan bistînin û bikine “Ermenistan” ketiye dilê kurdan, rewşenbîrên kurd van beytên jêrê wekî nameyeke pîroz dubare dikin:

Ger dê hebûwa me padîşahê  
Laîq bîdiya Xwedê kulahek,

Hasil bibûwa ji bo wî tacek  
Elbette dibû me jî rewacek

Xemxwarî dikir li me yetîman  
Tînane derê ji dest leîman

Xalib nedibû li ser me ev Rûm  
Nadibûne xerabeyê di dest bûm<sup>315</sup>

...

Ger dê hebuwa me îttîfaqek  
Vêkra bikra me înqiyadek

Rom û Erebb û ‘Ecem bi temamî  
Hemîyan jî me re dikir xulamî

Tekmîlî dikir me dîn û dewlet  
Tehsîlî dikir me îlm û hîkmet<sup>316</sup>

Li ser bergê kitêba *Xulaseî ‘Eqâid* a ku Ehmed Ramîz çap kiriye, ji *Mem û Zînê* ev beyt heye:

Cemî’ milel xudan kitab in  
Kurmancî tenê di bê hisab in

---

315 Ehmedê Xanî, *Mem û Zîn*, r. 152-153.

316 Ehmedê Xanî, hb., r. 155.

Peyrevê Ehmedê Xanî yê sedsala 19an Hacî Qadirê Koyî jî beyte-ke pir nêzîkî vê gotiye:

Her kurd e le beynî kullî millet  
Bê behr e le xundinî ketabet<sup>317</sup>

Em dikarin bibêjin ku ev herdu beyt tercumanên hestên netew-perwerên kurd ên sedsala 19 û 20an e. Lewre kurmanç yanî kurd, di nav “cemî”ê milel/hemû miletan” de “bêhisab” in, navê wan nayê gotin. Li gorî rewşenbîrên wê serdemê kurdîtiya ku zemanekî dewra zêrîn dijiya îro mensîyy (jibîrkirî)<sup>318</sup>, sukût (bêdeng)<sup>319</sup>, saqit û ‘elîl (ketî û nexweşok)<sup>320</sup> û meflûc (felcoyî)<sup>321</sup> e. Helbet gelek sebebên vê rewşê hene û ehlî qelemên kurd ên dema Osmanî li ser sedem û çareyên vî halî gelek tişt gotine. Li gorî Bedîuzzeman Seîdê Kurdî sedem “feqîrtî, cehalet û îxtîlaf” e. Çareya wê jî “xwendin, xwendin, xwendin û destê hev girtin, destê hev girtin, destê hev girtin” e.<sup>322</sup>

Li gorî ‘Ebdullah Cevdet nebûna dîrokeke nivîskî (di sedsala 20an de *Şerefnameyek ne bes e*)<sup>323</sup>, nebûna îdealê ango projeyeke dahatuyê û pîrsgirêka alfabe-yê yanî zehmetiya hînbûna herfên ‘erebî ye. Li gorî Cewdet, ji bo çareseriyê berî her tiştî hewce ye ciwanên kurd biryar bidin bê dixwazîn bibin çî, yanî îdealekê ji xwe re diyar bikin. Piştî wê wezîfeya rewşenbîrên kurd ew e ku di nav civaka xwe de rêjeya xwendin û nivîsandinê bilind bikin ku herî kêr % 40 be, paşê jî alfabe-yekê saz bikin ku zarokê di nava mehekê de hînî xwendin û nivîsandina wê bibe.<sup>324</sup>

---

317 *Di Sedsaliya Wê de Rojî Kurd 1913*, amd. Koma Xebatên Kurdolojiyê, r. 161.

318 *Di Sedsaliya Wê de Rojî Kurd 1913*, amd. Koma Xebatên Kurdolojiyê, r. 98.

319 *Di Sedsaliya Wê de Rojî Kurd 1913*, amd. Koma Xebatên Kurdolojiyê, r. 102.

320 *Di Sedsaliya Wê de Rojî Kurd 1913*, amd. Koma Xebatên Kurdolojiyê, r. 208.

321 *Di Sedsaliya Wê de Rojî Kurd 1913*, amd. Koma Xebatên Kurdolojiyê, r. 214.

322 Bozarslan, *Kürd Teavün ve Terakkî Gazetesi Kovara Kurdî-Tirkî 1908-1909*, r. 54-55.

323 *Di Sedsaliya Wê de Rojî Kurd 1913*, amd. Koma Xebatên Kurdolojiyê, r. 99.

324 *Di Sedsaliya Wê de Rojî Kurd 1913*, amd. Koma Xebatên Kurdolojiyê, r. 99-100.

Bulgaristanli Togan bal dikişîne ser pirsgirêka rewşenbîriyê û li rewşenbîrên ciwan ên kurdan çûna welatê xwe, tevlibûna nav gelê xwe û li wir avakirina mekteban, perwerdeya li gorî ilmê pedogojiyê, di çandinê de bikaranîna rêbazên modern salox dide.<sup>325</sup>

Li gorî Zehawîzade sedem nebûn an jî kêmbûna “hiss-i millî [hêsta netewî]” ye. Çare jî fikirîna li ser kurdîtiya xwe û halê xwe yê îroyîn e.<sup>326</sup>

Ehmedê Xanî di beyta jor de gazin ji bêkitab û bêhisabbûna kurdan dike, lê bi nivîsandina *Mem û Zînê* bersiva xwe jî bersiva wan miletên ku kurdan nahesibînin jî dîsa ew dide:

Da xelqi nebêjitin ku ekrad  
Bê me'rîfet in, bê esl û binyad

Di sala 1919an de di serî de Hemzeyê Muksî, rewşenbîrên kurd ên li Stembol û Diyarbekirê<sup>327</sup> *Mem û Zînê* cara ewil wekî kitêb li çapê dixin. *Mem û Zîna* ku heta niha di çapemeniya kurdî de parçe parçe dihate weşandin êdî wekî berhemeke serbixwe jî belav dibû. Bi qasî ku em ji çapemeniya wê dewrê dişopînin û şahidên demê dinivîsîn vê çapê pir deng vedaye. Li gorî nivîsandina Celadet, kurdan kitêb ji dest hev revandine.<sup>328</sup> Lê ne tenê *Mem û Zîn*, *Newbehar* ango *Nûbihara Biçûkan û Eqîda Îmanê* ya Xanî jî di dewra Osmanî de li Stembolê çap dibe. Ev yek jî nîşan dide ku Xanî di vê dewrê de bi berhem û nêrînên xwe dijî û tesîr li aktivîstên tevgera kurdî dike.

---

325 *Di Sedsaliya Wê de Rojî Kurd 1913*, amd. Koma Xebatên Kurdolojiyê, r. 135-136.

326 Zehawîzade Y.Z., “Kürdlerde Hiss-i Millî”, *Hetawî Kurd*, j.4 (19 Mart 1330/1 Nîsan 1914), r. 7-8. Ji bo tîpguhêziya latînî ya vê nivîsê bnr. Malmîsanîj, *Yirminci Yüzyılın Başında Diyarbekir’de Kürt Ulusçuluğu (1900-1920)*, r. 98-99.

327 Ekrem Cemîlpaşa di bîranînên xwe de dinivîse ku wan ji Diyarbekirê ji bo çapkirina *Mem û Zînê* arîkariya maddî şandine. Bnr. *Muhtasar Hayatım*, r. 31.

328 Bedirxan, *Mustafa Kemal’e Mektup*, r. 38.

### 2.2.2. Hacî Qadirê Koyî

Di sedsala 19 û 20an de bi navgîna amûrên wekî çapemeniyê û perwerdeya nûjen di edebiyata kurdî de jî guhertinek dest pê dike. Helbest dîsa hêmana sereke ye lê cureyên wekî çîroka modern û piyês jî nû nû di edebiyata kurdî de têne dîtîn. Herwiha helbesta kurdî jî wekî berê namîne. Aliyê ruxsarî ‘eynî bimîne jî naverok diguhere. Di helbesta kurdî de pêşengê vê guherînê Hacî Qadirê Koyî ye. Ji aliyê ruxsarî ve tu ferqa helbesta wî û ya helbesteke klasîk nîne. Lê mijar êdî ne xezal û horî, ne jî mey û meyxane ne. Koyî, “kurdperwer, pêşverû û dewletxwaz e”.<sup>329</sup>

Dengê Xanî di sedsala 19an de bi Hacî Qadirê Koyî ji nû ve olan dide. Herekol Azîzan di *Hawarê* de ji bo wî “Hacî Qadirê koyî Xaniyê didowan e. Ew jî weke Xanî bi derdê miletê xwe dişewitî. Şîhir û qesîdeyên wî tev de li ser milet û welêt in” dibêje.<sup>330</sup> Koyî hem pesnê Xanî û *Mem û Zînê* dide hem jî peyamên Xanî -li gor şertên nû yên cîhanê- vedibêje. Bi gotina C. Alî Bedirxan, Xanî digot “bixwînin”; Koyî li gora wextê xwe, bi ser ve zêde dikir û digot “bi awayê nû bixwînin”.<sup>331</sup>

Helbesta Koyî ya ku di rojnameya *Kurdistanê* de cih digire jî pesnê Ehmedê Xanî û *Mem û Zînê* ye:

Eman qedrî bizane em kitêbe  
Le dunya êstekey hemtay nemawe

...

Le mecmûî duwel Soran û Botan  
Le sayey em kitêbe nasirawe

Le kurdan xeyrî Hacî-w Şêxî Xanî  
Esasî nezmî kurdî danenawe<sup>332</sup>

329 Remezan Alan, *Bendname*, weş. Avesta, Stembol, 2009, r. 219.

330 *Hawar Cild 2 Hejmar 24-57 (1934-1943)*, amd. F. Cewerî, r. 817.

331 Celadet Alî BEDIR-KHAN, “Merhele”, *Roja Nû*, j.1 (3 Gulan 1943), r. 1. Ji nû ve çapkirin: Weş. Jîna Nû, Uppsala, 1986.

332 Bozarslan, *Kurdistan Rojname Kurdî ya Pêşîn 1898-1902*, c. I, r. 135-136.

Hacî Qadirê Koyî jî wekî Ehmedê Xanî, di kurdî de israr kiriye. Nimûneya vê ev e: Koyî, dawîya temenê xwe li Stembolê derbas dike û ji bîranînên helbestvanekî tirk ê bi navê Uskudarli Talat em fêm dikin ku wî dersa edebiyata erebî û farisî dida ango wî ev ziman di asta mamostetiyê de dizanî lê “dîwana wî bi kurdî bû”.<sup>333</sup>

Hacî Qadirê Koyî girîngiya rojnameyê fêm kiriye û hê di salên 1890î de, gava li Stembolê bû bi helbestên xwe pesnê wê daye.<sup>334</sup> Gava em bînine bîra xwe ku ew mamosteyê zarokên Bedirxan Beg e, emê baştir fêm bikin ku bingeha fikra rojnameya kurdî çawa çêbûye û yên ku rojnameya ewil a kurdî derxistine çima Bedirxanî ne:

Sed qaîme û qesîde kes naykirre be pûlê

Rozname û cerîde û kewtote qîmet û şan<sup>335</sup>

Koyî, bi helbestên xwe û fikrên xwe yên netewî di *Rojî Kurd*, *Hetawî Kurd*, *Jîn û Têgeyiştinî Rastî* de jî derdikeve pêş. Xelîl Xeyalî ji helbestên wî parçeyan di nav nivîsên xwe de diweşîne. Bê çawa Koyî hewariyê Xanî be, Xelîl Xeyalî jî şagirdê Koyî ye. Xeyalî, gava bangê mezinên kurdan ku li Stembolê gihane meqamên mezin lê gelê xwe ji bîr kirine dike, Hacî Qadir wek mînak nîşanî wan dide û dibêje carekê berhemên wî bixwînin û bibin şopdarên wan, da ku milletê we lenetê li we neke; rehmetê bixwîne.<sup>336</sup> Xelîl Xeyalî jî girîngî dide hişyarbûna kurdan, bi taybetî li ser xwendin û nivîsandina bi kurdî disekine. Wekî mînak di nivîsa “Bextreşî û Nezaniya Kurdan” de gazin ji şêx, mela, feqî û mîrên kurdan dike ku çima ew kitêb û dîwanên xwe bi kurdî nanivîsin.<sup>337</sup> Mehmed Salih Bedirxan jî ji bo helbestên Xanî û Koyî dibêje; hewce ye her kurdek wan hîfz bike, ji ber zanibe.<sup>338</sup>

---

333 Arslan, “Hacî Qadirê Koyî: Serencema Dîwana Wî Li Stembolê”, r. 95-96.

334 Hassanpour, “Kürt medya kültürünün yaratılması”, r. 91.

335 Hacî Qadirî Koyî, *Dîwan*, ed. A. Zêrevan, weş. Nefel, Sweden, 2004, r. 85.

336 Babê Naco, “Fe’tebirû Ya Uli’l-Ebsar”, *Hetawî Kurd*, j.2 (21 Têşrînisanî 1329/4 Kanûn 1913), r. 9.

337 *Di Sedsaliya Wê de Rojî Kurd 1913*, amd. Koma Xebatên Kurdolojiyê, r. 195.

338 *Di Sedsaliya Wê de Rojî Kurd 1913*, amd. Koma Xebatên Kurdolojiyê, r. 192.

Koyî di helbesta xwe ya di *Hetawî Kurdê* de, ji tembelî, nezanî, bêkemaî, baweriya bi şêxan gazin dike; pesnê ehlî japon dide ku bi fenn û sin'et xaka Çînê girtiye. Tevî hemû halê wan jî hêviyên xwe ji kurdan nabire:

Kurd ême nezan û şikewt in  
Pêkewe miş agir û newt in

Bê eger dest yektirî bigirin  
Wek Skender hemû cîhan digirin<sup>339</sup>

Koyî di helbesta xwe ya ku di *Jînê* de hatiye weşandin, li xerîbiyê bi kurdekî Baban re sohbet dike û xweziya xwe bi dema mîrektiyan kurdan tîne:

Gelêkim bîstuwe pest û bilindî dewletan, emma  
Cîhan neydîtuwe pestî mîsalî hakimî kurdan

...

Le wextî xoy hemû şa bûn, serapa bêxem û şa bûn  
Le cû da Hatemî Taî, le şer da Rustemî dastan<sup>340</sup>

Xanî û Koyî herdu jî ji ber rewşa xirab a kurdan gazin dikin, lê wekî suçdarê vê rewşa xirab zumreyên ku ew rexne dikin cuda ne: Xanî gazinê ji mezinên kurdan ango ji mîran dike:

Teb'iyeta wan egerçî 'ar e  
Ew 'ari li xelqê namidar e

Namûs e li hakim û mîran  
Tawan çî ye şa'ir û feqîran<sup>341</sup>

Berevajî Xanî, Koyî xweziya xwe bi dema mîrektiyan tîne û berê tîrên xwe dide şêx, mela û 'ulemayên kurdan:

---

339 "Qesîdeî Rehmetî Hacî 'Ebdulqadir[î] Koyî", *Hetawî Kurd*, j.4 (19 Mart 1330/1 Nîsan 1914), r. 18. Ji bo tîpguhêziya latînî ya vê helbestê bnr. Koyî, *Dîwan*, r. 104-108. Ji bo şiroveya Remezan Alan a li ser vê helbestê bnr. *Bendname*, r. 220-221.

340 Bozarslan, *Jîn Kovara Kurdî-Tirkî 1918-1919*, c. I, r. 226.

341 Ehmedê Xanî, *Mem û Zîn*, amd. K. Yıldırım, r. 153.

Yekser ‘ulema dirušt û wurdî  
Ta bixunînewe du herf[î] kurdî<sup>342</sup>

Koyî, perwerdeya kevnar jî li pêşiya kurdan wekî seddek (asteng-  
gek) dibîne û pesnê fenna/zanista Ewrûpayê dide:

Êste me‘lûmî bû hemû millet  
Ey melay ders û muftî[y] ummet

Ême bî xîret in û bî ‘ar in  
Ewî ney xwendiwe le me ‘ar in

Qeyd û tezbîb û şerh û haşiyekan  
Bûne sedd[î] me‘arif[î] kurdan<sup>343</sup>

Koyî, şairekî muteceddîdane (nûjen) û miletperwer e; helbestên wî yên tenqîdkarane (rexneyî) û îctimaî (civakî) hene. Van tesbîtan rojnameya *Têgeyîştinî Rastî* dike ku di sala 1918-1919an de li Bexda-  
dê ji aliyê rêvebiriya Brîtanya ve bi kurdî dihat weşandin û paşê jî cih dide helbesteke wî.<sup>344</sup>

Hacî Qadir xwedî dîwaneke mezin bû. Ji nûçeyeke rojnameya *Serbestîyê* em dizanin ku KTMNCê, li ser mecmûaya helbestan a “Xoce Qadir” ku sê hezar xezelên bibelaxet dihawîne lêkolînek daye destpêkirin. Piştî tenzîm û tesnîfa wê, dê berhemê bişînine çapxaneyê. Di dewama nûçeyê de tê ragihandin ku Xoce Qadir ji helbestvanên navdar ên kurd ên netewî ye. Ew bi helbestên xwe bûye berdevkê hissiyata gel û wî di helbestên xwe de êş û elema kurdan vegotîye.<sup>345</sup> Ji van gotinan tê fêmkirin ku Xoce Qadir, Hacî

---

342 *Di Sedsaliya Wê de Rojî Kurd* 1913, amd. Koma Xebatên Kurdolojiyê, r. 161.

343 “Hacî ‘Ebdulqadir Qeddese Sirrehu’l-‘alî”, *Hetawî Kurd*, j.1 (11 Teşrîni-  
ewwel 1329/24 Cotmeh 1913), r. 25.

344 “Edebiyat-i Kurdî”, *Têgeyîştinî Rastî*, j.24 (15 Nîsan 1918), r. 3, ê ku der-  
basî tîpên latînî kir: Malmîsanîj, “Çend nivîs ji perîyodîkên Kurdî (1908-  
1963)”, *Çira*, j.10 (Havîn 1997), r. 71-72.

345 Arslan, “Serbestî Gazetesi (1918-1919) ve Bedirxanîler: Celadet Alî Be-  
dirxan’ın Yazıları ve Kürtlere Dair Bazı Haberler”, r. 451.

Qadirê Koyî ye. Lê ew dîwan îro ne li ber dest e. Dibe ku ev xebata girîng temam nebûbe yan jî di nav atmosfera tevlihev a wê demê de derfeta çapê nedîtibe. Mehmed Emîn Zekî Beg dibêje ku Koyî Dîwana xwe li Stembolê bo çapê daye ‘Ebdurezaq Bedirxan, lê ji ber ku Îttîhatçıyan/hikûmeta ITCê ew girtiye û kuştiye ev dîwan jî winda bûye.<sup>346</sup> Li gorî rîwayeteke din Xelîl Xeyalî berî mirina xwe belgeyên xwe teslîmî Anterî dike, di nav wan de dîwaneke destxet a Koyî jî heye. Lê ev dîwan û hemû belge û kitêbên Anter, di sala 1972an de têne desteserkirin û paşê jî têne şewitandin.<sup>347</sup> Çapên herî kevin ên dîwana Koyî ev in:

1. *Komele Şî‘ranî Hacî Qadirî Koyî*, 1925, Bexdad, Çapxaney Darusselam, 59 rûpel. Le layan Ebdurrehman Seîd ve çapkirawe.

2. *Dîwanî Hacî Qadirî Koyî*, 1953, Hewlêr, Çapxaney Kurdistan, 128 rûpel.<sup>348</sup>

---

346 Mehmet Emin Zeki Bey, *Kürd ve Kürdistan Ünlüleri*, wer. M. Baban-M. Yağmur-S. Kutlay, weş. Apec, Spånga/Sweden, 1988, r. 293.

347 Anter, *Hatıralarım*, r. 65.

348 Mistefa Nerîman, “Bibliyografyay dîsed salî kitêbî kurdî 1787-1986”, r. 126, 108, Kitêbxaneyê Kurdî, <http://www.calameo.com/read/000501720e4dbe388c61c?authid=pZrc1zF67haY>, 28, 27.01.2014.

# BEŞA SÊYEM

## KITÊBÊN KURDÎ YÊN KU DI DEWRA OSMANIYAN DE BI HERFÊN ‘EREBÎ HATINE WEŞANDIN

Weşangerî li Ewrûpa hê di sedsala 16an de dikeve bin kontrola kapîtalîstan. Ew dixwazin kar bikin û ji bo vê jî li kitêbên balkêş digeriyan. Vê yekê weşangeriya kapîtalîst afirand, weşangeriya kapîtalîst jî zimanên weşanê yên standard. Li gorî Benedict Anderson, ev zimanên weşanê bi sê rêyan bingeheên bîreweriya netewî dideynin:<sup>349</sup>

**Zimanên weşanê qadeke danûstan û ragihandinê ya yek-bûyî ava kir:** Mirov çawa mehkûmê curbicurbûna ziman be, ziman jî mehkûmê lehçe û devokên cuda ye. Zimanên weşanê di nav vê curbicurbûnê de yekê digire navendê û bi vî rengî mirovên ku di axaftinê de ji hev fêm nakin, li ser kaxezê, bi xwendina heman tiştî û têgihiştina heman fikrî li qadeke hevpar digihine hev. Ev jî texey-yula “em”ê bi xwe re tîne.

**Zimanê weşanê zimên wekî xwe dihêle, ev jî fikra qedîm-tiyê bi xwe re tîne:** Her îstînsax ango zêdekirina tekstekê ji aliye mustensîx (nivîsende) ve, afirandineke nû ye; ji ber ku girêdayî jê-hatîbûn, dîqqet û zanîna wî ye. Vê yekê ilmê edîsyon-krîtîkê afirandiye. Lê bi rêya çapxaneyê tekstekê êdî bê guhertin wekxwe dikare bê zêdekirin. Bi xêra vê yekê, guhertina zimanan hêdî dibe û ew êdî awayên xwe yên modern/standard werdigirin.

---

349 Anderson, *Hayali Cemaatler*, r. 59-61.

### **Weşangeriya kapîtalîst zimanekî desthilatdariyê diafirîne:**

Di nav zimanan de hin lehçe nêzîktirî zimanê weşanê dibin, ji ber vê yekê ew dibine zimanê desthilatdariyê jî, lehçeyên din bi qasî wan bi siûd nabin.

Ji ber ku dewlet an jî desthilatdariyeke navendî ya kurdan ne-bûye, sistemeke wan a kapîtalîst jî çênebûye. Lê têkiliya kurdan bi çapxaneyê re çêbûye. Kurd, di dawiya sedsala 19 û destpêka ya 20an de xwedî çapemeniyeke serbixwe bûn û bi zimanê xwe gelek kitêb çap û belav kirine.

Ji çaxê ku kurdan îslamîyet qebûl kiriye heta îro kulliyateke mezin a kurdî bi herfên ‘erebî hatiye nivîsîn. Edebiyata kurdî ya klasîk tev bi vê alfabayê ye. Ji xeynî vê du dewletên ku kurd tabîê wan bûn -Dewleta Osmanî û Dewleta Sefewî- jî ev alfabe bi kar dianîn. Di sedsala bîstan de di nav rewşenbîrên kurdan de nîqaşên alfabayê hebin jî heta qonaxa Qafqasya û Şamê (kovara *Hawarê*) ji bo diyalakta kurmançî serdestiya herfên ‘erebî berdewam e. Kitêbên kurdî yên di dewra Osmaniyan de çap bûne jî piranî bi herfên ‘erebî ne. Me ev kitêbên bi herfên ‘erebî li gorî menbea wan a weşanê dabeş kirin: Yên ku saziyên fermî yên Dewleta Osmanî weşandine û yên ku rewşenbîr/netewperwerên kurdan weşandine.

### **3.1. Kitêbên Kurdî yên ku ji Aliyê Saziyên Fermî yên Dewleta Osmanî ve Hatine Weşandin**

Em dikarin vê binbeşê wekî “Kitêbên Ewîl” jî bi nav bikin. Lewre kitêbên kurdî yên ewîl ji aliyê saziyên fermî yên Dewleta Osmanî ve hatine weşandin. Ev pêvajoyê bi *Dîwana* Mewlana Xalid dest pê dike: Ew kitêba ewîl a kurdî ye ku di nav sînorên Dewleta Osmanî de hatiye çapkirin.<sup>350</sup> Piştî wê *Dîwan-i Et’ime* (1884-1885) tê ku hem ji bo kurdî hem jî ji bo vê binbeşê îstisna ye. *Türkçeden Kurd Lisani-na Mutercem Ilmihaldır* (1891) û *El-Hediyyetu’l-Hemîdiyye fî’l-Luxeti’l-Kurdiyye* (1893) jî kitêbê din ên vê binbeşê ne. Taybetmendiya kitêbên vê dewrê (*Dîwan-i Et’ime* ne tê de) ew e ku ev kitêb bi destê

---

350 Hassanpour, *Kürdistan’da Dil ve Milliyetçilik 1918-1985*, r.297-298; Malmîsanîj, *Türkiye ve Suriye’de Kürtçe Kitap Yayımcılığının Dünü ve Bugünü*, r. 34.

rayedarên dewletê têne çapkirin; di amadekarina wan de erê, lê di çapkirina wan de bandora komele û rewşenbîrên kurdan nîne.

**3.1.1. *Dîwanî Belaxet-unwan Mewlana eş-Şêxî Muceddîdî Terîqî Neqşibendî Ziyaeddîn Xalid qeddese sirruhu'l-ezîm, Mewlana Xalidê Şarezorî, H. 1260 (1844), Metbe'e-i Amîre, Stembol, 99 rûpel.***

Kitêba ewil a kurdî ku di dewra Osmanî de hatiye çapkirin *Dîwana* Mewlana Xalidê Şarezorî ye. *Dîwan*, ji helbestên Mewlana Xalid ên bi 'erebî, farisî û kurdî pêk tê. Piraniya helbestên dîwanê bi farisî, beşek ji wan jî bi 'erebî ne. Jimara helbestên kurdî jî pênc in. "Helbestên Mewlana Xalid yên Kurdî bi zaravayê Hewremanî hatiye nivîsandin. Hewremanî binebeşa zaravayê Goranî ye. Zaravayê Hewremanî îro her çend ji aliyê kêman kesa bête bikaranîn jî, bi rastî ev zarava xwedî kevneşopîyeke nivîsê ya gelek kevnar û dewlemend e."<sup>351</sup>

*Dîwan* bi emrê padîşahê Osmanî 'Ebdulmecîd tê çapkirin.<sup>352</sup> Sedema vê jî têkiliyên baş ên terîqeta neqşibendî-xalidî û Siltan 'Ebdulmecîd in. Ya rastî hê di salên 1820î de Mewlana Xalid xelîfeyê xwe -pêşî Mehmed Salih paşê 'Ebdulwehab es-Sûsî- şandine Stembolê<sup>353</sup>, lê 'esil di dewra 'Ebdulmecîd de (1839-1861) li paytextê bandora xalidiyan zêde dibe. Wekî mînak xocayê padîşah Şehrî Hafîz Efendî -ku di vê dewrê de di Artêşa Taybet (Ordîya Xessa) de tê peywirdarkirin- xalidî bû. Dîsa di vê dewrê de li Şamê li ser gora Mewlana Xalid turbe tê çêkirin û ji bo bikaranîna derwêş û kesên tîn serdanê, zawiye lê tê zêdekirin.<sup>354</sup> Em dikarin çapkirina *Dîwana* Mewlana Xalid jî encameke van têkiliyên baş bibînin. Jixwe piştî

---

351 'Ebdulcebar Kavak, "Helbestvaniya Mewlana Xalidê Şehrezorî û Helbestên Wî yên Kurdî", *Nûpelda*, j.4 (Havîn 2010), r. 12.

352 Di wergera tirkî ya kitêba Muhammed Emîn Zeki Beg de dinivîse ku dîwan bi emrê Siltan 'Ebdulhemîd Xan hatiye çapkirin lê ev xelet e. Bnr. *Kürtler ve Kürdistan Tarihi*, r. 318.

353 Rüya Kılıç, "Osmanlı Devletinde Yönetim-Nakşibendi İlişkinine Farklı Bir Bakış: Hâlidî Sürgünleri", *Tasavvuf: İlmî ve Akademik Araştırma Dergisi*, j.17 (2006), r. 105-106.

354 Hg., r. 110.

qedandina metnê *Dîwanê*, di dawiya kitêbê de bi helbesteke ‘erebî ji ber çapkirina wê pesnê padîşah tê dayîn (r. 96). Ji bilî vê çar kesan bi helbestkî û li gorî hesabê ebcêdê li ser sala çapkirina *Dîwanê* helbest gotine, ji van sê bi tirkiya osmanî yek jî bi farisî ye (r. 97-99).

Di jimara 10an a kovara *Jînê* de (2yê Sibata 1919an) bi îmzeyê M. Nejat Tewfîk, derbareyê Mewlana Xalid de nivîsek tê weşandin. Di nivîsê de Mewlana Xalid wekî “mezinê kurda” tê binavkirin û tê gotin ku KTMNCê, çapkirina berhemên edebî yên Mewlana Xalid ji xwe re kirine armanc.<sup>355</sup> Lê bi qasî ku em dizanin ev armanc pêk nehatiye.

Herekol Azîzan, derbareyê Mewlana Xalid de van agahiyan dide û paşê helbesteke wî ya bi kurdî nimûne dide:

“Şêx Xalid Ziyaedîn di terîqeta neqşibendî de şihba Xalidî daniye. Mewlana Xalid ji kurdên Silêmaniyê ye. Şêx Xalid herî ewilî li Bexdayê û di pey re li Şamê terîqeta xwe belav kiriye û di sala 1242an da li Şamê çûye rehmetê. Di çiyayê Çilyaran de veşartî ye. Mewlana Xalid şahirekî mitesewif e; û wî dîwaneke farisî heye. Min bi xwe dîwan ne dîtiye. Dibêjin ko di wê dîwanê de çend qesideyên bi kurdî an nîvkurdî hene. Me got nîvkurdî ji ber ko Mewlana di wan qesîdan de kurdî û farisî tevli hev kirine. Êdî mirov nizane ew qesîde bi kurdî an bi farisî ne.”<sup>356</sup>

Emîn Feyzî Beg, di berhema xwe ya bi navê *Encumenî Edîbanî Kurd* de derbareyê Mewlana Xalid de dibêje ku wî helbestên kurdî kêrî gotine.<sup>357</sup> Bi rastî jî di vê *Dîwana* çapkirî de tenê pênc helbestên wî yên bi zaravayê goranî hene.<sup>358</sup>

Li ser *Dîwana* Mewlana Xalid Abdulcebbar Kavak xebateke berfireh kiriye û hemû helbestên wî bi danberheva destxetan li ser sê beşan (farisî, ‘erebî û kurdî) amade kiriye.<sup>359</sup>

---

355 Bozarslan, *Jîn Kovara Kurdî-Tirkî 1918-1919*, c. II, r. 457.

356 Hawar Cild 2 *Hejmar 24-57 (1934-1947)*, amd. F. Cewerî, r. 816.

357 *Encumenî Edîbanî Kurd*, Amd. Emîn Feyzî Beg, H. 1339 (1920), Tercuman-i Heqîqet Metbe‘esi, İstanbul, r. 10.

358 Ji bo van pênc helbestan û wergera wan a kurmancî bnr. Kavak, “Helbestvaniya Mewlana Xalidê Şehrezorî û Helbestên Wî yên Kurdî”, r. 10-13.

359 Mevlânâ Halid-i Bağdâdî, *Divan*, amd. A. Kavak, weş. Semerkand, İstanbul, 2013.

## Nusxe

1. Beyazıt, H.X: Bayezid 3862.
2. Beyazıt, H.X: 9323.
3. Ozege, H.X: 0101314.
4. Millet, H.X: AEmtf03325.
5. Taksim, H.X: OE\_Far\_00105.

### **3.1.2. *Dîwan-i Et‘ime*, Mewlana Ebû Îshaq Hallac-i Şîrazî, Çapxaneya Ebuzziya, Stembol, H. 1302 (1885), 172+12 rûpel.<sup>360</sup>**

Ev kitêb hem bi naveroka xwe hem jî bi têkiliya xwe ya bi kurdî re balkêş e. Lewre ev dîwan bi farsî ye û helbestên di nav de hemû li ser xwarinê ne. Jixwe “et‘ime” bi ‘erebî pir jimareya te‘em ango xwarinê ye. Xwediyê dîwanê Ebû Îshaq/Bushaq (mirina wî H. 830/M. 1427) dibêje ku “piştî ustadên helbestê, tiştêkî ez binivîsim nema, ji ber wê min jî li ser xwarinê helbestên ku îştaha yekî vedikin nivîsî.” Ev dîwana qedîm di sala H. 1302/M. 1885an de ji aliyê Hebîb Efendî ve li Stembolê tê çapkirin.<sup>361</sup>

Tiştê ku vê dîwanê bi kurdî re têkildar dike û wê dike parçeyekî vê xebatê helbestê kurdî-lorî ye: Di dîwanê de di bin sernavê “we lehu fi’l-kurdiyyati we’l-loriyyat” de qesîdeyêke bi kurdiya lorî heye (r. 20-21). Qesîde ji 22 beytan pêk tê. Di dawiya wê de jî wekî nîşeyek hatiye nivîsîn ku di teshîha vê qesîdeyê de girêdayî zimanê lorî mane. Xuya ye çapker dema çapê ev helbest teshîh kiriye lê ji bo ku reseniya wê xirab nebe girêdayî zimanê lorî maye. Kurdiyyat û loriyyat peyvên pirjimar in, yanî mirov hêvî dike ku beşeke bi kurdî-lorî hebe lê di nusxeya çapkirî de tenê helbestek heye. Dibe ku di destxetên dîwanê de zêdetir helbestên kurdî-lorî hebin.

---

360 Ev kitêb di teza me de nebû, çimkî wî çaxî xebera me ji vê dîwanê û têkiliya wê ya bi kurdî re nebû. Ji bo ku em agahdar kirin ji Huseyn Şemrexî re minetdar in.

361 Ji bo jiyana Hebîb Efendî bnr. Ali Alparslan, “Habib Efendi”, *DIA*, c. 14, 1996, 370-371.

Ev kitêb, ji bo vê binbeşê îstisna ye, çimkî ne ji aliyê rayedarekî dewletê an jî ji aliyê saziyeke fermî ve hatiye weşandin. Lê di weşana wê de roleke komele û rewşenbîrên kurdî jî nîne. Wekî me gotî ew ji her alî ve îstîsna ye û me di “Armanc û Çarçoveya Xebatê” de got, ji bo ku kitêbek bibe mijara vê xebatê ne hewce ye bi temamî kurdî be; di nava wê de tenê beşek jî bi kurdî be ew besî me ye. Herwiha divê em bibêjin ku li gorî *Şerefnameya Şerefhanê Bedlîsî*, ku di sala 1597an de temam bûye, gelê lor beşek ji kurdan in<sup>362</sup> û dubeytiyên Baba Tahirê Uryan ên bi lorî ji nimûneyên kevintir ên edebiyata kurdî ya nivîskî ne.<sup>363</sup> Loma me ev kitêb jî li xebata xwe zêde kir.

Li jêrê emê beyta ewil û dawî ya vê helbestê bidin:

Ine kim arzûy lû hen quwwet-i can hen

Pûst kendet bikîm goşt-i berre-i buryan hen

Ine tûra suxen-i Bushaq ne tertîb-i te‘am

Enwerî hen û qesîde û xezel-i Selman hen

### **Nusxe**

1. Ozege, H.X: 0161903.

2. Ozege, H.X: 0101320.

3. Taksim, H.X: Bel\_Far\_00131.

### **3.1.3. *Türkçeden Kurd Lisanina Mutercem Ilmihaldir*, wer. Omer Ferîd, H. 1308 (1891), Çapxaneya Me‘mûretul‘ezîz, 48 rûpel.**

Li gorî agahiyên li ser bergê kitêbê, berhem ji bo ku zarokên kurdan agahiyên dînî hesantir hîn bibin, bi erêkirina Meclîsa Mearif a vîlayeta Elezîzê, bi emr û destûra walîtiyê di sala H. 1308/M. 1891ê de li Çapxaneya Me‘mûretulezîzê hatiye çapkirin.<sup>364</sup> Ji navê wê jî tê

---

362 Şerefhanê Bedlîsî, *Şerefname*, r. 62-63.

363 Abdurrahman Adak, *Destpêka Edebiyata Kurdî ya Klasîk*, ç.2, weş. Nûbihar, Stenbol, 2014, r. 120-132.

364 Îlmîhal, di *Eski Harflerlerle Basılmış Türkçe Eserler Kataloğu* ya M. Seyfettin Özege de (1977, r. 1913), bi qoda 21636 qeydkirî ye.

fêmkirin ku ev kitêb wergerek e û wergêrê wê Omer Ferîd e. Omer Ferîd li Mekteba Îdadî ya Elazîzê mamosteyê dîroka giştî ye. Agahiyên ser bergê pirtûkê ev in:

“Türkceden Kürd Lisanına Mütercem ‘İlmihaldir  
Ekrad etfaline istihsal-i ma’lûmat-ı dîniyye içün mûcib-i tes-  
hîlat olmak üzere Vilayet Meclis-i Ma’arifinin tensîbi üzeri-  
ne canib-i sami’î vilayet-penahîden verilen emr û müsa’ade  
mûcibince Ma’mûretu’l-‘azîz Matba’asında tab’ edilmiştir  
Mütercimi  
Ma’mûretulazîz Mekteb-i Î’dadî Tarîh-i ‘Umûmî Mu’allimi  
Omer/‘Emer Ferîd  
Sene 1308”

Di sala 1891ê de li Stembolê di kovara *Cerîde-i ‘Askeriye* de li ser vê pirtûkê nûçeyek tê weşandin. Kovarê ev nûçe ji rojnameya *Ma’mûretu’l-‘azîzê* neql kiriye.<sup>365</sup> Li gorî vê, waliyê bajêr ê ku ev kitêb daye wergerandin û çapkirin “Nesûhî Beg Efendî” ye. Kitêb ne tenê ji bo zarokan ji bo hemû kurdên wilayetê, bi taybetî ji bo yên gundan ku dînê xwe nizanin hatiye çapkirin. Li gorî nûçeyê, kurdên vê herêma Elezîzê piranî sunnî û xwedî hesasiyeta dînî ne lê bi zimanê wan nebûna kitêbeke wiha kêmasiyek bû. Bi taybetî melayên gundan vê kitêbê ji cimaeta xwe re bixwînin an jî zarokên kurdan piçekî hînî xwendinê bibin hewce namîne ku van pirsên dînî ji kesekî din bipirsîn, ev pirtûk besî wan e. Di nûçeyê de tê diyarkirin ku kurd miletekî jîr in loma hewldanên bo perwerdeya wan berhewa naçin.

Berhem kitêbeke dînî ye ku ji bo zarok û gundiyan hatiye amadekirin, loma bi awayekî hêsan qaîdeyên îmanê û esasê îbadetê li gorî fiqha henefîtiyê vedibêje. Di sê rûpelên wê yên dawiyê de dua û sûreyên ku di nimêjê de tene xwendin cih digirin. Ev beş tenê bi ‘erebî ye. Di çil û pênc rûpelên mayî de rûpelên rastê bi tirkîya osmanî, yên çepê wergera wê ya bi kurdî ne. Bi vî rengî berhem bi duzmaniya xwe balê dikişîne.

---

365 “Ma’mûretu’l-‘azîz Gazetesinde Okunmuşdur: Kürdce ‘İlm-i hal ve Muhammediyye”, *Cerîde-i ‘Askeriye*, No.275 (Yirmi Dokuzuncu Sene 16 Şa’ban 1308/27 Adar 1891), r. 12-13.

Tirkiya berhemê sade û sivik e, bo kurdiya wê jî em dikarin he-man tiştî bibêjin. Xusûsiyeteke din a ku xwendina metin hêsan dike jî hereke ne. Bi van herekeyan em bilêvkirina kelîmeyan hîn dibin û aşînayî fonetîka kurdiya wê dewrê dibin. Ev bo zimanzanan çavkanîyek muhîm e. Ya rastî kurdiya berhemê hêjayî lêkolînê ye, nexasim bo taybetmendiyên devokê û peyvên herêmi: Xa (xwe), şîve (şubhe, guman), avdaz (abdest, destilmêj), notul (mîna), hulistîyan (rabûn), damrandên (miçkirin), jûn (çok, kabok) û hwd.

Di kurdiya berhemê de gelek peyvên tirkî jî hene: îç (iç, nav), yanlîş (yanlış, xelet), omiz (omuz, mil), doxrîbûn (doğrulamak, rastbûn), dîmek (demek, gotin), bozmiş dekin (bozuyorlar, xira dikin) hwd. Dîsa gelek gotinên tirkî jî motamot li kurdî hatine wergerandin: Le nimiyê sekinîn-nimiyê rawestîyan (namaza durmak), qapanmişî erdê bû'ên (yere kapanmak), rûy xa le qible gerandên (yüzünü kibleye çevirmek), sivikce (hafifçe) hwd. Dawiya dawî hewce ye em bizanin ku wergêrê berhemê ne yekî profesyonel e û berhem li gorî devoka xwe tercume kiriye. Loma jî dikare ji bo devokên kurmancî bibe materyalek.

Em niha nikarin îddia bikin ku ev îlmîhal, kitêba ewil a çapkirî ye ku ji tirkî bo kurdî hatiye wergerandin, bo vê lêkolînê zêdetir û kûrtir hewce ne. Lê em bi rehetî dikarin bibêjin ku ew di vî warî de ji nimûneyên ewil e. Herwiha ev îlmîhala tirkî-kurdî ji bo kevneşopiya pexşana kurdî jî nimûneyeke muhîm e.

Ji ber ku ev kitêb li bajarekî wek Elezîzê dûrî navendê hatiye çapkirin, zêde belav nebûye û zêde kes jê agahdar nebûye. Lewre Mistefa Nerîman di xebata xwe ya bi navê *Bibliyografyay dûsed salî kitêbî kurdî 1787-1986* de kunyeya vê îlmîhalê nade. Dîsa Malmîsanîj jî di kitêba xwe ya bi navê *Türkiye ve Suriye'de Kurtçe Kitap Yayıncılığının Dunu ve Bugunu* û wergera wê ya îngilîzî *The Past and The Present of Book Publishing in Kurdish Language in Turkey* de behsa wê nake.

Kitêba *Türkçeden Kurd Lisanına Mütercem İlmihaldir*, di sala 2016an de li tîpên latînî hat veguhastin û wekî beşeke pirtûkê hat weşandin.<sup>366</sup>

---

366 Arslan, "Türkçeden Kürd Lisanına Mütercem İlmihaldir (1891, Elezîz): İlmîhaleke bi Tirkî û Wergera Wê ya Kurdî", *Kürdoloji Akademik Çalışmalar Cilt 1*, r. 246-272.

## Nusxe

1. Beyazıt, H.X: Bayazıt 7515.

### **3.1.4. *El-Hediyyetu'l-Hemîdiyye fî'l-Luxeti'l-Kurdiyye*, Yûsif Ziyaeddîn Paşa el-Xalidî, H. 1310 (1893), Çapxaneyaya Şirket-i Murettibiye, Derse'adet (Stembol), 319 rûpel.**

Ev ferheng ji aliyê Yûsif Ziyaeddîn Paşa (1844-1906) ve, ku di dema 'Ebdulhemîdê Duyem de li navçeya Mûtî ya Bedlîsê qeymeqamî kiriyê, hatiye amadekirin û bi destûra Wezaretê Perwerdeyê/Mearîfê di sala 1310/1893yan de li Stembolê hatiye weşandin. Amadekar Yûsif Ziyaeddîn Paşa, di nava berhemê de, di rûpelê 317an de bi erebî dibêje ku çapa vê qamûsê di "15 Zilhicce 1310"an de temam bû ku ev dîroka hicrî jî beramberî 30ê Hezîrana 1893yan tê.

Yûsif Ziyaeddîn Paşayê ku ferhenga xwe bi kurdî-'erebî amade kiriyê, ew îthafî padîşahê wê demê 'Ebdulhemîdê Duyem kiriyê û navê wê *El-Hediyyetu'l-Hemîdiyye fî'l-Luxeti'l-Kurdiyye* (Bi Zimanê Kurdî Diyarîya Hemîdî) daniye: Taybetiyek Yûsif Ziyaeddîn Paşa hebû, ew li kû derê wezîfedar bibûya zimanê wê herêmê hîn dibû. Gava li Mûtîyê qeymeqam e zimanê kurdî jî hîn bûye. Lê wî dîtîye ku ne ferheng ne jî rêzimana kurdî hatiye nivîsîn, li ser vê yekê xebata xwe ya *el-Hediyyetu'l-Hemîdiyye fî'l-Luxeti'l-Kurdiyye* amade kiriyê û pêşkêşî 'Ebdulhemîdê Duyem kiriyê. Wî di heman demê de li ser rêzimana kurdî jî xebateke bi 'erebî kiriyê.<sup>367</sup>

Diyar e ku amadekirina vê ferhengê ji bo Yûsuf Ziyaeddîn Paşa ewqas ne hêsan bûye. Di pêşgotina xebata xwe ya rêzimanî de ew vê yekê eşkere dibêje:

"Dema ez li Mûtîyê qaymeqam bûm, min nêrî ku zimanê kurdî digel ku ji aliyê miletek ve tê bikaranîn, hê ne ferhenga wî heye ne jî rêzimana wî. Loma ji bo xizmeteke însanî bikim û rê li ber birayên me yên kurd ên ku heta niha hatine jibîrîkirin vekim, min xwest ji bo vî zimanî ferheng û rêzimanekê amade bikim. Lê gelek mixabin ku

---

367 Mamoste Qedrî, "Vekolîneke kurt der barê Yûsuf Ziyaeddîn Paşa û xebata wî ya rêzimanî de", *Zend*, j.9, r. 81.

hê di serî de miradê min di ber min de ma. Çimki ji kurdan qet kesî guh neda vê fikra min û alîkariya min nekir. Ez bi tevayî heyr û mihirî mabûm ku Xwedê ji min re ‘alimekî zîrek û pispore şiyand ku ew ‘alim Mela Xalidê kurê Mela Xelîlê Sêrtî ye. Wî rê li ber min hêsan kir; gelek bêje û termên kurdî ji min re civandin; der barê rêzimana kurdî de agahiyên pir hêja bi min re parve kirin û bû sebeb ku ew xebat bi vî awayî derkeve holê.”<sup>368</sup>

Li gorî Celîlê Celîl, ev ferheng, di vê cureyê de kitêba ewil e, xwedî qiyametê bilind a çandî û edebî ye û çapkirina wê jî girîngiyek dîrokî dihewand.<sup>369</sup> Herwiha ev ferheng ji aliyê erdnîgariya dîrokî ve jî çavkaniyeke pir muhîm e. Ji ber ku tê de navê gelek gundan, bajaran, eşîran û hwd. derbas dibe.<sup>370</sup>

*El-Hedîyyetu’l-Hemîdiyye fî’l-Luxetî’l-Kurdiyye*, ne tenê wekî ferheng bi gelek awayan ji bo ziman û edebiyata kurdî berhemêke muhîm e. Naveroka wê nîşana vê ye: Sih rûpelên wê yên ewil derheqê gramera kurdî de ne. Di vê beşê de behsa mahiyeta zimanê kurdî, fonetîk, sentaks, mastar û demên kurdî û hê gelek mijarên din tê kirin. Di rûpelên navbera 33-266an de ferheng bi xwe heye. Di dewama wê de du helbestên Şêx Mihemedê Fersafî (r. 270-273), *Nûbehara Biçûkan* a Ehmedê Xanî (r. 279-292), *Fî Beyanî Erkani’l-Îslam* (r. 292), *Fî Beyanî’l-Îman* (r. 292-293), helbesteke kurdî (r. 293), *Eqîda Îmanê* ya Ehmedê Xanî (r. 294-297), helbesteke Şêx ‘Ebdullah Feyzî el-Muhemmedî el-Ensarî û helbesteke Mele Fethullahê Sêrtî ku pesnê kitêbê dide cih digire (r. 298-300). Di berdewama kitêbê de jî (r. 300-319) teqrîzên bi ‘erebî hene.

Li gorî belgeyê ji arşîva Osmanî Yûsuf Ziyaeddîn Paşa, ji bo ku li hemû kitêbxane û mektebên ku daxwaz dikin bê belavkirin ji vê ferhengê sêsed heb teberruken ango bêpere daye Wezareta Perwerdeyê.<sup>371</sup>

---

368 Mamoste Qedrî, hg., r. 82.

369 Celîl, *Kürt Aydınlanması*, r. 22.

370 A. Demir, “Li Ser el-Hedîyyeyê Vekolîneke Erdnîgariya Mêjûyî”, *Nûpelda*, j.9 (Bihar 2012), r. 35.

371 BOA. MF.MKT. 182/76, Dîrok: 19/Ra/1311 (H), 29.09.1893 (M).

*El-Hediiyetu'l-Hemîdiyye fî'l-Luxeti'l-Kurdiyye* di nav rewşenbîrên kurd de bûye sedema kêfxweşiyê, ev yek ji helbest û teqrîzên derbareyê wê tê fêmkirin. Ji xeynî van di hejmara 3yan a rojnameya *Kurdistanê* de nîrxandineke girîng a Mîqdad Mîdhet Bedirxan heye:

“Hin Xalidî hene, li Qudsa şerîf in. Yek ji van, xweyfezl û kerem Şêx Yûsuf Ziyaeddîn Paşa ye. Xwedê umrê wî dirêj û ilmê wî zêde bike! Berî şeş sala kitêbek çêkirîye, navê vê kitêbê **“El-Hediiyet’ul Hemîdiyye fî’l Luxet’îl Kurdîyye”** ye. Ev kitêb wek ‘erebî yi, behsa qewaidên ezmanê kurmancî dike. Luxatên kurmancî hemî gîhandine hev, vê kitêbê de nivîsîye. Mala wî ava, esasek ji ezmanê kurmanca re danî. Ez hêvî dikim ku ulema û mîr û paşayên kurda ji vê kitêbê peyda bikin. Gelek kitêbek qenc e. Ulemayên kurda re lazim e ku ew jî ji ezmanê xwe re tişkî binivîsin.”<sup>372</sup>

Gelo Yûsif Ziyaeddîn Paşa îlhama hediye kirina vê ferhengê ji Ebdulhemîdê Duyem re ji kû wergirt? Berî çapkirina ferhenga wî di sala 1892yan de ji aliyê R. Youssouf ve pirtûka *Grammaire Complète de la Langue Ottomane* tê weşandin û ew ji padîşah re tê diyarîkirin; ev îthaf hem bi tirkîya Osmanî hem jî bi frensî di nav pirtûkê de heye. Bi qenaeta me, Yûsif Ziyaeddîn Paşa ev xebat dîtiye û wî jî xwestiye ji zimanê kurdî ferhengê diyarî bide padîşah. Padîşah jî ev diyarî qebûl kiriye û ew di sala 1893yan de bi destûra fermî çap bûye.

“Eger ji bo wî nehatiba pêşkêşkirin nedihat çapkirin û dernediket.” Celîlê Celîl vê gotina Mele Necmeddîn neql dike û îddia dike ku destûra çapkirina vê kitêbê bi sernavê wê re ango bi diyarîkirina Ebdulhemîd re têkildar e.<sup>373</sup> Lê ya rastî ji belgeyeke arşîva Osmanî em hîn dibin ku Wezarata Perwerdeyê li ser fermana padîşahê vê ferhengê di sala 1906an de qedexa dike û ji Wezarata Karûbarên Navxweyî komkirina vê kitêbê daxwaz dike. Piştî vê yekê wezaret biryara berhev kirin û îmhakirina nusxeyan dide.<sup>374</sup> Di belgeyeke din a arşîvê de

372 Bozarslan, *Kurdistan Rojname Kurdî ya Pêşîn (1898-1902)*, c. I, r. 134-135.

373 Celîlê Celîl, *Jiyana Rewşenbiri û Siyasi ya Kurdan*, weş. Jina Nû, Uppsala, 1985, r. 29-30.

374 BOA. MF.MKT, 938/62, Dîrok: 11/Ca/1324 (H), 04.07.1906 (M); BOA. DH.MKT, 1097/41, Dîrok: 15/Ca/1324 (07.07.1906). Ji bo tîpguhêziya

ji bo vê ferhenga kurdî û elîfbayeke bi zimanê arnawidî tê gotin ku çap û weşandina kitêbên wiha ji siyaseta dewletê re pir bi zirar e.<sup>375</sup>

Weşandina ferheng û elîfbayekê çima ji siyaseta dewletekê re zirar be? Ferhengeke ku bi destûra wezaretê hatibe çapkirin, piştî 13 salan çima bê qedexekirin? Bersiva pirsê ewil rewşa siyasî ya Dewleta Osmanî ye. Ji ber ku di vê dewrê de tevgera arnawidan her ku diçe bi hêz dibe û hin ji wan daxwaza serxwebûnê dikin. Di tekoşîna arnawidan de nîqaşên alfabeyê jî cihekî muhîm digirin, ji ber ku netewperwerên arnawidan dixwazin derbasî tîpên latînî bibin lê Osmanî destûrê nade vê. Di vê dewrê de tevgera kurdan ne di asta ya arnawidan de ye û daxwazeke şênber a kurdan ji bo serxwebûnê jî nîne. Lê rayedarên Osmanî gelek caran rewşa kurd û arnawidan wek hev didîtin û ditirsîn ku bayê netewperweriyê ku ji Balqanan tê bandorê li rojhilatê împaratoriye jî bike.<sup>376</sup>

Bersiva pirsê duyem jî guherîna nêrîna polîtîk e û ji bo em vê guherînê fêhm bikin hewce ye em bûyereke dîrokî binîn bîra xwe: Sirgûna Bedirxaniyan. Şaredarê Stembolê Ridwan Paşa ji aliyê çend kesên kurd ve tê kuştin. Di vê sîûqesdê de navê ‘Elî Şamil Paşa û ‘Ebdurezaq Bedirxan jî derbas dibe. Piştî vê hadîseyê ‘Ebdulhemîdê Duyem, biryara sirgûna tevahiya mîrên malbata Bedirxaniyan û hê gelek kesên din dide.<sup>377</sup> Bi qenaeta me biryara qedexekirina *El-Hedîyyetu’l-Hemîdiyye fî’l-Luxetî’l-Kurdiyye* jî bi vê re têkildar e. Lewre sala sirgûnê û ya qedexekirinê yek e: 1906.

---

belgeyan bnr. Malmîsanîj, *İlk Kürt Gazetesi Kurdistan’ı Yayımlayan Abdurrahman Bedirhan (1868-1936)*, r. 87-89.

375 Gotina belgeyê wiha ye: “(Arnavud (Kürd) lisânlarınca bu misillü kütüb ve resâilîn tab’ ve neşri devletin siyâsetine fevku’l’âde muzarratı derkâr olduğundan...” Bnr. BOA. Y.PRK.MF., 5/32, Dîrok: 29/Z /1325 (H), 02.02.1908 (M). Ji bo tîpguhêziya temamê belgeyê bnr. Malmîsanîj, *İlk Kürt Gazetesi Kurdistan’ı Yayımlayan Abdurrahman Bedirhan (1868-1936)*, r. 89.

376 Arslan, “Ulemeden Münevvere Osmanlı Müelliflerinin Yerel Dillere Bakışı (Kürtçe Örneği)”, r. 269-270.

377 Malmîsanîj, *İlk Kürt Gazetesi Kurdistan’ı Yayımlayan Abdurrahman Bedirhan (1868-1936)*, r. 38.

Mehmed Emîn Bozarslan, *El-Hediyyetu'l-Hemîdiyye fî'l-Luxeti'l-Kurdiyye* derbasî tîpên latînî kir û wekî ferhengeke kurdî-tirkî ji nû ve weşand.<sup>378</sup> Zimanzana tirk Saime Inal Savi jî, ji bo tesbîtîkirina peyvên osmanî-tirkî yên tê de li ser *El-Hediyyetu'l-Hemîdiyye fî'l-Luxeti'l-Kurdiyye* û xebata Bozarslan lêkolînek kir.<sup>379</sup> Li gorî wê *El-Hediyyetu'l-Hemîdiyye fî'l-Luxeti'l-Kurdiyye* 5452 peyvî dihevwîne, Bozarslan ji van 516 heb negirtine û 947 heb jî lê zêde kirine û bi vî awayî ferhenga wî gihaye 5883 peyvên. Herwiha Bozarslan hin peyvên bi qertafa cî/çî ya tirkî guhertine. Bo nimûne; peyva sinetçî kiriye sinetker.<sup>380</sup>

*El-Hediyyetu'l-Hemîdiyye fî'l-Luxeti'l-Kurdiyye* ji aliyê Mihemed Mukrî ve li Lubnanê dîsa hat çapkirin<sup>381</sup> û ev çap paşê li Diyarbekirê jî hat weşandin.<sup>382</sup> Jan Dost, qismên erebî wergerande kurdî û ew wekî ferhengeke kurdî-kurdî hat weşandin.<sup>383</sup> Li ser vê ferhengê tezeke lîsansa bilind hate amadekirin<sup>384</sup> û beşa rêzimana kurdî ya bi erebî li tirkî hat wergerandin.<sup>385</sup>

### **Nusxe**

1. Millet, H.X: AE arb 4207
2. Millet, H.X: AE arb 04207 M

---

378 Yusuf Ziyaeddin Paşa, *Kürtçe-Türkçe Sözlük*, amd. M. E. Bozarslan, weş. Çıra, İstanbul, 1978, 404 r.

379 Saime Inal Savi, *Yusuf Ziyaeddin Paşa'nın El-Hediyyetü'l-Hamîdiyye'sinde Osmanlıca-Türkçe Taraması*, weş. Elila, Ankara, 1993.

380 Saime Inal Savi, hb., r. V, IX.

381 Yusuf Ziyaeddin Paşa el-Xalidî, *El-Hediyyetu'l-Hemîdiyye fî'l-Luxeti'l-Kurdiyye*, amd. Muhammed Mukrî, Mektebetu Lubnan, Bêrût, 1987, c. 1, 296 r.

382 Yusuf Ziyaeddin Paşa el-Xalidî, *El-Hediyyetu'l-Hemîdiyye fî'l-Luxeti'l-Kurdiyye*, amd. Muhammed Mukrî, Mektebetu Diyarbekir, Diyarbekir, 2011, 240 r.

383 Yûsuf Diyaeddîn Paşa, *Ferhenga Hemîdî/Kurdî-Kurdî*, amd. J. Dost, weş. Dara, Stenbol, 2017.

384 Nuriye Pilatin, *Yusuf Ziyâ El-Hâlidî'nin Hayatı ve Elhediyyetü'l-Hamidiyye Fî'l-Lûgati'l-kürdiyye Adlı Eseri (Metin İnceleme Ve Tasnif)*, Mardin: Mardin Artuklu Üniversitesi, 2020.

385 Yûsuf Ziyâ Paşa, *El-Kava'idu'l-Lugati'l-Kurdiyye-Mukaddime*, amd. A. Gemi-A. Yıldız, weş. Dara, Diyarbekir, 2021.

3. Milli, H.C: 06 Mil EHT A 40570
4. ISAM, H.X: KÜF.SÖZLÜK 153515
5. Suleymaniye, B: Kemal Edip K-Oğlu, H.X: 00349
6. Suleymaniye, B: A. Nihat Tarlan Matbu, H.X: 01269
7. DTCF, H.X: DTC168165
8. DTCF, H.X: DTC131078

### **3.2. Kitêbên Kurdî yên ku ji Aliyê Komele û Rewşenbîrên Kurdan ve Hatine Weşandin**

Dewra “Kitêbên Kurdî yên ku ji Aliyê Saziyên Fermî yên Dewleta Osmanî ve Hatine Weşandin” bi derketina rojnameya *Kurdistanê* diqede (1898). Lewre êdî weşaneke kurdî ku bi destê rewşenbîrên kurd tê çapkirin heye. Piştî vê rojnameyê bi du salan “Kurdistan ‘Azîmî Kavî Cem‘iyyetî” tê avakirin.<sup>386</sup> Ji vê komeleyê pê ve êdî di nav Dewleta Osmanî de rêxistinbûyîna kurdan a bi nasnameya xwe dest pê dike û êdî endamên van komeleyan ji bo çapkirina kitêbên kurdî, weşandina kovar û rojnameyên kurdî dikevine nav tevgerê.

Em dibînin ku avabûna komeleyên kurdî û xebatên wan ên rewşenbîrî li çapemenî û weşangeriya kurdî bandoreke mezin dike. Weşanên kurdî jî di geşedana nasnameya kurdî û fikra kurdayetî de bandoreke mezin pêk anî. Kurd, ku heta niha dûrî navendê, di nav şert û mercên xwe de dijîyan, êdî li paytexta împaratoriye bi komele û weşananên kurdî ango bi nasnameya xwe xuya dîkin. Xurtbûna nasnameya kurdî û fikra kurdayetî jî weşanên kurdî zêde dike. Bi vî rengî komele, weşan û nasnameya kurdî hevdu domîne dîkin ango hem ji hev hêzê digirin hem jî hêzê didine hev.

Bêstîsna hemû komeleyên kurdî behsa nezanî û paşdemayîna kurdan dîkin û ji bo kurdan girîngiya xwendin û nivîsandinê dubare dîkin. Ev sazî di rêziknameyên xwe de nîşan didin ku ewê li ziman û edebiyata kurdî xwedî derkevin û ji bo kurdan kitêban çap bikin. Bi rastî jî ji sala 1899an ku *Mewlida* kirdî ya Melayê Xasî çap

---

386 Malmîsanîj, *Yirminci Yüzyılın Başında Diyarbekir’de Kürt Ulusçuluğu (1900-1920)*, weş. Vate, İstanbul, 2010, r. 15-21.

dibe, heta avabûna Komara Tirkî, kitêbên kurdî yên çapbûyî piranî bi xeyretên van komeleyan û endamên wan in. Ji ber vê yekê em dikarin ji vê dewrê re “Dewra Komeleyan” jî bibêjin. Lê helbet ev komele jî bi demê re vediguherin, navberê didine xebatên xwe yan jî bi temamî betal dibin. Ji ber vê yekê emê vê dewrê bi bûyereke mezin bikine du beş.

### **3.2.1. Beriya Şerê Cîhanê yê Yekem (1898-1913)**

Em vê dewrê bi rojnameya *Kurdistanê* didin destpêkirin, jixwe piştî wê bi salekê, *Mewlûda* kirdî (kirdkî, dimilî, kirmancî, zazakî) ya Mele Ehmedê Xasî li Diyarbekirê çap dibe. Ev kitêb, di weşangeriya kurdî de mîladek e. Lewre yekem kitêba kurdî ye ku bi hewldanên rewşenbîrekî kurd hatiye çapkirin. Bi vê kitêbê di weşangeriya kurdî de dewra kitêbên ewil diqede, dewra netewperwerên kurd û komeleyên wan dest pê dike.

Piştî *Mewlûda* kirdî, di vê dewrê de heft kitêbên din ên bi kurdî çap dibin: *Mewlûda* Melayê Bateyî ya çapa Ehmed Ramîz, *Mewlûda* Melayê Bateyî ya çapa Haziq Efendî, *Mewlûda* Melayê Bateyî ya çapkerê wê nediyar, *Mewlûda* Melayê Bateyî ya çapa Mehmed Şefîq Arwasî, *Elîfbayê Kurmancî* ya Xelîl Xeyalî û *Xulaseî Eqaid* a Şêx ‘Ebdullahê Nehrî. Dîsa kitêba *Qewaîdî Lisanê Kurdî* ya Omer ‘Ewnî Efendî ku ne li ber dest e jî di vê dewrê de hatiye çapkirin.

#### **3.2.1.1. *Mewlidu’n-Nebî*, Mele Ehmedê Xasî, R. 1315 (1899), Çapxaneya Lîtoğrafya, Diyarbekir, 36 r.**

Bi qasî ku em dizanin berhema yekemîn û yekane ya kirdî ku di serdema Osmanî de çap bûye ev *Mewlûda* Mele Ehmedê Xasî ye. *Mewlid* bi şêweya mesnewiyê, bi awayekî menzûm hatiye nivîsîn. Di rûpelê destpêkê de bi tirkîya osmanî tê gotin ku ev mewlûda ku ji aliyê Ehmedê Xasî ve, yê ji gundê Hezanê ya navçeya Licê ya bajarê Diyarbekirê, bi zimanê zazayan hatiye nivîsîn, li ser destûra Wezareta Perwerdeyê ya bi tarîxa 25 Mart 1315/6 Nîsan 1899an de li çapxaneya Lîtoğrafya çarsed heb hatiye çapkirin.

*Mewlid* bi vê beytê dest pê dike:

Ez bi bismillahî îbtida kena  
Raziqî ‘aman û xasan piya kena

*Mewlid* tevî beşa destpêkê û di dawiyê de duaya mewlidê ji çar-deh beşan û sêsed û şêst û şeş beytan pêk tê. Di rûpelê 24an de bi awayê pexşan tê gotin ku ev “Mewlidê Kirdî” bi arîkariya Xwedê û bereketa pêxember di sala 1326ê tarîxa ‘erebî de hatiye temamkirin. Di rûpelê 25an de li ser tarîxa temamkirina berhemê bi hesabê ebcedê helbesteke ‘erebî cih digire. Di dawiya kitêbê de (r. 26) helbesteke ‘erebî ya Mele Fethullahê Sêrtî heye ku dîsa bi hesabê ebcedê tarîxa berhemê diyar dike. Dîsa li paşbergê kitêbê dibêje “Hediyesi altmış paredir” ango bihayê wê şêst pere ye.

Di arşîva Osmanî de belgeya destûra *Mewlida* kirdî heye. Di belgeyê de ji bo zimanê mewlidê carina “Zaza lisani” carinan jî “Zaza lisani uzere muharrer Kurdce mevlid” yanî mewlûda kurdî ya ku bi zimanê zazakî hatiye nivîsîn tê gotin. Herwiha em ji vê belgeyê hîn dibin ku Ehmedê Xasî gava mewlûd nivîsî hê feqe bû.<sup>387</sup>

Di dewra Osmanî de bi zazakî tenê ev kitêb hatiye weşandin lê di kovara *Hawarê* de ji nivîsa “Zarê Dumilî û Mewlûda ‘Usman Efendi” ya Celadet Alî Bedirxan em hîn dibin ku ‘Usman Efendiyê Babî jî di sala 1901ê de mewlideke bi dimilî nivîsiye. Wî di sala 1904an de li Diyarbekirê, piştî Meşrûtiyeta Duyem jî li Stembolê hewl daye ku wê çap bike lê ji ber ku li van çapxaneyan kesî ku reşbeleka/destxeta wî bixwîne nebû kitêb çap nebûye.<sup>388</sup> Ev *Mewlida* ‘Usman Efendiyê Babî cara ewil di sala 1933yan de ji aliyê Celadet Alî Bedirxan ve di nav Kitêbxana Hawarê de li Şamê çap dibe û paşê ji aliyê Ahmet Kirkan ve bi lêkolîneke berfireh bi tîpên latînî wek teza mastirê tê weşandin.<sup>389</sup>

*Mewlidê* kirdî ya Ehmedê Xasî heta niha gelek caran li tîpên latînî hatiye veguhastin.<sup>390</sup> Lê ya herî dawî bi amadekariya Roşan Lezgîn

387 BOA. MF. MKT. 442-56, Dîrok: 25/Za/1316 (H), 06.04.1899 (M).

388 *Hawar Cild 1 Hejmar 1-23 (1932-1933)*, amd. F. Cewerî, r. 604-605.

389 Ahmet Kirkan, *Bîyîşa Pêxemberî ya Osman Esad Efendî û Destpêkê Edebîyatê Klasîk yê Kirmanckî*, weş. Vate, İstanbul, 2018.

390 Malmîsanîj, “Mewlidê Nebî”, *Hêvî*, j.4 (Îlon 1985), r. 75-97; *Mewlûdê Nebî*, amd. Mihanî, weş. Firat, İstanbul, 1994.

pêk hatiye.<sup>391</sup> Di vê xebata Lezgîn de nusxeya *Mewlidê* jî wekxwe hatiye çapkirin. Lê ev nusxeya *Mewlidê* û nusxeya ku me ji Erziromê peyde kir, dîroka wan yek jî be ji aliyê mîzanpajê ve ji hev cuda ne. Xetên nusxeya Erziromê spehîtir û rûpelên wê jî bixemiltir in.

### **Nusxe**

1. Ozege, H.X: 0102383

### **3.2.1.2. *Mewlidu'n-Nebî bi'l-Luxeti'l-Kurdiyye*, H. 1324 (1906), weş. Kurdîzade Ehmed Ramîz, Çapxaneya Ictihad, Qahîre, 35+1 r.**

Ne li ser bergê ne jî di naveroka kitêbê de tu nîşane heye bê ka helbestvanê vê menzûmeyê kî ye. Lê kesên ku ji *Mewlûda* kurmancî hayedar in gava beyta ewil dixwînin pê derdixin:

Hemdê bê hed bo Xudayê 'alemîn

Ew Xudayê daye me dînê mubîn

Ev, *Mewlûda* Mela Huseynê Bateyî ye. Jixwe di nav kurmancan de gava mewlûd tê gotin *Mewlûda* Bateyî tê fêmkirin. Ya rastî bi hemû lehçeyên kurdî gelek mewlûd hatine nivîsandin. Li gorî xebata Hasan Arslan<sup>392</sup> tenê bi zaravayê kurmancî ji 40î zêdetir mewlûd hene lê ya herî kevin û navdar a Bateyî ye.

Nusxeyên destxet ên *Mewlûda* Bateyî pir in, lê wekî çap cara ewil di 1903an de li Berlinê di nav berhema A. v. Le Coq de bi ser navê “Haza Mewlîdu'n-Nebîyyu'l-Haşîmiyyi bi'l-Luxeti'l-Kurdiyyi Ehli'l-'Iraqiyyi” tê weşandin.<sup>393</sup> Wekî kitêbeke serbixwe jî cara ewil Ehmed Ramîz wê çap dike.

Di dawiya kitêbê de Ehmed Ramîz, ji xwendekaran rica dike ku ger li cem wan kitêbên kurdî hebin bo çapkirinê ji wî re bişînin. Di vir de gotina “ji namûs û xîreta qewmê xu” balkêş e ku têkiliya weşana kitêbên kurdî û fikra kurdayetiyê nîşanî me dide:

---

391 *Mewlidê Kirdî*, amd. R. Lezgîn, weş. Nûbîhar, Stenbol, 2013.

392 “Kürtçe Mevlidler”, *Kürtçede İslâmî İlimler*, ed. A. Timurtaş - F. İdiz, weş. Peywend, İstanbul, 2021, r. 207-208.

393 A. v. Le Coq, *Kurdische Texte -1-*, weş. Reichsdruckerei, Berlin, 1903, Beşa Zeyl, r. 49-94.

“Paş hemd û sena’ê tam ji bo Xaliqê enam, selat û selam ser fexrê enam digel enbiya’ê ‘ezam we al û eshabê wan ê kîram bê ku Xudê te’ala ji me ra muyesser kir Mewlûda kurdî. Ev car niyeta min ez kitêb û resailê kurdî teb’ û neşr bikim. Rica min ev e her çî li cem wî kîtabek kurdî hebit ji fezl û îhsana xu ya ji namûs û xîreta qewmê xu ji me ra bişînin, heta ku ez teb’ bikim.\* Paşî digel nusxa wî çend nusxeê din jî jê ra teqdîm dikim.”\*\*

Di kovara *Ictihadê* de derbareyê weşana vê kitêbê de îlanek heye. Di îlanê de tê gotin ku *Mewlûd* di çapxaneyê *Ictihadê* de hatiye çapkirin û cara ewil e tê weşandin.<sup>394</sup> Herwiha di fihrista çapxaneyê *Ictihadê* de jî danasîneke biçûk a vê *Mewlûdê* û kitêba *Emîr Bedirxan* heye.<sup>395</sup> Ji paşbergê kitêba *Xulaseî ‘Eqaid* jî em bihayê *Mewlûdê* hîn dibin: “Li Stembolê çil, li Kurdistanê bîst pere”. Li gorî îlana *Ictihadê* jî bihayê wê “1 Frenq” e.

Wekî ku tê dîtin, buhayê pirtûkê ji bo kurdên li welêt erzantir e; çimkî herçiqas ji ber zextan ew li dûriyê bin jî berê wan li welêt e, dixwazin weşanên xwe –ya rast deng û hizra xwe- bigihînin wir. Em dikarin bibêjin ku Ehmed Ramîz di vî warî de peyrevê Mîqdad Mîdhet Bedirxan e. Çimkî bi heman rengî avakare rojnameya *Kurdistanê* Mîqdad jî dibêje, ewê ji her hejmarê “2000 heban” ji bo ku li gundan û navçeyan bê belavkirin ji waliyên welêt re bişîne.<sup>396</sup> Lê ji ber zextan ev tu caran pêk naye. Babialî ango navenda burokrasiya Osmanî hê jimara duyem a rojnameyê nehatî weşandin biryara qedexeya wê derdixe.<sup>397</sup>

Ehmed Ramîz, di nivîsara xwe ya bi navê “Reşbelek” de derbareyê vê *Mewlûdê* de jî agahî dide: “Penc sal berê Misrê da “Mewlida

\* Di orîjînalê metnê de ev peyv “bikin” hatiye nivîsîn lê li gorî hevokê hewce ye “bikim” be.

\*\* Di orîjînalê metnê de xalbendî pir şaş bû, di veguhestinê de me rast kir.

394 “Kürdce Mevlidu’n-Nebî”, *Ictihad*, sal: 2, j.4 (Eylul 1907), r. 288.

395 *Matba’-a-i İctihâdın Fihrist-i Neşriyâtı*, Metbee-i İctihâd, Misr, 1908, r. 38-39.

396 Bozarslan, *Kurdistan Rojname Kurdî ya Pêşîn (1898-1902)*, c. I, r. 111.

397 Malmîsanij, *İlk Kürt Gazetesi Kurdistan’ı Yayımlayan Abdurrahman Bedirhan (1868-1936)*, r. 128.

kurdî” penc hezar teb’ û neşr kirim.” Bi rastî pênc hezar nusxe li gorî wê demê û hetta ji bo îro jî hejmareke pir zêde ye. Di dewama nivîsarê de em hîn dibin ku Ehmed Ramîz, ji bo mesrefa vê çapê 25 zêr ji berîka xwe daye, lê di encamê de tu kar/sûd ji vê bazarê nekiriye.<sup>398</sup> Ya rast ji vegotina wî ya jor tê fêmkirin ku ew çap û belavkirina kitêbên kurdî bi armancên netewî dike û çavê wî ne li pere ye, lê rewşa wî, rewşa weşangeriya kurdî ji nîşanî me dide.

Di rûpelê dawî yê *Mewlûdê* de di bin sernavê “unwan” de îbareyeke bi ‘erebî heye ku ev li Misrê navnîşana Ehmed Ramîz e: “Kurdîzade (Ehmed Ramiz) birewaqî’s-sadetu’l-ekrad bi el-Ezher bi Misr”.

*Mewlûda* kurmancî wekî metnekî dînî di nav gel de pir belav bûye. Sebebên vê pir in, lê bi qenaeta me du faktorên sereke hene; yek jê ji ber ku menzûm e, xwedî aheng e, herikbar e, loma li xweşiya millet diçe. Ya duyemîn jî ji ber ku zimanê wê zimanê gel e. Di vir de ji zimanê gel mebest ne sivikbûna zimanê wê ye, cureyê zimên bi xwe ye. Berevajî Quran û hedîs û kitêbên fiqhê yên bi ‘erebî, *Mewlûd* bi kurdî ye. Herwiha xwendina mewlûdê xwedî roleke civakî ye jî, wekî ku mirov li hev digihin, mirovên birçî têr dikin, ji bo xêra miriyan nan belav dikin hwd. Loma di nav baweriya gel de cihekî wê yê mezin heye. Alî Emîrî Efendiyê Diyarbekrî di sala H. 1296/M. 1879an de di berhema xwe ya *Mir’atul-Fewaid* de behsa Melayê Bateyî dike û dibêje mewlûda wî di nav kurdan de pir tê xwendin.<sup>399</sup>

Populerîteya mewlûdê ya di nav gel de xwe di nav weşangeriya kurdî de jî nîşan daye. Ji bilî vê çapa ku Ehmed Ramîz li Misrê kiriye, *Mewlûda* kurmancî di dema Osmanî de -bi qasî ku me di çarçoveya vê xebatê de dît- herî kêrîm pênc caran çap bûye. Bi vî rengî di dema Osmanî de kitêba ku herî zêde hatiye çapkirin *Mewlûd* e. Wekî heman cure hewce ye em *Mewlûda* kirdî ya Ehmedê Xasî jî bînine bîra xwe. Ji bo populerîteya *Mewlûdê* mîna keke balkêş jî îlaneke di rojnameya *Serbestîyê* de ye: Di nuxxeya 24ê Adara 1919an de tê gotin ku sihê vê mihê, roja yekşemê, piştî nîvro saet yekê, li avahiya “Kurdistan

398 “Reşbeleka Kurdîzade Ehmed Ramizê Licêyî”, amd. M. Serfiraz-B. Hawar, r. 8.

399 Arslan, “Ali Emîrî’nin Mir’âtü’l-Fevâ’id Adlı Eserinde Osmanlı Dönemi Kürt Şairleri”, r. 223-224.

Cem'iyet Evi" ya li Cagaloglu wê *Mewlûda* kurdî bê xwendin.<sup>400</sup> Li ser vê merasîmê di *Jînê* de jî nûçeyek heye. Li gorî vê, merasîm pêk hatiye. Keçeke kurd, ku wê rojê wê nikariba bê merasîmê, nameyeke bi hêstên netewî nivîsandî şandiye. Vê keçikê digel nameyê sepeteke xemilandî û qotiyek jî şandiye. Li ser daxwazê ev sepet û qotî li wir hatiye firotin û kesekî 570 lîra pê daye.<sup>401</sup> Piştî vê bi demekê, 20ê Hezîrana 1919an vê carê KKTC, merasîmeke mewlûd xwendinê çêdike.<sup>402</sup> Di nûçeya *Jînê* de nabêje bê ka mewlûd bi çi zimanî hatiye xwendin lê îhtimaleke mezin *Mewlûda* Melayê Bateyî ye. Bi vî rengî em dibînin ku rola civakî ya *Mewlûdê* di sedsala 20an de xwe di nav tevgera kurdî de jî nîşan dide, ew dîsa civakê/girseyan li hev dicivîne.

### **Nusxe**

1. Ozege, H.X: 0102384
2. Millet, H.X: AEmnz1369
3. Millet, H.X: AEMtfo8996
4. Milli, H.C: 06 Mil EHT A 10056
5. Taksim, H.X: MC\_Osm\_K.01236

### **3.2.1.3. *Mewlîdu'n-Nebî, Mela Huseynê Bateyî, R. 1324 (1908), weş. Diyarbekirli Haziq, 48 rûpel.***

Ev nusxeya *Mewlûdê* bi nivîseke tirkîya osmanî dest pê dike. Ji vê nivîsê em derbareyê nusxeyê de hin tiştan hîn dibin. Li gorî vê, kitêb bi ruxseta resmî, destûra Wezareta Perwerdeyê ji aliyê Haziq Efendiyê Diyarbekirî ve hatiye çapkirin.

Navê Haziq Efendî di kovara *Amid-i Sevda* ya Alî Emîrî de jî derbas dibe. Li gorî agahiya ku *Amid-i Sevda* dide, Haziq Efendî nûnerê kovarê ye û ew li Diyarbekirê li kêleka Sûka Ketenciyan bazirganekî muteber e.<sup>403</sup> Naxwe muhtemel e ku ev kitêb li Diyarbekirê hatibe

---

400 Arslan, "Serbestî Gazetesi (1918-1919) ve Bedirxanîler: Celadet Alî Bedirxan'ın Yazıları ve Kürtlere Dair Bazı Haberler", r. 432.

401 Bozarslan, *Jîn Kovara Kurdî-Tirkî 1918-1919*, c. IV, r. 713.

402 Hb., c. V, r. 932.

403 Murat Issi, "PEYMÂN -Diyarbekir'in İlk Hususi Gazetesi-", *e-Şarkiyat İlmî Araştırmalar Dergisi*, j.7 (Nisan 2012), r. 92.

çapkirin. Em dibêjin muhtemel, lewre di nava kitêbê de ne navê weşanxaneyê ne jî yê bajêr dinivîse. Îhtimaleke din a xurt jî Stembol e, ji ber ku piraniya metbûata kurdî li Stembolê bû. Bi qenaeta me îhtimala Diyarbekirê nêzîktir e, sebebek ji ber ku weşangerê wê li Diyarbekirê ye. Sebeba duyem balkêş e; xet û mîzanpaja vê *Mewlûdê* û ya *Mewlûda* kirdî ya Ehmedê Xasî ku li Diyarbekirê çap bûye pir dişibe hev, wekî ku ji yek çapxaneyê derketine.

Wekî cihê çapkirinê, di dîroka çapê de jî pirsgirêk heye. Lewre di binê rûpelê destpêkê de dîroka H. 1313 dinivîse, ev teqabulî 1895-1896ê mîladî tê. Di rûpelê 47an ê kitêbê de, piştî ku metnê *Mewlûdê* diqede îbareya “ketebehu Heseneyn er-Radûşî 1324” heye. Pêşî em şaşnivîsê sererast bikin: Heseneyn er-Radûşî hewce ye Huseyn el-Ertûşî bûya. 1324 jî di teqwîma rûmî de teqabulî 1908ê mîladî dike ku ev dîroka çapê ye. Ji ber ku 1908 sala Meşrûtiyeta Duyem e. Di wê dewra azadiyeke demkurtî de gelek kitêb, kovar û rojname çap dibin. Xuya ye ev *Mewlûd* jî di wê pêvajoyê de çap bûye. Jixwe di nivîsa bi tirkîya osmanî ya destpêkê de pesnê ‘Ebdulhemîdê Duyem jî tê dayîn û dua jê re tê kirin. Di îlana kovara *Ictihadê* ya derbareyê *Mewlûda* kurmançî de ku Ehmed Ramîz çapkiribû, dihat gotin ku *Mewlûd* cara pêşîn e tê çapkirin. Naxwe ev *Mewlûda* ku Haziq Efen-dî çap kiriye teqez piştî sala 1907an çap bûye. Sala 1313ê muhtemelen tarîxa destûrstandina ji Wezareta Perwerdeyê ye. Jixwe li gel salê hejmara destûrê jî dinivîse. Carinan ji ber bêderfetiye carinan jî ji sebebên din kitêb piştî ku destûr hate standin di cih de çap nahin. Lê di navbera destûrgirtin û çapkirina vê *Mewlûdê* de bi rastî jî demeke pir dirêj heye.

Di rûpelê ewil ê kitêbê de ew nivîsa bi tirkîya osmanî heye, navbera rûpelên 2 û 47an de tekstê *Mewlûdê* û di rûpelê 47 û 48an de jî duaya mewlûdê ya bi ‘erebî cih digire. Metnê *Mewlûdê* li gorî vê nusxeyê tevî destpêkê şazdeh beş e û bi giştî 560 beyt e. Destpêk bi besmeleyê dest pê dike û li serê her beşê sernavek heye.

Ev nusxeya *Mewlûdê* taşbasma ango çapberî (lîtografya) ye û xetê wê pir spehî ye. Li gorî çapa Ehmed Ramîz, ev ji aliyê xet û mîzanpajê ve pir pêşketî ye.

## **Nusxe**

Di kitêbxaneyên fermî yên li Tirkîyeyê me tu nusxeyên vê *Mewlûdê* nedît. Birêz Dr. Abdurrahman Adak, kopyayeke wê ji kitêbxaneya xwe ya şexsî de da me, em jê re minetdar in. Herwiha di arşîva *Nûbiharê* de jî nusxeyeke vê *Mewlûdê* heye.

### **3.2.1.4. *Elîfbayê Kurmancî*, Xelîl Xeyalî, R. 1325 (1909), weş. Kurdîzade Ehmed Ramîz, Stembol, 27 rûpel.**

Elîfba, navê xetên aramî-erebî ye. Piştî belavbûna îslamê ya di nav kurdan de, kurdî piranî bi van xetan hatiye nivîsîn. Xelîl Xeyalî jî, di vê kitêbê de li ser xwendin û nivîsandina kurdî ya bi herfê 'erebî lêkolîn kiriye û hewl daye ku ji kurdiya kurmancî re elîfbaye-ke standart saz bike.

#### **Nîqaşên li Ser Xetan: Elîfba yan Alfabe?**

Nîqaşên li ser alfabeyê di nav rewşenbîrên Osmanî de hê di dema Tenzîmatê de dest pê dike, lê geşedana vê nîqaşê piştî Meşrûtiyeta Duyem e. Munaqeşeyên di nav rewşenbîrên Osmanî de tesîrê li entelijansa kurdan jî kiriye. Bi taybetî di *Rojî Kurdê* de ev nîqaş bi gelek nivîsên cuda tê meşandin. Li gorî Zinar Silopî, cara ewil di sala 1913an de Faîz Beg derbasbûna alfabeya latînî pêşniyazî Civata Hêvî dike û 'Ebdullah Cevdet jî di *Rojî Kurdê* de vê fikrê diparêze.<sup>404</sup>

Bi rastî jî hê di hejmara ewil a *Rojî Kurdê* de 'Ebdullah Cevdet dibêje hewce ye em herfên ku niha tê bikaranîn terk bikin û ji bedêla wê derbasî herfên nû bibin ku zarokekî heft-heşt salî di qedera mehekê de karibe xwendin û nivîsandina wê hîn bibe.<sup>405</sup> 'Ebdullah Cevdet rasterast nabêje em derbasî tîpên latînî bibin lê tê fêmkirin ku mebesta wî ev e. Di heman hejmarê de nivîskarê bi navê Suleymaniyeli Mes'ûd, diyar dike ku sebeba paşvemayîna misilmanan şiklê herfên wan e. Lewre herfên 'erebî dikevîne gelek şiklan, ji ber vê jî hînbûn û hînkirina wan zehmet e. Çareserîya vê jî di perwerdeya destpêkê de, ji bo her herfê bikaranîna tenê şiklekî ye. Nivîskar

---

404 Silopî, *Doza Kürdüstan*, r. 164.

405 *Di Sedsaliya Wê de Rojî Kurd 1913*, amd. Koma Xebatên Kurdolojîyê, r. 100.

bi vê armancê elîfbayeke ku ji çil herfî pêk tê amade kiriye û hetta di gotara xwe de cih daye bendeke ku bi vê elîfbayê hatî nivîsîn.<sup>406</sup> Suleymaniyeli Mes'ûd, terkkirina herfên 'erebî pêşniyaz nake, tenê dixwaze wan hêsantir bike û ew, pîrsgirêka elîfbayê/alfabeyê ne tenê ji bo kurdan, ji bo hemû misilmanan difikire.

Di hejmara 2yan a *Rojî Kurdê* de jî nîqaşa alfabeyê dewam dike. Ta'mîm-i Ma'arif ve Islah-i Hurûf Cem'iyeti [Komeleya Belavkirina Perwerdeyê û Rastkirina Herfan-TMIHC], nameyekê ji *Rojî Kurdê* re dişîne û bi vî awayî tevî nîqaşa alfabeyê ya kurdan dibe. Ev komele li dijî alfabeya latînî derdikeve, argumana wan ev e ku terkkirina herfên 'erebî wê têkiliya gelên misilman bi zimanê 'erebî re qut bike û ev jî wê misilmantiyê bibe tunebûnê. Ew peyvên wekî "Qur'an, hedîs, hades, muhaddis, muhdes, sunnet, ferz, ferâ'iz, tâ'et" mînak dide ku ev di jiyana her misilmanî de hene û ev peyv li alfabeya latînî hejdeh tîpên nû jî bîr zêdekirin dîsa bi rastî nayê nivîsandin, ji ber vê yekê jî ew îddia dikin ku nivîsandina wê ya ji bilî herfên 'erebî, wê kurdî xerab bike. Ji ber van sedeman wan rêça sererastkirina herfên 'erebî hîlbijartîye û encûmeneke taybet li ser vê xebatek pêk aniye. Li gorî vê yekê wê hin herfên nû li elîfbaya 'erebî bêne zêdekirin û hemû herf weke yên latînî jî hev cuda bêne nivîsandin. Di nameya TMIHCê de bi vê elîfbaya nû metnên mînak jî hatine nîşandan.<sup>407</sup> Di hejmarê sêyemîn a *Rojî Kurdê* de, di rûpelê dawî de vê carê beşa ewil a *Mewlûda* Melayê Bateyî bi vê nivîsa nû tê weşandin.<sup>408</sup> Di heman hejmarê de Mehmed Salih Bedirxan jî bi nivîsekê piştgiriya vê elîfbaya nû ya TMIHCê dike û beyteke ji *Mem û Zînê* bi vê elîfbayê dinivîsê. Li gorî wî, hewce ye rayedarên Civata Hêvî têkiliyê bi TMIHCê re deynin da ku encamekê ji vê xebatê bistînin. Piştî wê jî hewce ye bi arîkariya pişporan li ser kitêbên rêzimanê xebat bêne kirin.<sup>409</sup>

---

406 *Di Sedsaliya Wê de Rojî Kurd 1913*, amd. Koma Xebatên Kurdolojiyê, r. 112-113.

407 *Di Sedsaliya Wê de Rojî Kurd 1913*, amd. Koma Xebatên Kurdolojiyê, r. 144-147.

408 *Di Sedsaliya Wê de Rojî Kurd 1913*, amd. Koma Xebatên Kurdolojiyê, r. 197.

409 *Di Sedsaliya Wê de Rojî Kurd 1913*, amd. Koma Xebatên Kurdolojiyê, r. 143-144.

Weşandina metnan a bi vê elîfbaya nû di *Hetawî Kurdê* de jî dewam dike. Di rûpelê dawî yê hejmara yekem de beşa duyem<sup>410</sup>, di rûpelê dawî yê hejmara duyem de beşa sêyem a *Mewlûda* kurmancî bi vî rengî tê weşandin.<sup>411</sup>

‘Ebdurezaq Bedirxanê alîgirê Rûsyayê, di mijara alfabeyê de cuda difikire: Ew dixwaze di bingeha nivîsandina kurdî de alfabeya rûsî deyne.<sup>412</sup> Yekî din ê ku di vê mijarê de cuda difikire jî Mewlanzade Rif’et e: Li gorî wî kurd û ermenî ji heman kokê ne, ew herdu jî ji çiyayên Filîstîne heta şarê Rewandûzê ewladê “urdu”yan in. Bi vê elîfbaya niha em nikarin zimanê xwe biparêzin, hewce ye em herfên xwe yên qedîm vejînin.<sup>413</sup>

Zeynelabidîn Zinar dibêje ku Xelîl Xeyalî beriya Celadet alfabeya latînî bi kar anîye.<sup>414</sup> Li gorî Salih Akin jî di 1920-1921ê de du kurdên bi eslê xwe Bitlîsî, Xelîl Xeyalî û Mihemed Emîn, li Stembolê bi guhaztina kurdî ji herfên erebî bo tîpên latînî mijûl bûne.<sup>415</sup> Wan ji bo van îddiyên xwe çavkaniyek nîşan nedane lê em dizanin kesê ku cara pêşîn ev îddîa avêtiye ortê Celîlê Celîl e: “Orbîlî [Hovsep Orbeli, m. 1961], di 1919-1920an de, alfabeyek çêkir. Ev xebata Orbîlî yarmetiyekî mezin û girîng da Kurdên Bitlîsê. Kesên wek **Xelîl Xeyalî** û Mehmed Emîn, li ser vê bingehe alfabeyeke kurdî ya latînî danîn.”<sup>416</sup>

Gelo Xelîl Xeyalî, bi tîpên latînî mijûl bûye? Eger bûbe çiqasî bûye? Ev ne diyar e. Delîleke ku van îddiyên jor îsbat bike jî li ber destê me nîne. Lê berhema Xelîl Xeyalî ya bi herfên ‘erebî, *Elîfbayê Kurmancî*, bi hemû girîngiya xwe li ber destan e.

---

410 *Hetawî Kurd*, j.1 (11 Teşrîniewwel 1329/24 Cotmeh 1913an), r. 32.

411 *Hetawî Kurd*, j.2 (21 Teşrînisani 1329/4 Kanûn 1913), r. 32.

412 *Autobiografîya Ebdurrizaq Bedirxan*, wer. û amd. Celîlê Celîl, weş. Havîbûn, Berlin, 1999, r. 33.

413 Mevlânzade Rif’et, “Muhterem “Hetawî Kurd” Gazetesi Müessislerine”, *Hetawî Kurd*, j.2 (21 Teşrînisani 1329/4 Kanûn 1913), r. 2-3.

414 Zeynelabidîn Zinar, *Nimûne Ji Gencîneya Çanda Qedexekirî*, Stockholm, 1991, r. 179.

415 Salih Akin, *Lêkolînên Zimannasiya Kurdî*, weş. Avesta, Stembol, 2013, r. 23.

416 Celîlê Celîl, *Jiyana Rewşenbiri û Siyasî ya Kurdan*, r. 140.

## Xelîl Xeyalî û *Elîfbayê Kurmancî*

Xelîl Xeyalî, di warê zimên de pir hasas e û girîngiyeke mezin dide xwendin û nivîsandina bi kurdî. Di nivîsa xwe ya bi navê “Ziman û Nezaniya Kurdan” de gazinan ji şêx û mela û bi giştî ‘ulemayan dike ku çima ew bi zimanê xwe nanivîsin lê bi ‘erebî, farisî û tirkî dinivîsin. Ew dibêje heta em bi zimanê xwe nexwînin û neniwîsin, em ji belaya nezaniyê xilas nabin û hebûn û tunebûna me di nav alemê de wê yek be. Di vî warî de Şêx Ubeydullah, Şêx Ehmed Kaka û Şêx Mihemedê Fersafî wek mînak nîşan dide ku ewan ev heqîqet fêm kiriye û li zimanê xwe xwedî derketine.<sup>417</sup> Dîsa di nivîsa xwe ya bi navê “Ziman” de ew ji “şeş mîlyon” kurdî û bi taybetî ji mezinê wan dipirse ku wan ji bo xwe çi kiriye û di dawîya nivîsê de deh hewcedariyên kurdan rêz dike. Ji van a yekem “ji bo zû xwendin û nivîsandinê herfek”, a duyem jî “ser terzek nû elîfbayek” e.<sup>418</sup>

Xelîl Xeyalî, hasasiyeta xwe ya derbareyê kurdî de di pratîkê de jî nîşan daye û kitêbeke bi navê *Elîfbayê Kurmancî* amade kiriye. Berhem bi nasandina herf û îşaretên herekeyan dest pê dike. Dûvre bi pevgirêdanên van herf û îşaretan peyv, di dawiyê de jî hevok pêk tên. Di bin sernavê “Îbare” de metnekî kurt ê xwendinê (r. 23-24) heye. Hevokên di vê beşê de fikrîyata Xelîl Xeyalî û gelek rewşenbîrên kurd ên wê demê nîşan dide. Em dikarin van hevokan bikine çar beş: peyamên dînî (*sewab bike, guneh meke, limêj bike, rojî bigir* hwd), peyamên civakî (*dil kesik mehile, ji mezinan ra hurmet bike, destê wan ramûse, edeb hîn be, hesûdî meke, dê û bavê xo hez bike* hwd), peyamên perwerdeyî (*ders bixwîne, bextiyariya du alem di xwonden we nivîsandinê de ye, bê van tiştik nabe* hwd) û peyamên welatperwerî (*zimanê kurmancî ho be, muhebbeta welat ji îmanê ye* hwd). Di dawîya berhemê de jî duayên amentu, tehiyyat, weccehtu û qunût cih digrin (r. 24-26).

Di rûpelê dawî yê kitêbê de “Rica”yeke Ehmed Ramîz heye. Ehmed Ramîzê ku di dawîya *Mewlûda* kurmancî de daxwaza kitêbên

---

417 *Di Sedsaliya Wê de Rojî Kurd 1913*, amd. Koma Xebatên Kurdolojiyê, r. 160-161.

418 *Di Sedsaliya Wê de Rojî Kurd 1913*, amd. Koma Xebatên Kurdolojiyê, r. 186-187.

kurdî dikir, vê carê daxwaza arîkariyê dike. Lewre êdî li ber destê wî kitêbên kurdî hene, hetta ew mizgîniya kitêbên nû jî dide, lê ji bo çapkirina wan arîkarî lazim e. Ji naveroka vê ricayê jî tê fêmkirin ku weşangeriya kurdî ne bi meqsedên tîcarî lê ji bo xizmeta kurdariyê tê kirin: “Rica: Bihayê vê ji bo teb’kirina kutubê Kurma[n]can e. Li pey vê, qira’et û serf û nehwe zimanê Kurmancî jî dê teb’ bibe. Feqet em muhtacê arîkirinê ne. Bê arîkirin tiştik nabe. Hêvîya me xîret û cuwamêriya Kurma[n]can e. Meqsedê me ji zarokê Kurmancan ra nîşandana rêya ‘ilm û hunerê ye. Ketebe Mûsa ‘Ezmî el-Kurdî.”\*

Ji gotina dawî tê fêmkirin ku ev kitêb bi xeta Mûsa ‘Ezmî el-Kurdî hatiye çapkirin. Mûsa ‘Ezmî el-Kurdî (1891-1982), bi navê xwe yê fermî Hamit Aytac, li Diyarbekirê hatiye dinyayê. Ew di dema dawî ya Osmanî de û di dewra Komarê de yek ji xettatên navdartirîn e.<sup>419</sup>

Ji paşbergê kitêba *Xulaseî ‘Eqaid* em hîn dibin ku bihayê vê kitêbê “li Stembolê bîst, li Kurdistanê deh pere” ye. Di kataloga Kitêbxaneyê Dewletê ya Beyazîtê de jî tê nivîsîn ku ev kitêb “taşbasma”ango çapberî ye.

Seidê Kurdî, di kitêba *Îki Mekteb-i Musîbetin Şehadetnamesi yahud Divan-i Harb-i ‘Orfî ve Sa’id-i Kurdî* de, ji bo vê berhemê pesnê Xelîl Xeyalî dide, wî mînak nîşan dide û dibêje: “Vî kesî nimûneyeke xîretê nîşan daye û ji bo zimanê me yê ku hewcedarê kemilandinê ye bingehek daniye. Ez ji ehlê xîretê re şîret dikim ku ber herine berhema wî û li ser bingeha wî bîna ava bikin.”<sup>420</sup>

Kitêba *Elîfbayê Kurmancî*, cara ewil Mehmet Bayrak bi awayê wekxwe weşand.<sup>421</sup> Mamoste Qedrî, *Elîfbayê Kurmancî* veguhaste tîpên latînî û wekî gotar weşand.<sup>422</sup> Dîsa ew, di gotareke derbareyê kurtejiyana Xelîl Xeyalî de jî behsa *Elîfbayê Kurmancî* dike.<sup>423</sup>

---

\* Di orjînalê metnê de xalbendî pir şaş bû, di veguhestinê de me rast kir.  
419 M. Hüsrev Subaşı, “Hamit Aytac”, *DIA*, c. 4, 1991, r. 287-289

420 Bedî’uzzaman, *Îki Mekteb-i Musîbetin Şehâdetnâmesi Yâhûd Dîvân-i Harb-i ‘Örfî: ve Sa’îd-i Kurdî*, r. 48.

421 Bayrak, *Açık-Gizli Resmi-Gayr-ı Resmi Kürdoloji Belgeleri*, r. 462-505

422 Mamoste Qedrî, “Elfabeya Xelîl Xeyalî”, *Bîr*, j.3 (Payîz 2005), r. 92-106.

423 Mamoste Qedrî, “Xelîl Xeyalî”, *Bîr*, j.10 (Zivistan 2009), r. 114-118.

Ji xeynî vê elîfbayê, di paşbergê kitêba *Îki Mekteb-i Musîbetin Şehâdetnâmesi yahud Divan-ı Harb-i ‘Orfî ve Sa’id-i Kurdî* de, di nav kitêbên ku Ehmed Ramîz çapkirine de navê “Kurdce Serf Nehw” jî derbas dibe. Ya rastî di çavkaniyan de derbas dibe ku Xelîl Xeyalî û Ziya [Gokalp] Efendî li ser gramer û ferhenga kurdî xebitîne, lê Ziya Efendî ev xebat bi xwe re biriye Diyarbekirê û piştî jî bi gotina “min ew şewitandin” nedaye Xelîl Xeyalî.<sup>424</sup> Nivîskara tirk Halide Edip Adıvar jî di bîranên xwe de dibêje ku Ziya Gokalp di ciwaniya xwe de li ser kok û gramera kurdî xebitiye û ev yek bûye sebeb ku wekî netewperwerekî kurd bê nasîn.<sup>425</sup> Dîsa Mûsa Anter di bîranînên xwe de behsa gramera kurdî ya Ziya Efendî ya bi destnivîsa wî û lêkolînên Xelîl Xeyalî yên li ser zimanê kurdî dike, ku ev herdu li cem wî hebûne. Lê çaxê di sala 1972an de tê girtin ew jî têne desteserkirin û piştî ‘efûyê gava li serencama wan dipirse, jê re tê gotin ku kitêbxaneya wî tev hatiye şewitandin.<sup>426</sup> Dawiya dawî îro di destê me de kitêbeke serf û nehwa kurdî ku nivîskarê wê Xelîl Xeyalî ye nîne.

### **Nusxe**

1. Ozege, H.X: 0110017.
2. Ozege, H.X: 0110018.
3. Beyazit, H.X: K.201357.

### **3.2.1.5. *Musehheh Mewlîdê Seadetê Peyxemberî, Xoce Huseynê Ertoşî (Mela Huseynê Bateyî), R.1325 (1909), amd. ‘Ebdussemmed Fexrî, Çapxaneya Kutubxane-i Cihan, Derse‘adet (Stembol), 48 rûpel.***

Li gorî bergê kitêbê “nazim” ango helbestvanê vê mewlûdê ji feqehên Şafîtiyê “Xoce Huseynê Ertoşî” ye. Kesê ku ev mewlûd ji çapê re amade kiriye jî “ji mamosteyên Mekteba Î‘dadiya Erziromê Seyîd ‘Ebdussemmed Fexrî” ye. Wî ev weşan ji ber nusxeya esasî ya mewlûdê bi rêbaza teshîhê amade kiriye. Dîsa li ser bergê kitêbê

424 Alakom, *Eski İstanbul Kürtleri*, r. 108; Göldaş, *Kürdistan Teâli Cemiyeti*, r. 28.

425 Halide Edib, *Memoirs of Halide Edib*, John Murray (Publishing house), (first published), London, 1923, r. 317.

426 Musa Anter, *Hatıralarım*, ç.3, weş. Aram, İstanbul, 2013, r. 65.

dinivîse ku ji bo çapkirina vê mewlûdê ji Wezareta Perwerdeyê destûra fermî hatiye wergirtin.

Li gorî dîrok û hejmara li ser berg, me di arşîva Osmanî de destûrnameya çapkirina vê mewlûdê dît (BOA.MF.MKT./774-29). Li gorî vê belgeyê pêvajoya destûrê wiha pêk hatiye:

1. ‘Ebdussemed Fexrî, kitêba ku dixwaze çap bike bi sê nusxeyan û daxwaznameyekê pêşkêşî Wezareta Perwerdeyê dike. Ji ber ku mijara kitêbê dînî/îslamî ye Wezarata Mearifê ji bo destûra çapkirina Mewlûdê ji Daîreê Meşayixê Îslamî re dinivîse: 29 Şe’ban 1321/20 Mijdar 1903.

2. Daîreê Meşayixê Îslamî sê nusxeyan dide ber hev, nusxeyeke li ba xwe digire û ji bo çapkirina kitêbê fitûyê/destûrê dide. Destûrnameya ku di bin de navê Şeyxulîslam Mehmed Cemaleddîn heyê, dîroka wê ev e: 12 Zilqe’de 1321/18 Kanûnisanî 1319/30 Çile 1904.

3. Lê Daîre dibêje ji bo kontrolkirina piştî çapê lazim e nusxeyeke destnivîs ji Dahiliye Nezaretî (Wezareta Karê Navxweyî) re jî bê şandin. Li ser vê yekê nusxeyek ji wir re jî tê şandin: 26 Muharrem 1322/12 Nîsan 1904.

Bi vî şeklî 4 Muharrem 1322/8 Mart 1320/21 Adar 1904an de Mewlûda kurmancî ji Wezareta Perwerdeyê destûra fermî ya çapê werdigire. Lê çapkirina kitêbê dimîne piştî Meşrûtiyetê.

‘Ebdussemed Fexrî kî ye em nizanin, di çavkaniyeke din de em rastî navê wî nehatin lê ji belgeyê arşîva Osmanî (BOA.MF.MKT./748-24) em hîn dibin ku ‘Ebdussemed Fexrî di dîroka 11.11.1903yan de li Erziromê li Mekteba Îdadî wekî mamosteyê dîrokê û zimanê tirkî hatiye wezîfedarkirin. Dema ji bo çapa vê mewlûdê serî li wezaretê xistiye ew hê di vê wezîfeya xwe de bû.

Di vê çapê de di navbera rûpelên 2 û 45an de tekstê *Mewlûdê* û di rûpelê 46 û 48an de jî duaya mewlûdê ya bi ‘erebî cih digire.

### **Nusxe**

1. Taksim, H.X: HP\_Osm\_00365.
2. Çapeke bêdîrok, muhtemelen ji serdema Komarê ye, li Met-be’eya Xulûsî çap bûye: Taksim, H.X: Bel\_Far\_00160.

**3.2.1.6. Xulaseî ‘Eqaîd, Şêx ‘Ebdullah Efendiyê Şemdînî (Nehrî), H. 1329 (1911), weş. Kurdîzade Ehmed Ramîz, Çapxaneya Manzûme-i Efkar, Stembol, 32 rûpel.**

Xulase û ‘eqaîd du peyvên ‘erebî ne. Xulase di vateya kurte de ye, ‘eqaîd jî pirjimariya eqîdeyê ye. ‘Eqaîd di heman demê de wekî têgeh navê şaxekî teolojiyê ye ku “bêyî ku nîqaş bike, bi awayekî kurte behsa esasên baweriya dînê îslamê dike”.<sup>427</sup>

Di edebiyata kurdî de di warê ‘eqaîdê de berhema ewil û ya herî navdar ‘Eqîdeya Îmanê ya Ehmedê Xanî ye. Xanî, ev berhema xwe di sala 1687an de temam kiriye.<sup>428</sup> *Nehcu’l-Enama* Mele Xelîlê Sêrtî û *Rewdetu’n-Ne’îma* Şêx ‘Ebdurrehmanê Axtepî jî di vî warî de muhîm in û ev her sê berhemen navborî jî menzûm in. Cihêtiya mezin a *Xulaseî ‘Eqaîdê* jî van berheman ev e ku ew pexşan e.

Li medreseyên kurdan jî berê de dihate gotin ku Şêx ‘Ebdullahê Nehrî kitêbeke ‘eqaîdê bi kurdî jî bo zarokên kurdan nivîsandiye.<sup>429</sup> D. N. MacKenzie dibêje ku Şêx ‘Ebdullah ev berhema xwe kêr zêde di salên 1800î de nivîsiye.<sup>430</sup> Ev berhema ku wekî destxet li medreseyên kurdan belav bûbû, cara pêşîn jî aliyê Kurdîzade Ehmed Ramîz ve li Stembolê tê çapkirin.

Kitêb bi muqeddîmeya muderrîsê Tekyeya Nehrî Omer bin Cercîs el-Beydawî dest pê dike. Ew di muqeddimeyê de dibêje ku wî ev berhema Şêx ‘Ebdullahê Şemdînî li ser “emr û îşareta” Seyîd Taha, jî bo weşandina wê nivîsandiye. Metnê *Xulaseî ‘Eqaîd*, jî rûpelê 4an, bi besmeleyê dest pê dike. Şêx ‘Ebdûllah, pêşî wateya kelîmeya şehadetê bi berfirehî rave dike. Di nav raveyê de wateya sîfatên Xwedê û agahiyên derbareyê jiyana Hz. Muhemmed de jî dide. Dûvre rîknên din ên îslamê dijmêre: Nimêj, zekat, rojî û hec. Di rûpelê şeşa de bi sernavê “rîknê îmanê şeş in” derbasî rîknê baweriya îslamê dibe:

---

427 Ahmet Saim Kılavuz, “Akaid”, *DIA*, c. 2, 1989, r. 213

428 Ehmedê Xanî, *Nûbehara Biçûkan*, r. 43

429 Seyyid Abdullah Nehrî, *Hulâsa-i Akaid Akaidin Özü*, amd. K. Yıldırım, weş. Semerkand, İstanbul, 2013, r. 31.

430 D. N. MacKenzie, “A Kurdish Creed”, dnd. *A Locust’s Leg: Studies in honour of S.H. Taqizadeh*, Percy Lund, Humphries & Co., London, 1962, r. 163.

Baweriya bi Xwedê, bi melaîketên wî, bi kitêbên wî, bi pêxemberên wî, bi qiyametê û xêr û şerê ku bi teqdîra Xwedê pêk tên. Di rûpelê 11an de metnê *Xulaseî 'Eqâidê* diqede lê Omer bin Cercîs el-Beydawî biyografiyeke kurt a Şêx 'Ebdullahê Nehrî lê zêde kiriye (r. 11-12). Berhem di rûpelê 12an de temam dibe û di bin de navê Omer bin Cercîs el-Beydawî û dîroka îstînsaxa wî cih digire: 14 Muhەرrem sene 329/3 Kanûnisanî sene 326, ev jî teqabulî 16ê Çileyaya 1911an dike.<sup>431</sup>

Destpêka *Xulaseî 'Eqâidê* wiha ye: “Bizane ruknê islamê pênc in, ruknê ewil kelimey şehadet e. “Eşhed” ez şahidiyê dikim “en la ilahe” ku nînin çu me’bûdek dî “illallah” xeyri zatek pak bî misl, ezelî û ebedî...”

Ev metin gelek caran -bi hinek cudahiyan- wekî metnekî anonim hatiye weşandin û îro jî di medreseyan de tê xwendin. Cara ewil Le Coq, destxeta wê ya bi sernavê “Fî Beyanî Erkani’l-Islam” di keşku-la xwe de bi awayê wekxwe weşandiye.<sup>432</sup> Zeynelabidin Zinar, îddia dike ku ev metin a Ehmedê Xanî ye û wî di nav *Hemû Berhemên Xanî* de ev jî weşandiye.<sup>433</sup> Di *El-Hediyyetu’l-Hemîdiyye fî’l-Luxeti’l-Kurdiyye* de jî, di berhevoka Le Coq de jî gava navê *‘Eqîda Îmanê û Nûbihara Biçûkan* tê weşandin, li sernavê wan navê Ehmedê Xanî bi eşkereyî tê nivîsandin. Lê gava ev metin tê weşandin li serê navê tu kesî nîne, angî ew wekî anonîm hatiye weşandin.

Xelîl Xeyalî, di sala 1913an de di *Rojî Kurdê* de bi gotina “ilmi-haleke kurmançî ji bo zarok[ên] kurmancan” behsa çapkirina vê eqâidê dike lê wekî berhema “Şêx ‘Ubeydullah en-Nehrî”.<sup>434</sup> Dibe ku ev şaşiyeke çapxaneyê be, çimkî navê ‘Ebdullah û ‘Ubeydullah bi herfên ‘erebî nivîsandina wan pir nêzîkî hev e.

Mackenzie, ku hê di sala 1962an de li ser metnê *Xulasî 'Eqâid* xebitiye, li ser destxeta Le Coq û *Xulaseî 'Eqâida* çapkirî lêkolîneke zimanî kiriye. Li gorî vê ew herdu tekst gelek nêzîkî hev in. Lê ji bo

---

431 Di orîjînalê metnê de sala hîcrî “339” hatiye nivîsandin lê xuya ye ev xeletîyeke çapê ye.

432 Le Coq, *Kurdische Texte -1-*, Beşa Zeyl, r. 40-47.

433 Ehmedê Xanî, *Hemû Berhem*, weş. Lîs, Diyarbakir, 2008, r. 357-363.

434 Di *Sedsaliya Wê de Rojî Kurd* 1913, amd. Koma Xebatên Kurdolojiyê, r. 225.

pirsa “gelo xwediyê vê eqaîdê Ehmedê Xanî ye yan Şêx ‘Ebdullahê Nehrî ye”, Mackenzie jî negihiştiye encamekê.<sup>435</sup>

Ji bîbliyografyaya C. J. Edmonds û ya Mistefa Nerîman em hîn dibin ku Huseyn Huznî Mukriyanî di sala 1925an de li Rewandizê bi navê *‘Eqîdey Îmanê* kitêbek çap kiriye ku nivîskarê wê Şêx ‘Ebdullahê Şemdînî ye.<sup>436</sup> Derfeta me ya dîtina vê kitêbê çenebû lê muhtemel e ku ew û *Xulaseî ‘Eqaîd* heman berhem bin.

Dawîya dawî, îddia pir, delîl kêr, lêkolîneriya kurdî qels e. Tiştê berbiçav ew e ku *Xulaseî ‘Eqîd*, ji aliyê Kurdîzade Ehmed Ramîz ve li Sembolê hatiye çapkirin û li serê jî navê Şêx ‘Ebdullahê Şemdînî (Nehrî) heye.

Wekî xwediyê berhemê, sala çapbûna vê kitêbê jî bi teşqeleye ye: Li ser bergê wê tu dîrok nîne. Di dawîya metnê de “Omer bîn Cercîs 14 Muharrem sene 329/3 Kanûnisanî sene 326” nivîsiye ku ew bermaberî 16ê Çileyê 1911an tê û Mackenzie di gotara xwe de ev wekî sala çapkirina kitêbê qebûl kiriye. Ehmed Ramîz jî serê sala 1912an heta tîrmehê li Kastamonuyê sirgûn e, loma îhtîmaleke mezin wî ev kitêb berî sirgûnê di mehên dawî yê sala 1911an de çap kiriye û hetta li gorî qenaeta me sebebeke sirgûna wî dibe ku ev kitêb bi xwe be, bi taybetî jî ber nivîsara wî ya “Reşbelek”.

Li jorê jî me got, Mackenzie di sala 1962an de gotarekê li ser *Xulaseî ‘Eqaîd* dinivîse, metnê wê derbasî latînî dike û werdigerîne îngilîzî.<sup>437</sup> Kadri Yıldırım jî *Xulaseî ‘Eqaid* wergerande tirkî û ew wekî kitêb çap bû.<sup>438</sup>

### **Reşbeleka Kurdîzade Ehmed Ramîz**

Di beşa duyemîn a vê kitêbê de ji rûpelê 13an heta dawiyê bi sernavê “Reşbelek” nivîsareke bi kurdiya kurmancî ya Ehmed

---

435 MacKenzie, “A Kurdish Creed”, r. 163-164.

436 C. J. Edmonds, “A bibliography of Southern Kurdish, 1920-36”, *Journal of the Royal Central Asian Society*, Vol. 24, Issue 3 (June 1937), r. 494; Mistefa Nerîman, “Bibliyografiya dîsed salî kitêbî kurdî 1787-1986”, r. 28.

437 MacKenzie, “A Kurdish Creed”, r. 164-170.

438 Seyyid Abdullah Nehrî, *Hulâsa-i Akaid Akaidin Özü*, amd. K. Yıldırım, weş. Semerkand, İstanbul, 2013.

Ramîz cih digire. Ev nivîsar bi ziman û naveroka xwe bi qasî *Xulaseî ‘Eqâidê* girîng e. Lewre Ehmed Ramîz di vê nivîsarê de fikrên xwe yên kurdîyê bi awayekî rêk û pêk dibêje û îzah dike. Ya rastî haya lêkolîneran ji “Reşbelek”ê hebû, Malmîsanîj<sup>439</sup> û Zeynelabîdin Zinar<sup>440</sup> behsa wê dikirin, ‘Ebdullah Varli ew dîtiye û xwendîye jî, lê paşê wîndî kiriye.<sup>441</sup> Piştî dîtina kitêba *Xulaseî ‘Eqâid* di paşîya wê de metnê “Reşbelek”ê jî giha ber destê lêkolîneran. Ew li tîpên latînî jî hate veguhastin û weşandin.<sup>442</sup>

Nivîsara Ehmed Ramîz bi gilî û gazin dest pê dike: “Kurd, “şêş milyon” hene. ‘Eceba heta nûha “şêş însan” rabûne qencîfîkî bo kurdan kirine? Kella summe kella”. Ew rexneyên tund li ‘alim, fazil û edebiyatvanan dike ku bi eslê xwe kurd in lê diçin xizmeta “xeyrê kurdan” dikin. Ew wan edebiyatvanên ku ji bo “se‘adeta qewm û eşîreta xo” naxebitin ji mel‘ûnan diwartir dibîne û wan bi xiyanetê tawanbar dike. Di vê mijarê de ew mîsala qumandaneke yûnanî dide ku îltîcayî dewleteke dijmin kiriye lê ji bo ku bêbextiyê li welatê xwe nekê xwe kuştîye.<sup>443</sup>

Gotinên Ehmed Ramîz ji bo dema xwe gelekî balkêş in: “Ez hemd û senaê bêpayan ji wî ‘Xellaqê ezeli we ebedî celle şe‘nehu’ ra dikim ku ez kurd xelq kirime, Ez, ezeli kurd hatime, îşallah ezê ebedî jî kurd herim, ezê kurd bimirim, ezê kurd rabim”.<sup>444</sup>

---

439 Malmîsanîj, ji Evdila Varli bihîştîye ku bi wî re destxeta Reşbelekê ya bi kurdî û ‘erebî heye. Bnr. *Yirminci Yüzyılın Başında Diyarbakır’de Kürt Ulusçuluğu (1900-1920)*, r. 20, jêrenot 27. Destxeta bi Varli re xuya ye ji orîjînalê wê hatiye kopyekirin. Sedema gotina kurdî û ‘erebî ev e, di nava Reşbelekê de helbesta ‘erebî ya bi navê *Qesîdeî Lamiyye* jî cih digire.

440 Zinar ji xelkê Licê bihîştîye ku kitêbeke Ehmed Ramîz bi navê “Reşbelek” jî heye. Bnr. *Nimûne Ji Gencîneya Çanda Qedexekirî*, r. 176. Lê hewce ye em bibêjin, “Reşbelek” ne kitêb e, nivîsar e û di sala 1911an de di nav *Xulaseî Eqâid* de hatiye çapkirin.

441 Xweşhêvî, “Kurdîzade Ehmed Ramîzê Liceyî”, r. 12.

442 “Reşbeleka Kurdîzade Ehmed Ramîzê Licêyî”, amd. M. Serfiraz-B. Hawar, *Nûbihar*, j.124 (Havîn 2013), r. 5-9. Vê dawiyê Roşan Lezgîn ew derbasî kurdiya kirdkî (zazakî) kir û weşand. Bnr. *Newepel*, j.69 (teşrîna peyêne 2014), r. 4-5.

443 “Reşbeleka Kurdîzade Ehmed Ramîzê Licêyî”, amd. M. Serfiraz-B. Hawar, r. 6.

444 “Reşbeleka Kurdîzade Ehmed Ramîzê Licêyî”, amd. M. Serfiraz-B. Hawar, r. 6.

Lê ev têbiniya wî belkî ji wan jî balkêştir e: “Vê noqtê da nezer[ê] qewmperestan nezeriya min e. Lewra fitreta ezeliyye, xilqet da ez kur[d]perest “xelk” kirime... Carina sohbetan da bo “letife” muqabil suala tu kurd yan misilman [î], her cewabdana min ez kurd im û misilman im vaqi‘ bûye.”<sup>445</sup>

Ehmed Ramîz di bin sernavê “Fikrek Tarîxî” de îddia dike ku bav û bapîrê kurdan berî pêxemberiya Hz. Muhemmed jî ne muşrik bûn lê “muwehhid” ango bawermendê yekîtiya Xwedê bûn. Piştî vê di bin sernavê “Qureyşî ji ku Hatine” de tezeke balkêş îddia dike: Li gorî wî qebîleya Qureyşan ku Hz. Muhemmed jî ji wê qebîleyê bû, muste‘reb in ango bi eslê xwe ne ‘ereb in lê paşê bûne ‘ereb. Li gorî ku ecdadê pêxember Hz. Îbrahîm e û Hz. Îbrahîm jî ji Rihayê ye, kurd e, naxwe Qureyşî jî bi eslê xwe kurd in.<sup>446</sup>

Nivîskar di sernavê “Şeca‘eta Bav [û] Bapîran” de jî ji dîrokê navê gelek lehengan dijmêre û îddia dike ku ew kurd in: Ristemê Zal, Behramê Çûbîn, ‘aşîqê Şîrîn Ferhad. Dîsa ew dibêje ku îraniyan bi saya kurdan zora yûnaniyan dibir. Ehmed Ramîz piştî vê ji *Mem û Zînê* wê beşa navdar a ku dibêje *Enwa‘ê milel xudan kitab in/Kurmanc tenê di bêhisab in*, pêşkêş dike û ji kurdan ricaya zanebûnê dike:

“Gelî xelk û biraêd min! ji bo hişyarkirina bira û bavêd xo bixebitin hetta ‘ilm û me‘arif bikin zimanê xwe da. Fedakarî lazim e. Xudan himmeta ‘alî bin, ewil qewaidê lîsanê xwe çêkin. kutubê dinê tercume bikin, her fenan asarê nafi‘e bixin zimanê xwe da.”<sup>447</sup>

Balkêş e, Ehmed Ramîz di temamê nivîsê de ji bo parastina fikrên xwe ayetên Quranê û hedîsên Hz. Muhemmed bi kar tîne. Di kurdayetiya Ehmed Ramîz de îslam cihekî muhîm digire û di fikrîyata wî de kurdayetî û îslam ne dijberê hev in, berevajî wê hêzê didine hev. Lê hewce ye em bibêjin ku di temamê nivîsarê de Ehmed Ramîz qet behsa meseleyên siyasî nake, ew tenê xwendin, hînbûn û pêşveçûnê ji kurdan re salox dide.

Mîsala qumandanê yûnanî û bi giştî vegotina wî nîşan dide ku Ehmed Ramîz edebiyatvanan wekî “şervan” an jî “rêber” dibîne û

445 “Reşbeleka Kurdîzade Ehmed Ramîzê Licêyî”, amd. M. Serfiraz-B. Hawar, r. 5.

446 “Reşbeleka Kurdîzade Ehmed Ramîzê Licêyî”, amd. M. Serfiraz-B. Hawar, r. 7.

447 “Reşbeleka Kurdîzade Ehmed Ramîzê Licêyî”, amd. M. Serfiraz-B. Hawar, r. 8.

edebiyatê jî amûrekî hişyarkirina gel dihesibîne: “Qewmê ku ziman [û] edebiyatê wî tune be [ji] heyata medeniyetê mehrûm e, [ji] mûdafa‘a huqûqê xwe mehrûm e.”<sup>448</sup>

Kesekî ku fikra wî ev be ne mumkun e ku çapkirina kitêban tenê wekî karekî tîcarî bihesibîne. Jixwe Ehmed Ramîz armanca xwe ya kurdewarî berê jî bi nivîs û têbiniyên xwe nîşan dabû lê di vê nivîsarê de ew xwe wekî “kurdperest” û “xizmetkarê kurdmancan” bi nav dike û dibêje “eger ‘emrê min bih[at]ana firotin bêtereddud minê bifirota, [di] rêya kurdan de serf kira. Lewra xel[k] ‘aşîqê mal û milkê dinê ye, wez ‘aşîqê lefzê kurmancî me.”<sup>449</sup>

Ehmed Ramîz, behsa rewşa weşangeriya xwe û *Mewlûda* kurmancî jî dike. Li gorî vê, wî ji bo ku teşwîq û hewesa kurdan li ser xwendinê çêbike bîst û pênc zêr mesref kirine û pênc hezar heb *Mewlûda* kurmancî li çapê xistiye. Ji van nuxseyan niha di destê wî de tenê sed û çil ‘eded mane, lê heta îro wî tenê pêncî qirûş girtiye, ew jî daye heqê posteyê. Ehmed Ramîz dibêje ku mal û milkê wî nîne û heta niha me’aş jî negirtiye.<sup>450</sup>

Ehmed Ramîz di dawiya *Mewlûda* kurmancî de, ya ku li Misrê çapkiribû, ji xwendevanan rica dikir ku kitêbên kurdî ji wî re bişînin da ku ew çap bike, lê ji bilî *Xulaseî ‘Eqaid* a ku Seyîd Tahayê Nehrî şandiye, tu kesî kitêb jê re neşandiye. Loma ew di dawiya “Reşbelek”a xwe de pesnê Seyîd Taha Efendî jî dide.<sup>451</sup>

Ji nivîsa di paşbergê *Xulaseî ‘Eqaidê* de em hîn dibin ku çar kitêbên Ehmed Ramîz li ber çapê ne: *Xetaya Selef û Xelef*, *Îxtara Ferat û Dicle (yaxûd) Gazî û Hewara Nabeyna Nehran*, *Sebebê Paşvemana Kurdan (yaxûd) Kurd û Kurdistan*, *Hîmaya Me’arif û Hîmayenekirina Me’arif*. Zinar Silopî gava behsa Ehmed Ramîz dike van berhemên wî jî dijmêre.<sup>452</sup> Lê îro yek ji van kitêban jî ne li ber dest e.

448 “Reşbeleka Kurdîzade Ehmed Ramîzê Licêyî”, amd. M. Serfiraz-B. Hawar, r. 9.

449 “Reşbeleka Kurdîzade Ehmed Ramîzê Licêyî”, amd. M. Serfiraz-B. Hawar, r. 8.

450 “Reşbeleka Kurdîzade Ehmed Ramîzê Licêyî”, amd. M. Serfiraz-B. Hawar, r. 8.

451 “Reşbeleka Kurdîzade Ehmed Ramîzê Licêyî”, amd. M. Serfiraz-B. Hawar, r. 9.

452 Silopî, *Doza Kürdistan*, r. 26.

### Nusxe

1. Ozege, H.X: 0136258.
2. Milli, H.C: 06 Mil EHT A 28006.

#### **3.2.1.7. *Mewlîdu'n-Nebî, Hesenu'l-Ertûşî (Mela Huseynê Bateyî), R. 1327 (1911), Derse'adet (Stembol), 47 rûpel.***

*Mewlûda* Melayê Bateyî, ku di nav sînorên Osmanî de cara ewil di sala 1906an de ji aliyê Kurdîzade Ehmed Ramîz ve hatibû çapkirin, di sala R. 1327an de (M. 1911) li Derse'adet ango li Stembolê careke din çap dibe. Li ser vê nusxeya *Mewlûdê* navê tu çapxane û weşangeran nîne. Di navbera rûpelên 1-44an de metin, sê rûpelên dawiyê de jî duaya *mewlûdê* heye.

### Nusxe

1. Ozege, H.X: 0131733.

#### **3.2.1.8. *Mewlîdu'n-Nebî, Hesenu'l-Ertûşî (Mela Huseynê Bateyî), R. 1327 (1912), Derse'adet, Çapxaneya Ehmed Kamil, 48 rûpel.***

Li ser nusxeya vê *Mewlûdê* ya ku me lê nihêrt sala çapê nebû. Lê Mufid Yüksel di nivîseke xwe ya derbareyê Melayê Bateyî de sala çapkirina vê berhemê “1327” nîşan dide. Dîsa li gorî wî weşangerê vê *mewlûdê* Mehmed Şefîq Arwasî ye.<sup>453</sup> 1327 li gorî teqwîma rûmî beramberî 1911-1912ê mîladî tê. Ji ber ku Mehmed Şefîq di navbera salên 1912-1913an de hatiye Stembolê<sup>454</sup> me jî sala çapkirina vê kitêbê 1912 hesaband. Di kitêbê de navbera rûpelên 2-45an metnê *Mewlûdê*, sê rûpelên dawiyê jî duaya *mewlûdê* ye.

Ev cara pêncemîn e ku *Mewlûda* kurmancî li nav sînorê Osmanî çap dibe. Bi vî rengî êşkere dibe ku kitêba kurdî ya ku di dewra Osmanî de herî zêde çap bûye *Mewlûda* Bateyî ye. Balkêş e, piştî

---

453 Müfid Yüksel, “Molla Hüseyin el-Batevî ve Kürtçe Mevlid-i Şerîfî”, dnd. *Uluslararası Beytüşşebap ve Molla Hüseyin Batevî Sempozyumu Bildirileri*, 20-21 Eylül 2014, Şırnak Üniversitesi Yayınları, 2015, r. 130.

454 Aydeniz, *Seyyid Şefik Arvasi*, weş. Nûbihar, İstanbul, 2013, r. 20.

avabûna Komarê hetta piştî Şark Islahat Planı [Plana Islahkirina Rojhilatê] ku heta bi axaftina kurdî qedexe dike ji *Mewlûda* kurmançî di salên 1343/1927 û 1350/1934an de li Stembolê bi tîpên 'erebî çap dibe. Li gorî Aydeniz, ê ku di sala 1350/1934an de *Mewlûd* çap kiriye dîsa Mehmed Şefîq Arwasî ye.<sup>455</sup>

### **Nusxe**

Tevî hemû lêgerîna xwe me di tu kitêbxaneyên fermî de nusxeya vê *Mewlûda* ku Mehmed Şefîq weşandiye peyde nekir. Mela 'Evdîselamê Bêcirmanî ji kitêbxaneya xwe ya şexsî nusxeyeke wê bi me re parve kir, em jê re minetdar in. Lê tiştêkî balkêş li ser bergê vê nusxeyê hem mohra çapxaneya Ehmed Kamil hem jî navê çapxaneya Osman Beg heye. Texmîna me ev e: *Mewlûda* ku di çapxaneya Ehmed Kamil de çap bûbû paşê di çapxaneya Osman Beg de wekxwe tê çapkirin, lê bi zêdekirina navê çapxaneya nû. Ji ber vê jî ev tevlihevî çêbûye. Nusxeyên çapên 1343/1927 û 1350/1934ê yên *Mewlûdê* di Koleksiyona Ozege de hene:

1. Çapa 1343/1927: Ozege, H.X: 0102376
2. Çapa 1350/1934: Ozege, H.X: 0131735

### **3.2.1.9. *Qewaîdî Lisanî Kurdî*, Omer 'Ewnî, R. 1328 (1912), Elezîz, Çapxaneya Hûrşîd Efendî, 48 rûpel.**

Omer 'Ewnî Efendiyê Xarpêtî, ev kitêb di sala R. 1317an de (1901) nivîsandiye û R. 1328an de (1912) bi destûra fermî di çapxaneya Hûrşîd Efendî de çap kiriye. Berhem, bi muqeddimeya Omer Ewnî û teqrîza Mehmed Kemaleddînê Xarpêtî dest pê dike. Paşê emsîlê muxtelifê, kişandina lêkeran, raveka navî, hevalnav û daçek tene ravekirin.<sup>456</sup>

---

455 Aydeniz, hb., r. 45.

456 Müfit Yüksel, "Ana dilde Eğitim Ve Kürtçede Alfabe/İmlâ Meselesi-7", *Yeni Şafak* (2.11.2013), <http://www.yenisafak.com.tr/yazarlar/Mu-fitYuksel/ana-dilde-egitim-ve-kurtcede-alfabe-impl%C3%A2-meselesi-7/40358>, 28.11.2014. Li gorî Sadık Albayrak, dîroka nivîsandina Omer 'Ewnî R. 1318 e. Ew jî teqabulî 1902-1903yan tê. Lê ji ber ku dîroka teqrîza Mehmed Kemaleddînê Xarpêtî, 1317 e, ev zêde rast xuya nake. Bnr. Sadık Albayrak, *Son Devir Osmanlı Uleması*, c. 4, weş. İstanbul Büyükşehir Belediyesi, İstanbul, 1996, r. 207.

Omer ‘Ewnî, derbareyê vê xebata xwe û berhemeke xwe ya din de ji *Kurd Te'avun ve Terakkî Gazetesi* re telgrafek şandiye û bersiva wî di hejmara 6an a kovarê de (9 Çile 1909) hatiye weşandin:

“Ma’muretul’aziz Mekteb-i Rüşdî-i Askerîsi Kavaid-i Osmaniye Muallimi Ömer Avni Efendi: Telgrafınız alındı. **Kavaid-i Lisan-ı Kürdî ve Edebî Tatbikat Numûnesi** namındaki eserleriniz henüz gelmedi. Himmetinize teşekkür ve gazetemize tefrika ve sonra da kitab şeklinde tab’edilmek üzere, heman göndermenizi temennî ve intizar ederiz.”<sup>457</sup>

[Omer ‘Ewnî Efendî yê Mamosteyê Rêzimana Osmanî li Mekteba Navîn a Eskerî ya Elezîzê: Telgrafa we giha me. Berhemên we yên bi navê **Qewaîdî Lisanî Kurdî û Edebî Tatbikat Numûnesi** hê nehatine. Em ji bo hîmmeta we spas dikin, em hêvî dikin û li bendê ne ku hûn berhemên xwe bişînin, da ku di rojnameya me de perçe perçe, dûvre jî wekî kitêb bêne weşandin.]

Di arşîva Osmanî de sicîla Omer ‘Ewnî<sup>458</sup> û ji bo çapkirina *Qewaîdî Lisanî Kurdî* daxwaznameya wî ya destûrê<sup>459</sup> mewcûd e. Ji daxwaznameya Omer ‘Ewnî tê fêmkirin ku wî berê jî ji bo çapê destûr xwestiye lê nedane. Vê cara duyem Wezareta Perwerdeyê destûreke balkêş dide. Wezaret di bersiva daxwaznameya Omer ‘Ewnî de dibêje ku êdî Qanûn-i Esasî heye, serbestiya metbû’atê heye, ji ber vê yekê ji bo çapkirina vê kitêbê hewcedarî bi destûrxwestinê nîne. Bi qasî bersiva wezaretê, armanca Omer ‘Ewnî Efendî ya çapkirina vê kitêbê jî balkêş e. Ew di daxwaznameya xwe de armanca xwe wiha dinivîse: “Bu havâlîde şu lisâna vukûf hâl-i bedeviyetde yaşayan Ekrâdî suhûletle hâl-i medenîyyete ifrâğ ideceği fikr-i selîm netîcesi olarak mezkûr risâlenin tab’ına ruhsat verilmesi-çün...”. Yanî Omer ‘Ewnî Efendî difikire ku ewê bi vê kitêbê kurdên bedewî/koçer bike medenî, ev pirtûk wê xizmeta vî karî bike. Ev nêrîna ku kurdan koçer, nezan û paşdemayî dibîne û ji bo xilasiya

---

457 Bozarslan, *Kürd Teavün ve Terakkî Gazetesi Kovara Kurdî-Tirkî 1908-1909*, r. 303.

458 BOA. DH.SAİDd.. 0186/55, Dîrok: 29/Z /1281 (H), 24.05.1865 (M).

459 BOA. MF.MKT. 1084/74, Dîrok: 14/Za/1326 (H), 08.12.1908 (M).

wan perwerdeya gel salox dide, di nav rewşînîbîrên Osmanî yên wê demê de -çi tirk çi kurd- pir bi hêz bû. Vegotina Omer 'Ewnî Efendî jî nimûneyeke vê nêrînê ye.

Mûsa Anter, di nivîseke xwe de behsa vê kitêbê dike û wê di nav kitêbên kurdî yên ku di serdema Osmanî de çap bûne dijmêre lê zêdetir agahî nade.<sup>460</sup> Lêkolîner Sadik Albayrak ev kitêb dîtiye, destpêk û nivîsa Mehmed Kemaleddînê Xarpêtî veguhastiye tîpên latînî jî.<sup>461</sup> Lê di pêvajoya vê xebatê de me ev kitêb nedît, metnê wê jî hê li tu deran nehatiye weşandin.

### **3.2.2. Dema Şerê Cîhanê yê Yekem (1914-1917)**

Dema Şerê Cîhanê yê Yekem, ji her alî ve zor û zehmet e û li weşangeriya kurdî jî tesîr dike. Di vê dewrê de kovarên kurdî têne tatîl-kirin û aktivîstên tevgera kurdî wekî 'esker beşdarî şer dibin. Di vê demê de tenê sê kitêbên kurdî hatine weşandin. Ji van *Mewlûdnamey Batê* û *Gewherî Yegane* ne li ber dest in. Halê hazir wekî berhemeke şênber ji vê dewrê di destê me de tenê *Newbehar* heye.

#### **3.2.2.1. *Mewlûdnamey Batî*, Mela Huseynê Bateyî, 1915, Stembol, 55 rûpel.**

Mistefa Nerîman di berhema xwe ya bi navê *Bibliyografyay dûsed salî kitêbî kurdî 1787-1986* de kunyeyeke wiha vediguhêze û dîsa li gorî wî ev kitêb cara duyem di 1966an de ji aliyê Gîwî Mukriyanî ve li Hewlêrê tê çapkirin.<sup>462</sup> Lê me kitêbeke wiha nedît û ji tu çavkaniyeke din jî hebûna wê piştrast nekir.

#### **3.2.2.2. *Gewherî Yegane*, Husên Huznî Mukriyanî, 1916, Heleb.**

Malmîsanij navê vê kitêbê ji berhema Mistefa Nerîman neql dikê lê dibêje: "Ez hîç rastî kitêbeke kurdî nehatime ku di dewra Osmanî

---

460 Musa Anter, "Yekbûn/1914'te Çıkan Dergi", *Doğu*, j.1 (Aralık 1969), r. 29.

461 Albayrak, *Son Devir Osmanlı Uleması*, c. 4, r. 207-209.

462 Nerîman, "Bibliyografyay dûsed salî kitêbî kurdî 1787-1986", r. 40.

de li Sûriyeyê hatiye weşandin.”<sup>463</sup> Me jî ev berhema *Gewherî Yegane* nedît lê di dawîya kitêba bi navê *Xunçey Beharistan* de, ku li Helebê ji aliyê Huznî Mukriyanî ve hatiye çapkirin, gelek agahî derbareyê wê de hene. Li gorî vê, *Gewherî Yegane*, li ser tarîxa kurdan e û ji çar cildan pêk tê. Cilda ewil ji dused û pênceh sehîfeyî pêk tê, di nava xwe de dused wênayên şexsan, berheman, bînayên bajarên qedîm dihewîne. Mijarên vê cildê “le ibtiday seltenet û siyasî îdare, hukûmet, medeniyet, sanayî, xet nûsîn, muharebe, û îstila û tereqqî û inqiraz û ze’efiyet û tewawî ehwalîyan” e.<sup>464</sup>

Mijarên cilda duyem, sêyem û çarem jî ev in: “Tarîxî ehwalî jîyan, diyanet, exlaq, ‘adet, seltenet, emaret, hukumdaranî ‘eşîret, qebail, taife, mezahib, teraîq, istila, şer û şûr, teşkilat û inqiraz û tewawî serguzeşteyan û macerayanî tarîx û tercumeî ehwalî piyawanî dînî, ‘ulema, şu’era û feylesofan, meşayix, sûfiye, musannifan, muwerrîxan û umera û axawet, hukkam û mezinan, ewane milletperwer û meşhûran ke le Kurdistan da pêgîştûn û îstiharyan kirduwe ser hed û sinor û erazî tebîî û me’adin û ticaret û zira’etî Kurdistan le ewwelî zuhûrî îslame we ta îmro”. Di vê nasandinê de tê gotin ku ev sê cild ji du hezar rûpelî zêdetir e û tê de sê sed kusûr sûret û xerîte hene.<sup>465</sup>

Ji vê nasandinê tê fêmkirin ku *Gewherî Yegane* kitêbeke mezin û hêja ye û herçendî îro li ber destê me nebe jî hebûna wê bi van agahiyan tê piştraskirin. Naxwe beriya *Xunçey Beharistan* (1925), hê di dewra Osmanî de kitêbêke kurdî li Sûriyeyê hatiye weşandin.

---

463 Malmîsanîj, *Türkiye ve Suriye’de Kürtçe Kitap Yayımcılığının Dünü ve Bugünü*, r. 117

464 Husên Huznî, *Tarîxî Kurdan Xunçey Beharistan*, Metbe’etu ‘Esr el-Cedîd, Heleb, 1925, r. 92. Me kopyeya vê kitêbê ji Dr. Berat Açıl wergirt û bi kar anî. Herwiha hemû berhemên Husên Huznî Mukriyanî ji nû ve çap bûne. Ev agahî di nav wan de jî hene. Bnr. *Sercemî Berhemî Husên Huznî Bergî Yekem*, weş. Aras, Hewlêr, 2011, r. 103-104.

465 Husên Huznî, *Tarîxî Kurdan Xunçey Beharistan*, r. 92-93.

### 3.2.2.3. *Newbehar*, Ehmedê Xanî, R. 1332 (1916), Stembol, Çapxaneya Ehmed Kamil, 37 rûpel.

*Newbehar* an *Nûbar* an jî *Nûbihar* an jî bi navê xwe yê dirêj *Nû-behara Biçûkan* berhema pêşîn a Ehmedê Xanî ye. Ew ferhengeke menzûm a bi kurdî-‘erebî û ‘erebî-kurdî ye. Ehmedê Xanî ew di sala 1683an de, gava 33 salî bû qedandiye. *Newbehara* ku bi gotina Xanî ji bo “biçûkêd kurmancan” hatiye nivîsîn, di nava xwe de tevî wateyên wan ên kurdî 954 peyvên ‘erebî dihewîne; ev peyv ji jiyanê û ji şaxên zanistê hatine berhevkirin.<sup>466</sup> *Newbehar* di medreseyên kurdan de yek ji kitêbên sereke ye ku piştî xilaskirina Quranê tê xwendin û jiberkirin.<sup>467</sup>

*Newbehar*, bi *Bismillahirrehmanirrehîm/Mebde’ê her ‘ilmekî navê ‘Elîm* dest pê dike. Piştî çardeh beytên destpêkê metnê ferhengê dest pê dike (r. 4). Ji bilî destpêkê berhem ji sêzdeh beş û dused beytî pêk tê. Di dawîya berhemê de çend hevokên pexşan hene ku Ehmedê Xanî dîroka temamkirina berhema xwe bi gotinên sergirtî nîşan dide. Li gorî vî hesabî Ehmedê Xanî ev berhema xwe H. 1094/M. 1683yan de qedandiye.<sup>468</sup>

Li gorî Veysel Aydeniz weşangerê vê *Newbeharê* Mehmed Şefîq Arvasî ye.<sup>469</sup> Ya rast li ser nusxeya me dîtî tu nîşaneyêke bi vî rengî nîne. Derbareyê sala çapkirina vê kitêbê de jî tevlihevî heye: Li ser nusxeya ku me dîtî bi destan “1332” dinivîse. Aydeniz jî di xebata xwe de dîroka vê kitêbê wekî “1332/1917” nîşan dide.<sup>470</sup> Lê eger em sala “1332” rûmî qebûl dikin, ew beramberî “1916-1917”a mîlatê tê. Ji ber ku em meha wê nizanin, sala wê ne zelal e, lê li gorî “Tarih Çevirme Kılavuzu” R. 1332 nêzîktirî M. 1916an e.

Z. Kaya dibêje ku *Nûbar* di sala 1903an de li Stembolê çap bûye û ew “di destê me de” ye.<sup>471</sup> Lê di dawîya xebata xwe de nusxeya orijînal a ku weşandî ev çapa Stembolê ye.

---

466 Şakelî, *Mem û Zîn’de Kürt Milliyetçiliği*, r. 34.

467 Ehmedê Xanî, *Nûbar*, amd. Z. Kaya, weş. Roja Nû, Stockholm, 1986, r. 5.

468 Xanî, *Nûbar*, amd. Z. Kaya, r. 38-39.

469 Veysel Aydeniz, *Seyyid Şefik Arvasi*, r. 46.

470 Aydeniz, *Seyyid Şefik Arvasi*, r. 46.

471 Ehmedê Xanî, *Nûbar*, amd. Z. Kaya, r. 6.

Li gorî lêkolîna me, *Newbehar* cara ewil di sala 1893yan de di nav kitêba *El-Hediyetu'l-Hemîdiyye fî'l-Luxeti'l-Kurdiyye* de tê weşandin (r. 279-292). Le Coq, destxeteke *Newbeharê* ku ji Şamê peyde kiribû, di sala 1903an de li Berlinê bi awayê wekxwe (facsimile) di nav *Kurdische Texte -1-* de diweşîne (beşa Anhang, r. 1-32). Girîngiyeke vê çapa Stembolê ew e ku cara ewil *Newbehar/Nûbihar* wekî kitêbeke serbixwe çap dibe. Ev çapa Stembolê di sala 1971ê de -ji aliyê mîzanpajê ve bi hin guherînên biçûk- careke din tê çapkirin.<sup>472</sup>

Ev berhem bi tîpên latînî cara ewil Z. Kaya li Stockholmê weşand<sup>473</sup>, heman xebat li Stembolê jî hate weşandin.<sup>474</sup> Kadri Yıldırım, *Nûbehara Biçûkan* tevî lêkolîneke berfireh, metnê bi tîpên latînî û 'erebî, şerh û wergera tirkî ji nû ve weşand.<sup>475</sup>

### **Nusxe**

Tevî hemû lêgerîna xwe me li tu kitêbxaneyên fermî yên li Tirkîyeyê ev çapa *Newbeharê* nedît. Huseyn Şemrexî ji kitêbxaneyaya xwe ya şexsî nusxeyeke wê bi me re parve kir, em jê re minetdar in. Çapa 1971ê di Kitêbxaneyaya Dewletê ya Beyazîtê de heye. H.X: 182336.

### **3.2.3. Piştî Şerê Cihanê yê Yekem (1918-1923)**

Di weşangeriya kitêbên kurdî yên di dema Osmanî de dewra herî bi adan ev e. Di vê dewrê de hem hejmara kitêban zêde dibe hem jî rûpelên van kitêban ji yên berê zêdetir in. Ev jî kemilîna weşangeriya kurdî nîşan dide. Têkiliya vê bi qelsbûna hêza Osmanî û xurtbûna tevgera kurdî re jî heye. Di vê dewra kurt lê herî tevlihev de yazdeh kitêb tene weşandin: *Nehcu'l-Enam* û *'Eqîda Îmanê* bi hev re, *Muqeddîmetu'l-Îrfan*, *'Eqîda Kurdan*, *Memê Alan*, *Mem û Zîn*, *Gazîya Welat*, *Encumenî Edîbanî Kurd*, *Hînkêrî Zîmanê Kurdî*, *Dîwan-i Es'ed*, *Dîwana Melayê Cizîrî û Dersa Dîn*.

472 Ehmedê Xanî, *Newbehar*, 1971, Tur Basımevi, İstanbul, 48 r. Di dawîya kitêbê de "Tillo Kitabevi-Siirt" dinivîse.

473 Ehmedê Xanî, *Nûbar*, amd. Z. Kaya, weş. Roja Nû, Stockholm, 1986.

474 Ehmedê Xanî, *Nûbar*, amd. Z. Zinar, weş. Firat, Stembol, 1992.

475 Ehmedê Xanî, *Nûbehara Biçûkan*, amd. K. Yıldırım, weş. Avesta, İstanbul, 2008.

**3.2.3.1. *Nehcu’l-Enama Mela Xelîl we ‘Eqîda Mela Ehmedê Xanî*, H. 1337 (1918), Çapxaneya Ewqaf-i Islamiye, Stembol, 30 r.**

*Nehcu’l-Enama* Mele Xelîlê Sêrtî û ‘*Eqîda Îmanê* ya Ehmedê Xanî du kitêbên sereke yên medreseyên kurdan in û mijara herduyan jî qaîdeyên dînê îslamê ne. Ew di sala 1918an de li Stembolê bi hev re hatine çapkirin.<sup>476</sup> Ev herdu berhem jî mesnewî ne ango her beyit di nav xwe de bi qafiye ne. Wezna wan herdu berhemên jî yek e: Fe’ûlun fe’ûlun fe’ûlun fe’ûl. Ji bilî wekhevîna mijar û cureyên ruxsarî di berhema Mele Xelîlê Sêrtî de bandora ‘*Eqîda Îmanê* ya Ehmedê Xanî eşkere xuya dike, lê cudahiya herî mezin a *Nehcu’l-Enamê* ew e ku behsa tesewwîf û exlaq jî dike, çimkî ev mijar di ‘*Eqîda Îmanê* ya Ehmedê Xanî de tune ne.<sup>477</sup>

***Nehcu’l-Enama Mele Xelîlê Sêrtî***

Nehc û enam du peyvên ‘erebî ne. Nehc di wateya rê, enam jî di wateya yên afirandî, mexlûqan de ye. Li gorî vê, maneya terkîba *nehcu’l-enam* “rêya mexlûqan” e, lê wekî navê taybet *Nehcu’l-Enam*, yek ji berhemên menzûm ên Mele Xelîlê Sêrtî ye, naveroka wê jî ji du mijarên sereke pêk tê:

– ‘Eqîde ango qaîdeyên dînê îslamê: hevdeh beşên *Nehcu’l-Enamê* derbareyê ‘eqîdeyê de ne: Ferzên ‘eynî, sîfetên selbî, heft sîfetên Xwedê yên qedîm, melaîket, rîsalet, şemalê Muhemmed, mi’rac, dîtina Xudê, qencîrî, jimara pêxemberan, te’sîra dua, te’yînkirina îmam/xelîfe, îxtiyariya cuzî, nîşanên rabûna qiyametê, pirsên qebrê û qiyametê, îmamên mezheban.

– Tesewwîf û exlaq: pênc beşên *Nehcu’l-Enamê* jî derbareyê tesewwîf û exlaq de ne: Nexweşiyên dil, wezîfeya her heft organên (çav, guh, ziman, zik, aletê cinsî, dest û ling), adabê xwarinê, lixwekirina cil û bergan, adabên nimêjê.

---

476 Mistefa Nerîman di bîbliyografya xwe de van herdu kitêban cuda nîşan dide lê li gorî nusxeya ku me lêkolînkirî ew bi hev re ne. Bnr. “Bibliyografyay dûsed salî kitêbî kurdî 1787-1986”, r. 29, 31.

477 *Nehcu’l-Enam – Eqîdeya Îmanê*, amd. H. Şemrexî, weş. Nûbihar, Stenbol, 2012, r. 9-10

Çardeh beytên dawiyê sebebê nezm, hemd û munacat in. Beyta destpêkê û beyta ku mexlesa şair derbas dibe ev in:

Tu guhdêre nutq û beyana fesîh

Ji bo ferzi ‘eynan e merdi melîh

...

Xelîli ku ev tarz bida’et nebû

We lê ew bi fermana exxi xo bû

*Nehcu’l-Enam*, yek ji kitêbên sereke yên medreseyên kurdan e, ji ber vê yekê jî gelek nusxeyên wê yên destxet hene<sup>478</sup> lê wekî çap cara ewil di sala 1918an de li Stembolê bi ‘*Eqîda Îmanê* ya Xanî re çap bûye. Li gor Omer Pakîş, ku kurtejiyana Mele Xelîl amade kiriye, xeta vê çapê ya “Mustafa Halim” e.<sup>479</sup> Mustafa Halim, yek ji xettatên mezin ê sedsala 20an e.<sup>480</sup>

Ev nusxeya çapkirî jî bîst û du beşan û bi giştî jî dused û heftê beytî pêk tê. Di ya ku Huseyn Şemrexî amadekirî de dused û heftê û sê beyt hene.<sup>481</sup> Çar beytên dawî yên *Nehcu’l-Enamê* di sala 1914an de di hejmara 10an a kovara *Hetawî Kurdê* de hatine weşandin.<sup>482</sup>

### **‘Eqîda Îmanê ya Ehmedê Xanî**

‘Eqîde û îman du peyvên ‘erebî ne. ‘Eqîde di wateya qaîde, esas û bingeh; îman jî di wateya baweriyê de ye. Li gorî vê yekê, ‘eqîda îmanê tê maneya “esasên baweriyê”. Wekî têgeh di edebiyata îslamî de bi navê “eqîdename” cureyeke taybet heye ku jî bo berhemên behsa şertên îslam û îmanê dike tê gotin. Bi zimanê kurdî jî edebiyateke dewlemend a îslamî heye.<sup>483</sup> Di edebiyata kurdî de di warê

---

478 Di lêkolîneke xwe de, li ser destxetên kurdî yên li kitêbxaneyên Stembolê, tenê li Kitêbxaneya Suleymaniye em rastî sê nusxeyên cuda yên vê berhemê hatin.

479 Ömer Pakîş, “Molla Halil Siirdî” *DIA*, c. 30, 2020, r. 251.

480 Ji bo kurtejiyana wî bnr. M. Uğur Derman, “ÖZYAZICI, Mustafa Halim”, *DIA*, c. 34, 2007, r. 135-137.

481 *Nehcu’l-Enam – Eqîdeya Îmanê*, amd. H. Şemrexî, r. 21-50.

482 “*Nehcu’l-Enamu’l-Kurdî*”, *Hetawî Kurd*, j.10 (20 Haziran 1330/3 Tîrmeh 1914), r. 10.

483 Ji bo kurtenasîna edebiyata kurdî ya îslamî û berhemên wê yên sere-

‘eqîdenameyê de berhema herî navdar ‘*Eqîda Îmanê* ya Ehmedê Xanî ye ku di 1687an de hatiye temamkirin û li pey xwe tradîsyonek ava kiriye. Heta di serdema Komara Tirkîyê de jî ‘eqîdenameyên kurmancî hatine nivîsîn.<sup>484</sup>

Ev nusxeya ‘*Eqîda Îmanê* ya Ehmedê Xanî ku di 1918an de çap bûye, yek pare ye û ji heftê beytî pêk tê. Lê ya ku Huseyn Şemrexî amade kiriye heftê û du beyt<sup>485</sup>, a Zeynalabidîn Zinar heftê û sê beyt e.<sup>486</sup> Beytên destpêk û dawî yên vê berhemê ev in:

Li ba te muheqqeq bitin ev cewab

Duhû gote min hatîfî bê hicab

Min û cumleê ummeta Mustefa

Bibey cennetî tabî Mustefa

‘*Eqîda Îmanê* cara ewil di nav *El-Hedîyyetu’l-Hemîdiyye fî’l-Luxe-tî’l-Kurdiyye* de hatibû weşandin (r. 294-297). Le Coq destxetêke wê di nav berhevoka xwe de bi awayê wekxwe diweşîne.<sup>487</sup> ‘*Eqîda Îmanê* heta niha gelek caran li tîpên latînî hatiye weguhastin û çapkirin: Kadri Yildirim, ew tevî lêkolîneke berfireh, bi tîpên latînî û ‘erebî, şerh û wergera tirkî ji nû ve amade kir.<sup>488</sup> Huseyn Şemrexî, *Nehcu’l-Enam* û ‘*Eqîda Îmanê* herdu wekî nusxeya 1918an bi hev re û bi tîpên ‘erebî, tevî lêkolîn û danberheva nusxeyan amade kir.<sup>489</sup>

### **Nusxe**

Tevî hemû lêgerîna xwe me di tu kitêbxaneyên fermî yên li Tirkiyê nusxeya vê kitêbê nedît. Huseyn Şemrexî ji kitêbxaneya xwe ya şexsî nusxeyeke wê bi me re parve kir, em jê re minetdar in.

---

ke bnr. Mesut Arslan, *Eqîda Kurmancî ya Mela Nesreddînê Zoqeydî*, weş. Peywend, Wan, 2024, r. 14-17.

484 Arslan, *Eqîda Kurmancî ya Mela Nesreddînê Zoqeydî*, r. 19-28.

485 *Nehcu’l-Enam – Eqîdeya Îmanê*, amd. H. Şemrexî, r. 70-78.

486 Xanî, *Hemû Berhem*, r. 371-379.

487 Le Coq, *Kurdische Texte -1-*, Beşa Zeyl, r. 33-39.

488 Ehmedê Xanî, *Eqîdeya Îmanê*, amd. K. Yildirim, weş. Avesta, İstanbul, 2008.

489 *Nehcu’l-Enam – Eqîdeya Îmanê*, amd. H. Şemrexî, weş. Nûbihar, Stenbol, 2012.

**3.2.3.2. Muqeddîmetu'l-Îrfan, M.M. (Mehmed Mîhrî),  
weş. Seyîd Mehmed Şefîq, R. 1334 (1918), Çapxaneya  
Necm-i Istiqbal, Stembol, 16 rûpel.**

Di kovara *Jînê* de ji hejmara 2yan heta ya 5an, derbareyê weşana *Muqeddîmetu'l-Îrfanê* de heman îlan hene. Li gorî van îlanan kitêb derbareyê qaîdeyên zimanê kurdî de ye.<sup>490</sup> Di kovara *Kurdistanê* de jî tê gotin ku ew rîsaleyeke xizmetkarê yekkirina zimanê kurdî ye.<sup>491</sup>

Berhem bi “Îfade”ya nivîskar dest pê dike (r. 2-3). Mehmed Mîhrî di îfadeya xwe de dibêje ku wî Mele Xidir, ku bi mexlesa Nalî meş-hûr e, ji xwe re rêber bijartiye. Paşê mijara berhemê (Eserin Mevzû’î) rave dike. Di vê beşê de kurdî li gorî zaravayên xwe tê tesnîfkirin û paşê jî derbareyê van zaravayan de agahî têne dayîn. Li gorî Mîhrî, kurdî di esasê xwe de du cure ye: kurdî û goranî. Goranî du şûbe ye: hewramî û zazakî. Kurdî jî sê şûbe ye: feylî, bilbasî û kurdî. Di vir de bilbasî jî dibe du beş: kurmancî û bilbasî (r. 4-5).

Mijara esas a berhemê bi rêzkirina herfan dest pê dike (r. 5). Li gorî vê, di elîfbaya kurdî de 34 herf hene, sê heb ji van di esasê kurdî de tune ne, lê bi bandora ‘erebî tevî bûne: Seya peltek (ث), zel (ذ), sad (ص). Piştî vê derbareyê hereke, îşaret û îmlaya kurdî de agahiyên kurt dide û derbasî pêkhatin û wateyên herfan dibe. Di vê beşê de yek bi yek derbareyê wate, emilandin û guhertina herfan de agahî hene. Ev beş heta dawîya kitêbê dewam dike û berhem bi “Xatime”yê dawî dibe (r. 16). Mehmed Mîhrî di vê beşê de dibêje ku di nav miletan de yê herî muhtacê zanînê qewmê kurd e, di nav kurdan de gelek kesên xwedî fezîlet hebûn û îro jî hene lê wezîfeya xwe nakin, ji ber vê yekê jî wî bi nivîsandina vê berhemê pêşengî kiriye.

**Projeya Ferhengeke Pênc Zimanî: Îrfan**

*Muqeddîmetu'l-Îrfan* wekî ku ji navê wê jî tê fêmkirin muqeddîme ango destpêk e, jixwe vê yekê Mehmed Mîhrî bi xwe jî beyan dike (r. 4). Armanca Mehmed Mîhrî ew bû ku bi navê *Îrfanê* luxet ango ferhengeke bi kurdî, tirkî, ‘erebî, farsî û frensî amade bike. Ji bo vê

490 Bozarslan, *Jîn Kovara Kurdî-Tirkî 1918-1919*, c. I, r. 228, 257, 283, 311.

491 Veroj, *Kurdistan (1919-1920)*, r. 249.

armancê di hejmara 1, 2, 4, 10, 18 û 19an a kovara *Kurdistanê* de bi sernavê “Îrfan” rêzenivîsan dinivîse. Herwiha ew bi sernavê “Esas” jî li ser serf û nehwa ango rêzimana kurdî rêzenivîsan dinivîse.

Di nivîsa hejmara yekemîn de Mehmed Mîhrî dibêje ku “li Ewrûpayê ji aliyê rojhilatnasan ve gelek luxetên kurdî hatine weşandin. Wî çendek ji van li Kitêbxaneya Beyazîdê dîtine. Lê ji ber şert û mercên Kurdistanê, nebûna rê, navgînên ragihandî û hwd. tevahiya van kêman in. Bi taybetî hin ji wan bi meqsêdên xirab hatine weşandin.” Mîhrî, vê mijarê zêde zelal nake lê dibêje ku “gava dem hat ezê eşkere bikim”. Li gorî wî dîsa ji Rojhilatê jî hin kesan luxetên kurdî amade kirine. Ji van a çapkirî tenê ya Yûsif Ziyaeddîn Paşa ye lê ew jî di dewra ‘Ebdulhemîdê Duyem de hatiye qedexekirin. Piştî vê Mehmed Mîhrî derbareyê ferhenga Yûsif Ziyaeddîn Paşa de agahiyan dide û kêmasiyên wê dijmêre:

- Nivîskarê kitêbê ‘erebî û zanîna wî ya derbareyê kurdî de ne bes e.

- Di amadekirina vê ferhengê de yên ku arî Yûsif Ziyaeddîn Paşa kirine, ‘alimên Sêrtê ne. Li Sêrtê jixwe ne kurdiyeke fesîh lê ‘erebiyeke tevlihev tê axaftin. Ji bilî vê zana û edebiyatvanên kurdan di îfadekirina xwe de gelek peyv, hevok û terkîbên ‘erebî bi kar tînin. Ji ber vê jî sisêyan yekê kelîmeyên ferhenga Yûsif Ziyaeddîn Paşa bi ‘erebî ne.

- Mehmed Mîhrî piştî vê rexneyê derbareyê projeya xwe ya ferhengê de jî agahiyekê dide. Li gorî vê, ewê bi ferhenga xwe bi awayekî eşkere îsbat bike ku kurdî li Rojhilat zimanê herî dewlemend e û bê hewcedariya zimanên din, zimanekî serbixwe ye.<sup>492</sup>

Di nivîsên hejmara 2yan<sup>493</sup> û 4an<sup>494</sup> de jî rexneyên Mehmed Mîhrî yên li ser *El-Hediyyetu’l-Hemîdiyye fi’l-Luxeti’l-Kurdiyye* berdewam dikin. Rexne û bersivên Mehmed Mîhrî yên li ferhengê û îddiyên Yûsif Ziyaeddîn Paşa em dikarin wiha rêz bikin:

---

492 Veroj, hb., r. 140-141.

493 Veroj, hb., r. 155-157.

494 Veroj, hb., r. 181.

- Yûsif Ziyaeddîn Paşa xwestiye kurdan bike ‘ereb û kurdî jî bike ‘erebî. Ji bo vê jî gelekî hewl daye ku peyvên ‘erebî di nav ên kurdî de rave bike. Lê ew di vê doza xwe de ne bi tenê ye, lewre zana û edebiyatvanên Îrana qedîm jî bi gotina “kurd lawên herî leheng ên Îranê ne” îddia dikirin ku kurd ji wan in.

- Paşa, ferhenga xwe tenê li ser peyvên qebîleya kurmanç amade kiriye lê ew jî bi temamî nehewandiye. Berevajî vê wî gelek emsile xistine nav berhema xwe de ku di ferhengekê de nivîsîna wan fêde nake. Lê ev tiştêkî normal e, ji ber ku ew ne “ehlî lisan” e.

- Paşa, di dîbaceya xwe de dinivîse ku zimanê kurdî di nav zimanên cîhanê de ji aliyê îxtîlaf, ferq û cudayî, nebûna yekgirtinê û tevlihevbûnê ve di serî de ye. Rast e, weke zimanên din di kurdî de jî îxtîlaf hene, lê bawer nakim ku ew di vî warî de sereke be. Eger Paşa berê xwe bidaya zimanê xwe yê ‘erebî, wî yê ev unwana serekebûnê bexşî ‘erebî bikira.

- Di muqeddîmeya berhemê de Paşa dibêje ku di kurdî de heta ji zimanê tirkî jî peyv hene. Ev ne rast e, di zimanê kurdî de her tişt heye lê tirkî qet nîne. Sedema vê îddiaya Paşa, herêma wî ye. Lewre ehlê Bedlîsê piranî ya memûr in an jî bi memûran re têkildar in. Ji ber vê jî bi tirkî dizanin û peyvên ‘erebî û tirkî ketine nav zimanê wan. Paşa jî hemû cure peyvên biyanî xistine nav ferhenga xwe û li dawiyê ew wekî tirkî, ‘erebî û farsî nîşan dane. Weke mînak peyva “çiplaq” her çawa be ji devê Bedlîsiyekî bihîstiye, xistiye ferhenga xwe û weke tirkî nîşan daye. Lê di kurdî de ji bo “çiplaq” ne yek lê gelek peyv hene, mesela “tazî”.

Derbareyê *Îrfanê* de îro di destê me de tenê ev çend nivîs hene. Dibe ku *Îrfan* wekî kitêbeke serbixwe çap jî bûbe, lê îro tu nusxe-yeke wê li ber destê me nîne. Mûsa Anter, di bîranînên xwe de gava behsa Mehmed Mîhrî dike, dibêje “ew kurdekî ji Silêmaniyeyê bû lê kurmançî jî xweş dizanî. Jixwe hema bêje zimanê ku nedizanî nebû: Erebi, farsî, tirkî, frensî û hemû zarava û devokên kurdî.”<sup>495</sup> Projeya ferhenga *Îrfan* jî encam û delîla vê zimanzaniya Mîhrî ye.

---

495 Anter, *Hatıralarım*, r. 73.

## Nusxe

1. DTCF, H.X: DTC085729
2. Ozege, H.X: 0118204
3. Taksim, H.X: OE\_TK\_01640.

### **3.2.3.3. ‘Eqîda Kurdan, ‘Ebdurehîm Rehmî, R.1334 (1918), Stembol.**

Ji îlaneke hejmara pêncan a kovara *Jînê* em hîn dibin ku ‘Ebdurehîm Rehmî bi navê ‘*Eqîda Kurdan*, îlmîhaleke menzûm nivîsandîye û nusxeyên çapkirî yên berhemê ji cihê belavkirinê re hatine şandin.<sup>496</sup> Dîsa ji îlaneke ji paşbergê kovara *Jînê* em hîn dibin ku bihayê wê 5 qirûş e.<sup>497</sup>

Îlmîhal ji wan berhemên dînî re tê gotin ku behsa şertên îslamê, îmanê û ta’et û îbadetê dîkin. Berevajî kitêbên fiqhê ku di medreseyan de têne xwendin, îlmîhal ji bo gel têne nivîsîn, ji ber vê yekê piranî kurt in û ji aliyê zimên ve jî sivik in.

Em dikarin bibêjin ku di vê kitêba ‘*Eqîda Kurdan* de sê nasnameyên ‘Ebdurehîm Rehmî gihane hev: zana, şa’ir û kurdperwer. Li gorî ku dikare îlmîhalekê amade bike diyar e ‘Ebdurehîm Rehmî kesekî zana ye, menzûm nivîsandina îlmîhalê jî aliyê wî yê şa’irtiyê nîşan dide û helbet bi kurdî nivîsandin jî ji kurdbûn û xemxwariya kurdî ya ‘Ebdurehîm Rehmî re delîlek e.

Çapa orijînal a vê kitêbê li ber destê me nîne. Hazim Kiliç, di lêkolîna xwe ya derbarê ‘Ebdurehîm Rehmî de dibêje ku ‘*Eqîda Kurdan* û *Gaziya Welat* li gel wî hene û ewê di demeke nêz de wan biweşîne<sup>498</sup> lê heta niha ev pêk nehatiye. Tehsîn Îbrahîm Doskî, di xebata xwe ya li ser ‘eqîdenameyên kurmançî de metnê ‘*Eqîda Kurdan* diweşîne.<sup>499</sup> Bi vî rengî herçendî çapa kitêbê di destê me de tune be jî em naveroka wê dizanin. Li gorî metnê ku Doskî weşandiye

---

496 Bozarslan, *Jîn Kovara Kurdî-Tirkî 1918-1919*, c. I, r. 311.

497 Bozarslan, hb., c. V, r. 910.

498 Hazım Kılıç, *Helbestvan û Nivîskarekî Welatparêz Evdirehîm Rehmîyê Hekarî [Abdurahim Zapsu]*, weş. Xanî&Bateyî, Danmark, 1991, r. 54.

499 ‘*Eqîdenameyên Kirmancî*, komkirin û berhevkirin: Tehsîn Îbrahîm Doskî, Belavkirawey Ekaîmîya Kurdî, Hewlêr, 2011, r. 17-26.

berhem ji deh beşan, ji heftê û çar beytan pêk tê. Di berhemê de sernavên wekî “dînê me”, “şertê îmanê”, “Hz. Muhemmed” cih digirin û têne ravekirin. Beytên ewil û dawî yên berhemê ev in:

(Elhemdulillah) dînê me îslam e heq em mu'min in  
Tabî'ê şahê emîn in ummeta wî muslim in

Ewel û axir ku yêke sanî û salis ku sê  
Qenc tefekkur ke bizane tarîxa ewê

Tehsîn Îbrahîm Doskî, ji beyta jor bi hesabê ebcedê tarîxa nivîsandina berhemê R.1331/M. 1916 dibîne. Balkêş e, eger ev tarîx rast be ‘Ebdurehîm Rehmî ev îlmîhal di esîrtiyê de nivîsiye. Çimki em dizanin ku ew û Bedîuzzeman Seîdê Kurdî di Şerê Cîhanê yê Yekem de li hemberî artêşa rûsan şer dikin û esîr dikevin. Esareta ‘Ebdurehîm Rehmî heta sala 1917an ku Şoreşa Bolşevîkan pêk tê dewam dike. Piştî şoreşê ew pêşî diçe Azerbaycanê ji wir jî diçe Stembolê û tevî tevgera kurdî dibe.<sup>500</sup>

### **3.2.3.4. Memê Alan, ‘Ebdurehîm Rehmî, R. 1335 (1919), Stembol.**

*Memê Alan*, pîyesa pêşîn a kurdî ye. Ew şanoyeke du perde ye û ji alî ‘Ebdurehîm Rehmîyê Hekarî ve hatiye nivîsîn. Perdeya ewil di hejmara 15an a kovara *Jînê* de, perdeya dawî jî di ya 16an de tê belavkirin.

Pevxistana pîyesê kin û besît e. Mekan odeyeke gund e ku li gorî ‘adetên kurdan hatiye raxistin. Li her çar aliyê odeyê doşek û balgih hatine danîn. Li dîwêr çekên Memê Alan daleqandî ne. Çar lehen-gên pîyesê hene: Memê Alan an jî bi kurtî Memo, jina wî Xezal, diya wî Çavreş, hevalê wî û heman demê de xizmetkarê mîr Lewend.

Mijara pîyesê di dema Selaheddînê Eyyûbî de derbas dibe. Siltan Selaheddîn bajarê pîroz Quds fetih kiriye, artêşa xaçparêzan ku dixwazin bajêr jê bistînin êrîş dikin. Bo arîkariya Selaheddîn,

---

500 Kılıç, *Helbestvan û Nivîskarekî Welatparêz Evdîrehîm Rehmîyê Hekarî [Abdurahim Zapsu]*, r. 17.

mîrê Hekarî li hemû mîrên herêma xwe banga cîhadê dike. Li ser vê bangê Memê Alan, kelecânî dibe, ew û hevalê wî Lewend dixwazin cihde tevî şer bibin. Ew ji dayika xwe destûr û helaliyê distînin lê ev ne bes e, lewre Mem zewicî ye, berî vê bi hefteyekê daweta wî û Xezalê çêbûye. Lê sebra Mem nayê ku neçe vî şerê pîroz nebe. Mem di piyêsê de hestên xwe wiha beyan dike:

“Ez ji kî kêmtir im! Ma ez Kurmanc nînim! Ma namusa her Kurdekî namusa min nîne! Elbet... Elbet ezê biçim. Qîyamet rabit dîsa ez diçim. Xwîn seran bibit dîsa ez xwe nagirim. Hetta Xezal jî min menî’ biket dîsa ez nawestim. Ez Memê Alan im. Mîrê Hekarîyan emir kirîye. Hem Sultan Selaheddîn şîrê xwe kêşaye, li pêşîya temamê dinyayê westaye, Qudsa şerîf muhafeze diket.”<sup>501</sup>

Di perdeya duyem de Memo piştî salekê ji şer vedigere mala xwe. Diya wî ne li malê ye. Xezal jî wî nas nake. Memo xwe wekî mîhvan dide nasîn û pirsan ji Xezal dike. Bi vî rengî sêdaqeta wê îmtihan dike. Ew dibêje, “Hûn keça malê ne, yan bûka malê ne?” Xezal ji vê pirsê hêrs dibe û wiha bersiv dide:

“Hûn mîhvan neban, miqabilê vê suala te lazim tat [dihat] ez bi çekan cewab bidim. Hinde qeder heye tu mîhvan î, qedrê mîhvaniyê ser me wacib e û çu kurdan di mala xwe da deng [li] mîhvanan nekiriye û daîma kurmancan di riya mîhvanê xwe da can daye. Dijminê kurmancan bibite mîhvan, dîsa qebûl dikin û qedrê digirin û xizmetê bo dikin”.<sup>502</sup>

Ev bersiv gelek li xweşa Memo diçe: “Xezala min, sed aferîn bo îsmeta te, ez fexrê bi te dikim” dibêje û xwe dide nasîn. Piştî van diyalogan herdu aşiq bi hev şa dibin. Dema ew di nav nivînan de ne, diya Memo tê malê. Dibîne ku kes derî venake, ew jî derî dişikîne û bûka xwe di nav cihan de bi wî halî dibîne. Ew Memo nas nake, hêrs dibe, radije rimê û li ser sînga Mem dixê. Xezal dike hewar, dayika wî xetaya xwe fêhm dike lê êdî dereng e, Mem dimire.<sup>503</sup>

---

501 Bozarslan, *Jîn Kovara Kurdî-Tirkî 1918-1919*, c. III, r. 675.

502 Bozarslan, hb., c. IV, r. 728.

503 Bozarslan, hb., c. IV, r. 728-729.

Nivîskar, di bin sernavê piyesê de “Tiyatroya kurdan fezîleta kurdan noşî didit” dinivise. Ji vê tê fêmkirin ku ‘Ebdurehîm Rehmî, ev piyes bo vegotina başiyên kurdan nivîsiye. Rastî jî nivîskar, di piyesê de mîrxasî, dîndarî û mîhvanperweriya kurdan, bi taybetî jî namûsperweriya jinên kurdan derxistiye pêş. Dîsa mekanê piyesê, navê lehangen, wekî dem hîlbijartina dema Selaheddînê Eyyûbî nîşan dide ku nivîskar dixwaze piyeseke netewî ya kurdan binivîse. Ji bo vê jî wî xwe spartîye folklorê kurdî. Wekî mînak piyes bi strana “Herê Memo, Memê Ebasî, Ebasî!/Bîrîndaro Memo, dayê kor bit, nenasî!” diqede ku ev strana gelêrî îro jî li herêma Colemêrgê tê gotin.

Ji îlaneke di hejmara 21ê ya kovara *Jînê* em hîn dibin ku ev piyes wekî kitêb jî çap bûye. Heman îlan di hejmarên 22, 23, 24 û 25an de jî cih digire. Dîsa jî îlaneke li paşbergê kovara *Jînê* em hîn dibin ku bihayê wê 5 qîrûş e.<sup>504</sup> Lê ev çap li ber dest nîne, me tu nusxeyên wê nedîtîn. Lê metnê şanoyê, ji ber ku di *Jînê* de hatiye weşandin li ber dest e û jixwe Bozarslan tîpguhêziya latînî ya temamê *Jînê* kiriye. metnê şanoyê bi tîpên latînî wekî kitêb jî çap bû.<sup>505</sup> Bi vî rengî ev berhema ‘Ebdurehîm Rehmî bi awayê kitêb nebe jî tekstê wê belav e.

### **3.2.3.5. *Mem û Zîn*, Ehmedê Xanî, R. 1335 (1919), Çapxaneya Necm-i İstîqbal, Stembol, 139 rûpel.**

*Mem û Zîn*, di sala 1695an de ji aliyê Ehmedê Xanî ve hatiye nivîsîn. Ev berhem, bi qalibê mesnewiyê hatiye nivîsîn û berhemeke edebiyata kurdî ya klasîk e. Mijara wê, wekî Leyla û Mecnûn, wekî Xusrew û Şîrîn çîrokeke eşqê ye. Lê ji bilî vê mijara ku di edebiyata Rojhilatê de mînakên wê pir in, *Mem û Zîn* bi sebebî telîfa xwe û bi beşa ku behsa rewşa kurdan dike jî mesnewiyên din cuda dibe. Bi vê cudatiya xwe di nav fikra netewperweriya kurdan de cihekî girîng digire. Ew beşa 5an ku pesnê camêrî û mîraniya kurdan dide û jî bêtîfaqî û bextreşîya wan gazin dike, û beşa 6an ku sebebê bi kurdî nivîsandina *Mem û Zînê* rave dike jî aliyê rewşenbîrên kurd

504 Bozarslan, *Jîn Kovara Kurdî-Tirkî 1918-1919*, c. V, r. 910.

505 Evdirehîm Rehmî Hekarî, *Memê Alan*, amd. R. Tovjîn, weş. Lîs, Diyarbakir, 2007.

ve, bi rewşa îroyîn a kurdan ve hatiye şibandin û ev yek ji bo bî-reweriya netewî hatiye ‘emilandin.<sup>506</sup>

Amadekariyên çapkirina *Mem û Zînê* li Stembolê ji aliyê saziyên kurdan ve dihate meşandin. Di nîsana 1919an de Kurd Asari Tedkîk Cem‘iyyeti (KATC) lêkolînên xwe yên li ser *Mem û Zînê* qedandibû, heşt formeyên wê bi awayekî nefîs çap kiribû, beşên mayî jî li ber çapê bûn.<sup>507</sup> Nûçeya projeya weşandina *Mem û Zînê* di hejmara 16an a kovara *Jînê* de jî bi sernavê Mujde/Mizgînî bi îlanên tirkî û kurdî tê belavkirin.<sup>508</sup> Di heman hejmarê de Memdûh Selîmbegî bi vê minasebatê li ser *Mem û Zînê* gotarekê dinivîse.<sup>509</sup> Celadet Alî Bedirxan jî, li ser weşana *Mem û Zînê* di rojnameya *Serbestî* de du gotaran dinivîse.<sup>510</sup>

Nûçeya qedandina çapkirina *Mem û Zînê* di 21. hejmara kovara *Jînê* de (hezîrana 1919an) tê belavkirin û heta jimara 25an jî ev tê dubarekirin. Di van îlanan de tê diyarkirin ku “ev kitêba ewil a kulliyata KTMNCê ye, ji bo çapê qet li ber pereyan nexistine û li kaxeza herî baş, bi awayekî nefîs çap kiriye. Hejmara çapa kitêbê hindik e loma ewê di karê belavkirinê de pêşî cih bidine Kurdistanê.” Li gorî van îlanan kitêba *Mem û Zînê* li Stembolê li îdarexaneyê KTMNC bi 50 qirûşî ye, ji bo yên derveyî Stembolê tevî heqê posteyê 60 qirûş e.<sup>511</sup> Nûçeyeke bi vî rengî di rojnameya *Jînê* de jî tê weşandin.<sup>512</sup>

Amadekirina *Mem û Zînê* KATCê, çap û belavkirina wê jî KTMNCê dike. KTMNC, girêdayî KTCê ye. Gava KTC di çarçoveya Prensîbên Wilson de ji bo kurdan bidestxistina statuyeke siyasî tevdigeriya, vê komeleyê jî xebatên kulturî ji xwe re kiribû kar û piştî derxistana kovara *Jînê* berhema wê ya herî mezin çapkirina *Mem û Zînê* ye.

---

506 Ji bo temamê van beşan û ravekirina wan bnr. Xanî, *Mem û Zîn*, amd. K. Yıldırım, r. 151-162.

507 Arslan, “Serbestî Gazetesi (1918-1919) ve Bedirxanîler: Celadet Alî Bedirxan’ın Yazıları ve Kürtlere Dair Bazı Haberler”, r. 449. Balkêş e, di vê nûçeyê de *Mem û Zîn* wekî “manzûm tiyatroyê” tê binavkirin.

508 Bozarslan, *Jîn Kovara Kurdî-Tirkî 1918-1919*, c. IV, r. 712.

509 Bozarslan, hb., c. IV, r. 718-719.

510 Arslan, “Serbestî Gazetesi (1918-1919) ve Bedirxanîler: Celadet Alî Bedirxan’ın Yazıları ve Kürtlere Dair Bazı Haberler”, r. 416-422.

511 Bozarslan, *Jîn Kovara Kurdî-Tirkî 1918-1919*, c. V, r. 909.

512 “(Mem û Zîn)in Tab’î Hitâm Buldu”, *Jîn*, j.33 (9 Mart 1336/9 Adar 1920), r. 4.

Hemzeyê Muksî, ku em dikarin wî wekî edîtorê kitêba *Mem û Zînê* bi nav bikin, ji kitêbê re pêşgotinek nivîsandiye. Ev pêşgotin di 19. hejmara kovara *Jînê* de jî hatiye weşandin. Hemzeyê Muksî, di vê pêşgotinê de derbareyê jiyana û berhemên Xanî de agahiyan dide, bi jêgirtinên ji *Mem û Zînê* li ser fikr û ramanên wî jî nixandinan dike.<sup>513</sup>

Qanatê Kurdo dibêje ku rewşenbîrên kurdan *Mem û Zîna* Ehmedê Xanî li Stembolê çap kir, lê hikûmeta tirkî ew kitêb şewitandin, nehiştin bela bikin û eşkere bifiroşin.<sup>514</sup> Bi heman rengî Roger Lescot jî diyar dike ku kitêb ji aliyê rayedarên Osmanî ve hate qedexekirin û tenê çend nusxeyên wê gihane îro.<sup>515</sup> Lê Celadet Alî Bedirxan bûyerê cuda neqil dike:

“Xanî’nin yuxarıda mevzu-u bahis ettiğim eseri evvelce yalnız el yazısı nüshalardan, Kürdistan medreselerinde okunurdu. 1310 tarihinde pederim tarafından tab’ına teşebbüs olunmuştu. O zamanki maarif encümeninde ale’l usul tetkik olunan bu eserin en ruhlu kısmı “çizilen mahalden maada (başka) tabında beis yoktur. 22 Ağustos 1310” şerhiyle tay edilmekle tab’ına muvaffakiyet elvermemişti. Mütareke devresinden istifade eden Kürt gençleri bu eseri tab eylediler. Ve binlerce nüshası Kürdistan dâhilinde ve haricinde bulunan Kürt münevveranı tarafından kapışıldı.”<sup>516</sup>

[Berhema Xanî ya ku li jor min behsa wê kir berê tenê ji nusxeyên destxetê, li medreseyan dihate xwendin. Di sala 1310 (1894)an de bavê min hewl da ku wê çap bike. Lê ji ber ku beşa herî bi coş a berhemê, piştî lêkolîna Encumena Mearif a wê demê bi raveya “ji bilî cihên ku hatine xîşkîkirin di çapa wê de astengî nîne 22 Tebax 1310” jê hate avêtin, çap pêk nehatibû. Ciwanên kurdan ji dewra Mutarekeyê îstîfade kirin, ev berhem çap kirin. Û rewşenbîrên kurd ên li Kurdistanê û derveyî wê, bi hezaran nusxeyên wê ji dest hev revandin.]

513 Ji bo tîpguhêzî û sadekirina vê pêşgotinê bnr. Bozarslan, *Jîn Kovara Kurdî-Tirkî 1918-1919*, c. IV, r. 824-827; hb., c. IV, r. 846-848.

514 Qanatê Kurdo, *Tarîxa Edebiyata Kurdî I*, weş. Roja Nû, Stockholm, 1983, r. 41.

515 Roger Lescot, *Le presse kurde, Roja Nû*, j.1 (03.05.1943), r. 4.

516 Bedirxan, *Mustafa Kemal’e Mektup*, r. 38. Dîroka 22 Ağustos 1310, beramberî 3yê Îlona 1894an a mîladî tê.

Celadet li benda jor agahiyeke balkêş dide ku bavê wî Emîn Alî Bedirxan di sala 1894an de hewl daye *Mem û Zînê* çap bike lê ji ber pergala sansûrê ev pêk nayê. Di sala 1898an de, di hejmara zyan a rojnameya *Kurdistanê* de Mîqdad Mîdhet Bedirxan jî heman armancê beyan dike. Ew diyar dike ku heta xilas bibe, di her hejmara rojnameyê de ewê beşeke *Mem û Zînê* biweşîne û niyeta wî heye ku *Mem û Zînê* wekî kitêb çap bike.<sup>517</sup> Weşandina beşên *Mem û Zînê* di rojnameya *Kurdistanê* de ji hejmara zyan dest pê dike, piştî ku rêvebiriya rojnameyê derbasî ‘Ebdurehman Bedirxan dibe jî berdeewam dike, lê çapkirina kitêba *Mem û Zînê* nabe nesîbê wî jî.

Piştî rojnameya *Kurdistanê*, di *Rojî Kurdê* de jî ew beşa meşhûr a *Mem û Zînê* ku bi beyta *Saqî tu ji bo Xudê kerem ke/Yek cur’eê mey di Camê Cem ke* dest pê dike di nav nivîsa Mehmed Salih Bedirxan tê weşandin.<sup>518</sup> Di heman hejmara *Rojî Kurdê* de Xelîl Xeyalî, di nava nivîsa xwe de gelek beytên *Mem û Zînê* diweşîne.<sup>519</sup> Ehmed Ramîz jî di kitêba xwe ya *Emîr Bedirxan* de, ku li ser sirgûniya malbata Bedirxaniyan a di sala 1906an de bi hest û vegotinên netewî nivîsandîye, wekî nimûneyek ji edebiyata kurdî cih daye beşa 5an a *Mem û Zînê*.<sup>520</sup> Di kongreya Civata Hêvî ya di sala 1913an de Ziya Wehbî radibe û ji *Mem û Zînê* qesîdeyeke ku pesnê kurdan dide dixwîne.<sup>521</sup> Ev hemû nîşan didin ku *Mem û Zîn* di tevgera kurdî ya sedsala 19 û 20an de ji bo hişyarbûna netewî ya kurdan wekî sembolekê hatiye bikaranîn.

Li gorî wergera tirkî ya berhemeke Celîlê Celîl, *Mem û Zîn* di sala 1915an de li Helebê di çapxaneyê Huseyn Huznî Mukriyanî de hatiye çapkirin û ev kitêba ewil a çapxaneyê Mukriyanî ye.<sup>522</sup> Balkêş e ku ev agahî di wergera kurdî ya heman berhemê de, a bi navê *Jiyana Rewşenbîrî û Siyasî ya Kurdan*, nîne. Me jî derbareyê vê çapa *Mem û Zînê* de agahiyeke din nedît.

517 Bozarslan, *Kurdistan Rojname Kurdî ya Pêşîn (1898-1902)*, c. I, r. 127

518 *Di Sedsaliya Wê de Rojî Kurd 1913*, amd. Koma Xebatên Kurdolojiyê, r. 192-194.

519 *Di Sedsaliya Wê de Rojî Kurd 1913*, amd. Koma Xebatên Kurdolojiyê, r. 195-196.

520 Lütîfî (Ahmed Ramiz), *Emir Bedirhan*, r. 64-68.

521 Silopi, *Doza Kürdistan*, r. 37.

522 Celîl, *Kürt Aydınlanması*, r. 93.

Çapa *Mem û Zînê* ya Stembolê paşê dibe sebebê hebskirina we-sangerê wê: Hemzeyê Muksî, ku ji vê çapê re pêşgotin nivîsîbû, di darizandina sala 1925an de ji ber vê kitêbê deh sal cezayê hebsê distîne.<sup>523</sup> Hemze, piştî ku sê sala di girtîgehê de dimîne, di sala 1928an de bi efûya giştî tê berdan. Piştî berdanê Hemze demekê li Stembol, Misir û Libnanê dimîne, paşê diçe Binxetê, yanî Sûriyeyê<sup>524</sup> û *Mem û Zîn*a ku li Stembolê çap kiribû vê carê di sala 1947an de li Helebê çap dike.<sup>525</sup> Ev çap hem bi “dîbace”ya xwe hem jî bi mîzanpaja xwe kopyeya çapa Stembolê ye, lê qelîteya wê li gorî çapa Stembolê qels e. Li ser bergê çapa Stembolê “Ji neşriyata (Jîn): Hejmar: 1” dinivîse. Li ser çapa Helebê “Ji neşriyata Jîn: Hejmar: 2” dinivîse.

*Mem û Zîn*, di dema Osmaniyan de kêmanî sê caran li tirkî tê wergerandin. Wergêrê ewil Ehmed Faîq e û wergera xwe di sala 1730î de temam kiriye. Ev werger li tîpên latînî jî hatiye veguhas-tin.<sup>526</sup> Wergêrê duyem Ebdulezîz Xalis e û wergera xwe di 1906an de qedandiye. Ev werger wekî destxet maye û nehatiye weşandin. Dîroka wergera sêyem trajîktir e, ji ber ku wergêrê wê Zulfîqar Fethî ji tirsê ku tiştek wê bê serê wî vê “ewraq-i muzirre”yê dişewitîne, ji ber vê yekê jî deqê vê wergerê îro ne li ber dest e.<sup>527</sup> Herwiha *Mem û Zîn* di sala 1976an de li zimanê azerbaycanî<sup>528</sup>, 1992an de li zimanê swêdî<sup>529</sup>, 2001ê de jî li frensî<sup>530</sup> tê wergerandin.

523 Hasan Hîşyar Serdî, *Görüş ve Anılarım*, weş. Med, İstanbul, 1994, r. 277.

524 Veysel Aydeniz, *Müküslü Hamza Eski Said'in Ehemmiyetli Talebesi*, ç.2, weş. Nûbihar, İstanbul, 2013, r. 93-95.

525 Aydeniz, hb., r. 106-107. Kunyeya vê çapê ev e: Ehmedê Xanî, *Mem û Zîn*, Çapxaneya Aras, Heleb, 1947, 139 r.

526 Ahmet Faîk, *Mem O Zîn*, amd. S. Dadaşbilge, İstanbul, 1969, Matbaa Tek-nisyenleri Basımevi, XVI+244 r.

527 Abdurrahman Adak, “Di serdema Osmaniyan de li pey rêça Ehmedê Xanî: Sê *Mem û Zînên* bi Tirkî”, *Nûbihar*, j.120 (Havîn 2012), r. 16.

528 Ev werger bi tîpên latînî ji nû ve çap bû: Ehmedê Xanî, *Mam û Zîn*, Kürd dilinden tærcûme ædæni: Ş. Əsgerov, Kiril ælifbasından çæviren: M. Kaplan, weş. Nûbihar, İstanbul, 2014.

529 *Mem och Zin*, wer. R. Alftan-G. Jänicke, Sara Förlag, Stockholm, 1992.

530 Ahmedê Khanî, *Mem et Zîn*, wer. S. Alexie-A. Hasan, L'Hartmattan, Paris, 2001, 336 r.

M. Emîn Bozarslan, di sala 1968an de cara ewil temamê *Mem û Zînê* derbasî tîpên latînî dike û ligel wergera wê ya tirkî li Stembolê çap dike. Tevî ku hin beytan ew bi xwe sansûr dike jî kitêb tê qedexekirin, ew jî tê darizandin lê di dawiyê de beraet dike.<sup>531</sup> Paşê Wezareta Çand û Turizmê ya Komara Tirkîyeyê bi xwe di sala 2010an de *Mem û Zînê* tevî wergera wê ya tirkî çap dike.<sup>532</sup> Vê yekê di çapemeniyê de gelekî deng veda, ji ber ku di dîroka Komara Tirkîyeyê de cara ewil bû ku saziyeke dewletê kitêbeke kurdî bi awayê fermî çap dikir. Lê pirsgirêkek hebû; amadekarê vê kitêbê ne kurdîzan bû. Kadri Yıldırım, li ser kêmasî û xeletiyên vê weşanê kitêbeke rexneyê nivîsand<sup>533</sup> û *Mem û Zîn*, bi lêkolîneke berfireh û tevî wergera wê ya bi tirkî ji nû ve amade kir.<sup>534</sup>

### **Nusxe**

1. Taksim, H.X: BEL\_Far\_00065.
2. Bi Huseyn Şemrexî re nusxeveke vê çapê heye lê ew jî ji destpêk û dawiyê kême.
3. Li Kitêbxaneyê Destxetan a Suleymaniye nusxeya çapa 1947an heye lê ew jî dawîya wê kême e: B: Sami Benli, H.X: 00982.

### **3.2.3.6. *Gaziya Welat - Kitêba Ewil-*, ‘Ebdurehîm Rehmî, R. 1335 (1919), Çapxaneyê Necm-i Istîqbal, Stembol, 24 rûpel.**

‘Ebdurehîm Rehmî, di kovara *Jînê* de helbestvanê herî çalak e. Bi qasî ku me dît di tevahiya *Jînê* de bîst û yek helbestên wî yên bi kurdî hatine weşandin. Mijara helbestên ‘Ebdurehîm Rehmî cur bi cur in. Lê welatperwerî û rewşa kurdan ên sereke ne. Dîsa nezana, hejarî, bêtifaqî û rojeva kurdan, wekî avakirina Komeleya Jinên

531 Ehmedê Xanî, *Mem û Zîn*, amd. M. Emin Bozarslan, ç.3, weş. Hasat, İstanbul, 1990, r. 571-580.

532 Ehmedê Xanî, *Mem û Zîn*, amd. N. Açıkgöz, weş. Kültür ve Turizm Bakanlığı, Ankara, 2010, 448 r.

533 Kadri Yıldırım, *Kültür Bakanlığı’nın Mem û Zîn Çevirisine Eleştirel Bir Yaklaşım*, weş. Avesta, İstanbul, 2011, 208 r.

534 Ehmedê Xanî, *Mem û Zîn*, amd. K. Yıldırım, weş. Avesta, İstanbul, 2010, 426 r.

Kurd, nûnertiya Şerîf Paşa ya di Konferansa Aştiyê ya Parisê jî ji helbestên wî re bûne tema.

*Gaziya Welat*, kitêba helbestê ya ‘Ebdurehîm Rehmîyê Hekarî ye. Hassanpour ji Vilçevskî neql dike ku *Gaziya Welat* ji sê cildan pêk tê<sup>535</sup> lê îro di destê me de Kitêba Ewil û Kitêba Duwê tenê hene.

Di cilda ewil a *Gaziya Welat* de çardeh helbest hene. Li binê her helbestê dîroka nivîsandina wê jî heye. Temamê helbestan berê di kovara *Jînê* de hatine belavkirin. Li gorî dîwanê navê helbestan û hejmara *Jînê* ku helbest tê de hatiye weşandin wiha ne: Bang (j.1), Qewî bi Xarina Ze‘îfan Dijîn (j.2), Destê Tenê Deng jê Na‘êt (j.5), Selaya Paşîvê (j.6), ‘Eşqa Welat (j.2), Bê Hêvî Nebin (j.9), Ji bo Nesla Têt (j.8), Sersal (j.14), Nûr (j.15), Nezanîn (j.17), Heyyaelesselat (j.13), Mirovînî (j.18), Deng (j.3), Nalîna Sêwîkî (j.11).

Li paşbergê kitêbê jî ji bo me agahiyên girîng hene. Li gorî vê, buhayê kitêbê 10 qirûş e. Dîsa li vir navê berhemên nivîskêr ên çapkirî û yên li ber çapê hatine rêzkirin. Di nav berhemên li ber çapê de *Memê Alan*, *Kurdce Mîtod-i Pratik* (Kurdceden Türkçeye), *Mifta Xwendê* (Kurdce elifba kitabî), *Dersa Dîn û Hakkari Lehçesinde Kurdce Sarf û Nahv* gelek balkêş in. Ji van *Memê Alan* û *Dersa Dîn* em dizanin, lê yên din kanîn, gelo çap û belav bûne, em nizanin. Bi rastî tenê navê van berheman jî girîngiya wan nîşan dide, ew îro li ber destê me nînin, lê îhtimala hebûna wan jî niyet û armanca ‘Ebdurehîm Rehmî bi me dide zanîn ku wî dixwest ji bo kurdan û kurdî çî bike.

‘Ebdurehîm Rehmî, xezûrê Mûsa Anter e. Anter, di bîranînên xwe de bi hurmet behsa wî dike û hem di bîranînên xwe de<sup>536</sup> hem jî di nivîseke xwe de<sup>537</sup> cih dide helbesta wî ya bi navê “Eşqa Welat”.

Herdu dîwanên ‘Ebdurehîm Rehmî yên bi navê *Gaziya Welat* (Kitêba Ewil û Kitêba Duwê)<sup>538</sup> û hemû berhemên wî hatine berhev kirin û bi tîpên latînî hatine weşandin.<sup>539</sup>

---

535 Hassanpour, *Kürdistan’da Milliyetçilik ve Dil 1919-1985*, r. 300.

536 Anter, *Hatıralarım*, r. 65-67.

537 Musa Anter, “Eski Dergilerden Jîn”, *Doğu*, j.2 (Ocak-Şubat 1970), r. 25-26.

538 Evdîrehîm Rehmî Hekarî, *Gaziya Welat*, amd. S. Ulugana, weş. Lîs, Diyarbakir, 2016.

539 Necat Zanyar, *Abdurrahim Rahmi Zapsu Çok Yönlü Bir Tanıklığın Öyküsü*, weş. Doğan Kitap, İstanbul, 2023.

## Nusxe

1. Ozege, H.X: 0114961
2. Sermet Çifter, H.X: 014571
3. DTCF, H.X: DTC085691

### **3.2.3.7. *Encumenî Edîbanî Kurd*, amd. Emîn Feyzî Beg, H. 1339 (1920), Çapxaneya Tercuman-i Heqîqet, Stembol, 142 rûpel.**

Kitêba *Encumenî Edîbanî Kurd* di edebiyata kurdî de yekemîn antolojî ye.<sup>540</sup> Antolojî ango bi kurdî guldeste, berhevok, bijarte wekî têgeha edebiyatê di wateya neqandin û li hev civandina cureyeke edebî yan jî berhemên şexsekî tê bikaranîn. Wekî antolojiya çîrokan, antolojiya helbestan, antolojiya Ehmedê Xanî, antolojiya helbestên kurdî yên klasîk hwd. Herçend antolojî wekî cure aîde edebiyata modern jî be di edebiyata klasîk de jî mînakên wê hene. Di edebiyata klasîk de ji van guldesteyan re mecmûa an jî tezkîre gotin.<sup>541</sup> Ya rastî *Encumenî Edîbanî Kurd* ji ber ku li gel mînakên helbestan agahiyên derbareyê helbestvanan de jî di hewîne zêdetir dişibe tezkîreyê.

*Encumenî Edîbanî Kurd* bi “Muqeddîme”ya Emîn Feyzî dest pê dike (r. 4-10). Di vê pêşgotinê de Emîn Feyzî dibêje ku udeba û şûerayên kurdan pir in lê berhemên wan nehatine berhevkerin. Ew armanca xwe jî di vê pêşgotinê de diyar dike: “Berhevkerin û çapkirina hin helbestên bi kurdiya babanî û bi vî rengî nîşandana feyz û zekaya milkî Baban”. Piştî vê Emîn Feyzî derbareyê jiyana Nalî, Şêx Riza Talebanî, Mistefa Begê Kurdî, Salim, Mewlewî, Ahî, Ehmedî Kor, Mewlana Xalid Ziyaeddîn û Arif Efendî de agahyan dide.<sup>542</sup> *Encumenî Edîbanî Kurd*, di nava xwe de ji panzdeh helbestvanan nêzî sed helbestî di hewîne. Ji bilî van di kitêbê de li bin hin helbestan de

---

540 Server Işık, “İlk Kürtçe Şiir Antolojisi Encümen-i Edîbân-ı Kürd ve Süleymaniyeli Emin Feyzi Bey”, *Kürt Tarihi*, j.1 (Haziran-Temmuz 2012), r. 60.

541 Ji bo mînaka mecmûayeke ku helbestên bi kurdî, tirkî, erebî û farisî di hewîne bnr. Dr. Abdurrahman Adak, “Şeyh Cüneyd-i Zokaydî ve Mahtut Bir Şiir Mecmuası”, *e-şarkiyat*, j.1 (nîsan 2009), r. 133-139.

542 Ji bo tîpguhêziya temamê muqeddîmeyê bnr. *Encumenî Edîban*, daner: Emîn Feyzî Beg, amd. M. X. Sadîî, r. 27-39.

ji bedêla navê helbestvanî de pirsnişan (?) heye. Dibe ku ev helbest anonîm bin an jî Emîn Feyzî helbestvanê wan nizanibe. Kitêb bi “Îfade”ya daner (r. 135), lîsteya navên taybet ên di kitêbê de (r. 136-137), hin te’bîrên kurdê Îran (r. 138), cedwela rast-xelet (r. 139-141) û lîsteya berhemên Emîn Feyzî yên bi tirkî (r. 142) diqede.

Balkêş e li Millet Kutuphanesi [Kitêbxaneya Destxetan a Millet-Stembol] bi navê *Muntexebat-i Eş’ar-i Kurdiyye* [Bijarteya Helbestên Kurdî] nusxeyeke destxet a vê berhemê jî heye. Bi raya me ev reş-belek yanî musweddeya Emîn Feyzî ye. Gava berhema xwe amade dikir helbestên ku ‘ecibandine wî pêşî li vê defterê qeyd dikir.

Emîn Feyzî wekî ku di pêşgotinê de jî gotibû, bi armanca nîşandana dewlemendiya mîrektiya Baban tenê helbestên şairên der û dora Silêmaniyê girtine nav berhema xwe. Baldariya wî ya li ser kurdên Baban ne tenê di vê berhemê de xuya dike. Wî di kovara *Înê* de li ser jêhatîbûna kurdên Baban ên di şer, sin’et û zanistê de du gotarên bi tirkî jî nivîsandine.<sup>543</sup> Di çapemeniya serdemê de li ser dîroka kurdan û rewşa wan a aktuel jî nivîsên wî hatine weşandin.<sup>544</sup> Ew, di jiyannamêya xwe de bi xwe dibêje ku endamê KTCê bû.<sup>545</sup>

Lêkolîner Ibnulemin Mahmud Kemal Inal, ku Emîn Feyzî şexsen nas dikir, di berhema xwe de kurtejiyana wî tevî nimûneyên ji helbestên wî weşandiye.<sup>546</sup> Di vir de *Encumenî Edîban* di nav eserên neçapkirî de derbas dibe, lê ev şaş e. Emîn Feyzî, bi tirkî du dîwan çap kirine<sup>547</sup> û herwiha helbestên wî yên bi kurdî jî hene.<sup>548</sup>

---

543 S. Bozkurt- M. Arslan (ed.), *Süleymaniye’den İstanbul’a Bir Kürt Aydını Emin Feyzi Bey’in Hatıraları*, weş. Nûbihar, İstanbul, 2022, r. 142-149.

544 *Süleymaniye’den İstanbul’a Bir Kürt Aydını Emin Feyzi Bey’in Hatıraları*, r. 127-141.

545 *Süleymaniye’den İstanbul’a Bir Kürt Aydını Emin Feyzi Bey’in Hatıraları*, r. 111.

546 İbnü’l-Emin Mahmud Kemal Inal, *Son Asır Türk Şairleri*, c. I, amd. M. Cunbur, Atatürk Kültür Merkezi Başkanlığı Yayınları, Ankara, 1999, r. 650-657.

547 Özcan Çiçek, *Emin Feyzi Bey’in Şuûât ve İlâve-i Şuûât Adlı Eserleri*, weş. Şarkiyat Bilim ve Hikmet Vakfı Yayınları, Diyarbakır, 2023.

548 Mesut Arslan, “Emin Feyzi’nin Edebi Yönü Hakkında Birkaç Söz”, *Süleymaniye’den İstanbul’a Bir Kürt Aydını Emin Feyzi Bey’in Hatıraları*, r. 21.

*Encumenî Edîbanî Kurd*, di sala 1983yan de ji alî “Korî Zanyarî Êraq Destey Kurd” ve li Bexdadê ji nû ve hate çapkirin.<sup>549</sup> M. Xalid Sadînî ev çapa Bexdadê derbasî tîpên latînî kir û ew li Stembolê ji nû ve hate weşandin.<sup>550</sup>

### **Nusxe**

1. Millet, H.X: AEfrs639
2. Milli, H.C: o6 Mil EHT A 34741.
3. Ozege, H.X: 0101489
4. Ozege, H.X: 0162123
5. Suleymaniye, B: Hüdai Efendi, H.X: 01448
6. Taksim, H.X: SEL\_Osm\_0615

### **3.2.3.8. *Hînkerê Zimanê Kurdî -Rehberî Zimanê Herdu Kurdî: Kurmancî-Babanî-, R. 1337 (1921), Çapxaneya Necm-i Istiqbal, Stembol, 64+1 rûpel.***

Civata Hêvî piştî dawîbûna Şerê Cîhanê yê Yekem ji nû ve dest bi xebatê dike û di vê dewra duyem de xebata wan a herî mezin *Hînkerê Zimanê Kurdî* ye. Li ser bergê kitêbê “Ji neşriyat[a] Hêvî Civata Telebeê Kurdan Jimar 1” dinivîse. Bi qasî ku em dizanin kitêbeke din jî derneketiye.

Ev kitêb ji bo kesên ku dixwazin hînî kurdî bibin hatiye amadekirin. Di pêşgotina kitêbê de tê diyarkirin ku armanca kitêbê hînîrîna peyivîna kurdî ye, ji ber vê jî zêde bala xwe nedane rêziman û rastnivîsê.<sup>551</sup>

Lêkolîner Amir Hassanpour îddia dike ku kurdî zimanekî cotstandart e: kurmancî û soranî.<sup>552</sup> *Hînkerê Zimanê Kurdî* jî wekî ku

---

549 *Encumenî Edîban*, daner: Emîn Feyzî Beg, amd. Lijney Wêje û Kelepor, Çapxaneya Korî Zanyarî Êraq, Bexdad, 1983.

550 *Encumenî Edîban*, daner: Emîn Feyzî Beg, amd. M. X. Sadînî, weş. Dîwan, Stembol, 2012, 137 r.

551 *Hînkerê Zimanê Kurdî*, amd. Koma Xebatên Kurdî di Çavkaniyên Osmanî de, weş. bgst, İstanbul, 2008, r. 44.

552 Hassanpour, *Kürdistan'da Dil ve Milliyetçilik 1918-1985*, r. 271.

ji navê wê jî tê fêmkirin kitêbeke dulehçeyî ye. Di kitêbê de hemû hevok û nivîs ji bilî tirkîya osmanî, bi kurmancî û babanî angî bi gotina îro soranî ne. Ji ber vê yekê kitêb ji aliyê lêkolînên lehçeyên kurdî ve jî pir girîng e. Ji bilî vê girîngiyeke din a kitêbê ev e ku “Hînkere Zimanê Kurdî, yekemîn pirtûka hînkirina zimanê kurdî ye ku ji hêla saziyeke kurdan ve hatiye amadekirin û weşandin.”<sup>553</sup>

Kitêb, bi “Bir İki Söz/Çend Gotin/Çend Qiseyek” dest pê dike. Paşê ders ders dewam dike. Hejmara dersa dawî 15 e, lê dersên 3, 4, 8 û 11an tunene. Piştî dersan derbasî metnên xwendinê dibe (r. 47-58). Ev metin jî wekî dersan bi tirkîya osmanî, kurmancî û babanî ne. Beşa dawî ya kitêbê “Birkaç Mükaleme/Çend Peyivîn/Çend Qise” angî diyalogên rojane ne (r. 59-64). Di rûpelê dawî de jî rastiya xeletiyên çapê hatine rêzkirin.

Kitêb, herçendî hinek belawela xuya bike jî di nava xwe de xwedî sistematîkekê ye. Bo nimûne; di dersa yekem de alavên dibistanê û ji yekê heta dehan jimar tene hînkirin. Di dersa duyem de pêşî rengan dide nasîn paşê jî rengê alavên dibistanê. Herwiha di vê dersê de ji dehan heta panzdehan jimar jî tene hînkirin.

Me berê di *Elîfbayê Kurmancî* ya Xelîl Xeyalî de dîtibû, di nava kitêbê de peyamên dînî, exlaqî û netewî bi awayekî beloq cih digirtin. Wekî kesekî misliman û kurdperwer Xelîl Xeyalî dixwest van dustûran hînê zarokan bike. Di *Hînkere Zimanê Kurdî* de jî ev peyam hene, lê kem in, belkî sê çar hevokên bi rengî hebin. Tê de zêdetir axaftinên rojane û civakî hene.

Nivîskar an jî amadekarê *Hînkere Zimanê Kurdî* ne diyar e, çimkî li ser kitêbê navê tu kesî tune ye. Li gorî lêkolîner Sezen Bilir, dibe ku kitêb ji aliyê pir kesan ve hatibe nivîsîn çimkî di kitêbê de bikanînên cuda hene.<sup>554</sup> Bi rastî jî ji ber ku kitêb bi “herdu kurdî”yan hatiye amadekirin, ihtimaleke zêf e ku kesekî amade kiribe. Dîsa nenivîsandina nav bi xwe jî dibe delîl ku kitêb ji aliyê lijnayekê ve hatiye amadekirin.

<sup>553</sup> *Hînkere Zimanê Kurdî*, amd. Koma Xebatên Kurdî di Çavkaniyên Osmanî de, r. 11.

<sup>554</sup> Hb., r. 9.

Malmîsanij, hê di sala 1986an de li ser vê kitêbê danasîneke berfireh nivîsiye.<sup>555</sup> *Hîngerê Zimanê Kurdî*, ji aliyê “Koma Xebatên Kurdî di Çavkaniyên Osmanî de” bi koordinatoriya Serhat Bozkurt û Sezen Bilir, li tîpên latînî hate veguhastin û tevî çapa wekxwe ya orijînalê kitêbê di sala 2008an de hate weşandin.<sup>556</sup>

### **Nusxe**

1. Ozege, H.X: 0103455
2. Milli, H.C: 06 Mil EHT A 37484.
3. Milli, H.C: EHT 1971 A 1022.

### **3.2.3.9. *Gaziya Welat -Kitêba Duwê-, ‘Ebdurehîm Rehmî, R. 1337 (1921), Çapxaneya Necm-i Istiqbal, Stembol, 23 rûpel.***

“Kitêba Ewil” a *Gaziya Welat* di sala 1919an de hatibû weşandin. Ev “Kitêba Duwê” dewama wê ye û di vê dîwana Ebdurehîm Rehmî de yazdeh helbest cih digirin. Ji van du heb, “Fîrquet” û “Wislet”, di kovara *Jînê* de hatine weşandin. Lê neh hebên din nehatine weşandin, ev yek jî girîngiya vê dîwanê zêdetir dike. Navê hemû helbestên dîwanê li gorî rêza wê ev in: Bêsernav (rista yekem halo ye: Wextê subê ye spêde da), Bêsernav (rista yekem halo ye: Xudê ji me ra go kulû weşrebû), Yekbûn, Fîrquet, Wislet, Kew<sup>557</sup>, Hewar, Bihişt, Zozan, Gîrya Welat, Loriya Welat.

### **Nusxe**

1. Milli, H. C: 06 Mil EHT A 36742.

---

555 Malmîsanij, “Ji Weşanên Hêviyê (1921): *Hîngerê Zimanê Kurdî*”, *Çarçira*, j.2 (Nîsan 1986), r. 23-28.

556 *Hîngerê Zimanê Kurdî*, amd. Koma Xebatên Kurdî di Çavkaniyên Osmanî de, weş. bgst, İstanbul, 2008, 126 r.

557 Navê vê helbestê bi herfên ‘erebî wiha hatiye nivîsîn: كەف. Bi vî awayî wekî “kef” an jî “kev” dikare bê xwendin lê ji helbestê tê fêmkirin ku mebest “kew” e.

**3.2.3.10. *Dîwan-i Es'ed -Farsî û Tirkî*-, el-Hac Mehmed Es'ed, R. 1337 (1921), Çapxaneyê Ewqaf, Stembol, 64+5 rûpel.**

Ji şeş berhemên Mehmed Es'ed Erbilî yek jî *Dîwana* wî ye. Helbestên di *Dîwana* wî de piranî bi farisî, hinek bi tirkî, yek bi 'erebî û yek jî bi kurdî ye.<sup>558</sup> Tiştê ku vê kitêbê tevî navê xebatê dike jî ew helbesta kurdî ye. Helbest bi sernavê “*Lisan-i Kurdî de Bir Gazel*”, di rûpelê 31-32yê *Dîwanê* de cih digire. Wekî ku ji sernavê jî diyar e helbest xezel e, ji heft beytan pêk tê û mijara wê ‘eşqa tesewwûfî ye. Beyta ewil û ya dawî ya vê helbestê ev e:

Şahî ke ruxi xibteî xurşîdi sema bî

Aşiq dibî feryadresî lutfî Xuda bî

...

Sûfî be temay bax û beri cennet e Es'ed

Haşa ke yibî ribx û cefa zewq û sefa bî

Di weşaneke nû ya *Dîwana* wî de ev helbesta kurdî ya Mehmed Es'ed bi herfên erebî û wergera wê ya tirkî cih digire.<sup>559</sup> M. Îrşad Seyda ev xezel hem derbasî tîpên latînî kiriye, hem jî wergerandiye kurmancî.<sup>560</sup> Selim Temo jî di xebata xwe ya antolojiyê de ev helbest derbasî tîpên latînî kiriye û wergerandiye tirkî.<sup>561</sup>

**Nusxe**

Di kitêbxaneyên cur bi cur de gelek nusxeyên *Dîwana* Es'ed hene. Emê tenê pênc heban binivîsin:

1. TBMM, H.C: 73003933, H.X: 197307899.

2. Ozege, H.X: 0109506.

---

558 Ji bo kurtejiyan û nasandina berhemên wî bnr. Hasan Kâmil Yılmaz, “Esad Erbilî”, *DIA*, c. 11, 1995, r. 348-349.

559 Muhammed Es'ad Erbilî, *Divân-ı Es'ad*, weş. Erkam, İstanbul, 1991, r. 121-122.

560 Şêx Es'edê Erbilî, “Xezel”, tîpderbasî û kurmancîkirin: M. Î. Seyda, *Nûbihar*, j. 97 (Payîz-Zivistan 2005), r. 10

561 Selim Temo, *Kürt Şiiri Antolojisi*, weş. Agora Kitaplığı, İstanbul, 2007, c. 1, r. 514-515.

3. DTCF, H.X: DTC130628.
4. DTCF, H.X: DTC131636.
5. Taksim, H.X: Bel\_Osm\_K.01401.

**3.2.3.11. *Dîwana Cizîrî*, Şêx Ehmed el-Cezerî (Melayê Cizîrî), R. 1338 (1922), weş. Mehmed Şefîq el-Arwasî el-Huseynî, Çapxaneya Ewqaf-i Islamiye, Stembol, 96 rûpel.**

Melayê Cizîrî, yek ji mezintirîn helbestvanê edebiyata kurdî ya klasîk e. Tenê *Dîwana* wî gihiştiye îro, lê vê *Dîwanê* jî têrî navdarbûna wî kiriye. Helbestên wî yên ku ‘eşqa îlahî û tesewwûf ji xwe re kirine mijar li nav hemû kurdan, bi taybetî di nav ehlê medreseyê de dihatin jiberkirin û bi aheng dihatin gotin.<sup>562</sup>

*Dîwan*, ji aliyê Mehmed Şefîq Arwasî ve tê weşandin û kitêb bi pêşgotina wî dest pê dike. Piştî wê, metnê *Dîwanê* jî bi helbesta “Newaya mutribê çengê fixan avête xerçengê” dest pê dike, bi ya “Me bi dil nêrgizê xasse divên” diqede. Di rûpelê dawî de (r. 96), Mehmed Şefîq Arwasî li ser temambûna çapê têbiniyekê dideyne û kitêbê bi duayekê diqedîne: “Bi tewfîqa Xuda rebbî te‘ala temambû teb‘kirina *Dîwana Cizîrî* di sala hezar, sêsed sih heştan di meha nîsan...”<sup>563</sup> Di heman rûpelî de helbesteke ‘Ebdurehîm Rehmîyê Herkarî ya li ser Melayê Cizîrî heye. Ew di vê helbestê de Melayê Cizîrî û Hafîzê Şîrazî berawird dike û Mela, ji Hafîz bilindtir dibîne:

Şîrazî li nav fursan kêşa ‘elema ‘îşqê  
 Mela! Te bire ewcan Hafîz bike pê meşqê  
 ...  
 Mella te wekî Hafîz Firdewsî nekir ustad  
 Hem ‘îşqê ji nû hilkir kurmancî te kir îcad  
 ...

<sup>562</sup> Şengül, “Melayê Cizîrî ve Diwan Okuma Geleneği”, r. 194-195.

<sup>563</sup> Ji bo tîpguhêzî û wergera tirkî ya vê nivîsê bnr. Aydeniz, *Seyyid Şefik Arvasî*, r. 49.

Kurmanc divê herdem fexrê bi te kin elheq  
Lakin tu ku Mensûr î rutba te bû [Enelheq]<sup>564</sup>

Celadet Alî Bedirxan, di kovara *Hawarê* de derbareyê Melayê Cizîrî de wiha dibêje: “Mela li cem hemî kurdmancan, nemaze li cem feqehan ewçend nas e ko ne hewce ye ez wesfê wî bidim. Mela şahirekî mitesewif e, dîwana wî di sala 1919an de li Stenbolê ketiye çapê.”<sup>565</sup> Xuya ye Celadet sala çapkirina *Mem û Zînê* û ya *Dîwanê* tevlihev dike, çimkî *Dîwana* Mela ne di 1919an de lê di 1922an de ketiye çapê.

*Dîwana* Mela, cara ewil di sala 1904an de ji aliyê rojhilatnas Martin Hartmann ve li Berlînê çap dibe. Hartmann, di pêşgotina xwe de gelek pesnê Melayê Cizîrî dide. Ew, ruhê Mela bi çar bêjeyan pênase dike: “Îhtîşam, hesasiyet, jixwebawerî, dîqet”.<sup>566</sup>

Berî Martin Hartmann, Alî Emîrî Efendiyê Diyarbekrî di sala H. 1296/M. 1879an de, di berhema xwe ya *Mir’atul-Fewaid* de ji bo Melayê Cizîrî, “Mela Ehmedê Kurdî” dibêje û behsa navdarbûna wî ya li nav kurdan, herwiha rengîniya dîwana wî dike.<sup>567</sup>

Hacî Qadirê Koyî jî di helbesteke xwe de wiha behsa Mela dike: “Le Cizîrê yekêk e Şêx Ehmed/Sahîbî naw û murşîdî erşed”,<sup>568</sup> Melayê Cizîrî, di edebiyata kurdî ya klasîk de wisa bûye ekolek/dibistanek ku heta sedsala 19 û 20an, angî pişt modernîzmê jî gelek helbestvanên wekî Şêxê Meczûb<sup>569</sup> û Mela Yasîn Yusrî<sup>570</sup> bûne peyrevên wî.

Berî vê çapa Stenbolê gelek helbestên Melayê Cizîrî di kovar û rojnameyên kurdî yên dema Osmanî de hatibûn weşandin. Bo

---

564 Ji bo tîpguhêziya temamê vê helbestê bnr. Aydeniz, hb., r. 114.

565 *Hawar Cild 2 Hejmar 24-57 (1934-1947)*, amd. F. Cewerî, r. 811.

566 Hartmann, “Li ser Edebiyata Kurdî & Li ser Melayê Cizîrî”, wer. A. İncekan, r. 132.

567 Arslan, “Ali Emîrî’nin Mir’âtü’l-Fevâ’id Adlı Eserinde Osmanlı Dönemi Kürt Şairleri”, r. 209-210.

568 Koyî, *Dîwan*, r. 129.

569 Mesut Arslan, “Peyrevê Melayê Cizîrî: Şêxê Meczûb û Dîwana Wî ya Kurdî”, dnd. *Gotarên Vekolînên Çanda Kurdî* de, weş. Nûbihar, Stenbol, 2024, r. 206-208.

570 Semih Gezer, *Dîwana Mela Yasîn Yusrî*, weş. Peywend, Wan, 2022, r. 30.

nimûne, di jîmara 4an a rojnameya *Kurdistanê* de xezeleke Mela tê weşandin.<sup>571</sup> Mehmed Mîhrî, di hejmara ewil, 2yan û 4an a kovara *Kurdistanê* de sê helbestên Mela diweşîne û werdigerîne tirkî.<sup>572</sup> Di hejmara 14an a kovara *Jînê* de dîsa helbesteke Mela tê weşandin.<sup>573</sup> Di dehemîn hejmara *Hetawî Kurdê* de jî helbesteke bi sernavê “Mela Ehmedê Cizîrî bona pêxemberê axirzeman gotiye” heye<sup>574</sup>, lê ev ne helbesta Melayê Cizîrî ye, ya Melayê Bateyî ye.

*Dîwana* Mela heta niha gelek caran ji nû ve hatiye çapkirin. Ji van a kevintir çapa Hartmann e: “Martin Hartmann, *Der Kurdische Diwan des Schech Ahmed von Geziret Ibn ‘Omar genannt Mala’i Gizri*, S. Calvary&Co., Berlin, 1904.” Bi vî rengî ev çapa Mehmed Şefîqê Arwasî dibe çapa duyem a *Dîwana* Mela. Mûsa Anter, ev çapa Arwasî dîtîye û di sala 1970yî de di gotareke xwe ya li ser Melayê Cizîrî de behsa wê dike.<sup>575</sup>

*Dîwana* Melayê Cizîrî di sala 1994an de li rûsî<sup>576</sup>, 2007an de jî li tirkî<sup>577</sup> hate wergerandin. Wergera tirkî ya Osman Tunç, tevî metnê kurdî û destxeta *Dîwanê* ya ji koleksiyona Martin Hartmann, ji aliyê Wezaretê Çand û Turizmê ya Komara Tirkîyeyê ve hate çapkirin. Bi vî rengî Wezaretê piştî *Mem û Zînê* kitêba xwe ya duyem a bi kurdî weşand.<sup>578</sup>

*Dîwana* Mela, berhemeke tesewîfî û xwedî belaxet û hunereke bilind e. Loma fêmkirina wê hîç ne hêsan e. ji ber vê yekê ew gelek caran hatiye şerh û şirovekirin. Li ser *Dîwana* Mela şerha pêşîn ya

---

571 Yener Koç-Serhat Bozkurt, “Du Hejmarên Rojnameya Kurdistan (1908-1909)”, r. 102.

572 Veroj, *Kurdistan (1919-1920)*, r. 134-135, 152, 175.

573 Bozarslan, *Jîn Kovara Kurdî-Tirkî*, c. III, r. 619-621.

574 *Hetawî Kurd*, j.10 (20 Haziran 1330/3 Tîrmeh 1914), r. 12-13.

575 Musa Anter, “Büyük Bir Ozanımız: Mela Ahmedê Cizîrî”, *Doğu*, j.2 (Ocak-Şubat 1970), r. 27-29.

576 Said Mela, “Wergera Rusî ya Dîwana Melaye Cizîrî”, *Çira*, j.3 (Îlon 1995), r. 102.

577 Molla Ahmed-i Cezîrî, *Divan*, wer. O. Tunç, weş. Kent Işıkları, İstanbul, 2007. (tenê bi tirkî); Melayê Cizîrî, *Dîwan*, wer. O. Tunç, ç.4, weş. Nûbihar, Stembol, 2011. (bi kurdî û tirkî).

578 Melayê Cizîrî, *Dîwan*, wer. O. Tunç, weş. Kültür ve Turizm Bakanlığı, Ankara, 2012.

Mela Ehmedê Zivingî ye. Ev şerha bi ‘erebî li kurdî jî hate wergerandin.<sup>579</sup> Ji bilî vê Mela Ebdusselam Naciye Cizîrî jî bi ‘erebî<sup>580</sup>, Abdulmukit Septioglu -33 qesîdeyên ewil- bi tirkî<sup>581</sup>, Celalettin Yoyler bi kurdî<sup>582</sup>, Abdulbaki Turan jî bi tirkî<sup>583</sup> *Dîwana Mela şerh kiriye*.

### **Nusxe**

1. Ozege, H.X: 0128256
2. Ozege, H.X: 0101304
3. Suleymanîye, B: Kemal Edip K-oğlu, H.X: 00396
4. Suleymanîye, B: Sami Benli, H.X: 01428-002
5. Suleymanîye, B: Sami Benli, H.X: 01430 (*Dawîya vê nusxeyê kêm e.*)
6. Dicle, H.X: 002170
7. Taksim, H.X: Bel\_Osm\_K.04317

### **3.2.3.12. *Dersa Dîn -Li Ser Mezhebê Îmam Şafî’î-, ‘Ebdurehîm Rehmî, R. 1338 (1922), Çapxaneyê Necm-i Istîqbal, Stembol, 16 rûpel***

‘Ebdurehîm Rehmî bêguman di dewra piştî şerê cîhanê de nivîs-karê kurd ê herî çalak e. Di navbera salên 1919-1922an de herî kêm pênc kitêbên wî yên bi kurdî têne çapkirin. Yek ji van jî kitêba *Dersa Dîn* e ku wekî *‘Eqîdeya Kurdan* ‘alimtiya ‘Ebdurehîm Rehmî nîşanî me dide, lê vê carê berhem ne menzûm e, pexşan e.

Kitêb bi “Îfade”ya nivîskarî dest pê dike (r. 2). Metin bi besmeleyê dest pê dike û piştî sê çar hevokên raveyê derbasî “riknêd îslamê”

---

579 Mela Ehmedê Zivingî, *Gerdeniya Gewherî Şerha Dîwana Melayê Cizîrî*, amd. û wer. E. Narozi, weş. Avesta, Stembol, 2013, 3 c.

580 Mela Ebdusselamê Cizîrî, *Şerha Dîwana Melayê Cizîrî*, amd. T. Î. Doskî, wer. J. Dost, weş. Dara, Diyarbekir, 2018.

581 Abdulmukit Septioglu, *Melayê Cizîrî Divanî’nın Şerhî*, weş. Nûbihar, İstanbul, 2005.

582 *Şîroveya Dîwana Melayê Cizîrî*, amd. C. Yöyler, weş. Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, Stenbol, 2006.

583 *Melayê Cizîrî Divanî ve Şerhi*, amd. A. Turan, weş. Nûbihar, İstanbul, çapa 1. 2010, çapa 2. 2012.

dibe. Nivîskar pênc rîknên îslamê rêz dike, derbareyê rîknêd ewil, kelîmêî şehadetê de agahî dide û derbasî mijara nimêjê dibe. Jixwe ji rûpelê çaran heta dawîya kitêbê mijar êdî nimêj e, rîknên rojî, hec û zekatê qet nehatine ravekirin. Lewre em ji vê kitêbê re bibêjin “kitêba nimêjê”, ne xelet e.

Bi berfirehî ravekirina nimêjê normal e, hewce ye em ji bîr nekin ku di dînê îslamê de piştî îmanê mijara herî girîng nimêj e. Berhema ‘*Eqîdeya Kurdan* mijara îmanê rave dikir, *Dersa Dîn* jî mijara ‘emelê rave dike û bi vî awayî hevdu temam dîkin. Li ser bergê dinivîse ku ev kitêb li ser mezhebê Îmamê Şafiî hatiye nivîsandin. Bi vî rengî ew ji *Turkçeden Kurd Lisanina Mutercem Ilmihaldirê* cihê ye. Ya rastî peyrewên van herdu mezhebên ‘emelê jî di nav kurdên misilman da hene, lê şafiîti belavtir e.

Dîsa li ser bergê pêş bi kurdî “Ji terefê ‘Civata Tedqîq-i Mesahif û Muellifat-i Şer‘iye’ hatiye tedqîqkirin”, li ser bergê hindur jî bi tirkî “Tedkîk-i Mesahif ve Mu‘ellifat-i Şer‘iyye Meclisince tedkîk idilmiştir” dinivîse. Civata Tedqîq-i Mesahif û Muellifat-i Şer‘iye di sala 1914-1915an de bi armanca qontrolkirina nusxeyên Quranê yê çapkirî û berhemên derbareyê îslamê de hatiye avakirin. Di 12ê Hezîrana 1922an de biryar hat standin ku gotarên li ser îslamê teqez ji vir destûrê bixwazin.<sup>584</sup> Ev berhema ‘Ebdurehîm Rehmî jî ku derbareyê îslamê de ye bi destê vê meclîsê hatiye lêkolînkirin û li gorî ku hatiye çapkirin destûr jî standiye. Ev yek nîşanê me dide ku di vê meclîsê de kesên kurdîzan jî hebûne. Mesela ji sala 1919an heta tîrmeha 1922an -ne yekpare jî be- serektiya vê meclîsê Mustafa Safvet Efendî kiriye ku ew bi eslê xwe kurdekî ji Rihayê ye.<sup>585</sup>

Li paşbergê vê kitêbê, di bin sernavê “Kitêbêd Mektebê” de navê gelek kitêbên kurdî yê çapkirî û yê bîne çapkirin hene. ‘Ebdurehîm Rehmî, di vir de bi aliyê xwe yê mamostetiye derdikeve pêşiya me. Ji vê listeyê tê fêmkirin ku ‘Ebdurehîm Rehmî û hevrêyên wî

---

584 Esra Yakut, *Şeyhülislâmlık: Yenileşme Döneminde Devlet ve Din*, weş. Kitap, İstanbul, 2005, r. 69.

585 Sever Işık, “Şeyh Mustafa Safvet Efendi”, *Kürt Tarihi*, j.5 (Şubat-Mart 2013), r. 40.

ji bo perwerdeya bi kurdî xwestine mufredat û kulliyatekê amade bikin lê ev negihîştine îro.

‘Ebdurehîm Rehmî, ne tenê ji bo zarokan ji bo perwerdeya mezinan jî xebat kiriye: Ji nûçeyêke rojnameya *Jînê* em hîn dibin ku ji bo kurdên xwendinê nizanin, bi taybetî ji bo ‘emeleyên (karkerên) kurd li navenda KTCê dersxaneyêke meccanî yanî belaş vebûye û li vir di bin çavdêrî û rêvebiriya ‘Ebdurehîm Rehmî de wê perwerde bê dayîn, ên ku daxwaz dikin hewce ye serî lê bidin, gava hejmar giha 30 kesî jî wê perwerde dest pê bike.<sup>586</sup> Gelo 30 kes temam bû, ew kurs vebû yan na, em nizanin; muhtemelen karkerên kurd ji hilgirtina barê dinyayê wext nedîtî û ew kurs jî tu çaxî venebû lê ev nûçe nîşan dide ku ‘Ebdurehîm Rehmî xemxwarê miletê xwe, mamosteyekî fedakar e. Herwiha em dibînin ku êdî saziyên kurdan girîngiyê didine perwerdeya gelî û xwebirêxistina karkerên kurd. Bo nimûne dîsa ji nûçeyêke *Jînê* em hîn dibin ku ‘emeleyên kurd loncayek ava kirine û bi hîlbijartinan heyeta vê loncayê hatiye diyarkirin.<sup>587</sup>

### **Nusxe**

1. Ozege, H.X: 0128133
2. Milli, H.C: 06 Mil EHT A 35659

### **3.3. Weşangerên Kurd**

Weşangerên kurdî yên dewra Osmanî -Diyarbakirli Haziq Efendî û weşanên mîsyoneran ne tê de- di heman demê de endamên tevgerên kurdî ne. Wekî Kurdîzade Ehmed Ramîz, Mehmed Şefîq Arwasî û Hemzeyê Muksî. Em dikarin ji bo weşangerên kovar û rojnameyên kurdî jî heman tiştî bibêjin. Wekî ‘Ebdurehman Bedirxan, Pîremêrd, Sureyya Bedirxan, Baban ‘Ebdulezîz, Kerkuklu Necmeddîn hwd. Ev yek jî têkiliya tevgera kurdî û weşangeriya kurdî nîşan dide.

Yekemîn komeleya kurdî ya weşanê jî di sala 1919an de li Stembolê bi navê KTMNCê tê avakirin: Ew, kitêba xwe ya yekane *Mem û Zînê* bi serkeftin çap dike. Ji daxuyaniya Civata Hêviyê tê fêmkirin

---

586 “Kürd ‘Amelesine Meccanî Dersler”, *Jîn*, j.33 (9 Mart/Adar 1336/1920), r. 4.

587 “Kürd ‘Amelesi İntihâbâtı”, *Jîn*, j.33 (9 Mart/Adar 1336/1920), r. 2.

ku piştî *Mem û Zînê* ew dixwazin “Dîwana Nalî û Dîwana Melayê Cizîrî û mîrasên edebî yên Elîyê Herîrî, Feqîyê Teyran, Mistefa Begê Kurdî, Şêx Qadir û Şêx Riza bên weşandin, ku hemî jî dîroka edebiyata Kurdî bi xeml û xêzên dewlemend û rengîn dadigirin.”<sup>588</sup> Lê zextên dualî (Hikûmeta Osmanî ya li Stembolê û tevgera Mistefa Kemal a li Enedolê) wekî projeyên siyasî yên KTCê rê nadine projeyên wê yên kulturî jî. KTMNCê di rêzîknameya xwe de armancên pir mezin û girîng dane ber xwe lê xuya ye çapxaneyêke wê jî nebû.<sup>589</sup>

Emê di bin vî sernavî de behsa sê weşangerên mezin ên kurdî bikin: Kurdîzade Ehmed Ramîz, Mehmed Şefîq Arwasî û Huseyn Huznî Mukriyanî.

### 3.3.1. Kurdîzade Ehmed Ramîzê Licêyî: Xidmetkarê Kurdmancan

Kitêbên ku Ehmed Ramîz çap kirine gelek jê li ber dest in, lê gava em bixwazin jiyana wî bixwînin ev ewqas ne rehet e. Derbareyê jiyana wî de agahiya herî zelal ew e ku wî qet memûrtî yan jî tu karên fermî nekirine. Lewre ew di “Reşbelek”ê de dibêje ku wî hîç meaş nestandiye.<sup>590</sup> Ji ber ku tu karê fermî nekiriye di arşîva Osmanî de sicîla wî jî nîne. Bi rastî bi saya wan sicîlan derbareyê kesayetên wê dewrê de gelek agahî têne bidestxistin, lê ji bo Ehmed Ramîz em ji vê mehrûm in.

Derbareyê jiyana Ehmed Ramîz de sê çavkaniyên sereke hene: bîranînên Qedrî Cemîlpaşa (Zinar Silopî), kurtejiyana wî ya ku Malmîsanî amadekirî<sup>591</sup> û “Reşbelek”a wî bi xwe. Ji bilî van çavkaniyên nivîskî, çavkaniyeke devkî jî “Adil Oztek” e. Ew kurê biraziyê Ehmed Ramîz e, an jî bi gotineke din Ehmed Ramîz, apê heq ê bavê Adil

588 Bozarslan, *Jîn Kovara Kurdî-Tirkî 1918-1919*, c. V, r. 959-960.

589 Hassanpour, “Kürt medya kültürünün yaratılması”, r. 101-102. Ji bo rêzîknameya KTMNCê bnr. Bozarslan, *Jîn Kovara Kurdî-Tirkî 1918-1919*, c. II, r. 467-471.

590 “Reşbelek Kurdîzade Ehmed Ramîzê Licêyî”, amd. M. Serfiraz-B. Hawar, r. 8.

591 Malmîsanî, *Yüzyılımızın Başlarında Kürt Milliyetçiliği ve Dr. Abdullah Cevdet*, r. 44-50.

Oztek bû. Me derbareyê jiyana Ehmed Ramîz de ji Adil Oztek ge-  
lek agahî standin. Bi arîkariya van û çend çavkaniyên din emê niha  
hewl bidin ku Ehmed Ramîz bidin naskirin.

Kurdîzade Ehmed Ramîz ji Licê ye. Li gorî Şevket Beysanoğlu  
sala zayîna wî 1878 e.<sup>592</sup> Li gorî hin çavkaniyan Ehmed Ramîz, di  
1878an de li gundê Xosorê li ser qeza Licê hatiye dinyayê.<sup>593</sup> Lê li  
gorî agahiya ku Adil Oztek dayî Ehmed Ramîz ji mezreya “Mehmûd”  
a gundê “Zengesor” e. Zengesor, îro bi navê xwe yê fermî Akbudak  
e û girêdayî Licê ye.

Di belgeyeke arşîva Osmanî de navê wî “Ehmed Ramîz-i Kurdî  
bin ‘Ebdullah” derbas dibe.<sup>594</sup> Ji vir em hîn dibin ku navê bavê wî  
‘Ebdullah e. Adil Oztek jî ev agahî piştrast kir. Bi gotina wî Mele ‘Eb-  
dullah, 20 salan li Meletî, 15 salan jî li navenda Diyarbekirê qadîfî  
kiriye. Heft kurên Mele ‘Ebdullah hebûn, yek jê Ehmed Ramîz e, yê  
din Helîm, Kerîm, Esad, Saîd, Tahir û yê herî biçûk Mihemed e. Ji  
van Helîm di dewra qiyama Şêx Seîd de tê kuştin. Mihemed jî kalikê  
Adil Oztek bi xwe ye.

Qadîtiya bavê wî nîşan dide ku Ehmed Ramîz ji malbateke  
xwende û alim e; herçendî derbareyê perwerdeya wî ya ewil de tu  
agahiyek di destê me de nebe jî, qet nebe em dikarin bibêjin ku wî  
perwerdeya xwe ya ewil ji bavê xwe standiye.

Navê Ehmed Ramîz, wekî çalakgerekî kurd cara ewil di nav KAK-  
Cê de derbas dibe. Ew, yek ji endamên vê komeleyê bû, ku Fîkrî  
Efendiyê Diyarbekirî di sala 1900î de ava kiriye.<sup>595</sup> Ehmed Ramîz  
di sala 1904an de diçe Misrê. Piştî ku diçe Misrê jî têkiliya xwe KAK-  
Cê re qut nake û li wir jî li ser hesabê vê komeleyê dixebite. Sedema

---

592 *Diyarbakırlı Fikir Ve Sanat Adamları İkinci Cilt*, (Yeni İlavelerle 2. Basılış),  
Diyarbakır Tanıtım Kültür ve Yardımlaşma Vakfı, İstanbul, 1997, r. 299.

593 Zilkîf Xweşhêvî, “Kurdîzade Ehmed Ramîzê Liceyî”, *Nûbihar*, j.107 (Bi-  
har 2009), r. 9.

594 BOA.İ.HB, 107/1330/S-033, Dîrok:15/S/1330 (H), 04.02.1912 (M), ji  
bo tîpguhêziya temamê belgeyê bnr. Malmîsanij, *Yirminci Yüzyılın Ba-  
şında Diyarbekir’de Kürt Ulusçuluğu (1900-1920)*, r. 124-125.

595 Silopî, *Doza Kürdistan*, r. 25; Malmîsanij, *Yirminci Yüzyılın Başında Di-  
yarbekir’de Kürt Ulusçuluğu (1900-1920)*, r. 16-18.

çûyîna wî polîtîk e yan na em baş nizanin, lê ew li Misrê bi muxalîfên ‘Ebdulhemîdê Duyem re têkilî dideyne, di nav wan de bi mêranî û jêhatîbûna xwe balê dikişîne.<sup>596</sup> Ehmed Ramîz bi xwe jî muxalîfêkî şedîd ê ‘Ebdulhemîdê Duyem e. Gava padîşah fermana sirgûnkirina malbata Bedirxaniyan dide kitêbeke bi navê *Emîr Bedirxan* dinivîse û di vê kitêbê de bi zimanekî tund wî rexne dike. Li ser bergê vê kitêbe dinivîse ku hasilata wê ji KAKCê re ye. Naxwe di sala 1907an de jî ev komele hê heye û Ehmed Ramîz yek ji endamên wê ye.

Di sala 1906an de Ehmed Ramîz, *Mewlûda* Bateyî cara ewil wekî kitêb çap û belav dike. Balkêş e, ev herdu kitêb jî (*Mewlûd* û *Emîr Bedirxan*) li çapxaneyê Ictihadê, ya ku xwediyê wê ‘Ebdullah Cevdet e, têne weşandin û di kovara *Ictihadê* de jî îlanên wan hene. ‘Ebdullah Cevdet yek ji avakarên Ittihad-i Osmanî ye ku ev koka ITCê ye û ew di nav Jonturkên muxalîfê ‘Ebdulhemîdê Duyem de kesekî pêşeng e. Ev yek jî derdora ku Ehmed Ramîz di nav de ye nîşanî me dide.

Di fihrista çapxaneyê Ictihadê de (1908) danasîna van herdu kitêban jî heye. Di danasîna *Mewlûdê* de hevokeke wiha derbas dibe: “Ezher-i Şerîf talebesinden Kurdîzade Ahmed Ramiz Efendinin himmetiyle neşr olunmuştur.”<sup>597</sup> Ji vê hevokê em hîn dibin ku di vê dewrê Ehmed Ramîz telebe ango xwendekarê el-Ezherê ye. El-Ezher li Qahîreyê mizgeft û medreseyeke mezin û dîrokî ye ku îro jî wekî zanîngeh aktîf e û di ilmên îslamî de navendeke sereke ye.

Ehmed Ramîz piştî îlankirina Meşrûtiyeta Duyem vedigere Stembolê û tevî tevgera kurdî dibe. Ew di nav Kurd Te‘avun ve Terakkî Cem‘iyyetiye û weşana wê *Kurd Te‘avun ve Terakkî Gazetesi* de (1908) cih digire<sup>598</sup>, herwiha yek ji avakarên KNMCê ye (1909).<sup>599</sup> Zinar Silopî dibêje ku wî mudîrtiya mekteba kurdî ya ku vê komeleyê li Stembolê vekiribû kiriye<sup>600</sup> lê ev şaş e. Mudîrê vê mektebê ‘Ebdu-

---

596 Silopî, *Doza Kürdüstan*, r. 25-26.

597 *Matba‘a-i İctihâdın Fihrist-i Neşriyatı*, r. 38-39.

598 Silopî, *Doza Kürdüstan*, r. 164.

599 Tunaya, *Türkiyede Siyasal Partiler Cilt: II Mütareke Dönemi*, r. 214-215.

600 Silopî, *Doza Kürdüstan*, r. 26.

rehman Bedirxan bû.<sup>601</sup> Dîsa li gorî Silopî, Xelîl Xeyalî, Mîrîkatib-zade Cemîl û Ehmed Ramîz ji bilî vê mektebê çapxaneyeye kurdî jî ava kiriye.<sup>602</sup> Ya rastî gava em li kitêbên ku Ehmed Ramîz weşandine dinêrin, ew li çapxaneyên cuda cuda hatine tebi'kirin. Yanî xuya ye çapxaneyeye wî bi xwe nîne. Em tenê çapxaneya *Elifbayê Kurmancî* nizanin belkî ew di vê çapxaneya ku Zinar Silopî behs dike de hatibe çapkirin.

Ehmed Ramîz di sala 1910an de di nava hewldanên derxistina du rojnameyên cuda de cih digire: Ya yekem bi navê *Kirmanç* e, zîmanê wê bi tirkî û kurdî, xwedî û mudîrê wê Ehmed Ramîz e û di 23 Mart 1326/5 Nîsan 1910an de destûra weşanê wergirtiye. Ya duyem bi navê *‘Eşîret* e, zîmanê wê tenê tirkî ye, xwediyê wê Ehmed Sureyya, mudîrê wê jî Ehmed Ramîz e û di 30 Eylul 1326/13 Cotmeh 1910an de destûrê werdigire.<sup>603</sup> Em ji van herdu rojnameyan re tenê dibêjin hewldan, ji ber ku îro tu nusxeyeke wan li ber destên me nîne.

Ehmed Ramîz û Seîdê Kurdî, îhtimaleke mezin li Stembolê hevdû nas dikin û di nav KTTC û KNMCê de bi hev re dixebitin. Ehmed Ramîz paşê weşangeriya du kitêbên wî dike: Ew di sala H. 1326an de *Nutuk* di H.1328an de jî *Îki Mekteb-i Musîbetin Şehâdetnâmesi Yâhûd Dîvân-i Harb-i ‘Orfî: ve Sa‘îd-i Kurdî* (çapa duyem) diweşîne. Ji *Îki Mekteb-i Musîbetin Şehâdetnâmesi Yâhûd Dîvân-i Harb-i ‘Orfî: ve Sa‘îd-i Kurdî* re bi sernavê “îfade-i naşîr” pêşgotinekê dinivîse.<sup>604</sup> Di kitêba *Nutukê* de jî balkêşiyek heye: Di bergê hundir de navê naşîr (weşanger) “Kutubhane-i İctihad sahibi Ehmed Efendî” dinivîse. Herwiha di îlaneke rojnameya *Yeni Mujdeyê* de jî gotineke bi

601 Demir, “Kürd Meşrutiyet Mektebi”, r. 76.

602 Silopî, *Doza Kürdüstan*, r. 23.

603 Ahmet Ali Gazel-Şaban Ortak, “İkinci Meşrutiyet’ten 1927 Yılına Kadar Yayın İmtiyazı Alan Gazete Ve Mecmualar (1908-1927)” *Atatürk Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü Dergisi*, c. 7, j.1 (2006), r. 232, 245. Di gotarê de ji ber ku navê rojnameya ewil *Kirmanç* nivîsîye me jî wisa veguhast lê îhtimaleke mezin navê rojnameyê *Kirmanc* an jî *Kurmanc* e.

604 Bedî’uzzeman, *Îki Mekteb-i Musîbetin Şehâdetnâmesi Yâhûd Dîvân-i Harb-i ‘Orfî: ve Sa‘îd-i Kurdî*, Artîn Asaduryan ve Mahdûmları Matba’ası, İstanbul, H. 1328, r. 3-8.

vî rengî heye: “Kütübkhâne-i İctihâd: Memâlik-i Osmâniyyenin her tarafında okunması istifâde olunması îcâb iden: dînî, fennî, siyâsî, târîhî her dürlü âsâr-ı ma’rûfe ve bedî’enin mahall-i furûhtıdır. Sipârîş idilen her yere gönderilir: Dersa’âdet Dîvân Yolu **Diyârbekirli Ahmed Râmzî** [Kitêbxaneyâ Ictihad: Cihê firotina hemû berhemên navdar û baş ên dînî, zanistî, siyâsî û dîrokî ye ku hewce ye li hemû welatê Osmanî bêne xwendin û sûd ji wan bêne wergirtin. Ji her derê re sipârîş têne şandin. Li Stembolê Dîwan Yolu Ehmed Ramziyê Diyarbekirî]<sup>605</sup>

Em baş dizanin ku çapxane û kovareke bi navê *Ictihadê* heye. Vê çapxaneyê bi sernavê Kutubhane-i Ictihad qederek kitêb jî çap kiriye, lê em dîsa baş dizanin ku xwediyê wê ‘Ebdullah Cevdet e.<sup>606</sup> Naxwe dibe ku ev Ictihadeke cuda be? Belgeyeke arşîva Osmanî vê îhtimalê pûç dike: Belge derbareyê kitêba Dozy ya bi navê *Tarih-i Islamiyet* de ye. Ev kitêba ku ji aliye ‘Ebdullah Cevdet ve hatiye wergerandin, li Misrê di sala 1908an de di çapxaneyâ Ictihadê de tê çapkirin. Kitêb ji ber naveroka xwe ji aliye derdorên îslamî ve pir tê rexnekirin, wergêrê wê jî tê sucdarkirin. Dawiya dawî kitêb ji aliye rayedarên Osmanî ve tê qedexekirin.<sup>607</sup> Niha di vê belgeya arşîvê de tê behskirin ku hin nusxeyên vê kitêbê wê transît derbasî Rûsyayê bibin, ji bo vê jî destûr tê xwestin. Ê ku bi vî karî re ‘eleqedar dibe, ji bo destûrê daxwaznameyê dide jî “Kutubhane-i Ictihad sahibi Ehmed Ramîz” e.<sup>608</sup> Naxwe îhtimala ku ‘Ebdullah Cevdet û Ehmed Ramîz şîrîkê hev bin xurttir e. Jixwe hevnasîna herduyan digihe heta

605 *Yeni Mucde*, No.5 (8 Hezîran 1325/21 Hezîran 1909), r. 8. Xuya ye di vê îlanê de şaşiyek heye; ji bedêla Ehmed Ramîz, Ehmed Ramzî hatiye nivîsandin. Mudîr û nivîskarê rojnameya *Yeni Mucde* M. Bedrî angî Bedriyê Meletyeyî ye. Di *KTTGê* de jî çend nivîsên wî hene. Ji bo jiyannameya wî bnr. Murat Issı, “Bir Osmanlı-Kürt Aydını Malatyalı Bedri”, *Kürt Tarihi*, j.12 (Nisan-Mayıs 2014), r. 36-45.

606 Derbareyê kovara *Ictihadê* de bnr. Nazım H. Polat, “İctihâd”, *DIA*, c. 21, 2000, r. 446-448; Malmîsanij, *Yirminci Yüzyılın Başında Diyarbekir’de Kürt Ulusçuluğu (1900-1920)*, r. 99-100.

607 İbrahim Hatiboğlu, “Osmanlı Aydınlarının Dozy’nin Târîh-i İslâmiyyetine Yöneltilen Tenkitler”, *İslâm Araştırmaları Dergisi*, j.3 (1999), r. 197-213.

608 BOA. Mv. 146/50, Dîrok: 22/Za/1328 (H), 25.11.1910 (M).

bi Qahîreyê; ma ne Ehmed Ramîz *Mewlûda Bateyî û kitêba Emîr Be-dirxan* li Qahîreyê li çapxaneyê Ictihadê çap kiribûn?

Ehmed Ramîz di sala 1909an de *Elîfbayê Kurmancî*, di sala 1911an de jî *Xulaseî 'Eqaidê* çap dike. Di dawîya *Xulasî 'Eqaidê* de nivîsara wî ya bi navê “Reşbelek” jî heye ku tê de wan fikrên xwe yên “kurd-perest” beyan dike. Dîsa li paşbergê vê kitêbê navê çar kitêbên xwe yên li ber çapê dinivîse. Zinar Silopî jî navê van çar berhemên Ehmed Ramîz dinivîse<sup>609</sup> lê îro yek ji wan jî li ber destê me nîne.

Ehmed Ramîz ne tenê kitêbên kurdî, yên bi tirkî jî çap dike: Di sala 1912an de ji ber ku sê kitêbên nemunasib bi tirkî çap kirine, dijberiya hikûmetê ji xwe re kiriye meslek, karekî wî yê daîmî û îqametgaheke wî ya diyar nîne, rewşa wî ya berê û niha gumanbar e, ji aliyê îdareya orfî ve ji Stembolê tê sirgûnkirin.<sup>610</sup>

Bi rastî çîroka sirgûnkirin û ‘efûkirina Ehmed Ramîz dûr û dirêj e û ewqasî jî balkêş e. Herwiha ev çîrok rûyê totalîter û kiryarên qirêj ên ITCê jî nîşanî me dide: Huseyn Kamî yê ku bi mexlesa Dehrî hîcwiye-yan (helbestên rexne û tinazê) li ser ITCê û rayedarên wê dinivîse û di kovar û rojnameyan de belav dike, dixwaze van menzûmeyên xwe wekî kitêb çap bike. Ehmed Ramîz wê gavê wî hişyar dike ku ev karekî xeter e, lê Huseyn Kamî îsrar dike, çimkî li gorî wî wê bi helbestan fikrên wî hêsantir belav bibin û wê xelk şaş bimîne ku çawa kesek dikare van rayedaran rexne bike. Li ser vê Ehmed Ramîz hemû berpirsiyariya çapkirina kitêbê digire ser xwe û di sala R.1327/M. 1911an de *Dîvançe-i Dehrî* çap dike. Lê hê kitêb nehatî belavkirin polîs bi ser çapxaneyê de digirin û hemû nusxeyan derdest dikin. Ehmed Ramîz û Huseyn Kamî herdu jî têne binçavkirin, Ehmed Ramîz hemû berpirsiyariya kitêbê digire ser xwe û dibêje tu têkiliya Huseyn Kamî pê re nîne. Bi vî awayî wî xilas dike, lê ew ji aliyê Dîwana Herbê ya Orfî ve sirgûnî bajarê Kastamonuyê dibe (16 Kanûnisanî 1327/12 Çile 1912).<sup>611</sup>

---

609 Silopî, *Doza Kürdistan*, r. 26.

610 BOA. İHB, 107/1330/S-033, Dîrok 15/S/1330 (H), 04.02.1912 (M). Ji bo tîpguzîya belgeyê bnr. Malmîsanîj, *Yirminci Yüzyılın Başında Diyarbekir’de Kürt Ulusçuluğu (1900-1920)*, r. 124-125.

611 Hüseyin Kâmi, *Dehrî Dîvançesi*, r. 193-194. Ji bo tîpguhêziya belgeya arşîvê ya derbareyê sirgûnkirina Ehmed Ramîz de bnr. Malmîsanîj, *Yirminci Yüzyılın Başında Diyarbekir’de Kürt Milliyetçiliği*, r. 124-125.

Huseyn Kamî ji aliyekî ve di taya xwe de ye, ji ber tirsê suîqesdekê, ji aliyê din ve li ber Ehmed Ramîz dikeve. Hemşeriyê Ehmed Ramîz jî ji wî rica dikin ku ji bo xilasbûna wî xîret bike. Huseyn Kamî ji bo çareserkirina meseleyê serî li rayedarên hikûmetê dide, ew sê şertan dideynine ber wî: Ji bo betalkirina sê hîcwiye yên wî yê li ser Tel'et Paşa wê medhiyeyekê ji bo wî binivîse, wê sond li ser Quranê û namûsa xwe bixwe û bi nivîskî jî beyan bike ku careke din li ser ITCê menzûm an jî pexşan tu tiştêkî nenivîse û wê meaşê hikûmetê qebûl bike.<sup>612</sup>

Huseyn Kamî li hemberî van şertan heyirî dimîne, hikûmetek çawa tenezzulî tiştên halo biçûk dike? Lê zêde wextê wî nîne, ji ber ku sê mehê din bi minasebata salvegera Meşrûtiyeta Duyem wê 'efû bê îlankirin û ji bo ku Kurdîzade Ehmed Ramîz jî têkeve nav vê 'efûyê hewce ye Huseyn Kamî van şertan pêk bîne. Ew di nav dudiliyê de ye, bi hevalên xwe yê di nav Hurriyet ve I'tilaf Firkasiyê de dişewire û ew biryar dide ku şertê sondê qebûl neke, meaşê ku bidin jî ji bo debara wî ji Kurdîzade Ehmed Ramîz re bişîne. Rayedarên hikûmetê li ser sondê zêde israr nakin lê medhiyeyê teqez dixwazin.<sup>613</sup>

Di vê pêvajoyê de Huseyn Kamî bi nameyekê Ehmed Ramîz ji rewşê û biryarên xwe hayedar dike. Bersiva Ehmed Ramîz hem derbareyê şexsiyeta wî de hem jî derbareyê jiyana wî ya sirgûniyê de agahiyan dihewîne: Berî her tiştî Ehmed Ramîz pereyan qebûl nake, çimkî ew pereyên millet in û hewce ye ji bo mearîfê bêne xerckirin. Ji ber vê yekê ew dibêje ku wan pereyan bidine "Mekteb-i Ittihad-i Osmanî" ku çendek berê ji ber ku Huseyn Kamî li wir konferans dabû, ketibû ber xezeba ITCê û ji avahiya xwe hatibû derxistin. Li gorî nameya Ehmed Ramîz, piştî ku ew gihaye Kastamonuyê cihde teklîfa yewmiyeyê (pereyên rojane) lê kirine, lê wî bi gotina "ez pereyên xefiyeyan (sîxuran) qebûl nakim" ev red kiriye û ji rojnameyên Stembolê re telgrafên protestoyê şandine. Ew niha bi firotina rojname û kitêban debara xwe dike.<sup>614</sup>

---

612 Hüseyin Kâî, *Dehrî Dîvânçesi*, r. 197-198.

613 Kâî, hb., r. 198-200.

614 Kâî, hb., r. 199.

Li ser vê bersiva birûmet a Ehmed Ramîz, Huseyn Kamî û hevalên wî serê xwe ditewînin. Kamî bi gotina Ehmed Ramîz dike û meaşê ku hikûmet dide wî, bexşî wê mektebê dike. Lê ji bo medhiyeyê dem her hindik dibû û êdî sebra rayedarên hikûmetê jî nemabû. Rojekê Xwedê îlham didiye û Kamî medhiyeyekê li ser Tel'et Paşa dinivîse. Ev helbest herçiqas wekî medhiye xuya bike jî di eslê xwe de hîcwiye ye, lê rayedarên hikûmetê vê fêhm nakin û bi vî rengî ew şertê medhiyeyê jî bi cih tê. Di vê medhiyeya ku di eslê xwe de hîcwiye ye, beyta bi Ehmed Ramîz re têkildar ev e:

Âsafâ lutfuna mazhar ola “Kürdîzade”

Nefesi kokdî onun ekl iderek sûm û basal<sup>615</sup>

[Wezîro, lutf û kerem bike bo Kurdîzade, (çimkî) ji xwarina sîr û pîvazan bêhna devê wî genî bû.]

Ehmed Ramîz piştî çend meh sirgûniyê di 1ê Tebaxa 1912an de tê ‘efûkirin. Navê wî di lîsteya kesên ku hatine ‘efûkirin de di rêza 111an de wekî “Diyarbakirli kitabci Ehmed Ramîz Efendî” cih digire û ev lîste di rojnameya fermî ya Dewleta Osmanî, *Takvîm-i Vakayî*’ de, tê weşandin.<sup>616</sup>

Ehmed Ramîz û Huseyn Kamî îhtimalek mezin hevdu ji Misrê nas dikin. Lewre Huseyn Kamî jî di dema ‘Ebdulhemîdê Duyem de sê salan li Misrê dimîne û gava Meşrûtiyeta Duyem tê îlankirin vedigere Stembolê.<sup>617</sup> Huseyn Kamî yê ku muxalifê ‘Ebdulhemîdê Duyem bû, îhtimaleke mezin piştî Bûyera 31ê Adarê, dibe muxalifê ITCê jî. Ew li ser kêmasî û xeletiyên rayedarên dewletê hîcwiyeyan dinivîse û yek ji kesên armanca tîrên wî Tel’et Paşayê ku rayedarê herî pilebilind ê ITCê ye. Huseyn Kamî ji aliyê fikrî ve îttîhad-i îslam ango yekîtiya misilmanan ji aliyê rêveberiya dewletê ve jî adem-i

615 Ji bo tîpguhêziya latînî ya temamê vê nivîsê û helbestê bnr. Kâmî, hb., r. 193-205.

616 “İstanbulda müteşekkil Dîvân-ı Harb-i ‘Örfî mahkûmlarından ve idâreten nefy idilenlerden mazhar-ı ‘afv-ı ‘âlî olanların esâmîsidir.” *Takvîm-i Vakayî*, No:1193 (19 Temmûz 1328/1 Tebax 1912), r. 2.

617 Hüseyin Kâmî, *Dehrî Dîvançesi*, r. 15.

merkeziyet ango rejîmeke nenavendî diparêze.<sup>618</sup> Ji nivîs û kirinên wî diyar e ku Ehmed Ramîz jî van nêrînan dihebîne û ev yek jî dostaniya Huseyn Kamî û Ehmed Ramîz xurttir dike.

Ehmed Ramîzê ku li Misrê bi Jonturkan re tevdigeriya, îro çima bûye muxalifê ITCê? Ev bi veguherîna ITCê re têkildar e. ITC, êdî ne tevgereke azadîxwaz û pirreng e; ew piştî Bûyera 31ê Adarê dibe totalîter, di pêvajoya şerê Balqanan de jî dibe tirkperest. Ji ber vê yekê normal e ku Ehmed Ramîz têkiliya xwe bi wan re birêbe û hetta bûbe muxalifê wan. Ne tenê ew, Mewlanzade Rif'et, Şerîf Paşa, 'Ebdullah Cevdet, Lutfî Fikrî jî muxalifê ITCê bûn.<sup>619</sup> 'Ebdullah Cevdet, ji ber gefên kuştinê yê ITCê di navbera salên 1915-1918an de nikare kovara xwe *Ictihadê* derbixe.<sup>620</sup>

Di mînakê Huseyn Kenan Paşa de jî me dîtibû, kurdên ji ITCê nerazî, di nav muxalifê wê Hurriyet ve I'tilaf Firkasiyê de cih digirin. Xuya ye rewşa Ehmed Ramîz jî bi vî rengî ye. Li gorî Ismail Goldaş, Ehmed Ramîz, Mewlanzade Rif'et û Şerîf Paşa endamên Hurriyet ve I'tilaf Firkasiyê ne.<sup>621</sup>

Ehmed Ramîz piştî ku ji sirgûniyê vedigere, bi du salan (R. 1330/M. 1914-1915) ew her sê kitêbên ku Dîwana Herbê ya Orfî ango rejîme eskerî ne munasib didîtin li pey hev diweşîne. Ev jî li hemberî rejîma ITCê wêrektiya wî nîşan dide.

Yek ji wan kitêbên ne munasib ku Ehmed Ramîz piştî vegera xwe ya Stembolê çap dike *Dîwançe-i Dehrî* ye û li gorî çavkaniyan Huseyn Kamî îhtimaleke mezin piştî vê çapa duyem tê sirgûnkirin.<sup>622</sup> Eger ev agahî rast be em dikarin bibêjin ku îhtimaleke hê me-

---

618 Hüseyin Kâî, hb., r. 28-30.

619 Malmîsanîj, *Yüzyılımızın Başlarında Kürt Milliyetçiliği ve Dr. Abdullah Cevdet*, r. 51-56.

620 Malmîsanîj, hb., r. 100.

621 Goldaş, *Kürdistan Teâlî Cemiyeti*, r. 15.

622 Hüseyin Kâî, *Dehrî Dîwançesi*, r. 26. Xuya ye amadekarê pirtûkê Ahmet Tanyıldız, sala 1330î hîcrî dihesibîne û wekî 1911-1912 derbasî mîladî dike. Bi qenaeta me ev şaş e. Ji ber ku çapa yekem a *Dîwançeyê* di sala 1327an de tê kirin û hê di çapxaneyê de ji aliyê polîsan ve tê desteserkirin. Ehmed Ramîz jî di encama vê de di sala 1912an de sirgûnkirin. Ne mimkun e ku salên 1327 û 1330î teqabulî heman salê bikin.

zintir Ehmed Ramîz jî dîsa tê sirgûnkirin. Balkêş e, piştî vê salê êdî em qet tevgerake Ehmed Ramîz nabînin. Ismail Goldaş gava lîsteya endamên KTC û KTMNCê rêz dike navê Ehmed Ramîz jî dinivîse.<sup>623</sup> Lê em ne bawer in ku Ehmed Ramîz di nav van tevgeran de be û hetta wê dewrê li Stembolê jî be. Lewre ne nivîs ne jî weşanên wî xuya dikin. Kesekî wekî Ehmed Ramîz çalak, ku ne li hemberî rejîma ‘Ebdulhemîdê Duyem ne jî ya ITCê serî tewandiye, ne mimkin e ku bi vî rengî bêdeng bimîne. Beriya Goldaş bi gelek salan, di raporeke xefî ya li ser kurdan de, ku ji aliyê Ahmet Hasip Koylan ve li ser daxwaza wezîrê karê navxweyî yê Tirkîyeyê hatiye amadekirin, lîsteyeke endamên KTC heye û tê de navê Ehmed Ramîz nîne.<sup>624</sup> Ev yek jî qenaeta me ya li jor qewîntir dike.

Malmîsanij di lêkolîneke xwe de dinivîse ku Mehmed Mîhrî ji Kurdîzade Ehmed Ramîz ders wergirtiye.<sup>625</sup> Lê diyar e ew, dersiamê (muderrisê) mizgefta Fatîhê Şehrî Ehmed Ramîz û Kurdîzade Ehmed Ramîz tevlihev dike. Tevliheviyeke din jî di nav Kurdîzade Ehmed Ramîz û mebûsê Dêrsimê Ehmed Ramîz (Tan) de çêdibe. Hetta di hin malper û kovaran de wêneyê Ehmed Ramîz (Tan) wekî yê Kurdîzade Ehmed Ramîz tê weşandin.

Derbarê zewac û kufleta Ehmed Ramîz de hîç agahiyek me nedît. Adil Oztek dibêje gava ew li nav Tirkî (Osmanî) bû nezewicî bû, eger piştî ku çû Sûriyeyê zewicî be em nizanin.

Derbareyê mirina Ehmed Ramîz de Zinar Silopî dibêje ku wî rojên xwe yên dawî li nav kurdên Şamê derbas kir û tirba wî jî li Şamê li taxa kurdan e.<sup>626</sup> Adil Oztek jî Zinar Silopî piştrast dike û dibêje Ehmed Ramîz piştî serhildana Şêx Seîd derbasî Sûriyeyê bû, hetta hin kesên ku çûne Sûriyeyê ji Oztek re gotine ku me li Şamê, li taxa Salihîye, taxa kurdan gora Ehmed Ramîz dît; li ser kevirê wê navê wî dinivîsî, lê ew goristan îro hatiye xirakirin û li ser avahî çêbûne. Dîsa di salên 80yî de şifêrên kamyonê ku diçûne Sûriyeyê ji wir

---

623 Göldaş, *Kürdistan Teâli Cemiyeti*, r. 43, 71.

624 Mehmet Bayrak ev rapor ji nû ve weşand. Ji bo lîsteyê bnr. Bayrak, *Kürtler ve Ulusal-Demokratik Mücadeleleri*, r. 90-92.

625 Malmîsanij, *Kürt Talebe-Hêvî Cemiyeti*, r. 56-57.

626 Silopî, *Doza Kürdüstan*, r. 26.

“Reşbelek”a Ehmed Ramîz û kitêbeke bi navê *Gaziya Welat* anîne. Lê ew niha ne bi Adil Oztek re ne.

Tevî van agahiyan jî derbarê jiyana Ehmed Ramîz a li Sûriyeyê nezelaliyek heye. Bo nimûne, Osman Sebrî û Nûreddin Zaza herdu jî di nameyên xwe de, ku ji Malmîsanij re şandine, dibêjin “Me li Sûriyeyê kesekî wiha qet nas nekiriye û navê wî jî nebihîstîye.”<sup>627</sup>

Ehmed Ramîz hem di “Reşbelek”a xwe de hem jî di kitêbên ku weşandine de bi nivîsên xwe yê ricayê eşkere dibêje ku ew weşangeriya kitêbên kurdî ji bo xizmeta kurdan dike. Di gotara xwe ya “Reşbelek”ê de navê xwe wek “Xidmetkarê Kurdmancan Ehmed Ramîz” dinivîse. Xuya ye ew debara xwe bi kitabfiroşiyê dike, lê ew weşandina kitêbên kurdî bi saîqên netewî, bo “xizmeta kurdman-can” dike. Ev yek jî têkîliya weşangeriya kitêbên kurdî û fikra kurdayetiyê nîşanî me dide.

Ehmed Ramîz bi xwe zaza ye, hem ji mintîqa wî hem jî bi gotina Adil Oztek ev tegez e. Lê wî “Reşbelek”a xwe bi kurmancî nivîsiye, kitêbên kurmancî çap kirine. Bi lehçeya xwe tiştê nenivîsandiye, çap jî nekiriye. Heman rewşê em bi Xelîl Xeyalî re jî dibînin: Ew ji eşîreke dimilî, ji eşîra Modan e, lê hemû nivîsên wî bi kurmancî ne, hetta *Elîfbayê Kurmancî* amade kiriye ku ew jî dîsa Ehmed Ramîz çap kiriye. Ev yek nîşanî me dide ku di serê van kesan de nîqaşa kurd/kird, kurmanc/zaza nîne, ji aliyê fikra netewî ve ew zelal û bêkompleks in. Herwiha zazakî nenivîsandina wan jî nîşan dide ku di vê dewrê de zazakiya nivîskî pir kêr e.

### 3.3.2. Mehmed Şefîq Arwaşî

Mehmed Şefîq Arwaşî, di sala 1884an de li gundekî Hîzanê yê navçeya Bedlîsê tê dunyayê. Perwerdeya dînî ji malbata xwe û li Wanê li medreseya Horhorê wergirt.<sup>628</sup> Ew di sala 1912-1913an de tê Stembolê û li wir tevî tevgera kurdî dibe; di nav Civata Hêvî û KTCê

---

627 Malmîsanij, *Yüzyılımızın Başlarında Kürt Milliyetçiliği ve Dr. Abdullah Cevdet*, r. 49; Malmîsanij, “Kurdîzade Ehmed Ramîzê Licî”, *Çarçira*, j.2 (Nîsan 1986), r. 22.

628 Aydeniz, *Seyyid Şefik Arvasi*, r. 15, 19.

de cih digire.<sup>629</sup> Gava KTC parçe dibe û alîgirên serxwebûnê Kurd Teşkilat-ı İctima'îyye Cem'îyyeti ava dikin, Mehmed Şefîq beşdarî wan nabe. Çimkî wî jî wekî Seyîd 'Ebdulqadirê Nehrî muxtarîyet ango di nav sînorê Osmanî de xweserîya kurdan diparast.<sup>630</sup>

Mehmed Şefîq Arwasî jî di dewra Osmanî de weşangerekî mezin ê kurdî ye. Kitêba herî girîng a ku çap kiriye *Dîwana Melayê Cizîrî* ye. Di nav kitêbên kurdî de yê ku di dema Osmaniyan de çap bûne, piştî *Mem û Zîna* Ehmedê Xanî kitêba herî girîng ev *Dîwan* e. Wî jî vê çapê re pêşgotinek jî nivîsandîye. Di vê pêşgotinê de derbareyê weşandina *Dîwana Mela* de wiha dibêje: "Weqta ku teb' û neşirkirîna vê dîwanê min ji bo mîletê xwe xîdmet dizanî û ji bo xo jî feyzekî me'newî hesab dikir eger çi hal û zeman jî mûsa'id nebûn lakîn bi 'ewn û 'inayeta Xudayê te'ala me dest tebi'kirîna wê kir."<sup>631</sup>

Xuya ye wekî Kurdîzade Ehmed Ramîz, Mehmed Şefîq jî çapkirîna kitêbên kurdî ne bi armancên ticarî lê bi dilxwaziya kurdewarî dike. Jixwe li gorî Veysel Aydeniz, Mehmed Şefîq ji bo çapkirîna kitêban pereyên ku hewce dikir bi hewldanên xwe peyde dikir.<sup>632</sup> Komara Tirkîyeyê hesabê vê xîzmetguzariyê wê jî Mehmed Şefîq bipirse; di doza sala 1925an de ji ber çapkirîna *Dîwana Mela* wê deh sal cezayê hebsê lê bibire.<sup>633</sup> Îhtimaleke mezin Mehmed Şefîq di 'efûya giştî ya di sala 1928an de tê berdan.<sup>634</sup>

Li gorî Veysel Aydeniz û Mufid Yuksel, Mehmed Şefîq *Mewlûda Bateyî* (1912) û *Newbehara* Ehmedê Xanî (1916-1917) jî weşandine.<sup>635</sup> Lê li ser nusxeyên van herdu berhemên nîşaneke bi vî rengî nebû.

Mehmed Şefîq, di 1919an de *Muqeddîmetu'l-Îrfana* Mehmed Mîhrî weşandiye. Di vê de guman nîne ji ber ku li ser bergê kitêbê

---

629 Aydeniz, hb., r. 32-35.

630 Vê agahiyê kurê Seyîd 'Ebdulqadirê Nehrî, Seyîd Mehmed, di parastina xwe ya mehkemeya 1925an de dibêje. Bnr. Bayrak, *Kürtler ve Ulusal-Devokratik Mücadeleleri*, r. 159.

631 Ji bo tîpguhêziya temamê pêşgotinê bnr. Aydeniz, *Seyyid Şefik Arvasi*, r. 111.

632 Aydeniz, hb., r. 45.

633 Serdî, *Görüş ve Anılarım*, r. 277.

634 Aydeniz, *Seyyid Şefik Arvasi*, r. 63.

635 Aydeniz, hb., r. 44-45.

îfadeyeke wiha heye: “Tabî” ve naşiri: Istanbul muderrislerinden Arvasîzade Seyyid Mehmed Şefîk” [Çapker û weşangerê wê: Ji muderrisên Stembolê Arwasîzade Seyîd Mehmed Şefîq].

Mehmed Şefîq û Mehmed Mîhrî bi hev re di sala 1919an de kovara *Kurdistanê* jî derdixin. Mehmed Mîhrî xwedî, Mehmed Şefîq jî sernivîskarê kovarê bû. Herduyan jî di medreseya Horhorê de li ba Seîdê Kurdî perwerde dîtiye. Digel Hemzeyê Muksî, şagirtêkî din ê Seîdê Kurdî, wan piraniya barê weşangeriya kurdî, çi kitêb çi jî kovar, girtiye ser milê xwe.<sup>636</sup>

Mehmed Şefîq di dewra Komarê de, piştî ku ji hebsê derdikeve tê Stembolê, li vir demek dirêj melatiya mizgefta Sultanahmetê û heta mirina xwe jî şêxîtiya tekyeya Husrev Paşa ya neqşîbendî/xalidî dike. Xuya ye di dema Komarê de bi ‘Ebdurehîm Rehmî û Mehmed Mîhrî re dostaniya wî û bi Mûsa Anter re têkiliya wî berdewam be jî tu têkiliya wî bi tevger û weşanên kurdî re namîne. Ew jiyanekê sûfiyane dijî û di 13ê Adara 1970yî de, li Stembolê wefat dike; li goristana Edirnekapi li cem hevalê xwe yê qedîm ‘Ebdurehîm Rehmî tê veşartin.<sup>637</sup>

### 3.3.3. Huseyn Huznî Mukriyanî

Huseyn Huznî Mukriyanî, di sala 1893yan de li gundekî Mahabadê hat dunyayê. Pêşîn ji bav û xalê xwe ders stand. Ger û geştên wî yên li welatê Asya û Ewrûpayê tesîr li fikriyata wî kir. Di ciwaniya xwe de çû Tebrîz û Erîwanê; li Moskova û Petersburgê du salan ma, ji wir çû Hindistan, Efxanistan û Stembolê. Li Stembolê perwerdeya xet (nivîsa spehî) û çapkirinê stand. Hê di ‘emrekî ciwan de hînî gelek zimanan bû. Piştî van seyahatan berê xwe da welatê xwe û bala xwe da rewşa kurdan, da ku xizmeta wan bike. Bi vê munasebetê di sala 1914an de çû Almanyayê û ji wir çapxaneyek kirî. Di sala 1915an de ew li Helebê saz kir. Dengên kurdî yên ku di elîfbaya ‘erebî de nînin ji yên farisî temam kir, herwiha ji bo kurdî ji Almanyayê siparîşa qalibên nû da û êdî dest bi çapkirina kitêbên kurdî kir. Barê

636 Aydeniz, hb., r. 19, 45.

637 Aydeniz, hb., r. 78, 83, 89; Anter, *Hatıralarım*, r. 71-72.

giran hemû li ser pişta wî bû; metin wî dinivîsand, rêzêkirin, teshîh, ciltkirin û firotin jî dîsa karên wî bûn.<sup>638</sup>

Li gorî Gîw Mukriyanî, çapxaneya ewil a kurdî ya birayê wî Huseyn Huznî Mukriyanî ye. Wî çapxane di sala 1913/1914an de ji Almanyayê kiriye. Parçeyên çapxaneyê 1914an de hatine Beyrûdê û ji wir jî ew birine Helebê. Lê piştî çapkirina çend kitêb û rojnameyan Mukriyanî, çapxaneya xwe bar kiriye Rewandûzê.<sup>639</sup> Li gorî Celîlê Celîl di sala 1915an de kitêba ewil a ku di vê çapxaneya Mukriyanî de hatiye çapkirin *Mem û Zîna* Ehmedê Xanî ye.<sup>640</sup> Lê Amir Hassanpour ji rastiya van agahiyan guman dike, ji ber ku di bîbliyografiyên Edmonds, vil'chevsky, Cumberland, Mistefa Nerîman û Pierre Rondot de navê kitêbeke bi vî rengî nîne.<sup>641</sup> Di lêkolîna vê xebatê de me jî *Mem û Zîneke* ku di sala 1915an de li Helebê çap bûye nedît.

Xuya ye Mukriyanî, li Helebê, di wê çapxaneyê de pir kêmtir çap kirine, ji wan jî pir kêmtir gihane îro. Mukriyanî 'esil xebatên xwe yên çap û weşanê piştî ku bar dike Rewandûzê (1925), li çapxaneya xwe ya bi navê "Zarê Kirmancî" dike. Di bîbliyografiya Edmonds de navê gelek kitêbên edebî û lêkolînî ku wî nivîsîne û çap kirine hene, herwiha bi navê *Zarê Kirmancî* kovarek jî heye.<sup>642</sup> Lê ev nayê wê wateyê ku di dewra Osmaniyan de li Sûriyeyê hîç kitêbek kurdî nehatiye çapkirin. Lewre mînak *Gewherî Yegane* heye ku di sala 1916an de li Helebê çap bûye. (Bnr. Beşa 3.2.2.2.). Dîsa teqez e ku di sala 1925an de li Helebê di çapxaneya "Esr el-Cedîd" de kitêba Mukriyanî ya *Xunçey Beharistan Tarîxî Kurdan* çap dibe.<sup>643</sup> Lê ji ber ku ne di maweya vê xebatê de ye me behsa wê nekir. Çavkanî behsa

---

638 Celîlê Celîl, *Kürt Aydınlanması*, weş. Avesta, İstanbul, 2001, r. 92-93.

639 Gîwî Mukriyanî, *Elf û Bêy Kurdî Wênedar Be Tîpî Latînî*, Çapxaney Kurdistan, Hewlêr, 1972, r. 13,15; Hassanpour, *Kürdistan'da Dil ve Milliyetçilik 1918-1985*, r. 278.

640 Celîlê Celîl, *Kürt Aydınlanması*, r. 93. Balkêş e, ev agahiya çapkirina *Mem û Zînê* di wergera kurdî ya heman kitêbê de nîne. Bnr. Celîlê Celîl, *Jiyana Rewşenbiri û Siyasi ya Kurdan*, r. 111-112.

641 Hassanpour, *Kürdistan'da Dil ve Milliyetçilik 1918-1985*, r. 278.

642 Edmonds, "A bibliography of Southern Kurdish, 1920-36", r. 487-497.

643 Bnr. *Sercemî Berhemî Husên Huznî Bergî Yekem*, r. 53-104.

berhema wî ya *Mêrgey Dilan* (Heleb, 1920) jî dikin<sup>644</sup> lê em rastî berhemeke wiha nehatin.

### 3.4. Weşangeriya Kurdî di Nav Sansur û Qedexeyê de (1898-1923)\*

Dîroka çapemeniya kurdî bi qedexeyê dest pê dike: Rojnameya ewil a kurdî *Kurdistan*, piştî hejmara xwe ya yekem (22 Nîsan 1898), hê ya duyem neweşandî ji aliyê rejîma ‘Ebdulhemîdê Duyem ve tê qedexekirin.<sup>645</sup> Bo nimûne, di arşîva Osmanî de belgeyek heye, ew karmendên gumrikê hişyar dike ku firax û alavên heciyan baş kontrol bikin; ji bo ku dema ew ji Misrê derbas dibin vê rojnameya qedexe bi xwe re neyînin.<sup>646</sup> Li ser vê qedexeyê di hejmara 5an de Mîqdad Mîdhet Bedirxan, bi tirkî arzihalek/daxwaznameyek ji Padîşah re dinivîse ku bi vê rojnameyê tu niyeteke wî ya xirab nîne û destûr dixwaze ku bikaribe bi serbestî wê belav bike. Paşê jî bi kurdî wiha dibêje:

“Ermenî û rom nehin nîvên kurdan e, çire ewan bi ezmanê xwe cerîde hebin û kurda tişteke tunînin û ji halê dinyayê bê xeber in! Gelî ulemayên kurda! Gelî mîr û axano! Hun jî îttîfaq bikin, bigîhin hev, telgrafekê ji Hezretê Padîşah re bikişînin, hêvî bikin da îzna vê cerîdeyê bidit ez ji we re rêkim, da hun jî bizanin dinyayê de çi dibe çi nabe!”<sup>647</sup>

Tevî vê uslûba nazik a Mîqdad jî qedexeya li ser rojnameyê tu zemanî ranebû. Jixwe piştî hejmara 5an Mîqdad vedigere Stembolê, karê weşana rojnameyê jî derbasî birayê wî ‘Ebdurehman Bedirxan dibe. Piştî vê yekê li hember rejîma ‘Ebdulhemîdê Duyem uslûba

---

644 Ahmet Özel, “Mûkriyânî”, *DIA*, c. Ek-2, 2019, r. 317.

\* Ev sernav di orjînalê teze de nebû, ew cara pêşîn di kovara *Wêje û Rexneyê* de hat weşandin. Bnr. “Weşangeriya Kurdî di Nav Sansur û Qedexeyê de (1898-1923)”, *Wêje û Rexne*, j.4 (çile-sibat-adar-nîsan 2015), r. 69-76.

645 Malmîsanij, *İlk Kürt Gazetesi Kurdistan’ı Yayımlayan Abdurrahman Bedirhan (1868-1936)*, r. 128.

646 Malmîsanij, hb., r. 130.

647 Bozarslan, *Kurdistan Rojname Kurdî ya Pêşîn (1898-1902)*, c. I, r. 161.

rojnameyê gav bi gav tund dibe, sekna rojnameyê nêzî Jonturkan, muxalifên ‘Ebdulhemîdê Duyem, dibe.<sup>648</sup> Lewre ‘Ebdurehman Bedirxan endamê ITCê ye, li Ewrûpayê di rojnameya ITCê ya bi navê *Osmanli* de cih digire û di sala 1902an de beşdarî Kongreya Parîsê ya muxalifên ‘Ebdulhemîdê Duyem jî dibe.<sup>649</sup>

Di warê kitêban de qedexeyeke dijiwar û balkêş em di *El-Hedîyyetu’l-Hemîdiyye fî’l-Luxeti’l-Kurdiyye* de dibînin. Ev ferhenga kurdî-erebî di sala 1906an de tê qedexekirin û biryara berhevkirina nusxeyên wê tê dayîn.<sup>650</sup> Hal ew e ku ev ferheng di sala 1893yan de bi destûrnameya fermî hatibû çapkirin<sup>651</sup>, li ‘Ebdulhemîdê Duyem hatibû diyarîkirin “*El-Hedîyyetu’l-Hemîdiyye*” û amadekarê wê, Yûsif Ziyaeddîn Paşa, ji bo belavkirina kitêbxane û mekteban sêsed heb teberrik dabû Wezaretê Perwerdeyê.<sup>652</sup> Lê piştî çend salan di belgeyê arşîvê de ji bo vê ferhengê û kitêbeke alfabeyê ya bi ernewidî tê gotin ku çap û belavkirina kitêbên wiha ji siyaseta dewletê re pir zirar e.<sup>653</sup> Xuya ye di çend salên dawî de di “siyaseta dewletê” de gelek tişt guherîne. (Bnr. Beşa 3.1.4.)

Celadet, agahiyeke balkêş dide ku bavê wî Emîn Alî Bedirxan, di sala 1894an de hewl daye *Mem û Zînê* çap bike lê ji ber pergala sansûrê ev pêk nehatiye. Çimkî îdarexaneya sansûrê ew qismê herî bi ruh û coş jê avêtiye.<sup>654</sup> Texmînkirina wan beşan zêde ne zehmet e, çimkî beşên ku *Mem û Zînê* ji mesnewiyên eşqê yên kevneşopî

---

648 Issi, “Kürt Basını ve Kürdistan Gazetesi (1898-1902)”, r. 130.

649 Issi, hg., r. 133.

650 Malmîsanij, *İlk Kürt Gazetesi Kurdistan’ı Yayımlayan Abdurrahman Bedirhan (1868-1936)*, r. 87-89.

651 Di bergê hundir ê kitêbê de wiha dinivîse: “Ma’arif Nezaret-i celîlesinin ruhsatiyla tab’ olunmuşdur”. Maneya vê hevokê ev e: Ev kitêb bi destûra Wezaretê Perwerdeyê hatiye çapkirin.

652 BOA. MF.MKT. 182/76, Dîrok: 19/Ra/1311 (H), 29.09.1893 (M).

653 Gotina belgeyê wiha ye: “(Arnavud (Kürd) lisânlarınca bu misillü kütüb ve resâilin tab’ ve neşri devletin siyâsetine fevku’l’âde muzarratı derkâr olduğundan...” Bnr. BOA. Y.PRK.MF., 5/32, Dîrok: 29/Z /1325 (H), 02.02.1908 (M). Ji bo tîpguhêziya temamê wê bnr. Malmîsanij, *İlk Kürt Gazetesi Kurdistan’ı Yayımlayan Abdurrahman Bedirhan (1868-1936)*, r. 89.

654 Bedirxan, *Mustafa Kemal’e Mektup*, r. 38.

cuda dike, wê ji bo kurdan dike metnekî netewî, ew beşa 5 û 6an e ku Xanî ji bêtifaqî û parçebûna kurdan gazin dike û sebeba bi kurdî nivîsandina berhema xwe rave dike.<sup>655</sup> Di sala 1904an de Martin Hartmann jî behsa qedexeya li ser *Mem û Zînê* dike. Li gorî vê, ji ber rihê netewî yê di nav *Mem û Zînê* de rayedarên Osmanî destûr nadine çapkirina wê; loma Bedirxanpaşazade Ebdurehman wê di rojnameya *Kurdistanê* de beş beş diweşîne.<sup>656</sup>

Heyama ‘Ebdulhemîdê Duyem (1876-1909), ji bo çapemenî û weşangeriyê serdemeke zor û zehmet e. Lewre di vê dewrê de di sala 1888an û 1894an de du rêzîknameyên fermî yên çapxaneyan têne qebûlkin. Ya yekem 41 xal, a duyem jî 47 xal e û bi vî rengî karê çapxaneyan hûr hûr tê tenzîmkirin.<sup>657</sup> Herçiqas ji berê de hebe jî, di vê dewrê de pergala sansûrê pir xurt dixebite. Kovar, rojname û kitêb piştî qontrolê hûrgilî encax têne çapkin. Piştî wê jî dîsa lêgerina çapxane û kitêbfiroşan heye û kitêbên “muzir” ango bi zerran an jî gumanbar têne derdestkin<sup>658</sup>, gelek rojname û kovarên ku li derveyê welêt têne weşandin, ketina wan a nav sînorên Osmanî têne qedexekirin<sup>659</sup> û hetta di sala 1902an de gelek kitêbên ku hatine berhevkin, têne şewitandin jî.<sup>660</sup>

Di dewreke wiha de tiştêkî pir “normal” e ku kurd jî ji vê rewşê para xwe bistînin. Lê ev jî rastiyeke e ku sansur û qedexa bi helkirina ‘Ebdulhemîdê Duyem xilas nebû. Meşrûtiyeta Duyem (1908), azadiyek anî û vê atmosfera azadiyê weşangeriya kurdî jî geş kir. Lê

---

655 Bo wan beşan bnr. Xanî, *Mem û Zîn*, amd. K. Yıldırım, r. 151-162.

656 Martin Hartmann, “Einführung”, *Der Kurdische Diwan des Schech Ahmed von Geziret Ibn ‘Omar genannt Mala’i Gizri*, S. Calvary & Co., Berlin, 1904, r. X. Ji bo wergera kurdî ya vê pêşgotinê bnr. “Li ser Edebiyata Kurdî & Li ser Melayê Cizîrî”, wer. A. İncekan, r. 129-133.

657 Birinci, Ali, “Osmanlı Devletinde Matbuat ve Neşriyat Yasakları Tarihine Medhal”, *TALİD*, J.7 (2006), r. 298.

658 Ji bo pergala sansûrê ya vê dewrê bnr. Fatmagül Demirel, *II. Abdülhamid Döneminde Sansür*, weş. Bağlam, İstanbul, 2007, r. 89-100.

659 Ji bo listeya rojnameyên ku ketina wan a nav sînorên Osmanî hatine qedexekirin bnr. Demirel, hb., r. 167-171. Di vê listê de nîne lê em dizanin ku li ser yekemîn rojnameya kurdî jî ev qedexa hebû.

660 Ji bo listeya kitêbên ku hatine şewitandin bnr. Demirel, hb., r. 172-183.

piştî Bûyera 31ê Adarê, ew jî tîk çû û vê carê despotîzma ITCê dest pê kir. Erê, kurdan piştî Bûyera 31ê Adarê jî komele ava kirin, kovar û rojname weşandin lê 'emrê wan kin<sup>661</sup>, dawiya wan her girtin û ji hev belavbûn bû.

Gava em li çapemeniya kurdî ya dewra Osmanî dinêrin, kovar û rojnameyên ku derketine hemû weşanên kulturî, mearifî ne. Heta sala 1920an, ku *Jîn* vediguhêre rojnameyeke siyasî, tu weşanên siyasî yên kurdan nînin. Sedema wê M. S. Azîzî ango Mehmed Salih Bedirxan di *Rojî Kurdê* (1913) de eşkere dike:

“[E]v cerîda ha ji ‘ilm û me‘rifetê behs dike. Ji tiştek dî nika-re behs bike. Çûnke qanûna dewletê de maddek heye, dibêje heçî ku cerîdeyê siyasî derxe, dibê pênçsed zêra emanet day-ne. Heçî ku kurd in: ‘aciz in ji tedarika van pera. Ji vê yekê re niho bi vê cerîdeyê [*Rojî Kurd*] iktifa kirine...”<sup>662</sup>

Erê, di wê serdemê de ji bo derxistana rojnameyeke siyasî hewce ye hûn 500 zêrî emanet -ya rast rehîn- deynin destê dewletê, qanûn wilo dibêje. Ev jî ji pêşketina çapemeniya kurdî re dibe astengeke mezin, ji ber ku derfeta civaka kurdan nîne ku pereyekî evqas mezin kom bikin.

Di vê dewrê de li hember çapemeniya kurdî kiryareke din a tund heye ku leheng û qurbanê wê dîsa Mehmed Salih Bedirxan e: Ew ji ber naveroka nivîseke xwe ya bi kurdî ya di *Rojî Kurdê* de ji aliyê hikûmeta leşkerî ve tê darizandin û girtin. Ev bûyer di rojnameya *Tercuman-i Hakikatê* (No. 11687, r. 3) de wekî nûçe tê belavkirin.<sup>663</sup>

Mehmed Salih Bedirxan, di *Rojî Kurdê* de ligel Xelîl Xeyalî nivîskarê herî bîrewer û hişmend e. Wî di vê kovarê de bi navê xwe û bi

---

661 Di vê 'emirkinbûnê de hewce ye bi qasî zextên ITCê em bêtifaqiya pêşengên tevgerên kurdan jî ji bîr nekin. Zinar Silopî di bîranînê xwe de dibêje ku Kurd Te'avun ve Terakkî Cemiyetiyê ji ber dijberiya mîran û paşayan, lihevnekirina Seyîd 'Ebdulqadir û Bedirxaniyan zêde dewam nekir û ev qadro ji aliyê Îttîhadçıyan ve bi hêsanî hate belavkirin. Bnr. *Doza Kürdistan*, r. 23. Encama KTCê jî wiha ye, ew pêşî dibe du perçe, paşê jî tesfiye dibe.

662 Di *Sedsaliya Wê de Rojî Kurd 1913*, amd. Koma Xebatên Kurdolojiyê, r. 155.

663 Bnr. *Sedsaliya Wê de Rojî Kurd 1913*, amd. Koma Xebatên Kurdolojiyê, r. 59.

navên “M. S. Azîzî” û “Babê Rewşo” gelek nivîsên kurdî nivîsîne. Ji ber ku di nûçeyê de derbas nabe, em nizanin gelo ew ji ber kîjan nivîsê hatiye darizandin. Lê gumana me diçe ser nivîsa “Berî Şîrî Qelem”ê. Lewre ev nivîs yekane nivîsa kurdî ye ku rasterast bi navê wî hatiye weşandin. Heman nivîs, di heman jimara kovarê de bi tirkî jî hatiye weşandin lê di ya kurdî de vegotina Mehmed Salih Bedirxan zêde zêde kurdewarî ye. Ew behsa nezanîna kurdan, nebûna dîroka wan a nivîskî û nebûna rojnameyên wan dike. Balê dikişîne ser pirsgrîka kurd û ermeniyan û şîretan li kurdan dike û wiha dibêje: “Da mileta me bi dewlet bibe.” Piştî vê jî cih dide wê beşa *Mem û Zînê* ku ji bêtifaqiya kurdan gazin dike û li gorî şiroveya gelek kesan dewleteke kurdî dixwaze. Ji ber van sedeman bi qenata me nivîsa ku bûye sebebê girtina Mehmed Salih Bedirxan “Berî Şîrî Qelem” e, belkî jî ew beşa *Mem û Zînê* bi xwe ye.<sup>664</sup> Hewce ye em anekdota Celadet ji bîr nekin ku îdareya sansurê beşa herî bi ruh a *Mem û Zînê* xêz/sansur kiribû.

Di dewra Şerê Cîhanê yê Yekem (1914-1918) de rewş girantir dibe û hemû weşanên kurdî, li Stembolê *Hetawî Kurd*; li Bexdayê *Bangî Kurd*, têne te’îlkirin ango weşana wan tê rawestandin. Dîsa di vê dewrê de em rastî cureyekî nû yê sansurê tên: Sansura peyva “kurd/kurdî”: Di sala R. 1332/M. 1916an de *Newbehar* ango *Nûbihara Biçûkan* a Ehmedê Xanî li Stembolê çap dibe. (Bnr. Beşa 3.2.2.3.) Li ser bergê vê kitêbê îfadeyeke ‘erebî heye: “Haze risaleti fî tercemeti be‘ze’l-luxat el-erebiyye bi’l-luxeti”. Li gorî wate û sentaksa ‘erebî hewce ye li dawiyê peyva “kurdiyye” heba, çimkî maneya vê îfadeyê ev e: “Ev rîsale wergera hin peyvên erebî bal bi kurdî ve ye.” Jixwe em dizanin ku *Newbehar* ferhengeke menzûm a ‘erebî-kurdî ye. Lê balkêş e peyva kurdî li wir “kêm” e. Gelo Rêveberiya Sansûrê ew avêt an weşanger ji bo ku kitêb neyê qedexekirin otosansur kir, em nizanin. Lê xuya ye ku hê jî wê dewrê ve peyva “kurd/kurdî” peyveke xeter e.

---

664 Ji bo tîpguhêziya nivîsa “Berî Şîrî Qelem” bnr. *Sedsaliya Wê de Rojî Kurd* 1913, amd. Koma Xebatên Kurdolojîyê, r. 189-194; ji bo tirkîya wê bnr. hb., r. 174-176.

Piştî şer, ku Osmanî û hevalbendên wê têk diçin, sê rêvebirên ITCê; Cemal, Enwer û Telet Paşa ji welêt direvin.<sup>665</sup> Em dikarin vê wekî dawîya despotîzma ITCê bixwînin lê mînakê ku emê niha biddin nîşan dide ku zîhnîyeta wê hê li ser hikm e: ‘Ebdurehîm Rehmîyê Hekarî, yek ji kesên herî berhemdar ên dewra piştî şer e, ew li ser Kurd Kadinlari Te‘alî Cem‘iyyeti [Komeleya Bilindkirina Jinên Kurd-KKTC] helbesteke bi kurdî dinivîse û vê ligel tercumeya wê ya bi tirkî di rojnameya *Serbestîyê* de dixwaze biweşîne. Tercumeya helbestê tê weşandin lê helbesta kurdî, yanî metnê resen ji aliyê Rêvebiriya Sansurê ve tê sansurkirin. Di rojnameyê de cihê helbesta kurdî vala xuya dike lê di bin de dibêje “tercumesi” yanî wergera wê û wergera tirkî cih digire.<sup>666</sup> Roja din di *Serbestîyê* de li ser vê sansurê daxuyaniyeke biçûk tê belavkirin. Tê gotin ku ev sansur ne qanûnî ye, gelek rojname, bi frensî û farisî helbestan diweşînin lê ew nayêne sansurkirin.<sup>667</sup>

Ew helbesta sansurkirî piştî çend mehan, di hejmara 22yan a kovara *Jînê* de bêsansur lê bêyî wergera tirkî bi sernavê “Ji bo Civata Dayikan” tê weşandin.<sup>668</sup> Gava mirov ji vir helbestê dixwîne yan jî li wergera wê ya tirkî dimeyzîne, tu wateyê nade vê sansurê. Lewra di helbestê de tu tiştê “muzir” an jî xeter xuya nake. Hetta ji serî heya binî yek carê navê kurd jî tê de derbas nabe. Beramberî wê cih dide hedîsa Hz. Muhemmed ku dibêje “Cinet di bin lingê dayikan de ye”. Ji vê jî tê fêmkirin ku pirsgrîk ne naveroka wê ye, zimanê wê bi xwe ye.

Di *Serbestîyê* de em rastî nûçeyêke din a li ser sansurê tên. Lehengê wê dîsa ‘Ebdurehîm Rehmî ye. Li gorî vê; Rehmî berhemeke xwe ya edebî ya menzûm ji bo kontrolkirin û destûra çapê dibe Rêvebiriya Metbûatê ku Rêvebiriya Sansurê jî girêdayî vê sazîyê ye. Lê ji ber ku di vê îdarexaneyê de kesekî ku bi kurdî dizane nîne, ew nikarin kontrol bikin û ji ber vê jî wan beyan kiriye ku ev berhem

665 “Üç Paşa Daha Kaçdı”, *İkdam*, j. 7805 (4 Teşrînisani 1918/4 Mijdar 1918), r. 1.

666 Arslan, “Serbestî Gazetesi (1918-1919) ve Bedirxanîler: Celadet Alî Bedirxan’ın Yazıları ve Kürtlere Dair Bazı Haberler”, r. 448.

667 Arslan, hb., r. 450.

668 Bozarslan, *Jîn Kovara Kurdî-Tirkî 1918-1919*, c. V, r. 942.

neyê weşandin. Di berdewamiya nûçeyê de ji vê rewşê gazin tê kirin ku di vê saziyê de nebûna kesî kurdîzan weşana kitêbên kurdî gelek zehmet dike.<sup>669</sup>

Ew dîmena ku di rojname yan jî di kovaran de ji ber sansurê cihên vala, hetta car caran sitûnên vala xuya dikin ji bo dewra Osmanî tiştekî ji rêzê ye ku mînakên wê pir in. Ji bo weşanên kurdî yan jî bi kurdan re 'eleqedar, ev dîmen herî zêde di kovara *Jînê û rojnameya Serbestîyê* de derdikeve pêşberî me. Di *Jînê* de carna hevokek, carna 3-4 rêz<sup>670</sup>, carna jî bendek bi temamî<sup>671</sup> ji ber sansurê vala hatiye hiştin. Piştî ku Jîn vediguherê rojnameyeke siyasî jî rewş naguhere. Bo nimûna di nivîsa Kemal Fewzî de, tam 124 riste hatiye "teyykirin" yanî avêtin.<sup>672</sup> Dîsa ji raporeke xefî em hîn dibin ku waliyê Elazîzê li mutesserîfê (qeymeqam) Dêrsimê emir kiriye ku ev rojnameya *Jînê* nekeve Dêrsimê û derdora wê.<sup>673</sup>

Kurdan di dewra mutarekeyê de, angî dewra piştî şer, *Mem û Zîna* Xanî çap û belav kirin. (Bnr. Beşa 3.2.3.5.) Ev çap di weşanên kurdî yê wê dewrê *Jîn û Kurdistanê* de wekî nûçe û mizgînî tê belavkirin. Lê berevajî Celadet, Qanatê Kurdo<sup>674</sup> û Roger Lescot<sup>675</sup> dibêjin ku ev çap ji aliyê hikûmetê ve hat qedexekirin. Di kitêbxaneyan de nebûna nusxeyên wê çapê îddiya Kurdo û Lescot piştrast dike.

Ji bilî *Mem û Zîna* resen, wergerên wê yê tirkî jî di dewra Osmanî de bûne qurbanê sansur/otosansur û qedexeyê. Wergêrê ewil Ehmed Faîq (1730) û yê duyem Ebdulêzîz Xalis (1906) ew beşa "bi ruh" angî "sebeb-i telif" wernegerandine.<sup>676</sup> Lê ya herî xirab rewşa

---

669 Arslan, "Serbestî Gazetesi (1918-1919) ve Bedirxanîler: Celadet Alî Bedirxan'ın Yazıları ve Kürtlere Dair Bazı Haberler", r. 449-450.

670 Ji bo mînak bnr. Bozarslan, *Jîn Kovara Kurdî-Tirkî 1918-1919*, c. IV, r. 857.

671 Ji bo mînak bnr. Hb., r. 715.

672 Hîzanîzade Kemal Fevzî, "Kürdistân Muhtâriyyeti", *Jîn*, j.36 (21 Haziran 1336/21ê Hezîrana 1920an), r. 1.

673 Malmîsanîj, "Jîn Gazetesi İstanbul", *Berhem*, j.4 (sibat 1989), r. 13.

674 Kurdo, *Tarîxa Edebiyata Kurdî I*, r. 41.

675 Lescot, *Le presse kurde*, r. 4.

676 Selim Temo Ergül, "Türkçe'de Kürt Edebiyatı", *Dipnot*, j.2, sal: 2010, r. 220-221.

wergêrê sêyem e: Zulfîqar Fethî ku *Mem û Zîn* wergerandiye tirkî, ji tirs a ku tiştêk wê bê serê wî, vê “ewraq-i muzirre”yê dişewitîne, ji ber vê yekê jî deqê vê wergerê îro ne li ber dest e.<sup>677</sup>

Em dibînin ku ji yekemîn rojnameya kurdî, *Kurdistan*, heta belavbûna Dewleta Osmanî, weşangeriya kurdî bi qedexeyê û sansurê re rûbirû maye. Dewra ‘Ebdulhemîdê Duyem, desthilatdariya ITCê an jî piştî şerê cîhanê, zêde ferq û cudahî nîne: Sala ewil a Meşrûtiyata Duyem em jê derxin, ji bo kurdî rewş her zehmet bû. Lê di nav vê rewşa giran de jî mîrîsa kurdî ya ji vê dewrê mayî qet ne hindik e, mirov bi tu awayî nikare wê biçûk bibîne.

Di vê dewrê de mexdûrê herî mezin ê sansur û qedexeyan *Mem û Zîn* e. Ev watedar e. Lewre *Mem û Zîna* Xanî, bi taybetî ew beşa 5 û 6an, ji vê dewrê heta îro bûye dengê netewperweriya kurdî. Qedexeyê û sansurkirina wê, ji aliyekî ve bîdengkirina fikra kurdayetî ye jî. Balkêş e, ev rewş wê di dewra Komara Tirkî de jî dewam bike: Di sala 1968an de M. Emîn Bozarslan *Mem û Zînê* derbasî tîpên latînî dike û ligel wergera tirkî li Stembolê diweşîne. Hetta ew ji bo ku xebata wî ji aliyê dadgehê ve neyê berhevkirinê, tedbîren wan beytên “bi ruh” bi xwe sansur bike lê dîsa jî ew û xebata wî ji darizandinê xilas nabin.<sup>678</sup>

---

677 Adak, “Di serdema Osmaniyan de li pey rêça Ehmedê Xanî: Sê *Mem û Zînen* bi Tirkî”, r. 16.

678 Ji bo rapora pîsporan a li ser naveroka vê weşanê û biryara dadgehê bnr. Ehmedê Xanî, *Mem û Zîn*, amd. M. Emin Bozarslan, ç.3, weş. Hasat, İstanbul, 1990, r. 571-580.



# BEŞA ÇAREM

## MÎSYONER LI NAV DEWLETA OSMANÎ Û WEŞANÊN WAN ÊN BI KURDÎ

Di dewra Osmanî de qederek kitêbên kurdî ji aliyê civatên misyoneran ve hatine çapkirin. Ev hem bi alfabeya xwe hem jî bi konteksta xwe ya dîrokî ji kitêbên ku heta niha me behs kirine cuda ne. Lê ji bo ku em dûmenê giştî yê kitêbxaneya kurdî ya dewra Osmanîyan bibînin hewce ye em ji van kitêban jî agahdar bin. Beriya ku em derbasî vê mijarê bibin hewce ye em piçekî Kitêba Pîroz nas bikin. Ew ji du beşên mezin pêk tê:

**Peymana Kevin:** Ev Tewrat e, peyman a ku Xwedê bi Mûsa Pêxember û gelê Îsraîlê re girê daye. Di kitêba Peymana Kevin de Tewrat, Kitêbên Dîrokî, Zebûr û Nivîsarên Pêxemberan hatine berhevkirin.<sup>679</sup>

**Peymana Nû:** Ev kitêba xirîstiyaniyê ye, peyman a ku Xwedê bi Îsa Pêxember re girê daye. Peymana Nû, di nav gel de zêdetir wekî Mizgînî (Încîl) tê binavkirin lê di yûnaniya kevin de navê wê Evanjeliyon e. Peymana Nû ji 27 kitêban pêk tê û zimanê wê yûnaniya kevn e. Ji 27 kitêban çar jê Încîl in ku bi destê Metta, Marqos, Lûqa û Yuhenna hatine nivîsîn. Dûv re Karê Şandîyan ango ‘Emelê Resûlan tê. Ev kitêb bi destê Lûqa hatiye nivîsîn û behsa bûyerên pêkhatina civîna bawermendan dike û li ser belavbûna wê disekine. Piştî wê bîst û yek name tên. Di van nameyan de behsa mirina Îsa, rabûna

---

679 *Încîl (Mizgînî)*, Kitab-ı Mukaddes Şirketi, İstanbul, 2005, r. 539.

wî, çûna wî ya ezmanan û hatina wî ya diduyan tê kirin. Di Peymana Nû de kitêba dawî Peyxama Yûhenna ye.<sup>680</sup>

#### 4.1. Derbareyê Mîsyoneriyê de

Mîsyon, di wateya wezîfe, peywîrê de ye, mîsyoner jî ji kesê wezîfedar an peywîrdar re tê gotin. Lê wekî têgeh ev peyv ji wan kesan re tê gotin ku dîne xirîstiyaniyê belav dikin; ji bo belavbûna wê dixebitin. Mîsyoneriya xirîstiyaniyê wekî binyada olî xwe disîpêre van gotinên Hz. Îsa: "... herin û hemû miletan bikin şagirtên min."<sup>681</sup> Dîsa gotinên wekî "Divê pêşî Mizgînî ji hemû miletan re bê dayîn"<sup>682</sup> û "Herin her çar aliyên dinyayê û Mizgîniyê li hemû afirînê bidin bihîstin"<sup>683</sup> jî ji mîsyoneriya xirîstiyane re bûne bîngeh.<sup>684</sup>

Li ser fermana Hz. Îsa, mîsyoner li her derê geriyane, civatên mîsyoneriyê ava kirine, Încîl li hezaran ziman û zaravayan wergerandine û li mirovan belav kirine. Li gorî pêşgotina wergerê Încîlê îro li cîhanê nêzî 6800 ziman hene û temamê Peymana Nû li nêzîkî 1200 zimanî hatiye wergerandin.<sup>685</sup>

#### 4.2. Mîsyonerî di Nav Dewleta Osmanî de

Civatên mîsyoneran li nav Dewleta Osmanî jî xebat kirine. Bi taybetî di sedsala 19 û 20an de, piranî protestan, gelek civatên mîsyoneriyê ava dibin û gelek ji wan berê xwe didine Rojhilata Navîn. American Board of Commissioners for Foreign Missions (ABCFM), British and Foreign Bible Society [Civata Kitêba Pîroz a Brîtanya û Biyanî-BFBS] mînakê vê ne.<sup>686</sup> ABCFM, di sala 1810an de li eyaleta Bostonê ya Amerikayê ava dibe û hê di sala 1819an de Dewleta Osmanî dixwe nav bernameya xwe ya xebatê û mîsyonerê xwe dişîne vê

---

680 Hb., r. v-vi.

681 (Metta 28/19), hb., r. 69.

682 (Markos 13/10), hb., r. 100.

683 (Markos 16/15), hb., r. 109.

684 Şinasi Gündüz, "Misyonerlik", *DIA*, c. 30, 2020, r. 193.

685 *Mizgînî Peymana Nû (Încîl)*, Înstîtûa Welger'andina K'itêba Pîroz, Moskva, 2011, r. 6.

686 Şinasi Gündüz, "Misyonerlik", r. 196.

derê. Bi taybetî piştî Fermana Islahetê ew lez didine xebatên xwe.<sup>687</sup> Di sala 1830î de Dewleta Osmanî û Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê hevpeymanekê îmze dikin. Bi vê hevpeymanê we'zên dînî yên mîsyonerên protestan ên Amerîkî tînin misogerkirin, di sala 1836an de li Stembolê yekemîn dêra protestanan tê vekirin û di sala 1848an de jî protestanên nav Dewleta Osmanî wekî cemaetke cuda tînin qebûl kirin.<sup>688</sup>

ABCFM, di sala 1834an de li Stembolê dibistanekê ji bo ermenîyan vedike, paşê li Xarpêt û Dîlokê jî kolejan vedike. Bi vekirina van mekteban tînkiliyên mîsyonerên protestan bi ermeniyên li nav kurdan û kurdên qizilbaş re jî zêde dibin. Ya rastî jixwe xebatên mîsyonerên protestan ên Amerîkî zêdetir li wilayetên rojhilat ên Osmanî bû û bandora xwe jî li ermenî û kurdên qizilbaş ên herêmê dikir.<sup>689</sup>

Padişahê Osmanî 'Ebdulhemîdê Duyem, li hemberî tevgerên mîsyonerî û ji bo ku ermenîyan û kurdan di nav Osmanî de bigire polîtîkayeke taybet dimeşand. Wî dixwest bi vegotina "Îttihad-i Îslam" gelên misilman bikişîne ba xwe. Dîsa bi avakirina Alayên Hemîdiye hem kurd bi xwe ve girê didan hem jî li hemberî tevgera ermenîyan hêzeke mezin û herêmî ava dikir. Dîsa bi projeya 'Aşîret Mektebi [Dibistana 'Eşîran] zarokên 'eşîrên 'ereb û kurdan dianîn Stembolê, li vir perwerde dikirin û bi vî rengî jî ew 'eşîr dixistine bin bandora xwe.<sup>690</sup> Ji bilî van 'Ebdulhemîdê Duyem bi polîtîkaya "teshîh-i eqaid" ango rastkirina bawerîyan dixwest komên wekî 'elewî, êzidî û nuseyîrî bîne ser îslama sunnî.<sup>691</sup>

Mîsyonerên protestan ên Amerîkî, berê xwe didine nav kurdan, ermenîyan û suryanîyan jî. Yek ji sebebên vê, reqabeta di navbera wan û katolîkan de ye. Bo nimûne, di sala 1855an de ji Mêrdînê ji

---

687 Mehmet Bayrak, *Alevi-Bektaşî Edebiyatında Ermeni Âşıklar (Aşuğlar)*, weş. Özge, Ankara, 2005, r. 62.

688 Bayrak, hb., r. 60.

689 Bayrak, hb., r. 60-61.

690 Bayrak, hb., r. 68-69; ji bo Dibistana 'Eşîran a nav Osmanî bnr. Alişan Akpınar, *Osmanlı Devletinde Aşîret Mektebi*, weş. Göçebe, İstanbul, 1997.

691 Selim Deringil, *İktidarın Sembolleri ve İdeoloji: II. Abdülhamid Dönemi (1876-1909)*, wer. G. Ç. Güven, ç.3, YKY, İstanbul, 2007, r. 95-96.

*The Missionary Herald* re name diçe ku katolik li vir pir kar dikin lê hîç mîsyonerên protestan nînin ku ders bidin zarokan.<sup>692</sup>

Li jêr emê behs bikin, mîsyonerên protestan bi zimanê kurdî gelek karên weşangeriyê dikin. Berhemên kurdî yên mîsyoneran ji bo zimanê kurdî; rapor û bîranînên wan ên li ser kurdan jî ji bo dîroka kurdan muhîm û balkêş in. Lê hatina wan a herêmê dibe sebaba pîrsgirêkên nû jî: ‘Ebdurehman Bedîrxan di rojnameya *Kurdistanê* de gava behsa tevliheviyên di navbera kurd û ermeniyên de dike wekî sebebkar polîtîkayên dewletên biyanî yên wekî Rûsya û Frensayê nîşan dide; digel wan ew mîsyoneran jî tawanbar dike: “Hewqas zeman e ermeniya tecawuz li kurda nedikir. Bînaen‘elehyh kurda jî [bi] wan re qenc îmtîzac dikir. Eve çend salek e îmtîzacê qedîm temamen muxtel biye.\* Bînaen‘elehyh sebebek heye, **ew sebeb jî fesada mîsyonera ye.**”<sup>693</sup>

Mîsyoner Gottlieb Christian Hoernle (bi almanî Hörnle, m. 1882) û Schneider, di sala 1835an de li herêma Tebrîz, Salmas û Urmiyeyê gerekê dikin û di rapora xwe de dibêjin ku xelkê suryanî ji hatina mîsyonerên Amerîkayî kêfxweş in. Sebaba vê kêfxweşiyê ji dînî zêdetir hêviya xilasbûna wan a ji bindestiya mislimanan e.<sup>694</sup> Xuya ye ev rewşa nû ya ku hêvî dida suryanî, ermenî û gelên din ên nemisliman ji bo kurdan cihê tirsê bû. Beyta Hacı Qadirê Koyî ya “Xakî Cizîr û Botan, ye‘nî wilatî kurdan/Sed heyf û sed mixabin deyken Ermenistan”<sup>695</sup> jî rengvedana vê tirsê ya di edebiyatê de bû.

Hêviya gelên nemisliman û tîrsa kurdan di sedsala 19 û 20an de li hev diket û vê qeyranê têkiliyên wan ên kevneşopî jî nû ve saz dikir. Di vê rewşa nû de mîsyoner jî hêmaneke girîng bûn.

---

692 Shemmas Sulliba, “Letter From Mardin”, *The Missionary Herald*, Vol. 52, No. 4 (April 1856), r. 120.

\* muxtelbûyîn: xirabbûn.

693 Bozarslan, *Kurdistan Rojname Kurdî ya Pêşîn (1898-1902)*, c. II, r. 537.

694 Hörnle&Schneider, “Beilage No. III: Auszüge aus dem Tagebuche der Brüder Hörnle und Schneider über ihre Reise nach Urmia und einigen Kurdendistrikten im Westen dieser Stadt”, *Magazin für die neueste Geschichte der evangelischen Missions- und Bibelgesellschaften*, j.21 (1836), r. 485.

695 Hacı Qadirî Koyî, *Dîwan*, r. 83.

### 4.3. Têkiliyên Mîsyoneran bi Kurdî re

Têkiliyên mîsyoneran bi kurdî re digihîje heta 1787an ku kitêba Maurizio Garzoni ya bi navê *Grammatica E Vocabolario Della Lingua Kurda* [Rêziman û Ferhenga Zimanê Kurdî] li Romayê çap dibe. Lewre nivîskarê vê kitêbê mîsyonerek e. Di dawiya vê kitêbê de wergera kurdî ya du duayên navdar ên xirîstiyaniyê cih digirin. Ji van duaya yekem bi navê “Orizione Domenicale” ye, bi îngilîzî “Lord’s Prayer” ango Duaya Rebb e. Duaya duyem jî “Salutazione Angelica” ango Silavên Ferîşteyan e.<sup>696</sup>

Mîsyonerê ABCFMê Samuel A. Rhea, li ser gramer û ferhenga kurdî ya herêma Hekarî dixebite û xebata wî wekî gotar tê weşandin. Di dawiya vê gotarê de em dibînin ku wî duaya “Lord’s Prayer” û jî Încîlê beşa “Parable of The Prodigal Son [Çiroka Kurê Musrîf]” wergerandiye kurdî.<sup>697</sup>

Têkiliyên mîsyoneran bi kurdî re digihîje sedsala 18an, lê fikra wergerandina Încîlê/an bal bi kurdî ve di destpêka sedsala 19an de, bi pêşketina tevgera mîsyoneriya protestanan a li Rojhilata Navîn şênber dibe. Li gorî Samuel Bagster, fikra wergerandina Încîlê li zimanê vî gelê “nezan û nîv-hov” cara ewil di sala 1822yan de ji aliyê Rev. Henry Leevs ve ji lijneya British and Foreign Bible Society [Civata Kitêba Pîroz a Brîtanya û Biyanî-BFBS] re hate pêşniyazkirin.<sup>698</sup> Ji rapora XXI. a BFBSê em hîn dibin ku di sala 1824an de projeyeke wan a wergerandina Peymana Nû li zimanê kurdî heye.<sup>699</sup> Lijneya BFBSê ev karê wergerê daye Bishop Shevriz (bi almanî Bischofs Schévros, Pîskopos Şevriz/Şevros, m. 1830). Pîskopos Shevriz, di sala

---

696 Maurizio Garzoni, *Grammatica E Vocabolario Della Lingua Kurda*, Roma, 1787, r. 283-284. Ji van wergera kurdî ya “Orizione Domenicale” li bajarê Qudsê li ser dîwarê Dêra Pater Noster neqîşandiye û îro jî disekine.

697 Samuel A. Rhea, “Brief Grammar and Vocabulary of the Kurdish Language of the Hakari District”, *Journal of the American Oriental Society*, v.10 (1872-1880), r. 155.

698 Samuel Bagster, *The Bible of Every Land*, London, Samuel Bagster and Sons, 1860, r. 83.

699 *The Twenty-First Report Of The British And Foreign Bible Society*, Printed By Augustus Applegath, London, 1825, r. 62.

1827an de wergera çar Încîlan bi herfên erebî qedandiye û ji Tebrîzê gihandiye ber destê Leeves.<sup>700</sup> Li gorî rapora XXIII. a BFBSê jî wergera çar Încîlan qediyaye, li Tebrîzê ji aliyê çend kesan ve hatiye rast-kirin û wergêr ji bo temamê Peymana Nû wergerîne hatiye teşwîq-kirin.<sup>701</sup> Ev wergera Pîskopos Shevriz çend caran hatiye nîrxandin, ji aliyê hin mîsyonerên din ve hatiye kontrol û teshîhkirin lê ew tu carî nehatiye çapkirin.<sup>702</sup>

Wergera kurdî ya Încîlê ne karekî hesan e, li pêşiya wê gelek astengî hene. Ji van astengiyan hin ji rewşa kurdan e, wekî jiyana eşîrî û koçeriyê, hebûna zarava û devokên cuda, ligel vê di nav wan de kêmbûna xwendin û nivîsandinê. Herwiha hin astengî jî ji hişmendiya mîsyoneran e. Lewre mîsyonerên pêşîn ku li nav kurdan digerin û derbarê wan de agahî didin, bo nimûne Hoernle û Wolff, dibêjin ku jiyana kurdan û zimanê wan “primitive” ango paşdemayî ye; alfabe-yeke wan, edebiyateke wan, nivîskarên wan tune ne. Ji ber vê yekê jî wergerandina Încîlê bal bi kurdî ve hem ne pêkan e hem jî bê feyde ye. Bo nimûne Hoernle, xwe li wergerandina kurdî ya Încîlê ceribandîye, lê ji ber van astengiyan dev jê berdaye; çimkî ew dibêje kurd koçer in û li hember perwerdeyê xemsar in.<sup>703</sup> Thomas Bois îddîa dike ku Hoernle, yekemîn kes e ku Încîla Yuhanna (Gospel of St. John) wergerandiye kurdiya mukrî/mokrî<sup>704</sup> lê me wergereke wiha nedît.

Hoernle û Schneider, di sala 1835an de li aliyê Urmîyeyê derdikevine ger-lêkolînekê ji bo bersivandina van sê pirsan:

1. Çima wergerên me yên Încîlê ji aliyê kurdan ve nayêne fêmkirin?

700 Bagster, *The Bible of Every Land*, r. 83-84.

701 *The Twenty-Third Report Of The British And Foreign Bible Society*, Printed By J. Moyes, London, 1827, r. xlv.

702 Bagster, *The Bible of Every Land*, r. 84.

703 Marcin Rzepka, “Protestants among Kurds and some problems of translation of the Bible into Kurdish in the 19th century”, *Orientalia Christiana Cracoviensia*, nr. 1 (2009), r. 88-89.

704 Joyce Blau, “Kurdish Language ii. History of Kurdish Studies”, *Encyclopædia Iranica*, 2009, <https://iranicaonline.org/articles/kurdish-language-ii-history-of-kurdish-studies>, 26.12.2024.

2. Ji lehçe û devokên kurdî kîjan ji bo wergerê baş û guncaw e?

3. Kurd, zimanê erebî, farsî û tirkî çiqas dizanin ku karibin ji wergerên Încîlê yên bi van zimanan sûd wergerin?<sup>705</sup>

Hoernle û Schneider, di encama vê ger-lêkolînê de di sala 1836an de raporeke almanî diweşînin û bi vî rengî çavdariyên xwe yên li ser kurdan û hewldanên xwe yên wergerandina Încîlê bo kurdî rave dikin. Ji destpêkê em hîn dibin ku ew vî karî ji bo “Bibelgesellschaft”a Londonê dikin. Ew di vê gerê de destxetên wergerên kurdî yên Încîlê ku Pîskopos Shevriz çêkiribûn jî bi dest dixin. Wekî me li jor behs kir, Shevriz, dema li Urmiyeyê bû, çar Încîl bi alîkariya kurdekî bi navê “Mollah Mohamed”ê ji eşîra “Sumailî” wergerandine kurdî lê ew nehatine çapkirin. Hoernle û Schneider dibêjin ku ev werger ne tam in û dema wan ev wergerên Pîskopos Shevriz bi kurdên vê heremê dane xwendin, wan gotine “em jê fêhm nakin”.<sup>706</sup> Xuya ye ew xebatên Pîskopos Shevriz, ji bo kurdî nimûneyên ewil ên wergera Încîlê bûn, loma jî ew ecemî û bêteşe bûn. Jixwe Samuel Bagster jî piştrast dike ku di encama nixandî, kontrol û teshîhên dirêj de wergerên Pîskopos Shevriz hêjayî çapê nehatine dîtin.<sup>707</sup>

Gotinên neyînî yên mîsyonerên pêşîn li ser kurdan û zimanê wan, di xebatên mîsyoneriyê de qenaeteke giştî çêdikin û ev yek wergerên kurdî yên Încîlê dereng dixê.<sup>708</sup> Balkêş e, Hoernle piştî ku dev ji wergera Încîlê berdide, ji bo bikeve nav civaka kurdan karê textoriyê dike.<sup>709</sup> Piştî wî jî emê gelek mîsyonerên textor, hemşîre, pîrik li nav kurdan bibînin. Ev terciheke maqûl bû, çimkî ji miletekî paşdemayî re beriya kitêban tenduristî hewce bû. Jixwe wekî hînbûna zimanên herêmî, avakirina dibistan, çapxane, dêr û sêwîxaneyan, bijîşkî jî karekî sereke yê mîsyoneran bû. Wan bi vî şeklî bi xelkê re rasterast têkilî didanî.

---

705 Hörnle&Schneider, “Beilage No. III: Auszüge aus dem Tagebuche der Brüder Hörnle und Schneider über ihre Reise nach Urmia und einigen Kurdendistrikten im Westen dieser Stadt”, r. 481.

706 Hörnle&Schneider, hg., r. 492.

707 Bagster, *The Bible of Every Land*, r. 84.

708 Rzepka, hg., r. 89.

709 Rzepka, hg., r. 89.

Divê em bibêjin ku yek ji astengên li pêşiya wergerên kurdî yên Încîlê jî êrîşkarî û bêtehemulîya mislimanan e. Bo nimûne, dema Pîskopos Shevriz û alîkarê wî li Urmiyeyê wergera xwe amade dîkin, misliman –bi gotina Hoernle “Muhamedanern”- pê dihesin. Alîkarê Pîskopos Shevriz ji canê xwe ditirse û baz dide. Misliman, qesda canê Pîskopos Shevriz jî dîkin loma ew jî mecbûr dimîne biçe Tebrîzê.<sup>710</sup>

#### **4.4. Kitêbên Kurdî yên ku ji Aliyê Mîsyoneran ve di Nav Sînorê Osmanî de Hatine Weşandin**

Piştî hewldanên ewil ên bêencam, cara pêşîn di sala 1856an de mîsyoner Încîla Metta (Madteos) werdigerînin kurdî û ew li Stembolê çap dibe. Bi vî rengî di weşangeriya kurdî ya serdema Osmanî de bi destê mîsyoneran dewreke nû dest pê dike. Çend taybetiyên giştî yên vê dewrê wiha ne:

**Piranî wergerên Încîlê ne:** Çi parçe parçe çi jî bi giştî, di vê dewrê de piranî wergerên Încîlê hatine weşandin. Dîsa kitêbeke alfabeyê û kitêbeke îlahiyan jî hatiye çapkirin, lê em nikarin wan ji Încîlan cuda bihesibînin, çimkî ew jî metnên dînî yên xiristîyanîyê dihewînin û weke kitêbên arîkar in ji bo xwendina Încîlê.

**Piranî bi tîpên ermenkî ne:** Ji bilî sê Încîlên dawî, ku di demên dawî yên Dewleta Osmanî de bi herfên ‘erebî hatine weşandin, ên din tev bi tîpên ermenkî ne. Li nav kurdan gelek ermeniyên kurdî-ziman hebûn. Bala mîsyoneran li ser wan bû. Jixwe ev wergerên Încîlê yên pêşîn ku ji aliyê mîsyonerên mezheba protestanîyê ve hatine amadekirin ne ji bo kurdan, ji bo ermeniyên kurdî-ziman bûn.<sup>711</sup> Yanî li vir mîsyonerîyeke mezhebî heye, armanc protestankirina ermeniyên ortodoks ên nav kurdan bû. Ewçax çima ne ermenkî lê bi kurdî? Bersiva vê Charles Noel, ê ku di sala 1919an de bi wezîfeyeke fermî li nav eşîrên kurdan geriyaye, dide: “Bi rastî jî li hin herêmên kurdan ermenî ji bilî kurdî zimanekî din nizanin.”<sup>712</sup>

710 Hörnle&Schneider, hg., r. 492-493.

711 Rzepka, hg., r. 90-91.

712 Noel, *Kürdistan 1919*, r. 156.

Berî Charles Noel, mîsyonerê Amerîkî Moses Payson Parmelee jî di sala 1888an de li ser kurdan, ermenîyan û van wergerên Încîlê wiha dibêje:

“The New Testament, a hymn book, and some smaller books have been translated into their language, printed in the Armenian character, designed more especially for those Armenians that have been so mingled with Koords as to lose their own language and to speak only the Koordish.”<sup>713</sup>

[Peymana Nû, pirtûka îlahîyan, û hin pirtûkên piçûktir li zimanê wan -kurdan- hatine wergerandin, ew bi tîpên ermenî hatine çapkirin, bi taybetî ji bo wan ermenîyên ku ew qas bi kurdan re tevlihev bûne ku zimanê xwe winda kirine û tenê bi kurdî diaxivin hatine sêwirandin.]

Parmelee, di dereke din a bîranînên xwe de vê mijarê berfirehtir rave dike:

“Some Armenians, in remote mountain districts, have lost their own language and speak only Koordish. The service in their churches has become a curious and almost meaningless mixture of Armenian and Koordish. To these brethren, sitting in such dense darkness, the more favored Armenians of other parts of Turkey have sent missionaries, and now the New Testament is translated into Armeno-Koordish, a hymn-book and other religious books have been prepared, churches and schools have been organized, and the bright light of truth has begun to shine in those darkest regions, through the missionary zeal of the Protestant churches of Turkey.”<sup>714</sup>

[Hin Ermenî, li navçeyên çiyayî yên dûr, zimanê xwe winda kirine û tenê bi kurdî diaxivin. Xizmeta di dêrên wan de bûye tevliheviyeke seyr û hema bêje bêwate ya ermenî û kurdî. Ji van birayan re, ku di nav tariyeke wisa de rûdiniştin, ermenîyên xêrxwaz ên li deverên din ên Tirkîyê, mîsyoner şandine û niha Peymana Nû bi zimanê ermenî-kurdî hatiye wergeran-

---

713 M.P. Parmelee, *Home and Work by the Rivers of Eden*, American Sunday School Union, Philadelphia, 1888, r. 31-32.

714 Parmelee, *Home and Work by the Rivers of Eden*, r. 59.

din, pirtûkek îlahiyan û pirtûkên olî yên din hatine amade-  
kirin, dêr û dibistan hatine birêxistinkirin û ronahiya rastiye  
ya geş li wan herêmên herî tarî, bi xîreta mîsyoneriya dêrên  
protestan ên Tirkiyeyê dest pê kir.]

Berî Parmelee ji dîsa mîsyonerê Amerîkî C. H. Wheeler, di sala  
1868an de, di bîranînên xwe de dema behsa xebatên American Bo-  
ard ên nav Osmanî dike dibêje ku wan çar Încîl (gospel) wergeran-  
dine kurdiya kurmancî û bi tîpên ermenkî çap kirine. Ew diyar dike  
ku armanca van Încîlan ne tenê kurd in herwiha ew ji bo “by many  
thousands of Armenians, Turks, Yezidees, Jacobites, and Nestori-  
ans in Koordistan, the eastern portion of Turkey in Asia”ê ne.<sup>715</sup> Ew,  
di dereke din de ji bi têbîniyekê destnîşan dike ku ji “The Koord”  
meqseda wî ermenî û suryaniyên kurdî-ziman in ku mîsyoner wan  
ji bo mîsyoneriyê di dêrên xwe de perwerde dikin.<sup>716</sup>

Nûreddîn Zaza, di jiyannameya xwe de dema behsa Qamişloya  
salên 1930î dike, behsa ermeniyên ku ji Bişêriyê koç kirine ji dike.  
Dibêje ku ew ji her alî ve kurdewar bûn û pirtûkên dînî yên rahibên  
wan bi tîpên ermenkî lê bi kurdî bûn.<sup>717</sup> Bi rastî Sevan Bogos-Der  
Bedrosyan ji dema behsa malbata xwe ya çaxê firmanê ji Xerzan  
bar kirine Binxetê dike, dibêje bi wan re pirtûka pîroz a bi kurdiya  
tîpên ermenkî hebû û dapîra wê rojê sê dana duayeke mesîhiyan bi  
kurdî dixwend.<sup>718</sup>

Me di çarçoveya xebata xwe de 11 pirtûkên kurdî yên bi tîpên  
ermenkî dîtin lê li derveyê Osmanî ji pirtûkên bi vî rengî çap bûne.  
Gor Yeranyan, ku li ser ermeniyên kurdî-ziman xebat dike, bi giştî  
18 heb pirtûkên kurdî yên bi tîpên ermenkî tesbît kirine û dibêje  
dîroka nivîsîna kurdî ya bi tîpên ermenkî digihe sedsala 15an.<sup>719</sup>

---

715 C. H. Wheeler, *Ten Years on The Euphrates*, American Tract Society, Bos-  
ton, 1868, r. 22.

716 Wheeler, *Ten Years on The Euphrates*, r. 216.

717 Nureddin Zaza, *Bir Kürt Olarak Yaşamım*, wer. A. Karakoç, weş. Pêrî, İs-  
tanbul, 2000, r. 264.

718 Sevan Boğos-Der Bedrosyan, “Boğos ailesinin Til’den Kamışlı’ya kadar  
olan hikâyesi”, [https://www.houshamadyan.org/tur/ada/kuzey-ve-gu-  
eney-amerika/bogos-der-bedrosyan-arsivi-usa.html](https://www.houshamadyan.org/tur/ada/kuzey-ve-gu-eney-amerika/bogos-der-bedrosyan-arsivi-usa.html), 18.01.2025.

719 Gor Yeranyan, *Episodes From Armenian-Kurdish History: Vol. 1 - Kurdish-*

Zimanê kurdî ne tenê di nav ermeniyên de, herwiha li nav suryaniyan jî berbelav bû. Bo nimûne, di sala 1913an de çaxê kurdan li Stembolê kovara *Rojî Kurd* derdixist, suryaniyan jî li Xarpêtê rojnameya *Mürşid-i Asûriyûn* derdixist û di nivîseke wê ya tirkî de gotina “Kürd Süryanîleri [suryaniyên kurd]” derbas dibe. Nivîskarê wê dibêje, ji bo ku em bala suryaniyên kurd jî bikişînin em ji kesên kurdîzan nivîsên kurdî bixwazin û wan di rojnameya xwe de biweşînin.<sup>720</sup> Berî modernîzmê jî têkiliyên suryaniyan bi zimanê kurdî re hebû. Lawîja Basîlyus Şem’ûn a ji sedsala 18an ku Celadet Alî Bedirxan di *Hawarê* de bi tîpên latînî jî weşandiye nîşaneya vê ye.<sup>721</sup> Dîsa gelek metnên kurdî bi tîpên suryankî hene ku ji wan re “gersûnî” tê gotin.<sup>722</sup>

Di vî sed salê dawî de (1923-2023), zimanê kurdî di nav çerxa piştaftinê de ewqas perçiqiye ku êdî kurd jî bi zimanê xwe nizanin lê xuya ye wextekî “lingua franca”ya Mezopotamyayê kurdî bû.

**Hemû bi kurmancî ne:** Ya rastî bi zaravayên din ên kurdî jî wergerên Încîlê hene, lê ew ne di nav sînoren Osmanî de hatine weşandin: Di sala 1900î de li Londonê Încîleke bi zazakî çap dibe.<sup>723</sup> Li deverên wekî New York, London û Julfayê jî wergerên Încîlê yên bi zaravayê soranî çap dibin. Yek ji mîsyonerên ku bi zaravayê

---

*Speaking Armenians, Printed Books in Kurdish Language With Armenian Script-*, Matenadaran Mesrop Mashtots Institute of Ancient Manuscripts, Yerevan, 2024, r. 334, 340.

720 “Süryânî lîsânînin kesb-i hayâtî”, *Mürşid-i Asûriyûn*, 5, No. 13 (Kanûnî-evvel 1913), 206 vgz. Benjamin Oliver Sunny Trigona-Harany, *Întibâh or Hâb-ı Gaflet: Âşûr Yûsuf, Naûm Fâik and the Ottoman Süryânî*, teza lîsansa bilind, Zanîngeha Boğaziçi, İstanbul, 2008, r. 52.

721 *Hawar Cild 2 Hejmar 24-57 (1934-1943)*, amd. F. Cewerî, r. 654-658.

722 Ji bo tîpguhêziya nimûneyeke metnê gersûnî û berawirdiya wê bi Lawîja Basîlyus Şem’ûn re bnr. Veysel Başçıl, “David Barzanaya’nın Yalancı İsa Şiirinin İçerik Çözümü ve Mor Basilius’un Lawîj’iyle Mukayesesi”, *Şarkîyat*, 16/2 (Ocak 2025), r. 711-716.

723 Ercan Çağlayan, “Osmanlı Belgelerinde Zazalar ve Zazaca Üzerine Notlar”, dnd. *I. Uluslararası Zaza Dili Sempozyumu*, weş. Bingöl Üniversitesi, Ankara, 2011, r. 281-282. Di arşîva Osmanî de derbareyê vê Încîla zazakî de belgêyek heye. Li gorî vê, ev Încîl ji aliyê BFBSê ve bi herfên ‘erebî li Londonê hatiye çapkirin û nusxeyên wê ji Bexdadê wê ji Îranê re bêne şandin. Bnr. BOA. MF.MKT, 662/20, Dîrok: 21/C/1320 (H), 25.09.1902 (M).

soranî (mukrî) herî zêde xebat kiriye Ludvig Olsen Fossum e. Wî li Mehabadê kar kiriye; di sala 1912an de îlahiyên xirîstiyaniyê bi navê *Kitêbî Şî'ranî Rûhanî* wergerandiye kurdî, ew di sala 1918an de çap bûye (*Kurdish Prayer Book*, New York). Di sala 1919an de jî hem wergera wî ya çar Încîlan (*Încîlî Muqeddesî*, New York) hem jî gramera wî (*A Practical Kurdish Grammar*, Minneapolis) çap bûye.

Herçendî ABCFM pêşketîtir xuya bike jî, di karê wergerandina Încîlan bal bi kurdî ve civatên herî çalak BFBS û American Bible Society [Civata Kitêba Pîroz a Amerîkî-ABS] ne. Li gorî kovara *Kurdish Facts and West-Asian Affairs*; ABS, “sister organisation” ango “rêxistana destebira” ya BFBSê ye.<sup>724</sup>

**Weşanên kurdî yên mîsyoneran jî di bin tesîra rewşa siyasetê ya Osmanî de ne:** Dewra ‘Ebdulhemîdê Duyem ji bo mîsyoneran jî zehmet e. Lewre di vê dewrê de wekî ku her tiştê derbarê ermenî û Ermenistanê de, her tiştê li ser kurdan jî tabû/xeter bû. Bo nimûne, mîsyoner Alpheus N. Andrus<sup>725</sup> di sala 1900î de li Mêrdînê wergera kurdî ya Peymana Nû qedandiye lê ji ber van zextan ew nikare taslaka xwe bişîne Stembolê.<sup>726</sup>

Pişti dewra ‘Ebdulhemîd, serdema meşrûtiyetê ji karên mîsyoneriyê re jî serbestiyê tîne; xebatên werger û çapê ji nû ve dest pê dikin. Di sala 1911an de li Stembolê sê Încîl û ‘Emelê Resûlan çap dibin. Alpheus N. Andrus, piştî serbestiya çapemeniyê dîsa lez dide xebatên xwe yên werger û translîterasyonê.<sup>727</sup> Lê demek şûn de vê carê şerê cihanê ji bo mîsyoneran dibe astangeke mezin. Bi taybetî ji ber firmana filehan, mîsyoner ji van herêman têne derxistin.<sup>728</sup>

---

724 “No Full Bible in Kurdish Yet”, *Kurdish Facts and West-Asian Affairs*, j.5 (April 1961), r. 15.

725 Ji bo xebatên mîsyoneriyê yên Andrus bnr. Fırat Avcı, *American Board (ABCMF) Missionary Alpheus Newell Andrus' Mardin Activities*, teza lîsansa bilind, Zanîngeha Dokuz Eylül, İzmir, 2022.

726 Hans-Lukas Kieser, *Iskalanmış Barış Doğu Vilayetleri'nde Misyonerlik, Etnik Kimlik ve Devlet 1839-1938*, wer. A. Dirim, weş. İletişim, İstanbul, 2005, r. 207.

727 Kieser, hb., r. 543-544.

728 Derbareyê şerê cihanê, tehcîra ermeniyan û rewşa mîsyoneran bnr. Kieser, hb., r. 487-507.

Civatên mîsyoneriyê heta avabûna Komara Tirkîyeyê jî li Stembolê aktîf in, em dibînin ku di sala 1922-1923yan de li Stembolê wergera kurdî ya sê Încîlan bi herfên ‘erebî tê weşandin. Mîsyonerên ku heta niha hemû xebatên xwe yên kurdî yên di nav Osmanî de bi tîpên ermenkî diweşandin, çawa karîbûn van her sêyan bi herfên erebî biweşînin? Çimkî di vê dewrê de Stembol, paytexta Osmanî, di bin kontrola dewletên biyanî de ye; hikmê Osmanî nemaye an jî pir kêmbûye. Vê yekê jî serbestiyek daye civatên mîsyoneriyê ku êdî karibin bi herfên ‘erebî jî dînê/mezhebê xwe belav bikin.

Gelo li hemberî van wergerên kurdî yên Încîlan berteka rewşenbîrên kurdî çawa bû? Yek, xebera wan ji van wergeran heye. Du, ew van wergeran li hemberî îslamê dihesibênin. Bo nimûne, Qazîzade Mistefa Şewqî di sala 1914an de di kovara *Hetawî Kurdê* de dibêje ku “ermen êsta Încîlîyan bi kurdî terceme kirduwe...” Dîsa li gorî wî, kurd qiyamet nadine xwendin û ilmê, dînê xwe jî nizanin; wiha here ewê dînê xwe winda bikin. Li hemberî vê rewşê ew bangî melayên kurd dike ku ew jî “kitêbê şer‘î kurdî terceme bikin.”<sup>729</sup>

Kitêbên kurdî yên ku ji aliyê mîsyoneran ve di nav sînorê Osmanî de hatine weşandin ev in:

#### **4.4.1. Încîl Xudeê me Îsa el Mesîh e Nivîsandin bi Destê Madteos, wer. Stepan, Stembol, 1856, 112 rûpel.**

Ev yekemîn wergera Încîlê ya bi kurdî, ji aliyê BFBSê ve hatiye weşandin û bi tîpên ermenkî ye. Di kitêbê de tenê Încîla Madteos (Metta) cih digire. Wergêrê wê Stepan (Stephan, Baron Stephan Tomas), li Hanî/Hênêya Diyarbekirê li şaxa ABCFMê wekî waîz kar dikir<sup>730</sup> û ji bilî vê wergerê di karên perwerdeyî yên vê mîsyonê de gelek xebat kirine.<sup>731</sup>

729 Qazîzade Mistefa Şewqî, “Tereqqî dînman divê”, *Hetawî Kurd*, j.4 (19 Mart 1330/1 Nîsan 1914), r. 23-24.

730 “No Full Bible in Kurdish Yet”, *Kurdish Facts and West-Asian Affairs*, r. 15; Bagster, *The Bible of Every Land*, r. 84.

731 Gülşen Akkoyun Özlü, *Amerikan Board Misyonerlerinin Diyarbakır’daki Faaliyet ve Kurumları (1850-1916)*, teza doktorayê, Zanîngeha İnönü, Malatya, 2023, r. 44, 50, 69, 96-97.

Li gorî raporeke destxet, ev Încîl 1000 heb çap bûye.<sup>732</sup>

Yek ji pêşêngên mîsyonerên protestan ên American Boardê li nav kurdan “Deacon Shemmas” dema di nav qoliyekê de ev wergerên Încîlê wergirtine û anîne mal pir kêfxweş bûye û ji yezdan re spasî kiriye. Vê yekê xanima wî di bîranînên xwe de wiha neql dike û derbarê vê wergera ewil de agahiyan dide:

“Saturday, I was alone in the sitting-room of our kiosk, .... when I heard the voice of Deacon Shemmas. And soon he entered, looking very happy, and exclaiming ‘Thanks be to God, thanks, many thanks, the Kurdish Gospel of Matthew has arrived!’ at the same time producing from his handkerchief, in which it was carefully wrapped, a small neatly-bound volume (...) ‘All I have been waiting for was these books’ (...)”. This new Kurdish Gospel is the first book ever published in the Kurdish language. It has been translated by our native preacher Stepan, who lives at Hineh, and we hope he will soon complete the translation of the whole New Testament, and that through it many will receive a knowledge of Jesus Christ.”<sup>733</sup>

### **Nusxe**

1. British Library (Londra), B: Asia, Pacific and Africa Collections, St Pancras Reading Rooms, H.X (Shelfmark): 14997.a.3.
2. Cambridge University, B: University Library: Order in Anderson Room, H.X (Classmark): BSS.509.1.E56.1.

#### **4.4.2. *Încîl Xudeê me Îsa el Mesîh e Nivîsandin bi Destê Madteos Marqos Luqa û Yanna, wer. Stepan, Stembol, 1857, Çapxaneyaya Kayol, 398 rûpel.***

BFBS, di 1856an de Încîla Madteos bi destê xebatkarê xwe Stepan wergerandibû kurdî, di 1857an de her çar Încîlan bi hev re werdigerîne û çap dike. Kitêb bi tîpên ermenkî ye û beşên wê bi vî rengî ne:

---

<sup>732</sup> “Report, Printing done in 1856, Committee on Publications”, <https://archives.saltresearch.org/handle/123456789/43090>, 03.01.2025.

<sup>733</sup> Bagster, *The Bible of Every Land*, r. 84.

- Încîla Madteos, r. 1-112
- Încîla Marqos, r. 113-184
- Încîla Luqas, r. 185-307
- Încîla Yanna, r. 308-398

Li gorî reporteke destxet<sup>734</sup> û xebata Samuel Bagster a ser wergerên Încîlê<sup>735</sup>, ev çar Încîl 3000 heb çap bûne.

### **Nusxe**

1. School of Oriental & African Studies (SOAS), H.X (Shelf-mark): EB85.471 /135028.
2. Cambridge University, B: University Library: Order in Anderson Room, H.X (Classmark): BSS.509.1.E57.1.

### **4.4.3. *Aypenaran Alifbe Cuz Kurmancî û Ermenî*, amd. Migirdîç Vartabed Dîkranyan, Stembol, Çapxaneyaya H. Muhendisyan, 1860, 55 rûpel.**

Ev kitêba alfabeyê ji aliyê keşayê ermenîyan ê Palûyê Migirdîç Vartabed Dîkranyan ve ji bo hînkirina zarokên ermenî yên li Kurdistanê, ku bi zimanê ermenî nizanin, hatiye amadekirin. Di nava kitêbê de hin metnên sivik, gotin û helbestên dîni yên xirîstiyaniyê cih digirin.<sup>736</sup> Ji bilî van metnan di nava wê de ferhengeke kurdî-ermenî jî heye. Ferhad Pîrbal, li ser vê kitêbê wiha dibêje:

“This translated book had many firsts: It was the first educational book for children; the first book to interpret the Bible; the first book to write history in Kurdish; the first book to include illustrations in Kurdish; the first Kurdish book in the Armenian alphabet; and the first Kurdish-Armenian dictionary. The dictionary contains more than 300 Kurdish-Armenian words.”<sup>737</sup>

---

734 Report, Printing in 1857, by Edwin E. Bliss, <https://archives.saltresearch.org/handle/123456789/44049>, 03.01.2025.

735 Bagster, *The Bible of Every Land*, r. 84.

736 Malmisanlı, “Osmanlı Döneminde Yazılan Kürtçe Eserler Üzerine”, r. 59.

737 Ferhad Pîrbal, “Kurdish literature in the former Soviet Union Republic of Armenia”, dnd. *Shadow of the Lion*, r. 116.

[Gelek taybetiyên sereke yên vê kitêba wergerandî hene: Ew kitêba pedagojîk a yekem ji bo zarokan bû; kitêba yekem a ku încîl şirove kiribû; kitêba yekem a ku dîrok bi kurdî nivîsibû; kitêba yekem bû ku îllustrasyonên bi kurdî dihewandin; Kitêba kurdî ya yekem bû ku bi alfabeya ermenî hatibû nivîsandin û ferhenga yekem a kurdî-ermenî bû. Di nav ferhengê de ji 300î zêdetir peyvên kurdî-ermenî derbas dibin.]

Malpera bi navê “Kurdish Academy of Language” vê kitêbê wekî yekemîn kitêba dersê ya kurdî (textbook) dinirxîne. Heman malper dibêje ku ev kitêb li Erîvanê hatiye weşandin.<sup>738</sup> Ev agahî xelet e, kitêb ne li Erîvanê, li Stembolê çap bûye.

Kitêbeke wekî vê, dîsa bi tîpên ermenî di 1868an de li New Yorkê çap dibe. Navê wê kitêbê *Dasagirkê Kurmancî* ye. “Dasagirk”, tê wateya pirtûka hînkirinê ku bi îngilîzî dibêjin textbook.<sup>739</sup> Ev kitêb ji aliyê American Tract Society ve hatiye weşandin.

### **Nusxe**

1. TBMM, H.C: 198803347, H.X: 198810408 û 198810408. (Ev nusxe du perçe ye.)

2. Nusxeya elektronîk bnr. <http://www.calameo.com/read/ooo504709a62d40c6b5dc>, 10.01.2014.

### **4.4.4. *Labder Lusadu/Çirayê Ronî, Migirdîç Vartabed Dîkranyan, Stembol, Çapxaneya H. Muhendîsyan, 1866, 188 rûpel.***

Migirdîç Vartabed Dîkranyan ku di sala 1860î de ji bo zarokan alfabe û ferhengeke kurdî-ermenî amade kir û carê pirtûkeke dîrokê nivîsiye. Kitêb, ji afirandina cîhanê dest pê dike, behsa Adem û kurên wî, tofana Nûh Nebî dike û heta kralê ermenî Apkar

---

<sup>738</sup> Kurdish Academy of Language, “The first Kurdish Textbook from 1860”, <http://www.kurdishacademy.org/?q=node/766>, 25.07.2013.

<sup>739</sup> Di wergera peyvên ermenî de me ev çavkaniya dijîtal bi kar anî: “Avedikyan Ermenice-Türkçe-İngilizce Sözlük”, <http://www.avedikyan.com/avedikyangiris.aspx?dil=tr>, 14.01.2014.

tê. Wekî navê wê naveroka kitêbê jî du zimanî ye. Her rûpel du stûn e, aliyê çepê ermenkî yê rastî kurdî ye. Ev kitêba dîrokî li tîpên latînî hat veguhastin û ligel lêkolîneke berfireh çap bû.<sup>740</sup>

Dîkranyan destpêka kitêbê de ji giregirên ermeniyen re spas dike ku heqê çapa vê kitêbê dane. Piştî di pêşgotinê de sebebên nivîsandina vê kitêbê îzah dike. Li gorî vê, wî ev kitêb ji fileyên Kurdistanê re nivîsiye ku ew hem dîne xwe hem dîroka milletê xwe bîzînin.<sup>741</sup> Baş e, madem muxatebê vê kitêbê file/ermenî ne û armanca Dîkranyan jî hem dîni hem jî netewî ye, ewçax çima bi kurdî nivîsiye? Bersiva vê Dîkranyan bi xwe dide: “qowmê fillan (...) izmanê bab û bapîrê wa unda kirîne, **bi izmanê kurmancî qisay dikin û nimêj diqin**, muhtacê izmanê xarîban bûne: Ji vê mazîr bilingazî nabî ji qowmîkê ra kî izmanê babê xê îjbîr dike û nizane.”<sup>742</sup> Dîsa li gorî Dîkranyan, ên ku zimanê xwe winda kirine ne tenê filla/ermenî ne; yaqûbî, rûm, katolik, nestûrî “avan jî mînayê wa izmanê babê wan unda kirine û bi izmanê kurmancî xabar didin û dibêjin.”<sup>743</sup>

Metnê esasî yê kitêbê wekî pîrs û bersiv hatiye nivîsandin. Di temamê kitêbê de 156 pîrs û bersiva wan heye. Bo nimûne, pîrsa ewil ev e: “Xudê vê dinê ji bîyê çî tîştî ra xuliqand?”<sup>744</sup> Dîkranyan, wekî mirovekî oldar di bin her pîrsê de bersiva wan dide.

*Çirayê Ronî*, piştî çapa ewil a 1866an, di sala 1868an de dîsa li Stembolê lê vê carê li çapxaneyê Divitçiyên ji nû ve çap dibe.

### **Nusxe**

1. Taksim, H.X: AERM0353.

2. Çapa 1868an: British Library, EAP180/1/3/133.

---

740 Migirdîç Dîkranyan, *Çirayê Ronî*, amd. A. Yiğitalp-A. Gebenlioğlu-İ. Çağatay-S. Bozkurt-T. Baykuşak, weş. Avrupa Birliği Sivil Düşün, İstanbul, 2024.

741 Dîkranyan, *Çirayê Ronî*, r. 85.

742 Dîkranyan, *Çirayê Ronî*, r. 85.

743 Dîkranyan, *Çirayê Ronî*, r. 85.

744 Dîkranyan, *Çirayê Ronî*, r. 91.

**4.4.5. Peymanê No ê Xoîyê me Îsa el Mesîh, wer. J. G. Bliss  
û yên din, Stembol, Çapxaneyê A. H. Boyacıyan, 1872,  
624+3 rûpel.**

Ev Încîla ku ji aliyê ABSê ve hatiye weşandin, bi tîpên ermenkî ye. Li gorî kovara *Kurdish Facts and West-Asian Affairs* wergêrê wê J. G. Bliss, li herêma Levant (Rojhilatê Behra Spî) yek ji xebatkarên ABSê bû.<sup>745</sup> Li gorî Kenneth J. Thomas, ji bilî çar Încîlan -ev jixwe 1857an de hatibûne weşandin- beşên din ên vê Peymana Nû keşayekî ermenî yê bi navê “Tamo” wergerandine.<sup>746</sup> Navê Tamo, di sala 1869an de di gotara Rev. Samuel A. Rhea de wekî “Deacon Tamo” derbas dibe. Li gorî vê, ew li Geverê cîran û alîkarê mîsyoner Rhea ye. Ew ji bilî kurdî, suryankî, tirkî û erebî jî dizane û Rhea ew hînî îbranî û îngilîzî jî kiriye.<sup>747</sup>

Di vê kitêbê de hemû beşên Peymana Nû, wekî her çar Încîl, ‘Emelê Resûlan, Nameyên Şandî cih digirin. Beşên kitêbê bi vî rengî ne:

- Încîla Madteos, r. 3-79
- Încîla Marqos, r. 80-129
- Încîla Luqas, r. 130-213
- Încîla Yanna, r. 214-275
- ‘Emelê Resûlan, r. 276-358
- Name, r. 359-584
- Wehî (Peyxama Yûhenna), r. 585-624

Di sala 2024an de temamê vê pirtûkê li tîpên latînî hat veguhas-tin û ligel lêkolîneke berfireh wekî teza doktorayê hat qebûlîkirin.<sup>748</sup>

---

<sup>745</sup> “No Full Bible in Kurdish Yet”, r. 15.

<sup>746</sup> Thomas, “BIBLE viii. Translations of the Bible into other Modern Iranian Languages”, *Encyclopædia Iranica*, <https://iranicaonline.org/articles/bible-viii>, 28.12.2024.

<sup>747</sup> Rhea, “Brief Grammar and Vocabulary of the Kurdish Language of the Hakari District”, r. 119.

<sup>748</sup> Îlyas Sayım, *Yekemîn Încîla Kurdî Bi Alfabe Ermenî Transkrîpsiyon û Lêkolîn*, Zanîngeha Bîngolê, Bîngol, 2024. Herwiha bnr. Îlyas Sayım -M.

## Nusxe

1. School of Oriental & African Studies (SOAS), H.X (Shelfmark): EB87.421 /135029.
2. Cambridge University, B: University Library: Order in Anderson Room, H.X (Classmark): BSS.509.1.E72.1.
3. Cambridge University, B: University Library: Ancient India & Iran Trust Library, H.X (Classmark): G7B 12.
4. British Library (Londra), B: Asia, Pacific and Africa Collections, St Pancras Reading Rooms, H.X (Shelfmark): 14997.a.2.

### **4.4.6. Yerkaranê bi Kurmancî, Xarpêt, Çapxaneyaya Kollêcê, 1880, 3+108 rûpel.**

“Yerkaran” bi zimanê ermenkî tê wateya kitêba îlahiyan ku bi îngilîzî jê re “hymn-book” tê gotin. Ev kitêba bi tîpên ermenkî jî wergera kurmancî ya hinek dua û îlahiyên xristiyanîyê ye. Tosinê Reşîd ji van îlahiyan heşt heb derbasî tîpên latînî kirine û ew di kitêba Mehmet Bayrak de hatine weşandin.<sup>749</sup> Vê dawiyê temamê îlahiyên di vê kitêbê de bi tîpên latînî hatin weşandin.<sup>750</sup> Li gorî vê, di nav pirtûka *Yerkaranê bi Kurmancî* de kin û dirêj 105 heb îlahiyên menzûm hene.

Me li jor behsa xebata Garzoni ya bi navê *Grammatica E Vocabolario Della Lingua Kurda* kiribû, wî di sala 1787an de “Lord’s Prayer” cara ewil tercumeyî kurdî kiribû ku ev di dîroka wergera kurdî de gaveke girîng bû. Heman dua bi navê “Nimêja Rebbanî” di *Yerkaranê bi Kurmancî* de jî heye: “Ya bavê meyî ezmana/Navê te paqij bibe/Xwendkariya<sup>751</sup> te bê/Bigihîje hemû dinê.”<sup>752</sup>

---

Zahir Ertekin, “Yekemîn Încîla Kurdiya Kurmancî û Hin Taybetmendiyên Wê”, *Bingöl Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü Dergisi*, j.19 (Haziran 2024), 16-31.

749 Bayrak, *Alevi-Bektaşî Edebiyatında Ermeni Âşıklar (Aşuğlar)*, r. 702-705.

750 Mehmet Bayrak, *Kürt Bâtıniliğinde Kutsal Metinler*, weş. Özge, Ankara, 2016, r. 725-759.

751 Xwendkarî/xunkarî ango seltenet.

752 Bayrak, *Kürt Bâtıniliğinde Kutsal Metinler*, r. 739.

“Lord’s Prayer” di xirîstiyaniyê de duayeke sereke ye loma wergerên wê yên kurdî pir in. N. Bailey, li ser wergerên kurmancî yên vê duayê lêkolîneke zimanî kiriye. Wî ji wergera Garzoni heta wergereke sala 2019an 16 wergerên vê duayê dane ber hev.<sup>753</sup> Lê di nav xebata wî de ev wergera *Yerkaranê bi Kurmancî* nîne. Bi rastî ev pirtûka îlahiyan nusxeyên wê kêm peyde dibin û wekî *Türkçe-den Kurd Lisanina Mutercem Ilmihaldir* ji ber ku li Elezîzê/Xarpêtê ango dûrî paytextê çap bûye, xuya ye zêde belav nebûye. Me jî li tu kitêbxaneyan nusxeya wê nedît.

*Yerkaranê bi Kurmancî*, li Xarpêtê li çapxaneya Kolêja Firatê (bi îngilîzî Euphrates College) ya mîsyoneran çap bûye. Vê yekê serekê vê kolejê mîsyoner Crosby Howard Wheeler di bîranînên xwe de piştrast dike.<sup>754</sup> Ev kolêj ji sala 1878an heta Şerê Cîhanê yê Yekem navendeke muhîm a mîsyoneran bû. Hê berî avakirina vê kolejê jî li Xarpêtê “Harpoot Theological Seminary” hebû. Mîsyoner Wheeler –ku paşê wê bibe serekê Euphrates College-, di bîranînên xwe de behsa xebatên “Harpoot Theological Seminary” dike. Li gorî vê, berî sala 1867an, di beşa kurdî ya “Harpoot Evangelical Union” de şeş xwendekarên kurdî-ziman hebûn.<sup>755</sup> Hetta ew rojekê konserekê didin û tê de dua û îlahiyên bi kurdî dibêjin. Li gorî Wheeler wan ev jî zimanê ermenkî wergerandibûn kurdî.<sup>756</sup> Wheeler, di dereke din de jî dibêje ku Evangelical Union ji van şeş mîsyonerên kurdî-ziman du kes paşê şandine Farqînê<sup>757</sup> ku Farqîn dikete nav qada “Koordish mission”.<sup>758</sup> Herwiha ew behsa “Koordish Missionary Society” dike ku me navê komeleyeke wiha ji dereke din nebihîstibû.<sup>759</sup> Ji vê em fêhmî dikin ku Xarpêt navend e û kesên ku li vir perwerde dibin li

---

753 N. Bailey, “The Lord’s Prayer in Northern Kurdish: Lexical and Orthographic Journeys Since 1787”, *Rodnoy Yazık*, j.2 (2021), r. 154-218.

754 C. H. Wheeler, *Odds And Ends: Or Gleanings From Missionary Life*, Boston, Congregational Sunday-School and Publishing Society, 1888, 129-130.

755 Wheeler, *Ten Years on The Euphrates*, r. 181.

756 Wheeler, *Ten Years on The Euphrates*, r. 246-247.

757 Wheeler, *Ten Years on The Euphrates*, r. 55.

758 Wheeler, *Odds And Ends: Or Gleanings From Missionary Life*, r. 129.

759 Wheeler, *Odds And Ends: Or Gleanings From Missionary Life*, r. 144.

gorî hewcedariyê diçine şaxên din ên mîsyoneriyê. Bi vî rengî ew li bajar û navçeyên din ên kurdan jî xwe bi rêxistin dikan. Dîsa li gorî vê şahîdiya dîrokî em dikarin bibêjin ku ev îlahiyên *Yerkaranê bi Kurmancî* wan şeş xwendekaran ji zimanê ermenkî tercume kirine.

Piştî belavbûna Osmanî, di salên 1934 û 1938an de li Helebê îlahiyên xristiyanîyê yên bi kurdî dîsa bi herfên ermenkî du caran çap dibin. Li gorî nimûneyên ji van çapan<sup>760</sup> em dikarin bibêjin ku wan bingeha xwe ji *Yerkaranê bi Kurmancî* ya sala 1880yî wergirtiye. Balkêş e, Nûreddîn Zaza jî di bîranînên xwe de behsa ermeniyên Qamişloyê dike ku pirtûkên dînî yên rahibên wan bi kurdiya tîpên ermenkî bûn.<sup>761</sup>

#### **4.4.7. Încîla Rabbê me Hisos Kristos ku Madteos Nvîsî, Sembol, Çapxaneyê A. H. Boyaciyan, 1891, 148 rûpel.**

Ev Încîla Metta ku ji aliyê ABSê ve hatiye weşandin, bi tîpên ermenkî ye. Li ser bergê wê, bi tirkiya osmanî dinivîse ku ew bi destûra Wezareta Perwerdeyê (Mearîf) hatiye weşandin û mesrefên wê yên çapê ji aliyê Civata Kitêba Pîroz a Amerîkî ve hatiye dayîn: “Ma’arif-i ‘Umûmiye Nezaret-i Celîlesinin 27 Rebî’ulevvel 309 ve 19 Teşrînievvel 307 tarîhli ve 693 numrolu ruhsatnamesiyle neşr olunmuşdur”.

Ev wergerên Încîlê ku heta niha me behskirin hemû bi tîpên ermenkî ne. Lê derbaskirina herfên ‘erebî ya van Încîlan jî di hişê mîsyoneran de hebû. Bo nimûne, Alpheus N. Andrus hê di sala 1894an de hewl dida vê Încîla Metta derbasî herfên ‘erebî bike.<sup>762</sup>

#### **Nusxe**

1. Taksim, H.X: AERM1566.
2. Cambridge University, B: University Library: Order in Anderson Room, H.X (Classmark): BSS.509.1.E91.1; BSS.509.1.E91.2.

---

760 Sayım, *Yekemîn Încîla Kurdî Bi Alfabe Ya Ermenî Transkripsiyon û Lêkolîn*, r. 54-57.

761 Zaza, *Bir Kürt Olarak Yaşamım*, r. 264.

762 “Eastern Turkey Mission”, *The Missionary Herald*, Vol. 90, No.8 (August 1894), r. 334.

**4.4.8. Încîla Rabbê me Hisos Kristos ku Marqos Nvîsî, Stembol, Çapxaneya A. H. Boyaciyani, 1911, 87 rûpel.**

**4.4.9. Încîla Rabbê me Hisos Kristos ku Luqas Nvîsî, Stembol, Çapxaneya A. H. Boyaciyani, 1911, 148 rûpel.**

**4.4.10. Încîla Rabbê me Hisos Kristos ku Yanna Nvîsî, Stembol, Çapxaneya A. H. Boyaciyani, 1911, 109 rûpel.**

**4.4.11. ‘Emelê Resûlan, Stembol, Çapxaneya A. H. Boyaciyani, 1911, 138 rûpel.**

ABSê, piştî ku Încîla Madteos weşand bi bîst salî vê carê her sê Încîlên din û beşa ‘Emelê Resûlan li Stembolê û dîsa tîpên ermenkî çap dike. Li gorî Eric M. Nort wergêrê van Încîlan sê kesên bi navê “Amirkhanian, Der Ghazarian û Abalahadian” in.<sup>763</sup> Kovara *Kurdish Facts and West-Asian Affairs* jî heman navan dubare dike û dibêje ev her sê kes jî ermenî ne.<sup>764</sup>

### **Nusxe**

1. Taksim, H.X: AERM1566/01, AERM1566/02, AERM1566/03.
2. Kitêbxaneya Zanîngeha Cambridge, B: Order in Anderson Room, H.X: BSS.509.1.F11.1, BSS.509.1.F11.2, BSS.509.1.F11.3, BSS.509.1.F11.4.

**4.4.12. Încîla ‘Îsayê Mesîh li ser Nivîsîna Metta, Stembol, Çapxaneya Agop Matyosyan, 1922, 104 rûpel.**

**4.4.13. Încîla ‘Îsayê Mesîh li ser Nivîsîna Markus, Stembol, Çapxaneya Agop Matyosyan, 1923, 106-167 rûpel.**

**4.4.14. Încîla ‘Îsayê Mesîh li ser Nivîsîna Luqa, Stembol, Çapxaneya Agop Matyosyan, 1923, 169-271 rûpel.**

Încîlên ku heta niha me rêz kiribûn tev bi tîpên ermenkî bûn, lê ev hersêyan dawî bi herfên ‘erebî ne. Li ser bergê her sêyan jî heman agahî dinivîse:

---

<sup>763</sup> Eric M. North, *The Book of a Thousand Tongues*, Harper & brothers Publishers, New York-London, 1938, r. 200.

<sup>764</sup> “No Full Bible in Kurdish Yet”, r. 15.

“Ji ‘ezmanê eslîy yûnanî hatiye tercumekirin  
 Ji terefî Civata Kutuba Muqeddesî Emerîkayî  
 Di çapxaneyê Agob Matyosyan da hatiye çapkirin  
 Di Istanbûl da”

“Civata Kutuba Muqeddesî Emerîkayî” ABS ye. Sala çapkirina wan cuda jî be jî jimara rûpelan tê fêmkirin ku ev Încîl berdewamên hev in. Lê Încîlek jî vê rêzê kême: Încîla Yuhenna.

Li gorî Eric M. Nort, ê ku ev her sê Încîl derbasî herfên ‘erebî kirine (transliterated) Henry H. Riggs e.<sup>765</sup> Kovara *Kurdish Facts and West-Asian Affairs* jî dibêje Rahib Henry H. Riggs di sala 1922an de *Încîla Metta* û *Markus*, piştî salekê jî *Încîla Luqa* amade kiriye.<sup>766</sup> Di kitêba bîranînê ya American Board de kurtejiyaneke Riggs heye û di wir de jî tê gotin ku Riggs di sala 1920an de jî aliyê hikûmetê ve bê doz û mehkeme ji Xarpêtê tê qewirandin. Ew tê Stembolê û bi arîkariya kurdekî zana û baş perwerdebûyî Încîlan werdigerîne kurdiya bi herfên ‘erebî.<sup>767</sup>

Ya rastî ne li ser berg ne jî di naveroka kitêbê de agahiyek heye, ka kê ew wergerandine. Lê gava em li jiyana Henry H. Riggs dinêrin ev ihtimal bi hêz dibe: Riggs (1875-1943), ji malbateke mîsyoner a Amerîkî ye. Li Sêwasê hatiye dinê, li Minnesotayê perwerde dîtiye. Di navbera salên 1907-1910an de li Xarpêtê serektiya Koleja Firatê kiriye. Di navbera salên 1912-1917an de dîsa li Xarpêtê karê mîsyoneriyê meşandiye.<sup>768</sup> Di sala 1911an de li ser rewşa dînî ya herêma Dêrsimê raporek amade kiriye û ev di kovara *The Missionary Review of the World* de hatiye weşandin.<sup>769</sup>

765 North, *The Book of a Thousand Tongues*, r. 200.

766 “No Full Bible in Kurdish Yet”, r. 15. Xuya ye di nîşandina salan de xeletiyek heye, lewra ya rastî *Încîla Metta* 1922an yên *Markus* û *Luqa* 1923an de çap bûne.

767 “Memorial records for Henry H. Riggs”, <http://www.dlir.org/archive/orc-exhibit/items/show/collection/12/id/17412>, 18.02.2015.

768 Cengiz Özakıncı, “Sivas’lı Misyoner Henry H. Riggs’in 1911Dersim Raporu”, *Bütün Dünya*, j.2012/2, r. 71-72.

769 Ji bo wergera tirkî ya vê raporê bnr. Mehmet Bayrak, *Alevilik ve Kürtler (İnceleme-Araştırma-Belgeler)*, weş. Öz-Ge, Wuppertal, 1997, r. 364-371.

Ji kurtejiyana Riggs tê fêmkirin ku ew bi kurdan re têkildar e û bi kurdî jî dizane, mimkun e ku di wergera van Încîlan de jî kede-ke mezin dabe. Lê Kenneth J. Thomas, ji bilî Riggs, navê Alpheus N. Andrus jî dinivîse. Li gorî wî, American Boards yanî ABCFS van herdu kesan dixebitîne û di sala 1922an de *Încîla Metta* û *Markus*, di sala 1923an de jî *Încîla Luqa* çap dike.<sup>770</sup>

Kurtejiyana Alpheus N. Andrus piştî mirina wî, tevî wêneyekî wî di kovara *The Missionary Herald* de tê weşandin. Li gorî vê kurtejiyanê, Andrus di sala 1843an de li New Yorkê hatiye dinyayê, 50 salî li Tirkîyeyê mîsyonerî jî ABCFSê re kiriye. Wî dixwest ku xebatên xwe yên mîsyoneriyê bi wergerandina kurdî ya Peymana Nû bi tac bike. Ew heta beşa 5an a *Book of Revelation*ê (Peyxama Yûhenna, bi yûnanî Apocalypse) çê jî dike lê 'emrê wî têrî qedandina wê nake û ew di 12ê Çileyê 1919an de li cihê ku lê bûbû wefat dike. Li gorî nivîskarê kurtejiyanê ev wergera kurdî ya bi herfên 'erebî, ji bo xilasbûna nijadê kurd, di dinyayê de belgeya herî girîng e û niha kop-yeya wê wekî du beşan li Stembolê ye.<sup>771</sup>

Di kitêba bîranînê ya American Board de jî kurtejiyaneke Andrus heye û di wir de jî tê gotin ku ji destpêka jiyana wî ya mîsyoneriyê ve kurd bala Andrus dikişînin; kêfa wî dihat ku biçe herêma Ridwan û Sêrtê û ligel wan biaxive. Wî di sala 1894an de dest bi wergera/translîterasyona kurdî ya Peymana Nû ya bi herfên 'erebî kiriye û gava mir di beşa 5an a *Revelation*ê de bû.<sup>772</sup>

Andrus û xanima wî Louisa di nîsana 1868an de têne Tirkîyeyê. Andrus wê gavê 24 salî bû. Piştî ku şeş meha li ser 'erebî xebitî, bi salane 1000 dolar meaşt li mîsyona Mêrdînê tê wezîfedarkirin. Ew li Mekteba Îlahiyatê ya Mêrdînê wezîfe dike, li gundan digere û di sala 1877an de dibe serekê mîsyonê. 1881ê de li Midyadê jî

770 Thomas, "BIBLE viii. Translations of the Bible into other Modern Iranian Languages", *Encyclopædia Iranica*.

771 R. Stanley M. Emrich, "Dr. Andrus, of Mardin", *The Missionary Herald*, Vol. 115, No.3 (March 1919), r. 107-108.

772 "Memorial records for Alphaeus N. Andrus", <http://www.dliir.org/archive/orc-exhibit/items/show/collection/12/id/16661>, 18.02.2015.

navendekê vedikin û Andrus gelek caran diçe wir û çend mehan lê dimîne. Andrus ji bilî ‘erebî hînî kurdî jî dibe; hem bi herfên ‘erebî hem jî bi tîpên ermenkî li ser wergera kurdî ya Încîlê dixebite. Dema Şerê Cîhanê di sala 1915an de Andrus pêşî ji Mêrdînê sirgûnî Sêwasê, paşê jî bi sebebên ‘eskerî sirgûnî Stembolê dibe. Piştî ku Amerîka li Osmanî û Elmanyayê şer îlan dike, di sala 1917an de ji Stembolê vedigere welatê xwe Amerîkayê û li wir di sala 1919an de wefat dike. Andrus piştî ku diçe Amerîkayê ji bo sêwiyên ermenî arîkariyê berhev dike, gramereke kurdî amade dike; niyeta wî piştî şer vegerîna Mêrdînê ye lê ‘emrê wî têr nake.<sup>773</sup>

Eger Andrus di karê xwe yê wergerê de gihabe heta *Book of Revelation*ê jixwe ji sedî nodê Peymana Nû qedandiye. Îhtimaleke mezin piştî mirina wî Henry H. Riggs li Stembolê li ser destxetên wî dixebite û ev her sê Încîl çap dibin.

Pirseke din jî, gelo Andrus û Riggs ev her sê Încîl ji nû ve wergerandine kurdî yan wergerên ku berê bi tîpên ermenkî hatibûne weşandin derbasî herfên ‘erebî kirin? Li jorê me dît, hin çavkanî ji bo vê xebatê translation (werger), hin jî transliteration (veguhas-tina herfan) dibêjin. Lê di kurtejiyana Andrus a di kitêba bîranînê ya American Board de “transliteration” tê gotin û di nîşeyê de tê diyarkirin ku wergera wê ya bi tîpên ermenkî ji aliyê “Bedros Amiranian, Bedros Der Ghazerian û Kavmê Ablahadian” ve hatiye kirin. Ev nav aşîna ne, çimkî ew wergerên Peymana Nû ya 1872an a bi tîpên ermenkî ne. Naxwe em dikarin bibêjin ku Andrus ew jî tîpên ermenkî derbasî yên ‘erebî kirine, Riggs jî xebata wî ya nîvcomayî berdewam kiriye û ev her sê Încîl hatine weşandin.

Gelo çima beşên kêr ên wergerê nehatin temamkirin û weşandin? Ya rastî dema ku werger hatine weşandin pir nazik e; êdî

---

<sup>773</sup> Suavi Aydın û nd., *Mardin Aşiret-Cemaat-Devlet*, ç.2, weş. Tarih Vakfı, İstanbul, 2001, r. 282, 284; İbrahim Özcoşar, *19. Yüzyılda Mardin Süryanileri*, weş. Beyan, İstanbul, 2008, r. 403-404; *Vinton Book Copy Volume III Near East*, The Congregational Library, Boston, bêdîrok, r. 82. Lînk: <https://ia600508.us.archive.org/18/items/vintonbookarmeni03vint/vintonbookarmeni03vint.pdf>, 07.01.2014. Li gorî *Vinton Book Copy Volume III Near East*, sala derketina wî ya ji Mêrdînê 1916 e.

Dewleta Osmanî bi temamî dimire û rejîma nû li Tirkîyeyê kontrolê digire destê xwe. Îhtimaleke zeîf e ku civatên mîsyoneran piştî 1923yan karibin weke dema Osmanî rehet kar bikin. Ya din jî Riggs, êdî ne li Stembolê ye, ew di navbera salên 1923-1940î de li Bêrûdê wezîfedar e.<sup>774</sup>

Thomas dibêje ku ev her sê Încîl ABCFMê çap kirine, lê li ser bergan navê ABSê dinivîse. Helbet ABS, ABCFM û BFBS jî hevdu cuda jî bin, ji ber ku armanca wan yek e, bi hev ve têkildar in.

### **Nusxe**

1. Kitêbxaneya Zanîngeha Cambridge, B: Order in Anderson Room, H.X: BSS.509.1.F22.1, BSS.509.1.F22.2, BSS.509.1.F22.3.

2. Enstîtuya Kurdî ya Parîsê, PDFya van her sê Încîlan di Pirtûkxaneya xwe ya dijîtal de weşand. Lînk: <http://bnk.institutkurde.org/catalogue/detail.php?pirtuk=1643>.

### **4.5. Kurtenêrînek li Ser Zimanê Wergerên Încîlê**

Ev wergerên Încîlê ji bo ziman û ferhenga kurdî malzemeyên dewlemend in û van salên dawî êdî ew dibine mijara xebatên akademîk.<sup>775</sup> Gelo ev werger çiqas serkeftî bûn, ziman rast bi kar dianîn an na, ev jî pirseke muhîm e. Marcin Rzepka gava behsa Peymana Nû ya 1872an dike, dibêje ku ew hate rexnekirin. Sedema yekem a rexneyê ew bû ku ew bi tîpên ermenî hatibû nivîsandin, a duyem jî ji diyalektên cihê gelek bêjeyên tevlihev di nava xwe de dihiwand ku ew jî ji bo gelek xwendevanan bêkêr bûn. Herwiha Rzepka lê zêde dike ku tê de gelek têgehên dînî ji zimanê ‘erebî hatibûne wergirtin; herwiha gelek peyvên rojane jî bi tirkî bûn, bo nimûne çarşi, alîşverîş, bayram.<sup>776</sup>

---

<sup>774</sup> Cengiz Özakıncı, “Sivas’lı Misyoner Henry H. Riggs’in 1911 Dersim Raporu”, r. 72.

<sup>775</sup> Bnr. Sayım, *Yekemîn Încîla Kurdî Bi Alfabe ya Ermenî Transkrîpsiyon û Lêkolîn*; Sayım -Ertekin, “Yekemîn Încîla Kurdiya Kurmancî û Hin Taybetmendiyên Wê”, r. 16-31.

<sup>776</sup> Rzepka, “Protestants among Kurds and some problems of translation of the Bible into Kurdish in the 19th century”, r. 92.

Ji ber ku di kurdî de têgehên dînî piranî îslamî ne, ew jî bi ‘erebî ne, asayî ye ku wergêran ew bi kar anîbin. Bo nimûne, di *Yerkaranê Kurmancî* de di nav îlahiyan de peyvên wekî “şerî‘et, Cibrahiîl” derbas dibin.<sup>777</sup> Herwiha peyvên wekî “nimêj, xwedê” jî derbas dibin ku herçend ev têgehên dînî jî bin xwerû kurdî ne:

Wextê nimêjê, wextê nimêjê  
Ku ji dinyayê min dike cihê,  
Gava nêzî textê Bav bibim  
Hewcetiya xwe kîvş bikim<sup>778</sup>

Ji bo peyvên tirkî jî, rast e, gelek peyv û qertafên tirkî derbasî kurdî bûne lê ji wan sê peyvên ku Rzepka nimûne daye “çarşi” ne bi tirkî ye, ew peyveke kurdî ye ku di farisî de jî heye û derbasî zimanê tirkî bûye. Peyva “alışveriş” û “bayram” jî tercîh an jî qelsiya wergêr e, ji ber ku di nav gel de kurdiya van peyvyan heye. Dema em metnê Peymana Nû ya sala 1872yan dinêrin, em dibînin ku bandora tirkî zêdetir di lêkerên hevedudanî de xwe dide der, wekî “saqin bibin”<sup>779</sup>, “başlamış kir”<sup>780</sup> û hwd.

Hewce ye em ji bîr nekin ku wergêrên van Încîlan ne profesyonel in: Ew an ermenî û suryaniyên kurdîzan in an jî mîsyoner in ku li herêmên kurdan kar kirine û hînî kurdî bûne. Ji ber ku kurdî ne zimanê wan ê zikmakî ye û wan perwerdeyeke bi kurdî jî nedîtiye pêkan e ku kurdiya wan qels be. Herwiha pîrbûna devok û zaravayên kurdî jî divê neyê jibîrkin. Ev wergêr encax dikarin devoka herêma xwe bizanibin ku ev yek di wergeran de eşkere xuya dike. Bo nimûne, Peymana Nû ya sala 1872yan bi devoka Serhedê ye, peyvên dînî/termînolojîk pir in û têgehiştina wan zehmet e; bi giştî ew ne metnekî herikbar e lê ji aliyê peyvên resen ve hêja ye.<sup>781</sup>

---

777 Bayrak, *Kürt Bâtıniliğinde Kutsal Metinler*, r. 750-751.

778 Bayrak, *Kürt Bâtıniliğinde Kutsal Metinler*, r. 739.

779 Sayım, *Yekemîn Încîla Kurdî Bi Alfabe ya Ermenî Transkrîpsiyon û Lêkolîn*, r. 78.

780 Sayım, hb., r. 86.

781 Sayım, hb., r. 446.

Ev kêmasiyên jor zêdetir di metnên pexşan de derdikevine pêşiya me. Dema em li nimûneyên menzûm dinêrin em kurdiyeke zelal û herikbar dibînin. Bo nimûne, ji *Yerkaranê bi Kurmancî*, du bendên teswîra dojah û bihuştê wiha ne:

Agir dojê qet kê mabe  
Kezeb dişewite hînik nabe  
Hîvî mecal têne birîn  
Betal nabe şîn û girîn  
...  
Bihuşt çi cîkî şîrîn e  
Veke kiteb û bixûîne  
Delalê dil hev dibînin  
Tehlî tengî qet nabînin<sup>782</sup>

Di maweya vê xebatê de wergerên dawî yên Încîlan di 1922-1923yan de bi herfên ‘erebî çap bûne. Ji ber ku ew ên dawî ne, li pêşiya xwe gelek nimûne dîtine, hewce ye wergerên herî kemilî ew bin. Di jêgirtina jêr de, diristî û herikbariya zimên vê kemilînê nîşan dide:

“Û welidîna Îsa Mesîh bi vî terzî bû: hingî ku diya wî Meryem ji Yûsif re nişankirî bû, berî ku bîne ba hev, ji Rûhê Paqij bi hemle xuya bû. Û mêrê wê Yûsif çunku merivekî salih bû, nexwest wê bihetikîne, fikirî ku bi star wê berde. Lêkin çaxê ku ewî ev tişt difikirî, eve melekê Reb di xewnê jê ra zahir bû û got, ey Yûsif kurê Dawid metirs ku jina xoy Meryem ji xo ra bistînî. Çima ku yê di hindûrê wê da welidî ji Rûhê Paqij e. Û ewê kurekî bîne, û navê wî Îsa deynî, çunku ew wê cemaeta xo ji gunahêd wan xilas bike. (Încîla Metta, Serî Ewil, 18-22)”<sup>783</sup>

---

782 Bayrak, *Alevî-Bektaşî Edebiyatında Ermeni Âşıklar (Aşuğlar)*, r. 704; Bayrak, *Kürt Bâtınîliğinde Kutsal Metinler*, r. 752-753.

783 *İncîla İsayê Mesîh li ser Nivîsîna Metta*, Çapxana Agos Matyosyan, Istanbul, 1922, r. 2.

## ENCAM

Di vê xebatê de me xîret kir ku em li ser 42 kitêbên kurdî\* yên di dewra Osmaniyan de çap bûne lêkolînekê bikin. Ji van 3 heb ne li ber destan bûn, em negihiştine wan: *Qewaîdî Lisanî Kurdî*, *Mewlûd-namey Batî*, *Gewherî Yegane*. Yên din tev metnên wan li ber dest in, li gorî vê menzereyê em dikarin van şiroveyan bikin:

Weşanên kurdî yên di dema Osmanî de, çî kitêb çî jî kovar û rojname, qet ne hindik in û ne mimkun e ku biçûk bêne dîtin. Di vê dewrê de çapemeniyeke kurdî ya pirzimanî û pirzaravayî heye. Vê çapemeniyê enerjiyeke nû daye edebiyata kurdî; hem a qedîm parastiyê û belav kiriye hem jî ya nû(jen) afirandiyê. Kitêbên ku hatine çapkirin jî bi vî rengî ne; ji aliyekî ve klasîkên kurdî (*Mem û Zîn*, *Dîwana Melayê Cizîrî*, *Mewlûda Bateyî*, *Nehcu'l-Enam*, *'Eqîda Îmanê*) li çapê dikevin, ji aliye din ve cureyên nû (wekî şanoya *Memê Alan*), kitêbên nû yên werger (wekî *Türkçeden Kurd Lisanina Mutercem Ilmihaldîr*) û telîf (*Gaziya Welat*, *'Eqîda Kurdan*, *Dersa Dîn*) derdikevin. Xebatên li ser zimanê kurdî (wekî *Hedîyyetu'l-Hemîdiyye fî'l-Luxeti'l-Kurdiyye*, *Elîfbayê Kurmancî*, *Muqeddîmetu'l-Îrfan*) û berhemên ku heta niha di nav derdoreke taybet de mabûn jî (wekî *Dîwana Mewlana Xalid û Xulaseî 'Eqâid*) hewce ye em ji bîr nekin.

---

\* Di nav van 42 kitêbî de *Muqeddîmetu'l-Îrfana* ku zimanê wê tirkîya osmanî ye jî cih digire. Sedema tevlikirina wê ya nav vê envanterê me di beşa destpêkê de gotibû.

Ev envanter, weşanên mîsyoneran ne tê de, keda netewperwerên kurdî ye. Bi taybetî qonaxa Stembolê afirînerê mezin ê vê kulliyatê ye. Qet ne tesaduf e ku du weşangerên mezin ên kurdî, Kurdîzade Ehmed Ramîz û Mehmed Şefîq Arwasî, di heman demê de endamên komeleyên kurdî bûn. Ev yek nîşanî me dide ku pêşketina nasnameya kurdî û ya weşangeriya kurdî girêdayî hev in û herdu ji heman kaniyê avê vedixwin: Kurdayetî. Avakirina komeleyan, derxistina kovar û rojnameyan, çapkirina kitêban ji hev ne cuda ne; ew bi hev ve girêdayî ne û piştgirî didine hev ku dînamoya wan jî fikra kurdîtiyê bû.

Gava em li bajaran dimeyzênin, navenda weşangeriya kurdî Stembol e. Sedemeke vê teknîk e; lewre derfetên çapkirinê herî zêde li Stembolê hebûn. Heta dawîya Dewleta Osmanî jî kurd li welatê xwe nebûne xwedî çapxaneyêke rêkûpêk, çapxaneyên heyî jî di bin kontrola dewletê de bûn. Çend mînakên wekî *Türkçeden Kurd Lisanina Mutercem Ilmihaldîr* (Elazîz), *Mewlûda kirdî* (Diyarbakir) em nehesibînin kurdan zêde xêrek ji van çapxaneyên fermî nedîtîye. Sedema din a vê rewşê jî tevgera kurdî bû. Lewre di destpêka sedsalê 20an de, bi taybetî piştî Meşrûtiyeta Duyem, navenda komeleyên kulturî, siyasî û netewperwerî yên kurdî yan Stembol bû yan jî wekî Diyarbakir Kurd Te‘alî Cem‘iyyetiyê bi wir ve têkildar bûn.

Di destpêka weşangeriya kurdî de navendeke balkêş jî Qahîre ye. Rojnameya kurdî ya ewil *Kurdistân* û *Mewlûda* kurmançî ya ku Ehmed Ramîz weşandî, li vir çap bûne. Sedema wê eşkere ye: Qahîre ji navendê dûr bû, destê rayedarên Dewleta Osmanî zêde nedigihîşte wê derê, ji ber vê jî navenda muxalifan û weşanên wan bû.

Ji bilî Stembol û Qahîreyê, Diyarbakir û Elezîz (Xarpêt) jî du navendên girîng ên weşangeriya kitêbên kurdî ne. Ev herdu bajar nîşanî me didin ku hejmareke hindik jî be di vê serdemê de weşangeriya kurdî xwe gihandîye Kurdistanê; li van herdu bajaran herî kêr 4 kitêbên kurdî çap bûne.

Xuya ye weşangeriya (kitêbên) kurdî bi rewşa kurdan û polîtîkaya Osmanî re jî têkildar e. Gava em kitêbên weşandî li gorî salan tesnîf dikin, dibînin ku ji 1844an heta 1897an tenê 4 kitêb hatine weşandin. Evên ku hatine weşandin jî yan ji aliyê sazîyên fermî

ve yan jî bi destê rayedarên dewletê ve hatine weşandin. Lewre di vê dewrê de rêxistineke xurt a kurdan nîne, herwiha şert û mercên siyasî jî (rejîma ‘Ebdulhemîdê Duyem) ne musaîd bûn. Lê piştî ku elîtên kurdan di nav tevgerên muxalîfên ‘Ebdulhemîdê Duyem de cih digirin, komeleyên xwe ava dikin, hejmar zêdetir dibe: Ji 1898an heta 1913an 8 kitêb têne weşandin. Tiştê ji hejmarê girîngtir ew e ku nivîskar û weşangerên van kitêban êdî netewperwerên kurd in: Wekî Xelîl Xeyalî û Kurdîzade Ehmed Ramîz. Di pêvajoya şerê cîhanê de, ku ji bo temamê Osmanî qeyraneke mezin bû û kurdan jî hem li herêma xwe hem jî li navenda Osmanî û cebheyên şer ev krîz têra xwe dijiyan û jê zirar didîtin, tenê 3 heb kitêb çap bûne. Geşedana esil a weşangeriya kitêbên kurdî dema piştî şer e. Di vê dewrê de ji nû ve netewperwerên kurd komeleyên xwe ava dikin û êdî bi dengekî bilindtir hebûna xwe diqîrin û mafên xwe yên siyasî dixwazin. Ev pêşketina tevgera kurdî bandora xwe li weşangeriya kitêban jî dike: Tenê di sala 1918an de 3, di navbera 1918-1919an de 6, di navbera 1918-1922an de 12 kitêbên kurdî çap dibin.\*

Kitêbên kurdî yên di maweya vê xebatê de bi du alfabeyên cuda hatine weşandin: 31 heb bi elîfbaya ‘erebî û 11 heb bi alfabeya ermenî ne. Bi elîfbaya ‘erebî weşana kitêbên kurdî tişteki asayî ye, çimkî kurdan ji dema ku tevli daîreya îslamîyetê bûne ve kulliyata xwe ya nivîskî bi van herfan afirandiye. Lê alfabeya ermenî mudaxeleyeke ji derveyî civaka kurdan e. Lewre kitêbên bi herfên ermenî piranî wergerên Încîlê ne û ji aliyê civatên mîsyoneran ve hatine weşandin. Armanca mîsyonerên protestan, ew bû ku ermeniyên bînine ser mezhebê xwe. Sedema kurdîbûna van wergeran jî ew bû ku ermeniyên hin herêmên kurdan ji bilî kurdî zimanekî din nedizani.

Ji Baba Tahirê ‘Uryan heta Şêxê Meczûb nimûneyên edebiyata kurdî ya klasîk di nav kevneşopîya Rojhilatê de piranî menzûm/helbestkî ne. Di sedsala 19 û 20an de jî serdestiya helbestê ya li hember pexşanê berdewam e. Lê rojnamegeriya kurdî di pêşketina pexşana kurdî de rêyeke nû û berfireh vekir. Dîsa di dewra modern de ji ber ko-var û rojnameyan qedrê pexşanê zêde bû. Balkêş e, gava em li kitêbên

---

\* Weşanên kurdî yên mîsyoneran ne di nav van hejmaran de ne.

maweya vê xebatê dimeyzênin rêjeya pexşanê ji ya helbestê bilindtir e: ji 42 kitêban 23 pexşan (% 55), 19 helbest (% 45) e. Lê di bilindbûna vê rêjeyê de bandora kitêbên ku mîsyoneran weşandine teqez e. Lewre ji 14 kitêbên ku mîsyoneran weşandî 13 heb (% 92,8) pexşan in. Beramberî vê ji 28 kitêbên ku rayedarên dewletê û netewperwerên kurdan weşandine 18 heb (% 64,3) helbest, 10 heb (% 35,7) pexşan in. Li vir jî di bilindbûna rêjeya helbestê de bandora edebiyata kurdî ya klasîk teqez e. Lewre gava em dimeyzênin ji van 18 heb kitêbên helbestê 14 heb (% 77,7) nimûneyên edebiyata kurdî ya klasîk in.

Em dikarin bibêjin ku helbesta kurdî di vê dewrê de jî sahib-rewac e lê hejmara pexşana kurdî jî ne kêm e. Bi taybetî pexşanên ‘Ebdurehîm Rehmî (şanoya *Memê Alan* û *Dersa Dîn*) serkeftî ne û nimûneyên girîng in. Dîsa *Çirayê Ronî* (1866) û *Turkçeden Kurd Lisanina Mutercem Ilmihaldîr* (1891) hem bi kevinbûna xwe hem jî bi duzimaniya xwe balê dikişînin.

Eger em van kitêban li gorî cureyên wan dabeş bikin, îstatîstîkeke wiha derdikeve: Wêje 16 kitêb (% 38.09), werger 13 kitêb (% 30.95), ziman 7 kitêb (% 16.66), dînî 4 kitêb (% 09.52), dîrok 2 kitêb (% 4.76). Di vir de ya herî balkêş rêjeya wergerê ye. Sedema bilindbûna wê dîsa weşanên mîsyoneran e. Lewre ji 13 kitêbên wergerê 12 heb ên mîsyoneran in ku wergerên Încîlê ne. Wergera din jî *Turkçeden Kurd Lisanina Mutercem Ilmihaldîr* e ku wergera îlmîhaleke îslamî ye. Yanî her 13 kitêbên wergerê jî yên dînî ne. Di vê dewrê de mînakên wê di kovar û rojnameyên de xuya bikin jî bi kurdî kitêbeke wergera wêjeyî nehatiye çapkirin.

16 kitêbên wêjeyî piranî helbest in (mewlûd û dîwan) lê nimûneya şano (*Memê Alan*) û antolojiyê (*Encumenî Edîbanî Kurd*) jî heye. *Nehcu’l-Enama* Mela Xelîl, *‘Eqîda Îmanê* ya Ehmedê Xanî û *‘Eqîda Kurdan* a ‘Ebdurehîm Rehmî, aliyê wan ê wêjeyî hebe jî ji ber ku taybetiya wan a dînî xurttir e me ew daxilî nav ên wêjeyê nekirin.

Di nav 7 kitêbên zimên de nimûneyên alfabe (*Elîfbayê Kurmancî*), ferheng (*El-Hedîyyetu’l-Hemîdiyye fî’l-Luxeti’l-Kurdiyye*) û rêzimanê (*Qewaîdî Lisanî Kurdî*, *Muqeddîmetu’l-Îrfan*) hene. Ji van a cuda *Ayyenaran Alifbe Cuz Kurmancî* û *Ermenî* ye, ew bi tîpên ermenkî ye, ên din tev bi herfên ‘erebî ne.

Di kategoriya dîrokê de tenê du kitêb hene: 1. *Gewherî Yegane* ku wenda ye û di vê xebatê de me encax hebûna wê piştrast kir û nave-roka wê rave kir. Tenê vê jî nîşan da ku ew çiqas kitêbeke girîng e. 2. *Çirayê Ronî* ya Migirdîç Dîkranyan ku dîroka pêxemberan li gorî xirîstiyaniyê ligel dîroka ermeniyen vedibêje. Mirov dikare *Çirayê Ronî* dînî jî hesab bike ji ber ku nivîskarê wê keşa ye û motîfasyona wî ya nivîsandina vê kitêbê jî xizmeta dînê xwe ye. Lê armanca Dîkranyan bi qasî dînî, netewî ye jî loma ligel dîroka pêxemberan behsa qralên ermeniyen jî dike ku cimaeta wî dîroka miletê xwe jî bizanin.

Benedict Anderson, di avabûna cemaetên xeyalî/nasnameyên netewî de kapîtalîzmê dideyne navendê. Çapxane û bihêzbûna zimanên gelan, bi piştevaniya kapîtalîzmê di vê avabûnê de roleke mezin digirin. Naxwe gava mijar hate ser kurdan hewce ye em pêşî bipirsin: Gelo di sedsala 19 û 20an de sermayedarên kurdan hebûn ku weşangeriya kurdî dest pê kir û di demeke kurt de giha astekê?

Bersiva pîrsa jor dîsa wê pîrsek be: Gelekî ku ne serbixwe be, desthilatdariyeke wî, rêveberiyêke wî, burjuvaziya wî, dibistanên modern ên bi zimanê wî nebin, sînorên wî, hundirê wî û hemû dewlemendiyan wî di bin destê dewletên biyanî û emperyal de bin, pîraniya xelkê wî gundî û hetta beşeke muhîm koçer bin, rêjeya xwendeyan kêr be, yê bajarî ku xwende ne û bi sin'et û bazirganiyê re 'eleqedar in jî pîranî ji nasnameya xwe ya netewî dûr ketibin çawa dikare derbasî merheleyêke wisa bibe? Bi zimanê miletekî bi vî rengî kîjan kapîtalîst ji bo qezenckirina pereyan wê kitêban çap bike?

Delîleke şênber a ku rewşa weşangeriya kurdî ya wê demê nîşan dide ev e: Weşanger erê lê weşanxaneyên kurdî nînin. Piştî Şerê Cihanê yê Yekem KTMNCê tê avakirin û ew tenê dikare *Mem û Zînê* çap bike. Hewce ye em dîsa bînine bîra xwe ku weşandina *Mem û Zînê* jî ne bi armancên ticarî lê ji bo xîreta netewî bû.

Dîsa delîleke din a ku rewşa weşangeriyê nîşan dide ev e: Tu kitêbên kurdî çapa duyem nekirine. Rast e, *Mewlûda* kurmançî herî kêr pînc çap kirine lê hemû li weşanxaneyên cuda û ji aliyên weşangerên cuda ve. Ji van tenê em tîraja ya yekem, a ku Ehmed Ramîz çapkirî dizanin (5000 heb), ew jî bi fedakirina 50 zêrî çap dibe û em ji "Reşbelek"ê hîn dibin ku Ehmed Ramîz ji aliyê maddî ve

-herçiqas armanca wî ya karkirinê nebe jî- di vê çapê de xisiriye.

Bi qenaeta me di sed sala 19 û 20an de weşangeriyeke kurdî ya modern heye lê ev xwe nasipêre kapîtalîzmê; 4 kitêbên ewil ji aliyê rayedarên dewletê ve, qederek ji aliyê mîsyoneran ve, yên din jî bi xî-reta kurdperweran ve têne weşandin. Bêkapîtal(îst)bûna weşangeriya kurdî ne kêmasiyek e, berevajî wê wekî yekemîn rojnameya kurdî ku bê piştevaniya tu dewletî û tevî hemû zextên rejîma ‘Ebdulhemîd li sirgûniyê derdiket, weşangeriya kurdî jî berhema xîreta netewperweriya kurdî ye û ev bi xwe dikare îlhamekê bide xebatên kurdî yên îro.

Gelo weşangeriya kurdî ya dema Osmanî zimanekî desthilatdariyê ava kiriye? Bersiva vê jî ji ber rewşa ku li jor hate ravekirin, na ye. Lê em bi rehetî dikarin bibêjin ku wê ji bo kurdan qadeke danûstan û ragihandinê ya yekbûyî ava kir û di standardîzasyona kurdî de jî roleke girîng list. Weşangeriya wê demê ya pîrzaravayî ji cot-standartbûna kurdî (kurmancî-soranî) re jî mîna keke baş e. Di vê dewrê de kitêbeke bi kirdî (zazakî) çap bûbe jî, em hê nikarin behsa standartbûna vî zaravayî bikin, lê hebûna wê kitêbê (*Mewlûda Ehmedê Xasî*), di *Dîwana Mewlana Xalid* de helbestên bi lehçeya goranî û helbesta lorî ya di *Dîwan-i Et’ime* de neqşeya zimanê kurdî temam dike.

Herkes behsa dewlemendiya folklorê kurdan dike lê kurd bi xwe jî ji edebiyata xwe ya nivîskî bê xeber in. Etîketa folklor, koçerî û nezaniyê ewqas bi kurdan ve maye ku êdî ew bi xwe ji ziman, edebiyat û dîroka xwe guman dikin; xwe biçûk dibînin. Hal ew e ku bi sedan salan e bi zimanê kurdî şaheserên edebî hatine nivîsîn. *Dîwana Melayê Cizîrî*, *Zembîlfiroşa Feqiyê Teyran*, *Perîşannameya Mela Perîşan*, *Mem û Zîna* Ehmedê Xanî, *Mewlûda* Melayê Bateyî, *Seyfilmulûka* Siyahpoş, *Dîwana Şêxê Meczûb* çendek ji wan in. Çaxê ku hemû milletên Rojhilatê edebiyata xwe bi destnivîsan zêde dikir, destxetên kurdan jî hebûn. Piştî ku teknîka çapa modern derket jî em dibînin ku rewşenbîrên kurdan bi zimanê xwe pirtûk, kovar û rojname çap kirine û li hemberî hemû zextan û qedexeyan zimanê xwe parastine. Wan hem edebiyata xwe ya qedîm li çapê xistiye hem jî nimûneyên edebiyata modern afirandiye. Ev xebata me jî delîl û belgeya vê rastiye ye.

## ÇAVKANÎ

### 1. Belgeyên Arşîvê

- BOA. MF. MKT. 774-29, Dîrok: 26.01.1322 (H), 12.04.1904 (M).  
BOA. MF. MKT. 748-24, Dîrok: 20.08.1321 (H), 11.11.1903 (M).  
BOA. DH. MKT. 2735-66, Dîrok: 18/M /1327 (H), 10.02.1909 (M).  
BOA. MF. MKT. 73/22, Dîrok: 29/L /1291 (H), 09.12.1874 (M).  
BOA. MF. MKT. 122/26, Dîrok: 17/S /1292 (H), 20.03.1875 (M).  
BOA. DH.SAÎDd.. 0186/55, Dîrok: 29/Z /1281 (H), 24.05.1865 (M).  
BOA. MF.MKT. 1084/74, Dîrok: 14/Za/1326 (H), 08.12.1908 (M).  
BOA. Mv. 146/50, Dîrok: 22/Za/1328 (H), 25.11.1910 (M).  
BOA. MF. MKT. 442-56, Dîrok: 25/Za/1316 (H), 06.04.1899 (M).  
BOA. DH. MKT. 2735/70, Dîrok: 18/M /1327 (H), 10.02.1909 (M).  
BOA. MF. MKT. 182/76, Dîrok: 19/Ra/1311 (H), 29.09.1893 (M).  
BOA. MF. MKT. 938/62, Dîrok: 11/Ca/1324 (H), 04.07.1906 (M).  
BOA. Y.PRK.MF., 5/32, Dîrok: 29/Z /1325 (H), 02.02.1908 (M).  
BOA. MF. MKT. 662/20, Dîrok: 21/C/1320 (H), 25.09.1902 (M).

### 2. Kovar û Rojname

- Kurdistan* (1898-1902): Bozarslan, M. Emîn. *Kurdistan Rojname Kurdî ya Pêşîn/İlk Kürd Gazetesi* (1898-1902), I-II Cild, weş. Deng, Uppsala, 1991.
- Kurd Te'avun ve Terakkî Gazetesi* (1908-1909): Bozarslan, M. Emîn. *Kürd Teaviün ve Terakkî Gazetesi Kovara Kurdî/Tirkî-Kürdçe-Türkçe Dergi* 1908-1909, weş. Deng, Uppsala, 1998.
- Kurdistan* (1908-1909, Stembol): Koç, Y.-Bozkurt, S. "Du Hejmarên Rojnameya Kurdistan (1908-1909)", *Zend*, j.21 (Zivistan 2014), r. 83-103.
- Şark ve Kurdistan* (1908): Akpınar, Alişan û nd. "Bir II. Meşrutiyet Gazetesi Olarak Şark ve Kürdistan", *Müteferrika*, j.35 (Havîn 2009), r. 3-47.
- Peyman (1909): İpek, Zülfükar. *Peymân Gazetesi'nin 1325 (1909) Transkript, Tahlil ve Değerlendirilmesi*, (teza lîsansa bilind), Zanîngeha Dicle, 2018.

*Rojî Kurd* (1913): Koma Xebatên Kurdolojiyê (amd.). *Di Sedşaliya Wê de Rojî Kurd 1913*, weş. Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, Stenbol, 2013.  
*Hetawî Kurd* (1913-1914).

Bangî Kurd (1914): Sidîq Salih û nd. *Govarî Bangî Kurd 1914*, Bexda, weş. Binkey Jîn, Silêmanî, 2021.

*Kurdistan* (1917-1918, Qahîre): Kemal Fuad, *Kurdistan: Yekemîn Rojnamey Kurdî Dewrey Sêyem 1917-1918*, Çapxaney Zankoy Silêmanî, 1998.

*Jîn* (Kovar, 1918-1919): Bozarslan, M. Emîn. *Jîn Kovara Kurdî-Tirkî/ Kürdçe-Türkçe Dergi 1918-1919*, I-V Cild, weş. Deng, Uppsala, 1985-1988.

*Kurdistan* (Kovar, 1919-1920): Sidîq Salih-Refîq Salih. *Govarî “Kurdistan” (Estemûl, 1919-1920)*, weş. Binkey Jîn, Silêmanî, 2022; Veroj, Seîd. *Kurdistan (1919-1920)*, weş. Dara, Stenbol, 2023.

*Serbestî* (Rojname, 1919): Arslan, Mesut. “Serbestî Gazetesi (1918-1919) ve Bedirxanîler: Celadet Alî Bedirxan’ın Yazıları ve Kürtlere Dair Bazı Haberler”, *Kürdoloji Akademik Çalışmalar Cilt 2*, weş. Yargı Yayınevi, İstanbul, 2016, r. 393-460.

*Jîn* (Rojname, 1920).

*Hawar* (1932-1943): Cewerî, F. (amd.). *Hawar Cild 1 Hejmar 1-23 (1932-1933)-Hawar Cild 2 Hejmar 24-57 (1934-1943)*, weş. Nûdem, Stocholm, 1998.

### 3. Gotar

Adak, Abdurrahman. “Di serdema Osmaniyan de li pey rêça Ehmedê Xanî: Sê Mem û Zînên bi Tirkî”, *Nûbihar*, j.120 (Havîn 2012), r. 16-23.

Afyoncu, Erhan. “İbrâhim Müteferrika”, *DIA*, c. 21, 2000, r. 324-327.

Alparslan, Ali. “Habîb Efendi”, *DIA*, c. 14, 1996, r. 370-371.

“Amerikan Hey’eti Bugün Tahkîkata Devam edecek”, *Vakit*, No: 635 (4 Ağustos 1335/4 Tebax 1919), r. 1.

Arslan, Mesut. “Hacî Qadirê Koyî: Serencema Dîwana Wî Li Stenbolê û Hevaltiya Wî Bi Keyfî Re”, *The Journal of Mesopotamian Studies*, j.1 (2016), r. 91-101.

- Arslan, Mesut. "Ali Emîrî'nin Mir'âtü'l-Fevâ'id Adlı Eserinde Osmanlı Dönemi Kürt Şairleri", *Dicle Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü Dergisi*, j.36 (2024), r. 207-230.
- Arslan, Mesut. "Ulemeden Münevvere Osmanlı Müelliflerinin Yerel Dillere Bakışı (Kürtçe Örneği)", *Mukaddime*, 15/2 (2024), r. 250-277.
- Asatrian, Garnik. "Prolegomena to the Study of the Kurds", *Iran and the Caucasus*, No.13 (2009), r. 1-58.
- Anter, Musa. "Yekbûn/1914'te Çıkan Dergi", *Doğu*, j.1 (Aralık 1969), r. 29-30.
- Anter, Musa. "Eski Dergilerden Jîn", *Doğu*, j.2 (Ocak-Şubat 1970) , r. 24-26.
- Anter, Musa. "Büyük Bir Ozanımız: Mela Ahmedê Cızırî", *Doğu*, j.2 (Ocak-Şubat 1970) , r. 27-29.
- Aslan, Taner. "II. Meşrutiyet Döneminde Matbuat ve Neşriyat Yasa-  
sakları", *Tarihin Peşinde*, j.2 (Ekim 2009), r. 225-248.
- Atalay, Talip. "Yerel Bir Tarihi Kaynak Olarak Diyarbakir Vilayet Ga-  
zetesi ve Ermeniler", *AÜİFD*, j.47 (2006), r. 143-158.
- Aytepe, Oğuz. "Kürt İstiklâl Komitesi", *Tarih ve Toplum*, j.173 (Mayıs 1998), r. 45-49.
- Babê Naco M. X. "Erbâb-ı Hamiyet ve Himmete", *Hetawî Kurd*, j.4 (19 Mart 1330/1 Nisan 1914) r. 4-7.
- Babê Naco. "Fe'tebirû Ya Uli'l-Ebsar", *Hetawî Kurd*, j.2 (21 Teşrîni-  
sanî 1329/4 Kanûn 1913), r. 3-10.
- "Bangî Kurd, Kurdistan, Jîn", *Serbestî*, No: 490 (9 Mayıs/Gulan 1919), r. 2.
- Babanzade Ehmed Ref'et. "Kürd Gençlerine", *Hetawî Kurd*, j.3 (29 Kanûniewwel 1329/11 Çile 1914), r. 18-19.
- Bailey, N. "The Lord's Prayer in Northern Kurdish: Lexical and Ort-  
hographic Journeys Since 1787", *Rodnoy Yazyk*, j.2 (2021), r. 154-218.
- Başçı, Veysel. "David Barzanaya'nın Yalancı İsa Şiirinin İçerik Çö-  
zümü ve Mor Baselius'un Lawij'iyle Mukayesesi", *Şarkiyat*, 16/2 (Ocak 2025), r. 705-728.
- Baykuşak, Tahir. "Xelîl Xeyalî Modan (1864-1946)", *Wêje û Rexne*, j.8 (2016), r. 76-87.

- BEDİR-KHAN, Celadet Ali. “Merhele”, *Roja Nû*, j.1 (3 Gulan 1943), r. 1. Ji nû ve çapkirin: weş. Jîna Nû, Uppsala, 1986.
- Hörnle&Schneider, “Beilage No. III: Auszüge aus dem Tagebuche der Brüder Hörnle und Schneider über ihre Reise nach Urmia und einigen Kurdendistrikten im Westen dieser Stadt”, *Magazin für die neueste Geschichte der evangelischen Missions- und Bibelgesellschaften*, j.21 (1836), r. 481-510.
- “Beyana ‘Civata Hêvî’ Feqêê Kurdan”, *Hetawî Kurd*, j.4-5 (10 Mayıs 1330/22 Gulan 1914), r. 11-14.
- Beydilli, Kemal. “Matbaa”, *DIA*, c. 28, 2003, r. 105-110.
- Birinci, Ali. “Osmanlı Devletinde Matbuat ve Neşriyat Yasakları Tarihine Medhal”, *TALİD*, j.7 (2006), r. 291-349.
- Serhat Bozkurt, Kürdistan Teali Cemiyeti ve Kürt Millet Fırkası İle İlgili Birkaç Haber, *Kürt Tarihi*, j.33 (Temmuz-Ağustos-Eylül 2018), r. 14-15.
- Bruinessen, Martin van. “Onyedinci Yüzyılda Kürtler ve Dilleri: Kürt Lehçeleri Üzerine Evliya Çelebi’nin Notları”, *Studia Kurdica*, No:1-3 (Nisan 1985), r. 13-37.
- Çakmak, Zafer. “Elazığ’da Yayınlanan İlk Gazete: Mamuretü’l-Aziz”, *Doğu Anadolu Bölgesi Araştırmaları*, j.3 (2003), r. 28-32.
- Demir, A. “Li Ser el-Hediyeyê Vekolîneke Erdnîgariya Mêjûyî”, *Nûpelda*, j.9 (Bihar 2012), r. 35-41.
- Demir, Bahattin. “Devlet Destekli Kürtçe Eğitim Kürd Meşrutiyet Mektebi” *Toplumsal Tarih*, j.200 (Ağustos 2010), r. 72-78.
- Demir, Bahattin- Bozkurt, Serhat, “Osmanlı Gazetesi ve Kürtler”, *Müteferrika*, j.37 (Havîn 2010/1), r. 51-81.
- Derman, M. Uğur. “ÖZYAZICI, Mustafa Halim”, *DIA*, c. 34, 2007, r. 135-137.
- “Eastern Turkey Mission”, *The Missionary Herald*, Vol. 90, No.8 (August 1894), r. 332-334.
- “Edebiyat-i Kurdî”, *Têgeyîştinî Rastî*, j.24 (15 Nisan 1918), r. 3.
- Edmonds, C. J. “A bibliography of Southern Kurdish, 1920–36”, *Journal of the Royal Central Asian Society*, Vol. 24, Issue 3 (June 1937), r. 487-497.

- El-Meranî, Muhammed Ronî. “Bilinen En Eski Kürt Alfabeti”, *Kürt Tarihi*, j.5 (Şubat-Mart 2013), r. 14-20.
- Emrich, R. Stanley M. “Dr. Andrus, of Mardin”, *The Missionary Herald*, Vol. 115, No.3 (March 1919), r. 107-108.
- Ergül, Selim Temo. “Türkçe’de Kürt Edebiyatı”, *Dipnot*, j.2 (2010), r. 213-231.
- Esin, Mehmet Nezir. “Molla Zeynelabidin Çiçek (Âmidî) ve İlmi Kişiliği”, *Dicle Üniversitesi İlahiyat Fakültesi Dergisi*, j.21/1 (2019), r. 40-62.
- Gazel, Ahmet Ali-Ortak, Şaban. “İkinci Meşrutiyet’ten 1927 Yılına Kadar Yayın İmtiyazı Alan Gazete ve Mecmualar (1908-1927)”, *Atatürk Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü Dergisi*, c. 7, j.1 (2006), r. 223-256.
- Gündüz, Şinasi. “Misyonerlik”, *DIA*, c. 30, 2020, r. 193-198.
- “Hacî Ebdulqadir Qeddese Sirrehu’l- alî”, *Hetawî Kurd*, j.1 (11 Teşrîniewwel 1329/24 Cotmeh 1913), r. 25.
- Hakan, Sinan. “Diyarbakir Kürt Kulübünün Yayıncılık Mücadelesi-1919”, *Kürt Tarihi*, j.10 (Aralık 2013-Ocak 2014), r. 46-51.
- Hanioğlu, M. Şükrü. “Jön Türkler”, *DIA*, c. 23, 2001, r. 584-587.
- Hanioğlu, M. Şükrü. “Jön Türk Basını”, *Tanzimat’tan Cumhuriyet’e Türkiye Ansiklopedisi*, c. 3, weş. İletişim, İstanbul, 1985, r. 844-850.
- Hanioğlu, Şükrü. “Kürt proto-milliyetçiliği, Jön Türklük ve II. Abdülhamid Rejimi: Azm-i Kavî Cemiyeti Örneği”, *Derin Tarih*, j.44 (Kasım 2015), r. 60-66.
- Hatiboğlu, İbrahim. “Osmanlı Aydınlarınca Dozy’nin Târîh-i İslâmiyyetine Yöneltilen Tenkitler”, *İslâm Araştırmaları Dergisi*, j.3 (1999), r. 197-213.
- Hîzanîzade Kemal Fevzî, “Kürdistân Muhtâriyyeti”, *Jîn*, j.36 (21 Haziran 1336/21ê Hezîrana 1920an), r. 1.
- Issı, Murat. “Bir Osmanlı Kürt Aydını Malatyalı Bedri”, *Toplumsal Tarih*, No: 212 (Ağustos 2011), r. 30-37.
- Issı, Murat. “Kürt Basını ve *Kürdistan* Gazetesi (1898-1902)”, *e-Şarîkiyat İlmi Araştırmalar Dergisi*, j.9 (Nisan 2013), r. 127-147.

- Issı, Murat. “PEYMÂN -Diyarbakir’in İlk Hususi Gazetesi-“, *e-Şarkiyat İlmi Araştırmalar Dergisi*, j.7 (Nisan 2012), r. 91-115.
- Işık, Server. “İlk Kürtçe Şiir Antolojisi Encümen-i Edîbân-ı Kürd ve Süleymaniyeli Emin Feyzi Bey”, *Kürt Tarihi*, j.1 (Haziran-Temmuz 2012), r. 60-61
- Işık, Sever. “Mısırdaki İki Ünlü Naşir: Ferecullah Zeki el-Kürdi ve Muhiiddin Sabri el-Kürdi”, *Kürt Tarihi*, j.9 (Ekim-Kasım 2013), r. 52-57.
- Işık, Sever. “Şeyh Mustafa Safvet Efendi”, *Kürt Tarihi*, j.5 (Şubat-Mart 2013), r. 38-43.
- “İstanbulda müteşekkil Dîvân-ı Harb-i ‘Örfî mahkûmlarından ve idâreten nefy idilenlerden mazhar-ı ‘afv-ı âlî olanların esâmîsidir.” *Takvîm-i Vakayî*, No: 1193 (19 Temmûz 1328/1 Tebax 1912), r. 1-3.
- “Jîn-Hayât”, *Türkçe İstanbul*, No: 162 (11 Mayıs/Gulan 1919), r. 2.
- Karakışla, Yavuz Selim. “Kürt Kadınları Teali Cemiyeti (1919)”, *Toplumsal Tarih*, j.111 (Mart 2013), r. 14-24.
- “Kari’lerimize”, *Kurdistan*, j.11 (15 Rebûissanî 1336/28 Çile 1918), r. 2.
- Kavak, ‘Ebdulcebar. “Helbestvaniya Mewlana Xalidê Şehrezorî û Helbestên Wî yên Kurdî”, *Nûpelda*, j.4 (Havîn 2010), r. 10-13.
- Khalid, Hewa Salam. “Zimanê Kurdî, Malbat û Zarên Wî”, *Kurdîname*, j.1 (November 2019), r. 3-16.
- Kılavuz, Ahmet Saim. “Akaid”, *DIA*, c. 2, 1989, r. 213.
- Kılıç, Rüya. “Osmanlı Devletinde Yönetim-Nakşebendi İlişkinine Farklı Bir Bakış: Hâlidî Sürgünleri”, *Tasavvuf: İlmi ve Akademik Araştırma Dergisi*, j.17 (2006), r. 103-119.
- Koç, Yener. “Siird Sancağı’nda 1912 Seçimleri Toplumsal Dinamikler ve Politik Farklılaşmalar”, *Toplum ve Kuram*, j.6-7 (Zivistan-Bihar 2012), r. 289-306.
- “Konferansın Mukarreratı”, *Vakit*, No.882 (24 Nîsan 1920), r. 1.
- Kut, Turgut. “Dârüttibâa”, *DIA*, c. 9, 1994, r. 10-11.
- “Kürd ‘Amelesi İntihâbâtı”, *Jîn*, j.33 (9 Mart 1336/9 Adar 1920), r. 2.
- “Kürd ‘Amelesine Meccanî Dersler”, *Jîn*, j.33 (9 Mart 1336/9 Adar 1920), r. 4.
- “Kürd Kulübü”, *İttihad ve Terakkî*, No.21 (9 Eylül 1324/22 İlon 1908), r. 3.

- “Kürd Millet Fırkası”, *Alemdar*, j.1516-116 (19 Temmûz 1335/1919), r. 1.
- “Kürdce Mevlidu’n-Nebî”, *İctihad*, sal: 2, j.4 (Eylul 1907), r. 288.
- “Kürdlerin Mütâlebi -Kürdistanın Vaz’iyyeti - İngiliz Murâkabesi-”, *Ileri*, No: 877 (24 Haziran 1336/24ê Hezîrana 1920an), r. 1.
- “Kürd Te’âlî Cem’iyyetinin Seddi”, *İkdam*, No: 8379 (11 Haziran 1920/11ê Hezîrana 1920an), r. 2.
- “Kürd Teşkilât-ı İctimâ’iyye Cem’iyyeti”, *Vakit*, No: 911 (7 Haziran 1336/7ê Hezîrana 1920an), r. 2.
- Lescot, Roger. Le presse kurde, *Roja Nû*, j.1 (03.05.1943), r. 4.
- Lescot, Roger. “Edebiyata Kurdî”, wer. S. Ay, *Wêje û Rexne*, j.1 (rê-bendan-sibat-adar-avrêl 2014), r. 212-219.
- Mackenzie, David Neil. “The Language of the Medians”, *BSO-AS*, 22/2 (1959), r. 354-355.
- “Ma’mûretu’l-‘azîz Gazetesinde Okunmuşdur: Kürdce ‘İlm-i hal ve Muhammediyye”, *Cerîde-i ‘Askeriye*, No.275 (Yirmi Dokuzuncu Sene 16 Şa’ban 1308/27 Adar 1891), r. 12-13.
- Malmîsanij, “Kurdîzade Ehmed Ramizê Licî”, *Çarçira*, j.2 (Nîsan 1986), r. 19-22.
- Malmîsanij, “Ji Weşanên Hêviyê (1921): Hînerê Zimanê Kurdî”, *Çarçira*, j.2 (Nîsan 1986), r. 23-28.
- Malmîsanij, “Jîn Gazetesi İstanbul”, *Berhem*, j.4 (sibat 1989), r. 10-13.
- Malmîsanij, “Çend nivîs ji perîyodîkên Kurdî (1908-1963)”, *Çira*, j.10 (Havîn 1997), r. 59-95.
- Malmisanlı, Mehmet. “Osmanlı Döneminde Basılan Kürtçe Eserler” *Tarih ve Toplum*, j.54 (Haziran 1988), r. 59-63.
- Malmisanlı, Mehmet. “Osmanlı Döneminde Yazılan Kürtçe Eserler Üzerine II”, *Tarih ve Toplum*, j.55 (Temmuz 1988), r. 58-63.
- Mela, Said. “Wergera Rusî ya Dîwana Melaye Cizîrî”, *Çira*, j.3 (îlon 1995), r.102.
- “(Mem û Zîn)in Tab’ı Hitâm Buldu”, *Jîn*, j.33 (9 Mart 1336/9 Adar 1920), r. 4.
- Mevlânzâde Rif’et. “Muhterem “Hetawî Kurd” Gazetesi Müessislerine”, *Hetawî Kurd*, j.2 (21 Teşrînisanî 1329/4 Kanûn 1913), r. 2-3.
- M[odanî] X[elîl]. “Derdê Kurdan”, *Hetawî Kurd*, j.2 (21 Teşrînisanî 1329/4 Kanûn 1913), r. 25-30.

- “No Full Bible in Kurdish Yet”, *Kurdish Facts and West-Asian Affairs*, j.5 (April 1961), r. 15-16.
- “Osmanlı Kürd Te‘avün ve Terakkî Cemiyeti”, *İttifak*, No: 22 (25 Ağustos 1324/6 İlon 1908), r. 3.
- “Osmânî Kürd İttihâd ve Terakkî Cem‘iyyeti”, *Tanîn*, No:67 (23 Eylül 1324/6 Cotmeh 1908), r. 8.
- Öpengin, Ergin. “Tevatür ve Temellük Kıskaçında Kürt Kültür Tarihciliği”, *Kürt Tarihi*, j.11 (Şubat-Mart 2014), r. 18-29.
- Özakıncı, Cengiz. “Sivas’lı Misyoner Henry H. Riggs’in 1911 Dersim Raporu”, *Bütün Dünya*, j.2012/2, r. 71-84.
- Özcan, Azmi. “Otuzbir Mart Vak‘ası”, *DIA*, c. 34, 2007, r. 9-11.
- Özel, Ahmet. “Mükriyânî”, *DIA*, c. Ek-2, 2019, r. 316-317.
- Pakiş, Ömer. “Molla Halil Siirdî” *DIA*, c. 30, 2020, r. 250-251.
- Polat, Nazım H. “İctihâd”, *DIA*, c. 21, 2000, r. 446-448.
- Qazîzade Mistefa Şewqî, “Tereqqî dînman divê”, *Hetawî Kurd*, j.4 (19 Mart 1330/1 Nisan 1914), r. 22-24.
- “Qesîdeî Rehmetî Hacî ‘Ebdulqadir[î] Koyî”, *Hetawî Kurd*, j.4 (19 Mart 1330/1 Nisan 1914), r. 17-19.
- Rhea, Samuel A. “Brief Grammar and Vocabulary of the Kurdish Language of the Hakari District”, *Journal of the American Oriental Society*, v.10 (1872-1880), r. 118-155.
- Rzepka, Marcin. “Protestants among Kurds and some problems of translation of the Bible into Kurdish in the 19th century”, *Orientalia Christiana Cracoviensia*, nr. 1 (2009), r. 87-93.
- Sayım, İlyas-Ertekin, M. Zahir. “Yekemîn Încîla Kurdiya Kurmancî û Hin Taybetmendiyên Wê”, *Bingöl Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü Dergisi*, j.19 (Haziran 2024), 16-31.
- Serfiraz, M.-Hawar, B. (amd.). “Reşbeleka Kurdîzade Ehmed Ramizê Licêyî”, *Nûbihar*, j.124 (Havîn 2013), r. 5-9.
- Shemmas Sulliba. “Letter From Mardin”, *The Missionary Herald*, Vol. 52, No. 4 (April 1856), r. 119-120.
- Subaşı, M. Hüsrev: “Hamit Aytaç”, *DIA*, c. 4, 1991, r. 287-289.
- Şengül, Serdar. “Melayê Cizîrî ve Diwan Okuma Geleneği”, *Folklor/Edebiyat*, j.86 (2016), r. 181-202.

- “Şerîf Paşa Kürd Hey’et-i Murahhasası Riyâsetinden İstifâ Ediyor”, *Vakit*, No. 882 (24 Nisan 1920), r. 1.
- “Üç Paşa Daha Kaçdı”, *İkdam*, j. 7805 (4 Teşrînisanî 1918/4 Mijdar 1918), r. 1.
- Xweşhêvî, Zilkîf. “Kurdîzade Ehmed Ramizê Liceyî”, *Nûbihar*, j.107 (Bihar 2009), r. 9-12.
- Wezîrê Eşo. “Dost û xêrxezê cim’eta Kurda yî mezin”, *Çira*, j.10 (Havîn 1997), r. 11-26.
- Wezîrê Eşo. “Dost û xêrxezê cim’eta Kurda yî mezin-II”, *Çira*, j.11 (Payîz 1997), r. 3-15.
- Yıldırım, Kadri. “Kürtlerin İslam Öncesi Alfabe Serüveni”, *Kürt Tarihi*, j.5 (Şubat-Mart 2013), r. 25-29.
- Yıldız, Ayhan. “Tevgera Wergera Kurmancî li Sûrî û Tirkîyeyê”, *Nûbihar Akademî*, j.13 (2020), r. 115-138.
- Yılmaz, Hasan Kâmil. “Esad Erbilî”, *DIA*, c. 11, 1995, r. 348-349.
- Zehawîzade Y.Z., “Kürdlerde Hiss-i Millî”, *Hetawî Kurd*, j.4 (19 Mart 1330/1 Nisan 1914), r. 7-8.
- Zengene, Ebdulla. *Rojnamevanî*, j. 6-7 (2001-2002), weş. Kurdistan Journalist Union, Hewlêr, r. 177-209.

#### 4. Pirtûk û Tez

- Adak, Abdurrahman. *Destpêka Edebiyata Kurdî ya Klasîk*, ç.2, weş. Nûbihar, Stenbol, 2014.
- Akin, Salih. *Lêkolînên Zimannasiya Kurdî*, weş. Avesta, Stembol, 2013.
- Akkoyun Özlü, Gülşen. *Amerikan Board Misyonerlerinin Diyarbakır’daki Faaliyet ve Kurumları (1850-1916)*, teza doktorayê, Zanîngeha İnönü, Malatya, 2023.
- Akpınar, Alişan. *Osmanlı Devletinde Aşîret Mektebi*, weş. Göçebe, İstanbul, 1997.
- Akşin, Sina (ed.). *Türkiye Tarihi 3 -Osmanlı Devleti 1600-1908-*, weş. Cem, İstanbul, 2009.
- Alakom, Rohat. *Eski İstanbul Kürtleri*, ç.2, weş. Avesta, İstanbul, 2012.

- Alan, Remezan. *Bendname*, weş. Avesta, Stembol, 2009.
- Alan, Remezan. *Folklor û Roman li dor texeyyulên berê rêçên îroyîn*, weş. Peywend, Stenbol, 2013.
- Albayrak, Sadık. *Son Devir Osmanlı Uleması*, c.4, weş. İstanbul Büyükşehir Belediyesi, İstanbul, 1996.
- Anderson, Benedict. *Hayali Cemaatler, -Milliyetçiliğin Kökenleri ve Yayılması-*, wer. İ. Savaşır, weş. Metis, İstanbul, 1993.
- Anter, Musa. *Hatıralarım*, ç.3, weş. Aram, İstanbul, 2013.
- Arslan, Hasan. “Kürtçe Mevlidler”, *Kürtçede İslâmî İlimler*, ed. A. Timurtaş - F. İdiz, weş. Peywend, İstanbul, 2021, r. 155-213.
- Arslan, Mesut. “Türkçeden Kürd Lisanına Mütercem İlmihaldir (1891, Elezîz): İlmihaleke bi Tirkî û Wergera Wê ya Kurdî”, *Kürdoloji Akademik Çalışmalar Cilt 1*, Yargı Yayınevi. İstanbul, 2016, r. 246-272.
- Arslan, Mesut. “Serbestî Gazetesi (1918-1919) ve Bedirxanîler: Celadet Alî Bedirxan’ın Yazıları ve Kürtlere Dair Bazı Haberler”, *Kürdoloji Akademik Çalışmalar Cilt 2*, Yargı Yayınevi, İstanbul, 2016, r. 393-460.
- Arslan, Mesut. “Emin Feyzi’nin Edebi Yönü Hakkında Birkaç Söz”, dnd. *Süleymaniye’den İstanbul’a Bir Kürt Aydını Emin Feyzi Bey’in Hatıraları*, ed. S. Bozkurt- M. Arslan, weş. Nûbihar, İstanbul, 2022, r. 17-25.
- Arslan, Mesut. “Destpêkek ji bo Edebiyata Kurdî ya Klasîk”, dnd. *Rêbera Hînkirina Kurdî*, weş. PHZH, Zürich, 2023, r. 173-186.
- Arslan, Mesut. “Peyrevê Melayê Cizîrî: Şêxê Meczûb û Dîwana Wî ya Kurdî”, dnd. *Gotarên Vekolînên Çanda Kurdî*, weş. Nûbihar, Stenbol, 2024, r. 205-220.
- Arslan, Mesut. *Eqîda Kurmancî ya Mela Nesreddînê Zoqeydî*, weş. Peywend, Wan, 2024.
- Avcı, Fırat. *American Board (ABCMF) Missionary Alpheus Newell Andrus’ Mardin Activities*, teza lîsansa bilind, Zanîngeha Dokuz Eylül, İzmir, 2022.
- Aydeniz, Veysel. *Müküslü Hamza Eski Said’in Ehemmiyetli Talebesi*, ç.2, weş. Nûbihar, İstanbul, 2013.

- Aydeniz, Veysel. *Seyyid Şefik Arvasi*, weş. Nûbihar, İstanbul, 2013.
- Aydın, Suavi û nd. *Mardin Aşiret-Cemaat-Devlet*, ç.2, weş. Tarih Vakfı, İstanbul, 2001.
- Bacon, Francis. *The New Organon*, ed. L. Jardine-M. Silverthorne, Cambridge University Press, 2000.
- Bagster, Samuel. *The Bible of Every Land*, London, Samuel Bagster and Sons, 1860.
- Bajalan, Djene R. *Jön Kürtler Birinci Dünya Savaşı'ndan Önce Kürt Hareketi (1898-1914)*, weş. Avesta, İstanbul, 2010.
- Baykuşak, Tahir. *The Role of The Press in The Construction of Kurdish Collective Identity: A Case Study on "Jîn" Journal (1918-1919)*, teza lîsansa bilind, İstanbul Bilgi University, 2014.
- Bayrak, Mehmet. *Açık-Gizli Resmi-Gayr-ı Resmi Kürdoloji Belgeleri*, weş. Özge, Ankara, 1994.
- Bayrak, Mehmet. *Alevi-Bektaşî Edebiyatında Ermeni Âşıklar (Aşuğlar)*, weş. Özge, Ankara, 2005.
- Bayrak, Mehmet. *Kürtler ve Ulusal-Demokratik Mücadeleleri*, ç.2, weş. Özge, Ankara, 2013.
- Bayrak, Mehmet. *Kürt Bâtınîliğinde Kutsal Metinler*, weş. Özge, Ankara, 2016.
- Baysal (Buğra), Jale. *Müteferrika'dan Birinci Meşrutiyete Kadar Osmanlı Türklerinin Bastıkları Kitaplar*, İstanbul Üniversitesi Edebiyat Fakültesi Basımevi, İstanbul, 1968.
- Bedirxan, Celadet A. *De la question Kurde/Kürt sorunu üzerine*, wer. T. Doğan, weş. Avesta, İstanbul, 1997.
- Bedirxan, Celadet A. *Mustafa Kemal'e Mektup*, weş. Avesta, İstanbul, 2012.
- Bedî'uzzaman. *İki Mekteb-i Musîbetin Şehâdetnâmesi Yâhûd Dîvân-i Harb-i 'Örfî: ve Sa'îd-i Kurdî*, Iqbal-i Millet Matba'sı, İstanbul, 1327; ç.2, Artîn Asaduryan ve Mahdûmları Matba'ası, İstanbul, 1328.
- Beysanoğlu, Şevket. *Diyarbakırlı Fikir Ve Sanat Adamları İkinci Cilt*, (Yeni İlavelerle 2. Basılış), Diyarbakır Tanıtım Kültür ve Yardımlaşma Vakfı, İstanbul, 1997.

- Birinci, Ali. *Hürriyet ve İtilâf Fırkası*, ç.2, weş. Dergâh, İstanbul, 2012.
- Bozkurt, Serhat-Arslan, Mesut. *Süleymaniye'den İstanbul'a Bir Kürt Aydın Emin Feyzi Bey'in Hatıraları*, weş. Nûbihar, İstanbul, 2022.
- Bruinessen, Martin van. "Ehmedê Xanî'nin Mem û Zîn'i ve Kürt Milli Uyanışının Ortaya Çıkışındaki Rolü", dnd. *Kürt Milliyetçiliğinin Kökenleri*, ed. A. Vali, wer. F. Adsay-Ü. Aydoğmuş-S. Kılıç, weş. Avesta, İstanbul, 2005.
- Chirguh, Bletch. *Kürt Sorunu Kökeni ve Nedenleri*, weş. Avesta, İstanbul, 2009.
- Celîlê Celîl (wer. û amd.) *Autobiografiya Ebdurrizaq Bedirxan*, weş. Havîbûn, Berlin, 1999.
- Celîlê Celîl. *Jiyana Rewşenbiri û Siyasi ya Kurdan (Dî Dawiya Sedşala 19'a û Destpêka Sedşala 20'a de)*, weş. Jina Nû, Uppsala, 1985.
- Celîlê Celîl. *Kürt Aydınlanması*, weş. Avesta, İstanbul, 2001.
- Cemil Paşa, Ekrem. *Muhtasar Hayatım*, weş. Beybun, Ankara, 1992.
- Cemîl Paşa, Ekrem. *Dîroka Kurdistan Bi Kurtebirî*, weş. Enstituya Kurdî ya Brukselê, Bruxelles, 1995.
- Çağlayan, Ercan. "Osmanlı Belgelerinde Zazalar ve Zazaca Üzerine Notlar", dnd. *I. Uluslararası Zaza Dili Sempozyumu*, weş. Bingöl Üniversitesi, Ankara, 2011, r. 271-290.
- Çiçek, Özcan. *Emin Feyzi Bey'in Şuâat ve Îlâve-i Şuâat Adlı Eserleri*, weş. Şarkiyat Bilim ve Hikmet Vakfı Yayınları, Diyarbakır, 2023.
- Demirel, Fatmagül. *II. Abdülhamid Döneminde Sansür*, weş. Bağlam, İstanbul, 2007.
- Deringil, Selim. *İktidarın Sembolleri ve İdeoloji: II. Abdülhamid Dönemi (1876-1909)*, wer. G. Ç. Güven, ç.3, YKY, İstanbul, 2007.
- Dîkranyan, Migirdîç. *Çirayê Ironî*, amd. A. Yiğitalp-A. Gebenlioğlu-İ. Çağatay-S. Bozkurt-T. Baykuşak, weş. Avrupa Birliği Sivil Düşün, İstanbul, 2024.
- Doskî, Tehsîn İbrahîm (komkirin û berhevkin). *'Eqîdenameyên Kirmancî*, Belavkirawey Ekaîmiya Kurdî, Hewlêr, 2011.
- Ehmedê Xanî, *Mem û Zîn*, amd. M. Emin Bozarslan, ç.3, weş. Hasat, İstanbul, 1990.
- Ehmedê Xanî. *Hemû Berhem*, weş. Lîs, Diyarbakır, 2008.

- Ehmedê Xanî. *Mem û Zîn*, amd. K. Yıldırım, weş. Avesta, İstanbul, 2010.
- Ehmedê Xanî. *Nûbar*, amd. Z. Kaya, weş. Roja Nû, Stockholm, 1986.
- Ehmedê Xanî. *Nûbehara Biçûkan*, amd. K. Yıldırım, weş. Avesta, İstanbul, 2008.
- Emîn Feyzî Beg (daner). *Encumenî Edîban*, latînzekirin: M. Xalid Sadînî, weş. Dîwan, Stenbol, 2012.
- Erbîlî, Muhammed Es'ad. *Divân-ı Es'ad*, weş. Erkam, İstanbul, 1991.
- Erim, Nihat. *Devletlerarası Hukuku ve Siyasi Tarih Metinleri Cilt I*, Ankara Üniversitesi Hukuk Fakültesi, Ankara, 1953.
- Ertekin, M. Zahir- Yıldız, Ayhan. *Govenda Zimanan Mulemme'*, weş. Lorya, Wan, 2022.
- Febvre, Lucien & Martin, Henri-Jean. *Kitabın Doğuşu*, wer. G. Batuş, weş. Avcıol, İstanbul, 2000.
- Garzoni, Maurizio. *Grammatica E Vocabolario Della Lingua Kurda*, Roma, 1787.
- Gezer, Semih. *Dîwana Mela Yasîn Yusrî*, weş. Peywend, Wan, 2022.
- Göldaş, İsmail. Kürdistan Teâlî Cemiyeti, ç.2, weş. Doz, İstanbul, 1991.
- Hakan, Sinan. *Türkiye Kurulurken Kürtler (1916-1920)*, ç.2, weş. İletişim, İstanbul, 2013.
- Halide Edib. *Memoirs of Halide Edib*, John Murray (Publishing house), (first published), London, 1923.
- Hartmann, Martin "Einführung", *Der Kurdische Diwan des Schech Ahmed von Geziret Ibn 'Omar genannt Mala'i Gizri*, S. Calvary & Co., Berlin, 1904, r. V-XI. Wergera wê ya kurdî: "Li ser Edebiyata Kurdî & Li ser Melayê Cizîrî", wer. A. İncekan, *Nûbihar Akademi*, j.3 (2015), r. 129-133.
- Hassanpour, Amir. *Kürdistan'da Dil ve Milliyetçilik 1918-1985*, wer. İ. Bingöl-C. Gündoğan, weş. Avesta, İstanbul, 2005.
- Hassanpour, Amir. "Kürt medya kültürünün yaratılması", dnd. *Kürt Kimliği ve Kültürü*, ed. P. Kreyenbroek-C. Allison, wer. Ü. Aydoğmuş, weş. Avesta, İstanbul, 2003, r. 79-130.
- Hroch, Miroslav. *Avrupa'da Milli Uyanış*, wer. A. Özdemir, weş. İletişim, İstanbul, 2011.

- Husên Huznî. *Tarîxî Kurdan Xunçey Beharistan*, Metbe'etu 'Esr el-Cedîd, Heleb, 1925.
- Husên Huznî. *Sercemî Berhemî Husên Huznî Bergî Yekem*, weş. Aras, Hewlêr, 2011.
- Hüseyin Kâmî, *Dehrî Dîvançesi*, amd. A. Tanyıldız, weş. Akademik Kitaplar, İstanbul, 2013.
- Încîl (Mizgînî), Kitabı Mukaddes Şirketi, İstanbul, 2005.
- Jwaideh, Wadie. *Kürt Milliyetçiliğinin Tarihi Kökenleri ve Gelişimi*, wer. İ. Çekem-A. Duman, ç.6, weş. İletişim, İstanbul, 2009.
- Kabacalı, Alpay. *Başlangıcından Günümüze Türkiye'de Matbaa, Basın ve Yayın*, weş. Literatür, İstanbul, 2000.
- Kılıç, Hazım. *Helbestvan û Nivîskarekî Welatparêz Evdirehîm Rehmîyê Hekarî [Abdurahim Zapsu]*, weş. Xanî&Bateyî, Danmark, 1991.
- Kırkan, Ahmet. *Bîyîşa Pêxemberî ya Osman Esad Efendî û Destpêkê Edebîyatê Klasîk yê Kirmanckî*, weş. Vate, İstanbul, 2018.
- Kieser, Hans-Lukas. *İskalanmış Barış Doğu Vilayetleri'nde Misyonerlik, Etnik Kimlik ve Devlet 1839-1938*, wer. A. Dirim, weş. İletişim, İstanbul, 2005.
- Koma Xebatên Kurdî di Çavkaniyên Osmanî de (amd.). *Hîngerê Zîmanê Kurdî*, weş. bgst, İstanbul, 2008.
- Koma Xebatên Kurdolojiyê (amd.). *Osmanlı Kürdistanı/Kurdistan Osmanî*, weş. bgst, İstanbul, 2011.
- Kurdo, Qanatê. *Tarîxa Edebiyata Kurdî I*, weş. Roja Nû, Stockholm, 1983.
- Koyî, Hacî Qadirî. *Dîwan*, ed. A. Zêrevan, weş. Nefel, Sweden, 2004.
- Le Coq, A. v. *Kurdische Texte -1-*, weş. Reichsdruckerei, Berlin, 1903.
- Lütfî (Ahmed Ramiz). *Emir Bedirhan*, amd. Koma Xebatê ya di Çavkaniyên Osmanî de Kurd, weş. bgst, İstanbul, 2007.
- MacKenzie, D. N. "A Kurdish Creed", dnd. *A Locust's Leg: Studies in honour of S.H. Taqizadeh*, Percy Lund, Humphries & Co., London, 1962, r. 162-170.
- Mahdi, Muhsin. "From the Manuscript Age to the Age of Printed Books", dnd. *The Book in the Islamic World: The Written Word and Communication in the Middle East*, ed. G. N. Atiyeh, State University of New York Press, Albany, 1995, r. 1-15.

- Makas, Hugo. *Kurdische Studien*, Carl Winter's Universitätsbuchhandlung, Heidelberg, 1900.
- Malbat, Ekrem. *Kürt Kadınları Teali Cemiyeti ve Nizamnamesi*, weş. Nûbihar, İstanbul, 2019.
- Malmîsanij, *Yüzyılımızın Başlarında Kürt Milliyetçiliği ve Dr. Abdullah Cevdet*, weş. Jîna Nû, Uppsala, 1986.
- Malmîsanij. *Abdurrahman Bedirhan ve İlk Kürt Gazetesi Kurdistan Sayı: 17 ve 18*, Sweden, 1992.
- Malmîsanij. *Cızıra Botanlı Bedirhaniler*, ç.3, weş. Avesta, İstanbul, 2009.
- Malmîsanij. *İlk Kürt Gazetesi Kurdistan'ı Yayımlayan Abdurrahman Bedirhan (1868-1936)*, weş. Vate, İstanbul, 2009.
- Malmîsanij. *Kürt Teavün ve Terakki Cemiyeti ve Gazetesi*, weş. Avesta, İstanbul, 1999.
- Malmîsanij. *Türkiye ve Suriye'de Kürtçe Kitap Yayımcılığının Dünyü ve Bugünü*, weş. Vate, İstanbul, 2006.
- Malmîsanij. *Yirminci Yüzyılın Başında Diyarbekir'de Kürt Ulusçuluğu (1900-1920)*, weş. Vate, İstanbul, 2010.
- Malmîsanij&Mahmûd Lewendî. *Li Kurdistana Bakur û li Tirkîyê Roj-namegeriya Kurdî (1908-1992)*, weş. Özge, Ankara, 1992.
- Matba'a-i İctihâdın Fihrist-i Neşriyâtı*, Metbee-i İctihâd, Misr, 1908.
- Mehmet Emin Zeki Bey. *Kürd ve Kürdistan Ünlüleri*, wer. M. Baban-M. Yağmur-S. Kutlay, weş. Apec, Spånga/Sweden, 1988.
- Mihemed Emîn Zekî Beg. *Dîroka Kurd û Kurdistanê*, wer. Z. Avci, ç.2, weş. Avesta, Stembol, 2012.
- Mizgînî Peymana Nû (Încîl)*, Înstîtûa Welger'andina K'itêba Pîroz, Moskva, 2011.
- M. S. Lazarev&Ş. X. Mihoyan (ed.). *Kürdistan Tarihi*, wer. İ. Kale, ç.3, weş. Avesta, İstanbul, 2010.
- Muhammed Emin Zeki Beg. *Kürtler ve Kürdistan Tarihi*, ç.4, weş. Nûbihar, İstanbul, 2012.
- Mukriyanî, Gîwî. *Elf û Bêy Kurdî Wênedar Be Tîpî Latînî*, Çapxaney Kurdistan, Hewlêr, 1972.

- Müteferrika, İbrahim. “Osmanlı Matbaasının Kuruluşu ve Başlangıcı”, wer. û amd. N. Kuran-Burçoğlu û M. Kiel, dnd. *Müteferrika ve Osmanlı Matbaası*, weş. Tarih Vakfı Yurt Yayınları, İstanbul, 2004, r. 63-75.
- Nehrî, Seyyid Abdullah. *Hulâsa-i Akaid Akaidin Özü*, amd. K. Yıldırım, weş. Semerkand, İstanbul, 2013.
- Noel, E. W. Charles. *Kürdistan 1919 Binbaşı Noel’in Günlüğü*, wer. B. Birir, ç.2, weş. Avesta, İstanbul, 2010.
- North, Eric M. *The Book of a Thousand Tongues*, Harper & brothers Publishers, New York-London, 1938.
- Olgun, Hakan. *Luther ve Reformu Katolisizm’i Protesto*, weş. Fecr, Ankara, 2001.
- Ortaylı, İlber. *İmparatorluğun Son Nefesi Osmanlı’nın Yaşayan Mirası Cumhuriyet*, ç.2, weş. Timaş, İstanbul, 2014.
- Özcoşar, İbrahim. *19. Yüzyılda Mardin Süryanileri*, weş. Beyan, İstanbul, 2008.
- Özege, M. Seyfettin. *Eski Harflerle Basılmış Türkçe Eserler Kataloğu*, c. 4, İstanbul, 1977.
- Özoğlu, Hakan. *Dewleta Osmanî û Neteweperwerên Kurd*, wer. A. Karadeniz, weş. Kitap, İstanbul, 2012.
- (Özzorluoğlu), Süleyman Tevfik. *II. Meşrutiyet’ten Cumhuriyet’e: Elli Yıllık Hatıralarım*, amd. Ş. Özdemir-T. Yıldırım, weş. Dün Bugün Yarı, İstanbul, 2011.
- Parmelee, M. P. *Home and Work by the Rivers of Eden*, American Sunday School Union, Philadelphia, 1888.
- Pedersen, Johannes. *İslam Dünyasında Kitabın Tarihi*, wer. M. M. Karagözoğlu, ç.2, weş. Klasik, İstanbul, 2013.
- Pilatin, Nuriye. *Yusuf Ziyâ El-Hâlidî’nin Hayatı ve Elhediye-tü’l-Hamidiyye Fi’l-Lügati’l-kürdiyye Adlı Eseri (Metin İnceleme ve Tasnif)*, Mardin: Mardin Artuklu Üniversitesi, 2020.
- Pirbal, Ferhad. “Kurdish literature in the former Soviet Union Republic of Armenia”, dnd. *Shadow of the Lion*, wer. Kurdish Globe, Shahab Printing House, Erbil, 2012, r. 114-121.
- Pirbal, Ferhad. “Pioneer Kurdish Publishers”, dnd. *Shadow of the Lion*, wer. Kurdish Globe, Shahab Printing House, Erbil, 2012, r. 44-49.

- Pîrbal, Ferhad. *Rojnamegerîy Kurdî be Zimanî Ferensî*, ç.2, Belavki-rawekanî Binkey Xendan-Kovarî Aso, Silêmanî, 2006.
- Rohat. *Kürdolojî Bilimi'nin 200 Yıllık Geçmişi (1787-1987)*, weş. Komkar, Köln, 1987.
- Savi, Saime İnal. *Yusuf Ziyaeddin Paşa'nın El-Hediyetü'l-Hamîdiyye'sinde Osmanlıca-Türkçe Taraması*, weş. Elila, Ankara, 1993.
- Sayım, İlyas. *Yekemîn Încîla Kurdî Bi Alfabe Ya Ermenî Transkrîpsiyon û Lêkolîn*, Zanîngeha Bîngolê, Bîngol, 2024.
- Serdî, Hasan Hîşyar. *Görüş ve Anılarım*, weş. Med, İstanbul, 1994.
- Silopi, Zinnar. *Doza Kürdüstan*, Stewr basim-evi, 1969.
- Şakelî, Ferhad. *Mem û Zîn'de Kürt Milliyetçiliği*, weş. Doz, İstanbul, 1996.
- Şemrexî, Huseyn (amd.). *Nehcu'l-Enam – Eqîdeya Îmanê*, weş. Nûbihar, Stenbol, 2012.
- Şerefhanê Bedlîsî. *Şerefname*, wer. Z. Avcı, weş. Azad, Mersin, 2014.
- Şêx Evdirehmanê Axtepî. *Rewdneîn*, amd. Z. Zinar, Stockholm, 1991.
- Şêx Mihemed Can. *Leyl û Mecnûn*, amd. Z. Zinar, Stockholm, weş. Pencînar, 1991.
- Taşgîn, Ahmet. “Süryani Kadim Ortodoks Kilisesinde Yenileşme Çabaları: Deyru'l-Zafaran Manastırında Patriklik Matbaası”, dnd. *Süryaniler ve Süryanilik*, c. 4, amd. A. Taşgîn û nd., weş. Orient, Ankara, 2005.
- Teotig. *Baskı ve Harf Ermeni Matbaacılık Tarihi*, wer. S. Malhasyan-A. İncidüzen, weş. Birzamanlar, İstanbul, 2012.
- The Twenty-First Report Of The British And Foreign Bible Society*, Printed By Augustus Applegath, London, 1825.
- The Twenty-Third Report Of The British And Foreign Bible Society*, Printed By J. Moyes, London, 1827.
- Trigona-Harany, Benjamin Oliver Sunny. *İntibâh or Hâb-ı Gafllet: Âşûr Yûsuf, Naûm Fâik and the Ottoman Süryânî*, teza lîsansa bilind, Zanîngeha Boğaziçi, İstanbul, 2008.
- Tunaya, Tarık Zafer. *Türkiye'de Siyasal Partiler Cilt: 1 İkinci Meşrutiyet Dönemi 1908–1918*, weş. Hürriyet Vakfı, İstanbul, 1984.

- Tunaya, Tarık Zafer. *Türkiyede Siyasal Partiler Cilt: II Mütareke Dönemi*, weş. Hürriyet Vakfı, İstanbul, 1986.
- Wheeler, C. H. *Ten Years on The Euphrates*, American Tract Society, Boston, 1868.
- Wheeler, C. H. *Odds And Ends: Or Gleanings From Missionary Life*, Boston, Congregational Sunday-School and Publishing Society, 1888.
- Xeznedar, Marûf. *Dîroka Edebiyata Kurdî*, c. I, wer. Z. Avcı, Stenbol, weş. Nûbihar, 2024.
- Yakut, Esra. *Şeyhülislâmlık: Yenileşme Döneminde Devlet ve Din*, weş. Kitap, İstanbul, 2005.
- Yeranyan, Gor. *Episodes From Armenian-Kurdish History: Vol. 1 -Kurdish-Speaking Armenians, Printed Books in Kurdish Language With Armenian Script-*, Matenadaran Mesrop Mashtots Institute of Ancient Manuscripts, Yerevan, 2024.
- Yusuf Ziyaeddin Paşa. *Kürtçe-Türkçe Sözlük*, amd. M. E. Bozarslan, weş. Çıra, İstanbul, 1978.
- Yûsuf Diyaedîn Paşa. *Ferhenga Hemîdî/Kurdî-Kurdî*, amd. J. Dost, weş. Dara, Stenbol, 2017.
- Yûsuf Ziyâ Paşa, *El-Kava'idu'l Lugati'l Kurdiyye-Mukaddime*, amd. A. Gemi-A. Yıldız, weş. Dara, İstanbul, 2021.
- Yüksel, Müfid. "Molla Hüseyin el-Batevî ve Kürtçe Mevlid-i Şerîfî", dnd. *Uluslararası Beytüşşebap ve Molla Hüseyin Batevî Sempozyumu Bildirileri, 20-21 Eylül 2014*, Şırnak Üniversitesi Yayınları, 2015, r. 129-136.
- Zaza, Nureddin. *Bir Kürt Olarak Yaşamım*, wer. A. Karakoç, weş. Pêrî, İstanbul, 2000.
- Zinar, Zeynelabidîn. *Nimûne Ji Gencîneya Çanda Qedexekirî*, Stockholm, 1991.
- Zinar, Zeynelabidîn. *Xwendina Medresê*, weş. Pencînar, Stockholm, 1993.

## 5. Çavkaniyên Elektronîk

"Avedikyan Ermenice-Türkçe-İngilizce Sözlük", <http://www.avedikyan.com>, 14.01.2014.

- Blau, Joyce. "Kurdish Language ii. History of Kurdish Studies", *Encyclopædia Iranica*, 2009, <https://iranicaonline.org/articles/kurdish-language-ii-history-of-kurdish-studies>, 26.12.2024.
- Boğos-Der Bedrosyan, Sevan. "Boğos ailesinin Til'den Kamışlı'ya kadar olan hikâyesi", <https://www.houshamadyan.org/tur/ada/kuzey-ve-gueney-amerika/bogos-der-bedrosyan-arsivi-usa.html>, 18.01.2025.
- Hanioglu, M. Şükrü. "Meşrutiyet, <https://islamansiklopedisi.org.tr/mesrutiyet>, 06.03.2025.
- Kurdish Academy of Language. "The first Kurdish Textbook from 1860", <http://www.kurdishacademy.org/?q=node/766>, 25.07.2013.
- "Memorial records for Alphaeus N. Andrus", <http://www.dlir.org/archive/orc-exhibit/items/show/collection/12/id/16661>, 18.02.2015.
- "Memorial records for Henry H. Riggs", <http://www.dlir.org/archive/orc-exhibit/items/show/collection/12/id/17412>, 18.02.2015.
- Neîman, Mistefa. "Bibliyografyay dûsed salî kitêbî kurdî 1787-1986", *Kitêbxaneyê Kurdî*, <http://www.calameo.com/read/000501720e4dbe388c61c?authid=pZrc1zF67haY>, 08.01.2014.
- "President Woodrow Wilson's 14 Points (1918)", <https://www.archives.gov/milestone-documents/president-woodrow-wilsons-14-points>, 26.01.2025.
- "Report, Printing done in 1856, Committee on Publications", <https://archives.saltresearch.org/handle/123456789/43090>, 03.01.2025.
- Report, Printing in 1857, by Edwin E. Bliss, <https://archives.saltresearch.org/handle/123456789/44049>, 03.01.2025.
- "Têgeyiştinî Rastî", *World Digital Library*, <http://www.wdl.org/en/item/3270/>, 12.03.2015.
- Thomas, Kenneth J. "BIBLE viii. Translations of the Bible into other Modern Iranian Languages", *Encyclopædia Iranica*, Vol. IV, Fasc. 2, pp. 213-214, awayê dijîtal: <http://wwwiranicaonline.org/articles/bible-viii>, 05.01.2014.

“Tarih Çevirme Kılavuzu”, <http://193.255.138.2/takvim.asp>, 20.05.2012.

“University of Cambridge Library Search”, <http://search.lib.cam.ac.uk/?q=Kurdish&x=13&y=16>, 10.07.2013.

*Vinton Book Copy Volume III Near East*, The Congregational Library, Boston, bêdîrok, r. 82, <https://ia600508.us.archive.org/18/items/vintonbookarmenio3vint/vintonbookarmenio3vint.pdf>, 07.01.2014.

“Yazma Eserler Veritabanı”, <https://portal.yek.gov.tr/works/search>, 12.01.2025.

Yüksel, Müfit. “Ana dilde Eğitim Ve Kürtçede Alfabe/İmlâ Meselesi-7”, *Yeni Şafak* (2.11.2013), <http://www.yenisafak.com.tr/yazarlar/MufitYuksel/ana-dilde-egitim-ve-kurtcede-alfabe-iml%C3%A2-meselesi-7/40358>, 28.11.2014.

## LÎSTEYA KITÊBÊN KURDÎ YÊN DI SERDEMA OSMANÎ DE

1. *Dîwanî Belaxet-unwan Mewlana eş-Şêxî Muceddidî Terîqî Neq-şibendî Ziyaeddîn Xalid*, Mewlana Xalidê Şarezorî, Metbe‘e-i Amîre, Stembol, H.1260/M.1844. (Rûpel: 99, Ruxsar: Menzûm, Cure: Edebiyat/helbesta klasîk, bi herfên ‘erebî)

2. *Încîl, Xudeê me Îsa el Mesîh e*, Nivîsandin bi Destê Madteos, Wergêr: Stepan, Çapxane: Nediya, Stembol, 1856. (Weşanger: BFBS<sup>786</sup>, Rûpel: 112, Ruxsar: Pexşan, Cure: Wergera dînî/xirîstiyânî, bi tîpên ermenkî)

3. *Încîl, Xudeê me Îsa el Mesîh e*, Nivîsandin bi Destê Madteos Marqos Luqa û Yanna, Wergêr: Stepan, Çapxane: Kayol, Stembol, 1857. (Weşanger: BFBS, Rûpel: 398, Ruxsar: Pexşan, Cure: Wergera dînî/xirîstiyânî, bi tîpên ermenkî)

4. *Aypenaran Alîfbe Cuz Kurmancî û Ermenî*, Amadekar: Migirdîç Vartabed Dîkranyan, Çapxane: H. Muhendisyan, Stembol, 1860. (Rûpel: 55, Ruxsar: Pexşan, Cure: Ziman/alfabe, Bi tîpên ermenkî)

5. *Labder Lusadu/Çirayê Ronî*, Migirdîç Vartabed Dîkranyan, Çapxane: H. Muhendisyan, Stembol, 1866. (Rûpel: 188, Ruxsar: Pexşan, Cure: Dîrok, bi tîpên ermenkî)

6. *Pêymanê No ê Xoîyê me Îsa el Mesîh*, Wergêr: J. G. Bliss û yên din, Weşanger: ABS<sup>787</sup>, Çapxane: A. H. Boyacıyan, Stenbol, 1872. (Rûpel: 624+3, Ruxsar: Pexşan, Cure: Wergera dînî/xirîstiyânî, bi tîpên ermenkî)

7. *Yerkaranê bi Kurmancî*, Çapxane: Kollêcê, Xarpêt, 1880. (Rûpel: 3+108, Ruxsar: Menzûm, Cure: Wergera dînî/xirîstiyânî, bi tîpên ermenkî)

8. *Dîwan-i Et‘ime*, Ebû Îshaq Hallac-i Şîrazî, Weşanger: Hebîb Efendî, Çapxane: Ebuzziya, Stenbol, H. 1302/M. 1885. (Rûpel: 172+12, Ruxsar: Menzûm, Cure: Edebiyat/helbesta klasîk, bi herfên ‘erebî)

---

786 BFBS: British and Foreign Bible Society [Civata Kitêba Pîroz a Brîtanya û Biyanî]

787 ABS: American Bible Society [Civata Kitêba Pîroz a Amerîkî]

9. *Turkçeden Kurd Lisanina Mutercem Ilmihaldır*, Wergêr: Omer Ferîd, Çapxane: Me'mûretul'ezîz<sup>788</sup>, Elezîz, H. 1308/M. 1891. (Rûpel: 48, Ruxsar: Pexşan, Cure: Wergera dînî/îslamî, Bi tîpên 'erebî)

10. *Încîla Rabbê me Hisos Kristos ku Madteos Nvîsî*, Wergêr: Amirkhanian, Der Ghazarian û Abalahadian, Çapxane: A. H. Boyacyan, Stenbol, 1891. (Weşanger: ABS, Rûpel: 148, Ruxsar: Pexşan, Cure: Wergera dînî/xirîstiyani, bi tîpên ermenkî)

11. *El-Hedîyyetu'l-Hemîdiyye fî'l-Luxeti'l-Kurdiyye*, Yûsif Ziyâeddîn Paşa el- Xalidî, Çapxane: Şîrket-i Murettibiye, Stenbol, H. 1310/M. 1893. (Rûpel: 319, Ruxsar: Pexşan, Cure: Ziman/ferheng, bi herfên 'erebî)

12. *Mewlidu'n-Nebî*, Mele Ehmedê Xasî, Çapxane: Lîtoğrafya<sup>789</sup>, Diyarbekir, R. 1315/M. 1899. (Rûpel: 36, Ruxsar: Menzûm, Cure: Edebiyata îslamî, Bi herfên 'erebî.

13. *Mewlidu'n-Nebî bi'l-Luxeti'l-Kurdiyye*, Mela Huseynê Bateyî, Çapxane: İctihad, Qahîre, H. 1324/M. 1906. (Weşanger: Kurdîzade Ehmed Ramîz, Rûpel: 35+1, Ruxsar: Menzûm, Cure: Edebiyata îslamî, bi herfên 'erebî)

14. *Mewlidu'n-Nebî*, Mela Huseynê Bateyî, Çapxane: Nediya, R. 1324/M. 1908. (Weşanger: Diyarbekirli Haziq, Rûpel: 48, Ruxsar: Menzûm, Cure: Edebiyata îslamî, bi herfên 'erebî)

15. *Elîfbayê Kurmancî*, Xelîl Xeyalî, Çapxane: Nediya, Stembol, R. 1325/M. 1909. (Weşanger: Kurdîzade Ehmed Ramîz, Rûpel: 27, Ruxsar: Pexşan, Cure: Ziman/alfabe, bi herfên 'erebî)

16. *Musehheh Mewlidê Se'adetê Peyxemberî*, Mela Huseynê Bateyî, Çapxane: Kutubxane-i Cihan, Stembol, R. 1324/M. 1908. (Weşanger: 'Ebdussemmed Fexrî, Rûpel: 48, Ruxsar: Menzûm, Cure: Edebiyata îslamî, bi herfên 'erebî)

17. *Xulaseî 'Eqâid*, Şêx 'Ebdullah Efendiyê Şemdînî (Nehrî), Çapxane: Manzûme-i Efkâr, Stembol, 1911, (Weşanger: Kurdîzade Ehmed Ramîz, Rûpel: 32, Ruxsar: Pexşan, Cure: 'eqîdename, bi herfên 'erebî)

---

788 Çapxaneya fermî ya wilayeta Me'mûretul'ezîzê.

789 Çapxaneya fermî ya wilayeta Diyarbekrê.

18. *Încîla Rabbê me Hisos Kristos ku Marqos Nvîsî*, Wergêr: Amir-khanian, Der Ghazarian û Abalahadian, Çapxane: A. H. Boyaciyân, Stembol, 1911. (Weşanger: ABS, Rûpel: 87, Ruxsar: Pexşan, Cure: Wergera dînî/xirîstiyânî, bi tîpên ermenkî)

19. *Încîla Rabbê me*, Hisos Kristos ku Luqas Nvîsî, Wergêr: Amir-khanian, Der Ghazarian û Abalahadian, Çapxane: A. H. Boyaciyân, Stembol, 1911. (Weşanger: ABS, Rûpel: 148, Pexşan- Cure: Wergera dînî/xirîstiyânî, bi tîpên ermenkî)

20. *Încîla Rabbê me Hisos Kristos ku Yanna Nvîsî*, Wergêr: Amir-khanian, Der Ghazarian û Abalahadian, Çapxane: A. H. Boyaciyân, Stembol, 1911. (Weşanger: ABS, Rûpel: 109, Ruxsar: Pexşan, Cure: Wergera dînî/xirîstiyânî, bi tîpên ermenkî)

21. *‘Emelê Resûlan*, Wergêr: Amirkhanian, Der Ghazarian û Abalahadian, Çapxane: A. H. Boyaciyân, Stembol, 1911. (Weşanger: ABS, Rûpel: 138, Ruxsar: Pexşan, Cure: Wergera dînî/xirîstiyânî, bi tîpên ermenkî)

22. *Mewlîdu’n-Nebî*, Hesenu’l-Ertûşî (Mela Huseynê Bateyî), Çapxane: Nediyyar, Stembol, R. 1327/M. 1911. (Rûpel: 47, Ruxsar: Menzûm, Cure: Edebiyata îslâmî, bi herfên ‘erebî)

23. *Mewlîdu’n-Nebî*, Hesenu’l-Ertûşî (Mela Huseynê Bateyî), Ehmed Kamil Metbe‘esi, Stembol, R. 1327/M. 1912. (Weşanger: Mehmed Şefîq Arwasî, Rûpel: 48, Ruxsar: Menzûm, Cure: Edebiyata îslâmî, bi herfên ‘erebî)

24. *Qewaîdî Lisanî Kurdî*, Omer ‘Ewnî, Çapxane: Xûrşîd Efendî, Elezîz, R. 1328/M. 1912. (Rûpel: 48, Ruxsar: Pexşan, Cure: Ziman/rêziman, bi herfên ‘erebî)

25. *Mewlûdnamey Batî*, Mela Huseynê Bateyî, Çapxane: Nediyyar, Stembol, 1915 (Rûpel: 51, Ruxsar: Menzûm, Cure: Edebiyata îslâmî, bi herfên ‘erebî)

26. *Gewherî Yegane*, Huseyn Huznî Mukriyanî, Weşanger û Çapxane: Huseyn Huznî Mukriyanî, Heleb, 1916. (Rûpel: 4 c., 2250?, Ruxsar: Pexşan, Cure: Dîrok, bi herfên ‘erebî)

27. *Newbehar*, Ehmedê Xanî, Çapxane: Ehmed Kamil, Stembol, R. 1332/M. 1916. (Weşanger: Mehmed Şefîq Arwasî, Rûpel: 37, Ruxsar: Menzûm, Cure: Ziman/ferheng, bi herfên ‘erebî)

28. *Nehcu'l-Enama Mela Xelîl we 'Eqîda Mela Ehmedê Xanî*, Mele Xelîlê Sêrtî-Ehmedê Xanî, Çapxane: Ewqaf-i Islamiye, Stembol, H. 1337/M. 1918. (Rûpel: 30, Ruxsar: Menzûm, Cure: Edebiyata îslamî/'eqîdename, bi herfên 'erebî)

29. *Muqeddîmetu'l-Îrfan*, M.M. (Mehmed Mîhrî), Çapxane: Necm-i Istiqbal, Stembol, R. 1334/M. 1918. (Weşanger: Mehmed Şefîq Arwasî, Rûpel: 16, Ruxsar: Pexşan, Cure: Ziman/rêziman, bi herfên 'erebî)

30. *'Eqîda Kurdan*, 'Ebdurehîm Rehmî, Çapxane: Nediya, Stembol, R. 1334/M. 1918. (Ruxsar: Menzûm, Cure: Edebiyata îslamî/'eqîdename, bi herfên 'erebî)

31. *Memê Alan*, 'Ebdurehîm Rehmî, Çapxane: Nediya, Stembol, R.1335/M. 1919. (Ruxsar: Pexşan, Cure: Edebiyat/şano, bi herfên 'erebî)

32. *Mem û Zîn*, Ehmedê Xanî, Çapxane: Necm-i Istiqbal, Stembol, R.1335/M. 1919. (Weşanger: KTMNC<sup>790</sup>, Rûpel: 139, Ruxsar: Menzûm, Cure: Edebiyat/helbesta klasîk, bi herfên 'erebî)

33. *Gaziya Welat* -Kitêba Ewil-, 'Ebdurehîm Rehmî, Çapxane: Necm-i Istiqbal, Stembol, R. 1335/M. 1919. (Rûpel: 24, Ruxsar: Menzûm, Cure: Edebiyat/helbesta modern, bi herfên 'erebî)

34. *Encumenî Edîbanî Kurd*, Amadekar: Emîn Feyzî Beg, Çapxane: Tercuman-i Heqîqet, Stembol, H. 1339/M. 1920. (Rûpel: 142, Ruxsar: Menzûm, Cure: Edebiyat/antolojî, bi herfên 'erebî)

35. *Hînkê Zimanê Kurdî*, Amadekar: Lijneya Civata Hêvî, Çapxane: Necm-i Istiqbal, Stembol, R. 1337/M. 1921. (Weşanger: Civata Hêvî, Rûpel: 64+1, Ruxsar: Pexşan, Cure: Ziman/rêbera axaftinê, bi herfên 'erebî)

36. *Gaziya Welat* -Kitêba Duwê-, 'Ebdurehîm Rehmî, Çapxane: Necm-i Istiqbal, Stembol, R. 1337/M. 1921. (Rûpel: 23, Ruxsar: Menzûm, Cure: Edebiyat/helbesta modern, bi herfên 'erebî)

37. *Dîwan-i Es'ed -Farsî û Tirkî-*, el-Hac Mehmed Es'ed, Çapxane:

---

790 KTMNC: Kurd Ta'mîm-i Ma'arif ve Neşriyat Cem'iyeti [Komeleya Belavkirina Zanîn û Weşanê ya Kurd]

Ewqaf, Stenbol, R. 1337/M. 1921. (Rûpel: 64+5, Ruxsar: Menzûm, Cure: Edebiyat/helbesta klasîk, bi herfên 'erebî)

38. *Dîwana Cizîrî*, Şêx Ehmed el-Cezerî (Melayê Cizîrî), Çapxane: Ewqaf-i Islamiye, Stenbol, R. 1338/M. 1922. (Weşanger: Mehmed Şefîq Arwasî, Rûpel: 96, Ruxsar: Menzûm, Cure: Edebiyat/helbesta klasîk, bi herfên 'erebî)

39. *Dersa Dîn*, 'Ebdurehîm Rehmî, Çapxane: Necm-i Istiqbal, Stenbol, R. 1338/M. 1922. (Rûpel: 16, Ruxsar: Pexşan, Cure: 'Eqîde-name, bi herfên 'erebî)

40. *Încîla 'Îsayê Mesîh Li Ser Nivîsîna Metta*, Wergêr: A. N. Andrus û Henry Riggs, Çapxane: Agop Matyosyan, Stenbol, 1922. (Weşanger: ABS, Rûpel: 104, Ruxsar: Pexşan, Cure: Wergera dînî/xirîstiyânî, bi herfên 'erebî)

41. *Încîla 'Îsayê Mesîh Li Ser Nivîsîna Markus*, Wergêr: A. N. Andrus û Henry Riggs, Çapxane: Agop Matyosyan, Stenbol, 1923. (Weşanger: ABS, Rûpel: 106-167, Ruxsar: Pexşan, Cure: Wergera dînî/xirîstiyânî, bi herfên 'erebî)

42. *Încîla 'Îsayê Mesîh Li Ser Nivîsîna Luqa*, Wergêr: A. N. Andrus û Henry Riggs, Çapxane: Agop Matyosyan, 1923. (Weşanger: ABS, Rûpel: 169-271, Ruxsar: Pexşan, Cure: Wergera dînî/xirîstiyânî, bi herfên 'erebî).

## SUMMARY

The 19th and 20th centuries, with the development and spread of the printing press, heralded a new era for the Kurdish language: The end of traditional manuscripts and the birth of the printed book. Already in 1787, a Kurdish grammar and dictionary by the Italian missionary-priest Maurizio Garzoni was published in Rome. There were also books on Kurdish language and literature published by missionaries, orientalist and travelers. However, it was only at the beginning of the 20th century that printed Kurdish books became an alternative to the manuscript tradition. This is also directly linked to the development of the Kurdish press. The Kurdish language and literature, which until then had been created and reproduced in Kurdish madrasas and in the palaces of Kurdish *mîrs*, was now being printed in printing houses in urban centers such as Cairo, Istanbul, Diyarbakir and Mamuretulaziz. Thus, Kurdish classics such as *Mem û Zîn* and Melayê Cizîrî's *Divan* reached a wider audience with the printing press, and the first works that formed the basis of modern Kurdish literature found the opportunity to be printed.

The subject of *Kurd, Kitêb, Çapxane* is Kurdish book publishing in the Ottoman period, in other words, Kurdish books published within the Ottoman borders. The main purpose of this study is to prepare a list of 42 Kurdish books published between 1844 and 1923 and to explain their content and historical context. For this purpose, copies of all Kurdish books published during this period were collected from official and private libraries, analyzed, classified and introduced.

*Kurd, Kitêb, Çapxane* consists of an introduction, four chapters and a conclusion. The introduction explains the purpose and framework of the study and provides information about the sources and methodology.

The first chapter is devoted to a brief history of the printing press. The spread of the printing press in the Ottoman Empire, the

first printing presses established in Kurdish cities, the Kurdish intellectuals' realization of the importance of the printing press and their struggle for the spread of literacy among Kurds are among the topics of this chapter. The history of written Kurdish is also briefly summarized in this section

The second part discusses the situation of the Kurds in the Ottoman Empire. In this section, events, organizations and individuals in the 19th and 20th centuries are mostly investigated: The Kurdish *mîrs* that were liquidated as a result of the Ottoman centralization efforts, the first Kurdish newspaper *Kurdistan* (1898, Cairo), the Second Constitutional Monarchy, World War I and the work of the Kurdish intellectual movement that developed especially in Istanbul and Diyarbakir, and the thoughts of Kurdish intellectuals about the Ottoman Empire and Kurdishness are among the main topics of this section. In addition, at the end of the chapter, the ideas of Ehmedê Xanî and Hacî Qadirê Koyî, who had a great influence on Kurdish nationalism, are emphasized. With these researches and explanations, it has been tried to show the development of Kurdish national identity in the last period of the Ottoman Empire. According to Mesut Arslan, it is this development of national identity that forms the basis of printed Kurdish books and the Kurdish press. Accordingly, there is a mutual and significant correlation between Kurdish nationalism and the Kurdish press and Kurdish book publishing. These are elements that feed and support each other.

While the first two chapters of the book constitute the theoretical background of the study, the third and fourth chapters are purely bibliographical: In the third chapter, Kurdish books in Arabic script printed during the Ottoman period are classified and introduced one by one. Among these books, there are a few new ones that have not been mentioned in the sources before. In this classification and introduction, the historical developments described in the second chapter and the history of Kurdish societies are also taken into consideration. In this way, the connection between Kurdish book publishing and Kurdish nationalism was tried to be shown. In addition, short biographies of three Kurdish book publishers, Kurdîzade

Ehmed Ramîz, Mehmed Şefîq Arvasî and Huseyn Mukriyanî, and their motivations for publishing Kurdish books are among the topics of this chapter.


The fourth and final chapter deals with the Kurdish books published by Protestant missionaries. In this section, the definition of missionary work, missionary work in the Ottoman Empire, and the relationship of missionaries with Kurds and the Kurdish language are emphasized. Then -as in the third chapter- the books published in this period are introduced one by one. This section also shows us the phenomenon of “Kurdish books in Armenian script”: Most of the 14 Kurdish books published by Protestant missionaries during this period were translations of the *Bible*, 11 of which were in Armenian script. Moreover, the translators of these Kurdish texts in Armenian script were mostly Kurdish-speaking Armenians. The analysis of these texts and their historical background is a research topic in itself.

At the end of *Kurd, Kitêb, Çapxane*, there is a list of Kurdish books published during the Ottoman period and their cover illustrations.


## BERGÊN PIRTÛKAN

1. Helbesta kurdî-lorî ya di *Dîwan-i Et'îme* de:  
 “We lehu fi'l-kurdiyyati we'l-loriyyat”, Stembol, 1302/1885.






3. *El-Heddiyyetu'l-Hemîdiyye fî'l-Luxeti'l-Kurdiyye*,  
Stembol, 1310/1893.




4. *Mewlida Kirdî ya Ehmedê Xasî, Diyarbekir, 1315/1899.*




5. *Mewlûda Kurmancî ya Mela Huseynê Bateyî,*  
weşana Kurdîzade Ehmed Ramîz,  
Qahîre, 1324/1906.






7. Musehheh Mewlidê Seadetê Peyxemberî, Xoce Huseynê Ertoşî  
(Mela Huseynê Bateyî), Stembol, 1325/1909.



بِسْمِ اللَّهِ الرَّحْمَنِ الرَّحِيمِ

حمد بی حد بو خدای عالمین او خدای دایه مه دین مبین  
 ام کریمه امّا خیر البشر تابع وی مقتدای ناموز  
 او خدای مالک ملک العظیم دایه مه میراث قرآنا کریم  
 دین مه کز کامل و نعمت تمام یعنی دامه آخندو دارالسلام  
 او خدای بی نظیر و ذوالجلال بی مثال و بی همتا و بی دوال  
 رازق بی دست و پاماد و موز عالم سیرانه گوشت دز صدوز  
 کاسار بنده و سلطان جان راجع رحمن لطیف و مهربان

8. *Xulaseî 'Eqaid*, Şêx 'Ebdullah Efendiye Nehrî,  
weşana Kurdîzade Ehmed Ramîz, Stembol, 1329/1911.



رەش بە لێ      عدد


۱

باش، واجبات لاسمه : ازدبزم . حتی ابرو ،  
هرچه قاص علماء ، فضلاء ، ادباء زى جنس وقوم  
کردان، هاته : ا کر توحزبك زاحف هندك ، زى  
مستثناء بکى — اوژى ، وک احمد خانى، احمد بآنى،  
فقيه طيران ، على حريرى ، ملاء جزيرى ،  
« قدس سرهم » اوى دى — حوياًتري « خدمت » ی  
وان ، غير کردانرا بويه ؟؟؟ [۱۰]


مرووکو ، ابناء جنس خورا « خدمت » نکه .  
هر چندان غير وانرا ، دکه ، بالاکه ؛ « عندالله »  
خودان خير وسواب نابه . « عندالناس » زى تقدیس  
نابه ؟ هرودکی : مروویکو ؛ مالدار بی اقرباء و تعلقات  
و حیرانی وی ، محتاجی معاوت و صدقان بن ، اورایه ،

[۱۱] وی ، تعطیلا ، نظرقوم ، پرستان ، نظریامنه . لورا  
طورتا ازایه ، خلقتدا ، از کرپرست « خاق » کرمه ...  
چارنا ، صحبتاندا بو ، « ، لطیفه » مقابل سوالا تو  
کرد، یان مسلمان ، هر جوابدانان، من . از ، کردم و مسلمانم  
واقع بويه .

10. *Newbehar*, Ehmedê Xanî,  
Stembol, 1332/1916.




11. *Mem û Zîn*, Ehmedê Xanî,  
Stembol, 1335/1919.






|                         |                          |
|-------------------------|--------------------------|
| سەرنامه نامه نام الله   | بى نام وى ناتمامه والله  |
| اى مطلع حسن عشقباژى     | محبوب حقیقی و مجازی      |
| نام تیه لوح نامیا عشق   | اسم تیه نقش خامیا عشق    |
| بى نقش ته نقش خامه خامه | بى نام ته نامه ناتمامه   |
| نام تیه شاه بیت مقصود   | فهرست مکاتبات محمود      |
| مضمون مراسلات لاریب     | مشهود مکاشفات بالغیب     |
| محبوب قلوب من له القلب  | قلبان تودکی بباخو فه جلب |
| معشوق تویی بفخرو نازی   | عاشق تویی لیک بى نیازى   |
| مطلق تومفید ومستفادی    | بى شبه مرید وهم مرادی    |
| نورى، تودحسن روى دلدار  | نارى، تود قلب عاشق زار   |
| شمى نه ژقسم نورو ناری   | شمسى ژعیان تو پرده دارای |
| کنجی تودنیف طلسم عالم   | کنزى توعیان ژاسم آدم     |
| اف عالم و آدمی و مشهود  | اف ممکن و ماسوای موجود   |
| همیان بیه مداره و دیر   | فیاض ریاض خلق والامر     |
| امر ته باقظ کن دو عالم  | موجود کرن غرض چه آدم     |
| آدم بخوه يك ژهر دو آنه  | يك حرف ژامرکن فکانه      |
| او حرف حقیقتا محقق      | هم امره بقدرتاته هم خلق  |
| اشباح مرسمن ژناسوت      | ارواح موسمن بلا هوت      |
| اف روح وجسد بجبروا کراه | تزو یج بوین بامرالله     |
| ناسوتی اگرچه رنک سفاله  | لا هوتی ژپر توا جاله     |


13. Gaziya Welat - Kitêba Ewil-,  
'Ebdurehîm Rehmî, Stembol, 1919.



14. *Encumenî Edîbanî Kurd*, Emîn Feyzî,  
Stembol, 1339/1920.



15. *Hînkêrê Zîmanê Kurdî*,  
Stembol, 1921.



16. *Dîwana Cizîrî*, Melayê Cizîrî, weşana Mehmed Şefîq Arwasî,  
Stembol, 1338/1922.

# دیوانا جزیری

---

مؤلفی

شیخ احمد الجزیری

---

طابعی

محمد شفیق آلا رواسی الحسینی

---


شہزادہ ہاشمی : اوقاف اسلامیہ مطبعہ سی  
۱۳۳۸ — ۱۳۴۰

Çavkanî: Henry H. Riggs, "The Religions of the Dersim Kurds", *Missionary Review of the World*, v.34, no. 10 (1911), r. 737.



A MISSIONARY VISITING A KURD AT HOME

18. Yekemîn wergera kurdî ya Încîlê: Încîla Madteos (Metta), 1856.



19. Încîla Metta, Marqos, Luqa û Yuhenna bi hev re.

# ԻՆՃԻԼ

ԽՕՏԷԷ ՄԷ ԻՍԸ ԷԼ ՄԷՍԻՇԷ

ՆԸՎԸՄԵՆՏԸՆ

ՊԸ ՏԷՍԹԷ ՄԱՏԹԷՈՍ ՄԱՐԿՈՍ

ԼՈՒԳԱՍ ՈՒ ԿԵՆՆԱ

— 1010301 —

Bible. N.T. Kurdish-Kurmangî.  
...

ԼԸ ԸՄԹԱՄԴՈՒԼՏԱ

ԳԸՅՕԼ

1857

20. Aypenaran Alifbe Cuz Kurmancî û Ermenî,  
Migirdîç Vartabed Dîkranyan.

431-57 ԱՅԻՐԵՆԵՐԱՆ  
ԲԻՐՏԵՐԷՆ ԵՒ ՀԱՅԵՐԷՆ  
“Կ”  
ԱՆՏՊՈՆՏԻՐ  
ԳՈՐԾԱՆՈՒՄ ԵՐՄԷՆԻ

ՅՕՐԻՆԵԱՆ Ի ՊԵՏՍ ՄԱՆԱԿԱՆՆԵՆ ԲԻՐՏԻՍՏԱՆՏԻՈՅ  
Ի Տ. ՄԿԲՏԻՉ ՎԱՐԴԱՊԵՏՏԵ ՏԻԳՐԱՆԵԱՆ  
ՅԱՌԱՋԱՐԷԷ ԲԻՐՏԻՍՏԱՆՈՒ ԵՒ ԲԱՆՈՒՆՈ

Ի ՀԱՅՐԱՊԵՏՈՒԹԵԱՆ Ս. ԵՋԱՄԵՆՈՒ Տ. Տ. ՄԵՏՈՒՆՈՒ  
ՎԵՀԱՊԱՆՈՒ ՊԵՏՈՒՄԻՆՈՒ ԵՄԼԱՆՆԵՆ ՀԱՅՈՅ  
Ի ՊԵՏՐԱՊԵՏՈՒԹԵԱՆ Ս. ԵՐՈՒՄԵՆՈՒ Տ. ՅԱՎԱԿԱՆՈՒ  
ՄԵՐԱՋԱՆ ԵՐՊԵՊԵՆՈՒՄ  
ԵՒ Ի ՊԵՏՐԱՊԵՏՈՒԹԵԱՆ ՊԵՏՐԱՊԵՏՈՒՄԻՆՈՒ Տ. ՄԵՐՈՒՄ  
ԵՄԼԱՆՊԵՏՈՒ ԵՐՊԵՊԵՆՈՒՄ



Այս քաղաքը քաղաքի հարկի հարկը քաղաքի  
Մշակ քաղաքի իմաստով և ան քաղաքի քաղաքի

1860

ԿՈՍՏԱՆԴՆՈՒՊՈԼԻՍ

Ի ՊԵՏՐԱՊԵՏՈՒ ԵՐՊԵՊԵՆՈՒՄ

ՊԵՏՐԱՊԵՏՈՒ ԵՐՊԵՊԵՆՈՒՄ

21. *Labder Lusadu/Çirayê Ronî,*  
*Migirdîç Vartabed Dîkranyan.*

## ԶԲՐԱՅԻՆ ԲՈՕՆԻ

### ՀԱԹ ԶԻ ԳՐԱԲԵՆ

ԺԸ ՄԿՐՏԻՉ ՏԻԳՐԱՆԵ ՄԸԹՌԱՆ

ՄՈՒՐԱԽԱՍԵ ԳԻՐՏԻՍԹԱՆ

ԳԱՍՄԱ ԳՈՒ

Պրնտեհ մաքուր, գոցմեղեղմես ու խոնկառն Արաբիկան  
քի աշխիք քրույնսին վարագայե բազմեհմա զո ընման Արմենի  
նըքնանաքնի :

ԻԵՑՐԱԹԵ ՍԱՆԻԿԱՆ ԳԸԼԱ ԻԿԹԻԸՄ ԳԸՊԻ


ԱԸ ԲՈՃԵ ԿԱԹՈՒԼԻԿՈՍԻԹՈՍԵ ԵԶՄԻԱՆԻՆ ԸՌՕՆԻ  
ԸՄՈՒԿ ՄԱՏԹԵՈՍ ԿԱԹՈՒԼԻԿՈՍԵ

ԱԸ ԲԱԹՐԻԿԻԹՈՍԵ ԳՈՒՏՄԵ ԲԱՏԻԸ ԳՈՎՄԵԿԱՊԱՆՏ  
ԵՍԱՅԻ ԱՐՔԵՊԻՍԿՈՊՈՍԵ

ԳԸ ԱՄԻԵ ԻԶԶԵԹԼՈՒ ԻՌՈՏԻԳԸԺԱՌԹ  
ԳՕՂՈՍ ԲԱԹՐԻԿԵ ԸՍՏԱՄԳՈՒԼ

ԱԸ ԸՍՏԱՄԳՈՒԼԵ  
ԱԸ ԳԱՍՄԱՆԱՆԵ ՄԻԻԿԵՆՏԻՍ

1866



# Ի Ն Ճ Ի Լ Ա

ԸԱՊՊԷ ՄՈՒ ՅԻՍՈՒՍ ՔՐԻՍՏՈՍ

Ք Օ

ՂՈՒԿԱՍ ՆՎԻՍԻ



ԼԸ ՍԹԱՄՊՈԼՏԱ

ԼԸ ՊԱՍՄԱՆԻՄԵՆԷՆԻ Ա. Յ. ՊՕՅԱՃԵԱՆ ԹԱՊ ՊՈՒՂ

— . —

1911

— ❧ — انجیلا — ❧ —

عیسیٰ بی مسیح

— ❧ — لى نڤیسنا متی — ❧ —

— ❧ —

ژ عهزمانى اصليي يونانى هاتيه ترجمه کرن

— ❧ —

ژ طرقي جفانا کتبا مقدسى امریکایى

د سهره آغوب ماطیوسیاندا هاتییه چاپکرن

د استانبولدا

۱۹۲۲

## İNDEKS

### A

- Alî Emîrî Efendî 19,  
31, 107, 108, 153,  
Andrus, N. Alpheus  
(Misyoner) 192,  
201, 204, 205

### B

- Baban Cemaleddîn 50  
Baban 'Ebdulezîz 4,  
48, 50, 157  
Babanzade Ehmed  
Ref'et 13  
Baban Hikmet 40, 64  
Babanzade İsmail  
Heqqî 45, 48, 49,  
53, 57, 79  
Bedirxan Beg 36, 46,  
54, 55, 85  
Bedrî (Malatyali) 45,  
47, 162  
Bishop Shevriz  
(Misyoner) 185,  
186, 187, 188

### C

- Celadet Alî Bedirxan  
4, 19, 59, 60, 72,  
73, 74, 80, 83, 104,  
112, 140, 141, 142,  
153, 173, 176, 178,  
191  
Civata Hêvî (Kurd  
Talebe Cem'iyeti)  
48, 49, 50, 55, 56,  
58, 67, 69, 110,  
111, 142, 148, 157,  
168, 238

### E

- 'Ebdulkerîm (Slêmanî/  
Suleymaniyeli) 49  
'Ebdullah Cevdet 18,  
21, 33, 41, 49, 57,  
58, 64, 71, 73, 82,  
110, 160, 162, 166  
'Ebdullah Efendiyê  
Şemdînî (Nehrî)  
141, 260, 273  
'Ebdurehîm Rehmî  
[Hekarî] 16, 32,  
48, 71, 76, 136,  
137, 139, 140, 144,  
145, 150, 155, 156,  
157, 170, 177, 212,  
'Ebdurehman  
Bedirxan 39, 40,  
41, 42, 43, 46, 48,  
142, 157, 172, 173,  
174, 184  
'Ebdurezaq Bedirxan  
54, 88, 100, 112  
Ehmed Cemil  
(Mîrîkatibîzade)  
19, 45, 161  
Ehmedê Xanî 2, 30, 31,  
44, 46, 52, 79, 80,  
81, 82, 83, 84, 85,  
86, 98, 117, 118,  
119, 128, 130, 131,  
132, 139, 141, 169,  
171, 174, 176, 178,  
212, 241  
Ehmedê Xasî 102, 103,  
104, 107, 109  
Ehmed Ramîz  
[Kurdîzade] 4, 12,

- 18, 19, 32, 43, 54,  
55, 81, 105, 106,  
107, 109, 113, 115,  
117, 119, 120, 121,  
122, 123, 142, 158,  
159, 160, 161, 163,  
164, 165, 166, 167,  
168, 210, 213

- Ekrem Cemîlpaşa 20,  
23, 48, 64, 69, 71,  
83.

- 'Elî Şamil Paşa  
(Bedirxanî) 54,  
100

- Emîn Alî Bedirxan 46,  
63, 64, 65, 142,  
173

- Emîn Feyzî  
(Suleymaniyeli)  
92, 146, 147, 148,  
238, 255

- Encum Yamulkî 61,  
68, 74

- 'Ezîz Yamulkî 71, 74

### F

- Fadil Muxlîs 75  
Faîz Beg 110  
Fikrî Efendî  
(Diyarbekrî) 38,  
159  
Fikrî Necdet  
(Diyarbekrî) 49,  
75  
Fuad Temo 48, 49

### G

- Garzoni, Maurizio 29,  
30, 185, 199, 200

## H

Hacî Qadirê Koyî 2, 32,  
39, 68, 79, 82, 84,  
85, 86, 87, 88, 153,  
184, 216, 241

Haziq Efendî  
(Diyarbakirli) 103,  
108, 109, 157, 236.

Hemzeyê Muksî 4, 20,  
31, 48, 94, 83, 141,  
143, 170

Hetawî Kurd (Kovar;  
1913-1914) 4, 49,  
50, 56, 57, 58, 74,  
86, 112, 131, 154,  
176, 193

Hîlmiyê Siwêrekî 31,  
77

Huseyn Huznî  
Mukriyanî 18, 21,  
119, 126, 127, 142,  
158, 170, 171, 237,

Huseyn Kamî (Dehrî)  
163, 164, 165, 166,

Huseyn Kenan Paşa  
(Bedirxanî) 46,  
53, 54

## J-K

Jîn (Kovar, 1918-1919)  
31, 32, 60, 68, 70,  
72, 73, 74, 75, 76,  
77, 78, 86, 92, 108,  
133, 136, 137, 139,  
140, 141, 144, 145,  
147, 150, 154, 157,  
177, 178

Jîn (Rojname, 1920)  
70, 71, 178

Kamiran Alî Bedirxan  
18, 19, 60, 72, 73,  
74, 80

Kemal Fewzî  
(Hîzanîzade) 48,  
64, 71, 77, 178

Kerkuklu Necmeddîn  
49, 57, 64, 65, 66,  
79, 99, 157

Kurdiyê Bitlisî 32, 77,  
78, 79

Kurd Te'avun ve  
Terakkî Gazetesi  
(KTTG) 45, 46, 70

## L

Lahûtî Xan 75, 76, 78

Law Reşîd 77

Lutfî (Mexlesa  
Kurdîzade Ehmed  
Ramîz) 18, 54,

Lutfî Fikrî 14, 166

## M

Mehmed Es'ed (Erbîlî)  
151, 238

Mehmed Mîhrî 1, 32,  
48, 71, 76, 133,  
134, 135, 154, 167,  
169, 170, 238

Mehmed Salih  
Bedirxan 14, 32,  
46, 49, 55, 56, 85,  
111, 142, 175, 176

Mehmed Şefîq  
(Arwasî) 48, 71,  
103, 123, 124, 128,  
133, 152, 154, 157,  
158, 168, 169, 170,  
210, 237, 238, 239,  
242, 257

Mehmed Şukrî  
(Sekban) 64

Mela Huseynê Bateyî  
(Melayê Bateyî) 2,  
18, 26, 28, 32, 103,  
105, 107, 111, 115,  
123, 126, 154, 160,  
163, 169, 209, 214,  
236, 237, 246, 248

Mela Xelîlê Sêrtî 26,  
28, 98, 117, 130,  
238

Melayê Cizîrî (Şêx  
Ehmed el-Cezerî)  
26, 28, 31, 33, 52,  
129, 152, 153, 154,  
155, 158, 169, 209,  
214, 239, 240, 257

Memdûh Selîmbegî 48,  
56, 64, 66, 68, 70,  
78, 140

Mes'ûd  
(Suleymaniyeli)  
111

Mewlânzade Rif'et 12,  
19, 64, 71, 72, 166

Mistefa Şewqî  
(Qazîzade) 48, 75,  
193

Mîqdad Mîdhet  
Bedirxan 32, 39,  
43, 46, 99, 106,  
142, 172

Mewlana Xalid  
(Şarezorî) 2, 90,  
91, 92, 146, 209,  
214, 235

## N

Nalî 26, 133, 158

## O

Omer 'Ewnî Efendî 20,  
103, 124, 125, 126,  
237

Omer Ferîd (wergêr/  
mutercim) 94, 95,  
236

## Q

Qazî Letîf 76

Qedrî Cemîlpaşa  
(Zinar Silopî) 4,  
19, 48, 64, 110,  
122, 158, 161, 163,  
167, 175

**P-R**

Pîremêrd

(Suleymaniyeli

Tewfîq) 45, 157

Rewşen Bedirxan 50

Riggs, Henry H.

(Mîsyoner) 203,

204, 205, 206, 239,

258

Rojî Kurd (Kovar,

1913) 13, 14, 18,

49, 54, 55, 56, 57,

58, 70, 74, 78, 85,

110, 111, 118, 142,

175, 191

**S**

Seîdê Kurdî 12, 45, 47,

53, 82, 114, 137,

161, 170

Seyîd 'Ebdulqadir

Efendî (Nehrî) 44,

45, 53, 60, 62, 63,

72, 169, 175

Seyîd Taha (Nehrî)

117, 122

Stepan (Stephan

Tomas, Mîsyoner)

193, 194, 235

Sureyya Bedirxan

(Azîzî Ehmed) 46,

47, 48, 157, 161

**Ş**

Şerefname 25, 28, 33,

52, 82, 94,

Şerîf Paşa 62, 63, 69,

72, 145, 166

Şêx Mihemedê Fersafî

98, 113

Şêx Riza (Talebanî)

146

**X**

Xelîl Xeyalî (Modanî)

13, 16, 19, 29, 31,

32, 33, 48, 49, 52,

77, 85, 103, 110,

112, 113, 114, 115,

118, 142, 149, 161,

168, 211, 236, 247

**Y**

Yûsif Ziyaeddîn Paşa

97, 93, 158

**Z**

Zaxoyî (Helbestvan)

71

